



**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

TEZA WÊNEYA HELBESTÎ  
LÎNSANSA DI HELBESTÊN KURDÎ YÊN MISTEFA BEGÊ KURDÎ DA  
BİLIND BARZÎ ABDULKHALEQ SALAHALDIN SALAHALDIN

**ŞAXA MAKEZANISTA  
ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

**RÊBANDAN – 2017**

**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ**  
**ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZINDÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZÎMAN û ÇANDA KURDÎ**

**Teza Lîsansa Bilind**



**Wêneya Helbestî di Helbestên Kurdî yên Mistefa Begê Kurdî da**

**Barzi Abdulkhaleq Salahaldin SALAHALDIN**

**14950001081**

**Şêwirmend**

**Alk.Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ**

**WAN- 2017**

**T.C.**  
**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Yüksek Lisans Tezi**



**Mustafa Begi Kurdi'nin Kürtçe Şiirlerinde İmge**

**Barzi Abdulkhaleq Salahaldin SALAHALDIN**

**14950001081**

**Danışman**

**Alk.Doç. Dr Nesim SÖNMEZ**

**VAN – 2017**

## ETİK BEYAN SAYFASI

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında (Wêneyê Helbestî di Helbestên Kurdî Yên Mistefa Begê Kurdî da).

Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi.

Tüm bilgi belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumumu.

Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi.

Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı.

Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak hayıplarımı kabullendiğimi beyan ederim.

KURTE .....	iv
ÖZET .....	v
ABSTRACT.....	v
PÊŞGOTIN .....	vii
SPASKIRIN .....	viii
KURTBÊJÎ.....	ix
DESTPÊK .....	1
1.1:Têgih,Rêman û Pênaseya Wêneyê Helbestî.....	2
1.2. Giringîya Wêneyê Helbestî Di Rêbazên Wêjeyî da.....	12
1.2.1.Rêbaza Klasîzim .....	13
1.2.2.Rêbaza Romansîzm.....	19
1.2.3 Rêbaza Rîyalîzm .....	25
1.2.4Rêbaza Parnas .....	29
1.2.5.Rêbaza Sîmbolîzm (remzî).....	31
1.2.6.Rêbaza Dadaîzm .....	33
1.2.7.Rêbaza Suryalîzm .....	34
1.3. Pêkhatayên Wêneyê Helbestî.....	36
1.3.1. Ziman (Language).....	37
1.3.2. Aşop-Endêşe (Imagination) .....	43
1.3.3.Bîr (Idea).....	48
1.3.4. Soz (Emotion) .....	50
1.3.5.Bûnmend (Waqî'î, real) .....	53
1.3.6. Hidam, Hişmendî,Nest (Unconsciousnesis) .....	54
1.4. Jiyan û Serdema Mistefa Begê Kurdî (Kurdî).....	56
2. Cureyên Wêneyê Helbestî di Helbestên Mistefa Begê Kurd da: .....	60
2.1. Wêne Li Rûyê Hestî û Jîrî:.....	61
2.1.1. Wêneyê Hestî .....	61
2.1.1.1.Hesta Bînînê.....	62
2.1.1.2.hesta Bihîstinê .....	65
2.1.1.3.HestaBêhnkirinê.....	68
2.1.1.4.Hesta Çejtine .....	69

2.1.1.5. Hesta Berketinê (berkewtin) .....	70
2.1.2. Wêneyê Watayî (El sure al ma'newîye).....	72
2.2. Wêne Li Rûyê Rawestan û Livê (Lebatê).....	74
2.2.1. Wêneyê Rawestyayî (westaw) .....	74
2.2.2. Wêneyê Lebatî (livî,culaw).....	76
2.3. Cureyên Wêneyê Helbestî Li Rûyê Pêkhateya Şêwazê ve .....	79
2.3.1. Wêneyê Tinazî (Daşorîn, hîcîw, hîciw) .....	79
2.3.2. Wêneyê Felsefî.....	83
2.3.3. Wêneyê Derûnî .....	87
2.3.4. Wêneyê Remzî .....	91
2.4. Wêneyê Ronbêjî (Rûnbêjî, Beyan) .....	94
2.4.1. Wêneyê Lihevçiwandin (El-sure teşbiye) .....	95
2.4.2. Wêneyê Xwastin (El-sure el-îstîariye).....	99
2.4.3. Wêneyê Xaze (Al sure al-mecaziye).....	103
2.4.4. Wêneyê Dirkeyî (El-sure el-kînaye) .....	106
3. Çavkanîyên Wêneyê Helbestî Li Ba Mistefa Begê Kurdî .....	108
3.1. Çavkanîya Hêsinî (xudî) .....	110
3.2. Çavkanîya Mijarî (Babetî) .....	113
3.2.1. Çavkanîya Neteweyî (Xwemalî).....	114
Çavkanîya Wêjeya Kîlasîk (Helbestvanên Hevserdem) .....	115
Çavkanîyên Kelepûra Gelî (Millî): .....	123
Helbestên Folklorîya Kurdî (Şî`rî Folklorî Kurdî).....	124
Efsane: .....	125
Destan: .....	128
Gotinên Pêşîyan .....	133
Kevneşopî(Dabûnerî).....	135
Siruşt (Xweza, Xwerist).....	137
3.2.2. Çavkanîya Cîhanî.....	139
A-Çavkanîya Dîrokî:.....	140
B-Çavkanîya Ayînî (Dînî):.....	141
1-Dîne Zerdeştî .....	142
2-Dîne Mesîhî (Xirîstîyanî).....	143
3 -Dîne Îslamê .....	144

Encam .....	146
ÇAVKANÎ .....	148



## KURTE

Di vê nameyê da ku bi navnîşana ‘‘Wêneyê Helbestî di Helbestên Kurdî Yên Mistefa Begê Kurdî da’’ye ku şîrovekirina wêne helbestên helbestvane. Me di vê vekolînê da rêbaza şîrove û wesfî bi kar anîye û ji sê beşan pêktê, beşa yekem bişêweya teorik e ku; ji çar teorîyan pêktê. Herwiha beşa duyem ku beşeke piratîkî ye ku ji çar tewereyan pêkdê. Beşa sêyem jî ku bi şêweyê piraktîkîye. Ji ‘‘çavkanîyên wêneyê helbestî li ba Mistefa

Begê Kurdî’’ pêktê ew jî ‘‘çavkanîyên hêsîn’’ û ‘‘çavkanîyên mijarî’’. Çavkanîyên mijarî jî ji çand beşên din pêktê, wek ; Çavkanîyên Helbestvanên Kîlasîkî (hevserdem) ku Nalî û Salim e. Herwiha ‘‘Kelepûra (Çandî) Neteweyî’’ ku çend mijaran li xwe digre, wek; Helbestên Folklorî, efsane, destan, gotinên pêşîyan, kevne şopî û, siruşt.

Herwiha ‘‘çavkanîyên dînî’’ jî beşe ke giring ya dîwana helbestvan e, ewdîn (ol) jî; Dîne Zerdestî, Dîne Mesîhî (Xiristîyanî) û Dîne Îslamê ne ku li ba helbestvan bûne çavkanîya helbestan.

Peyvên giştî ‘‘wêneyê ronbêjî’’ û ‘‘wêneyê daşorîn (hicîw)’’ û ‘‘wêneye felsefî û wêney derûnî’’ û ‘‘wêneyê remzî’’



## ÖZET

Mistefa Begê Kurdî'nin Kürtçe Şiirlerinde İmgecilik adındaki bu çalışmamız şairin şiirlerinde kullandığı imgelerin yorumunu içeriyor. Yorum ve vasıf yöntemlerini kullandığımız ve üç bölümden oluşan çalışmamızın teorik biçimindeki birinci bölümü dört alt başlıktan meydana gelmektedir.

Aynı zamanda çalışmamızın pratik biçimindeki ikinci bölümü de dört alt başlıktan oluşmaktadır.

Bu kaynakçalar özlü ve konulu kaynakça olarak ikiye ayrılır ve konulu kaynakça da birkaç kola ayrılır.Örneğin Klasik Dönem şair kaynakçası olarak Nalî ile Salim'ı gösterebiliriz.

Aynı zamanda milli kültür kaynakçaları olan folklorik şiirler, efsane, destan, atasözleri, gelenek, görenek ile doğa ve dini kaynakça olan Zerdüştlük, Hıristiyanlık ile İslamiyet de şairin divanındaki şiirlerinde kullandığı ve yararlandığı önemli kaynakçalardır.

Sonuç olarak, çalışmamızda şu imgeleri kullandık: Biçimsel ve Bileşen Olarak İmgeler: Hicivsel imgeler, felsefî ve psikolojik imgeler, sembolik imgeler.

## **ABSTRACT**

This thesis entitled "Image Poetry in the Kurdish Poems of Mustafa Beg Kurdi" contains the explanation of the poet's Image Poetry. In this study, explanatory and descriptive methods are used. The study consists of three sections. The first section which is a theoretical section consists of four sub-branches: The first one is dedicated to the concept and dialect of image poetry. The second sub-branch is dedicated to the importance of image poetry in the literary movements. The third one is about the components of image poetry. The fourth one is about Mustafa Beg's life and time. The second section which is a practical one consists of four sub-branches: The first one is about image in terms of senses and abstract meaning. Image in terms of sense is that which is identified via the five senses of human being, and image in terms of abstract meaning is one which is not identified via the five senses. The second sub-branch talks about image in terms of stopping and movement, as they can be understood by their names that there is not any movement in those images that are stopped, and there is movement in the movable images. The third sub-branch explains image in terms of component and shape like satire image, philosophical image, psychological image, and symbolic image. The fourth sub-branch is about rhetoric image which consists four other parts like simile, personification, metaphor, and conceit. The third section which is a practical one talks about Mustafa Kurdi's sources of image poetry such as subjective and objective sources. Objective sources consists of some other parts like sources of classical poets like Nali and Salim, local cultural sources which contains some subjects like folklore poetry, myth, epic, adage, traditions, and nature. The poet is a religious source of an important part of his poetry book. Those religions which became sources of poetry for the poet are Zardash, Christianity, and Islam.

## PÊŞGOTIN

Di serî da ji bo beşa yekem ji bo ku bi şêweyekî zanistî zelalkirina têgiha wêneyê helbestî rêbaza wesfî bi kar hatîye, di her du beşên din da jî ji bo diyarkirina şêwaz û çavkanîyên wênehelbestên helbestvan me sûd ji rêbaza şîrovevî wergirtîye. Ji ber wêna veroka vekolîna min ji kurtekên ku bi zimanên kurdî, îngilîzî û tirkî û herwiha ji pêşekî, sê beş, encam û lista çavkanîyan pêk tê. hatîye.

**Beşa Yekem:** Bi ser çar tewere da dabeş dibe, her tewere behsek girînge ji bo vekolînê. Di tewereya yekem da me behsa rêman û têgiha wêneyê helbestî kirîye, ya duyem da me behsa girîngîya wêneyê helbestî di rêbazên wêjeyî da kirîye. Di tewereya sêyem da me behsa pêkhatîyên wêneyê helbestî kirîye, ya çarem da me bi kurtî behsa jîyan û serdema helbestvan kirîye.

**Beşa Duyem:** Ji coreyên wêneyî helbestî di helbestên kurdîyên Mistefa Begê Kurdî da pêktê ku çar tewere ye û ev jî bi hoya pîvana rêbaza şîrovevî ye. Me di tewereya yekem da ew wênehelbestên helbestvanê xwe destnîşankirîye ku di kevine ber hest û jîr (zeka), herwiha di tewereya duyem da me ew wêneyên di rewşa rawestan (bê liv, bêlebat) û livê da ne dest nîşan kirîye. Di tewereya sêyem da me şêwaza wênehelbestên helbestvan diyar kirîye, ya çarem da jî me bi hoy û hunera rewabêjî ku ji wêneyê li hevçiwandin, xwastin (îstî'are), xaze (mecaz) û dirke (kinaye) pêktê destnîşankirîye.

**Beşa Sêyem:** Me çavkanîyên helbestên helbestvan dest nîşan kirîye ku çavkanîyên hêsînî û mijarîne. Çavkanîya mijarî ji çend şaxan pêktê; çavkanîyên helbestvanên kilasîk (hevserdem) ku Nalî û Salime, kelepûra neteweyî weke helbestên folklorî, efsane, destan, gotinên pêşîyan, kevneşopî, siruşt. Çavkanîyên cîhanî jî çavkanîyeke girînge ku helbestvan pê wênehelbestên xwe binexşîne, me ew jî weke du coreyan destnîşan kirîye.

## **SPASKIRIN**

Spas û şukran ji bo Xwedayê Mezin (C.C) ku alîkarê min bû û temen da min ji bo temam kirina vê vekolînê ku bi şêweyekî rastî û pakî ji bo xizmetkirina çiraya ronakîya fêrbûn û zanînê. Herwiha spas ji bo malbata min bi taybetî xweşdivî û hevalên hemû jiyana min ku ew jî dayik û bavê mine ku ji seretaya xwendina min heta îro bi dil sozî ez perwerde kirim ku bi karibim serkeftî bibim. Herwiha spas ji bo hevsera jiyana min FirmêskXan ku di demên xweşî û nexweşîyê da alîkaraminbû ji bo serkeftinê. Spas ji bo gelekî birêz Dr. Nesim SÖNMEZ ku her ji yekem roja xwendina min bidilekî mezin û sozanealîkarîyeke mezin ve derîyêzanist û zanyarîyê lirûyê min vekir ku bi karibim serkeftî bibim. Herwiha spas ji bo mamostayên gelekî birêz Dr. Adil Germîyanî û Dr. Îdrîs Ebdulla, M. Rûmet Riha Aydın, M. Ferman, M. Awat û M. Umêd ku di dem û gavên pêwîst da alîkarê min bûn ji bo serkeftin û temam kirina vekolîna min.

## **KURTBÊJE**

amd. : amadekar

b. : berg

b.n. : berhema navborî

ç. : çap

d.x.l. : dirûda xwedê Leser be

dr. : dîktor

d.k. : dîwanî kurdî

h.b. : heman berhem

h.w.d. : her wekî din

hj. : jimar

k. : koçî

m. : mamosta

r. : rûpel

## DESTPÊK

Têgiha wêne li ba pirranîya mirov an mijareke hestpêkirîye, sûda wêne ji seretaya di rust bûna (çêbûna) mirovan heta îro he bû. Wekemînak wêne di serdemên seretada zimanê got û bêj û pêwendîya navbera takekesan bû, ev jî bi belgeyên dîrokî û zanistî ve hatiye mîsogerkirin. Çimkî mirovên sereta bi nexşan di na wêne li sertiş tîn der dorê ji hev tê di gihîştin, dîsa bi der bas bûna demê û serdeman û herwiha bi pêşketina şaristanîyetên mirovî giringîya wêne pirrtir û zêde tîrbû. Heta wêradeyê ku wêne liba helbestvanan bû beşeke serekî ya helbestan, herwek em di bînin helbest coreyê serekîya wêneyê û li serhêsina (xûdî) wêne berde wame û manîna xwe bi hoya wêne misogerkirîye. Ji ber wê giringîya wêne rojbiroj zêdetir dibe, li hemû warê jîyanê û bi hemûcorên xwe ve.

Navnîşana vê nameyê ji "Wêneyê Helbestî Di Helbestên Kurdîyên Mistefa Begê Kurdîda" pêktê, vê ve kolînê ji du xalên giring çavkanî wergirtîye, ew jî; giringîya mijara wêneyê helbestî wek giringtirîn xasiyet û taybet mendîya helbestê. Çimkî eşkere ye wêne dirustker û binaxeya hemû deqên helbestê ye, loma bi şêweyekî zanistîyane em li ser rêman û pênaseya wêneyê helbestî ra di westin herwiha me giringî û pûteya wêne bigiştî û bitaybetî jî di rêbazên wêneyê da xisterû. Herwiha helbestvanê me zinyê kurd Mistefa Beg ku bi ber navê "Kurdî" tînakirin ev helbestvanê mezin dikeve qonaxa kilasîk û yek ji wan helbestvanên ku ji wan re tê gotin "Sêkuçkeyên Helbestên Baban". Vekolîna me ya di derbarê vî helbestvanî di cihê xwe da ye, çimkî gelekî kême li ser vî helbestvanî vekolîn hatine kirin û awirhatîye dayin berhemên wî. Ew vekolîneyên li ser hatine kirin tenê bişêweyekî lawekî (neserekî) bûn, ji berwê me yekser û bi şêweyekî serekî li ser vî helbestvan êmezîne vekolînek baş û rêkûpêk kir. Armanceke mezînya vê lêkolînê heye, ew jî nîşandana giringî û ciwanîya wêne helbestane bi mînakên wêne helbestên Mistefa Begê Kurdî. Herwiha bi vê ve bi pênavn îşan û naveroka lêkolînê ev em esînorê helbestên helbestvanê xwe di yar kir, çimkî weke ku eşkereye helbestvan bi kurdî û farisî helbest nivîsandîye me di lêkolîna xwe da bi tene helbestên kurdî wergirtîye. Jiber wê sînorê lêkolîna me dikeve panî û fireh bûna helbestên wîyên kurdî, pêwîste em amajeyê bi xaleke giring jî bi kin ku bandora helbestvanên farisî liser Mistefa Beg xuya dibe. Lê ji ber wê lêkolîna me sînardar bû bi helbestên wîyên kurdî ve, me di vê lêkolînê da rêbazên wesfî û şîroveyî bi kar anîye.

## 1.1:Têgih,Rêman û Pênaseya Wêneyê Helbestî

Wêneyê helbestî di wêjeyê da û bi taybetî di helbestêda pûte û giringiya wê heye di hîmdanîn û berhemanîna metnek helbestên zindî.Wek çawa hebûn û mayîna mirovan di jiyandêda girêdayîye bi can (ruh) ew jî hebûna helbestan girêdayîye bi wêneyê helbestî.Çimkî her teksta helbestekê ku wêne têda nebû ji ciwanî û çêja helbestê bêpar dibe (dimîne).“*Têgiha wêneyî (Imagisim=imgecilik)ji nişkave ji dayik bûye,ku demekê Ezra Pound û Hîwim li odeyek çayxaneyê di nava Muzexaneyê Berîtanya rûniştibûn guh li Hilda Doolittle digirtin ku helbestek dixwend wê gavê Pawend yekser bi dengê bilind xweşhaliya xwe derbirrî (îfade kir) û hawar kir:Ev helbesteke wêneyî ye!*”<sup>1</sup>.Di ferhenga Hembane Borîne ya Hejar Mukuriyanî yê helbestvanê kurd li hemberî peyva “*wêne wî şikil*”<sup>2</sup>daniye.Di wêjeya kurdî da ji bilî wêneyê helbestî ev têgih jî bikar tên;Wêneyê hunerî,wêneyê edebî,wêneyê rewanbêjî, wêneyê rûnbêjî.“*Hellbete dirustbûna wêne di wêje û hunerda heta radeyekê hest bi cudahî (ciyawaziya) wan têkirin çimkî di hemû wêneyên wêjeyî da wêneyekî hunerî têda heye, lê merc nine hemû wêneyên hunerî wêneyekî wêjeyî têda hebe*”<sup>3</sup>Dema ku helbestvan bi tekstek helbestî wêneyê gernasekî(gernas=palewan)yan ciwaniya siruştê dike,yaxud bi helbestê ciwantirîn wêneyê helbestî derbarê karesatek yan jî sitemek (zilm) ku bi ser gelê wî/wê da hatiye wêne dike(dixe rû),wekemînak gelek helbestvanên me bi helbestan karesata kîmyabarana Helebce wêne kirine.Di virda ev wêneya wêneyekî wêjeyî ye,çimkî yek ji coreyê wêjeyî ku helbeste ev wêneya pê kişandiye,herwiha wêneyekî hunerîye ku bi rêya peyvan nexşandine.Dema ku wênekêş tê be pênûs û firçe û boyaxên rengareng wêneyê vê karesatê ji bo me dikşîne ev tenê wêneyê hunerîye, hîç wêneyekî wêjeyî têda tune.

Herwiha di wêjeya erebîda sure şî'rîye,sure fenîye, sure el edebîye û di wêjeya farisîda sure xiyal” bikartê, herwiha “*peyva wêne (image) di îngilîzîda amaje ji bo ew reha hevbeş dike ku digel peyva xeyalda (imagination) heye ku bûye sedema hevbeşiya wan di yek warê zanîn û perwerdêda û ew peywendiya bihêza ku di*

<sup>1</sup> - ‘Adil Germîyanî,*Şa’îranî Wêneyî û Çemkî Wêney Honraweyî*, ko.Raman,2001, J. 61,r35

<sup>2</sup> -Hejar,*Henbane Borîne*,Ferhengî Kurdî-Farisî,Çapxaney Sirûş, Çapî Heştam, r933

<sup>3</sup> -Arî Sûbhî Koyî,*Wêney Hunerî Le Şî’rî Nalî da*, ko.Kosar,2002, J.2-3,r246

*navbera xeyal û wêneda heye bi wê pîvanê (sedemê) wêne giringtirîn şênberên xeyale di helbestanda''.*<sup>4</sup>

Wêjeya Kurdî weke piraniya wêjêya gelên dinê cîhanê sereta bi helbest destpêkiriye, ji ber wê bûyina wêneyê helbestî bi destpêka helbestêye, wata wêneya helbestî di serdemek diyarkirî (bellî) da dirust nebûye û di serdemek diyarkirî da temaw nabe, heta helbest berdawam be wêneyê helbestî jî berdewam dibe. "Wêneyê tişteki nuh (nû=niwê) niye, di wê dema ku helbest hebû weke nika dîsa piştî xwe dida wêneyan (ji wêneyan materyal disend), lê li rûyê bikaranînê her helbestvanek bi şêweyekî cihê bikartînin herwek çawa di nava helbestên kevn (klasik) û nuh da ciyawazî heye".<sup>5</sup> Wata wêneyê helbestî ji aliyê helbestvanan bi pê dem, şûn (cî) û rêbazên wêjeyî guherîn bi ser da hatine ku qonax bi qonax giringî pê hatiye danîn û wêneyên nuh nexşandine ku di qonaxa pêş xwe da nebûn. Di qonaxa wêjeya kilasîkî wêneyê helbestî bi dîtî û wêneyê rewanbêjî da bi hunerên lihevçiwandin (teşbî) û xwastin (îstî'are) û Dirke (kînaye) û xaze (xwaze, mecaz) herwiha pabendbûna wan bi zanista kêşa 'erûzî û yekitiya Serwa (dîsgotin, qaffîye) da hîn zêde derdikeve. 'Erûz ku kêşa helbestên 'erebîye û digel hatina dînê îslamê ketiye nav helbesta kurdî û bûye binemayek di wêjeya kurdîda. Herwiha di qonaxa nuh da wêneyê helbestî xwe ji kêşa 'erûz derbas dike ku ji bilî wêneyên ronbêjî çend corên din ye wêneyê li xwe digire (têda heye) ji wan "wêneyê remzî, wêneyê zeynî, wêneyê efsaneyî".<sup>6</sup>

Herwiha di helbesta nuh da "wêne materyalê guzarîşte (têgîn) ku dîmenekî zindî diguhezîne û ezmûna mirovayetî kurt (zelal) dike. Di helbesta nuh da heman (regez) yan naşîrîniya wan hîç giring nîne, belkî giring ewe ku ew wêneya bi giştî ta 'bîr (guzarîşt) li hestên rastgo bike û bi şêweyekî canecan biguhezînin".<sup>7</sup> Di qonaxa helbesta hevçerx da helbest bi temamî xwe ji benda (girêdana=pabendbûna) kêş û serwa derbas dike, di virda erka wêneyê helbestî rêze rêze (xelek=elqe) û parçeyên helbestê girê dide, ji bo ku wêneyên tak (tek) bi şêweyekî yekgirtî û tevlihev derbikevin û ji helbestên kevn (klasik) cuda wateya helbestê xwe di wêneyên tak û

<sup>4</sup> - Serdar Ehmed Hesên Gerdî, *Binyatî Wêney Hunerî Le Şî'ri Kurdî da (1970-1991)*, Silêmanî, Dezgay Serdem, 2004, r25

<sup>5</sup> - Îhsan Ebbas, *Fen Şî'r, Teb'e Salîse, Tewzî'* we Neşir Dar Seqafe we Beyrût, Lubnan, s230

<sup>6</sup> - Ferhad Qadir Kerîm, *Binyatî Wêney Le Şî'rekanî Hemdî da*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2012, r34

<sup>7</sup> - Cebbar Ehmed Hisên, *Îstatîkay Deqî Şî'ri Kurdî Kurdistanî 'Iraq*, Çapxaney Serdem, Silêmanî, 2008, r94-95



çend amancên diyarîkirî da dibîne. Wêneyê helbestî di qonaxa hevdem (nûdem=hevçerx) da ji goşenîga (raman, dîtin, goşewir) û xezîneya xeyala helbestvanda bi şeweyekî cor bi cor û azad derdikeve. ‘*Helbesta azad ew helbeste ku divê(dixwaze) helbestgerî (şûriyet) bê rêzbend (qafîye)dirust bike û bi helbestgerî dirust dike. Li ciyê (şûna) wê(rêzbend) bi muzîka ‘erûzî helbestan dirust bike, bi muzîka nav (daxilî= nawekî) dirust dike yan bi wêneyê awaz (arya, selîqe, melodî=niwa)û forma teze*’.<sup>8</sup> Dema ku helbestvan d’*inîgarxaneya (album) xeyalda*’.<sup>9</sup>bi ezmûna nîgarkêşan di tabloya huneriya xwe da û dîmenê siruşt û xeyal û gengaz (ketwar=waqî’î) û hinav û derûniya xwe tevhev dike,di temamê şahreh (şahdamar) û xwînî û laşda dixê ser zar bi rêya deng yan nivîsê ciwantirîn tabloya wênehelbestî dikşîne bi peyvan. ‘*Di helbestên azad da bîr bûye wêne, wêne jî bûye bîr, paşê wêneyê hunerî ron bû ku wesîleyeke ji bo nêrîn û dirustbûn û derbirrîn di helbesta serbest da, çimkî şoreşa helbesta azad şoreşek bû bi wêneyên hunerî encama xwe da.Wêne keresekekî (materyal) serekiya dirustbûna derbirrîna (îfadekirina) ezmûna helbestvane bi hemû aliyên digel naverok û taybetmendiyên wê ezmûnê ye*’.<sup>10</sup>

Divirda ev wêneya neynika (‘eyne, awêne) helbestvane û helbestvanê/a me wek xwe nîşan dide,wate eger helbestvan di rewşek derûnî û hêvî û bendewariyek bilind û baş da be ew wênehelbesta bi heman şewe dibe,lê eger bi berevajî (pêçewane)be helbestvan wê wênehelbesta xwe bi haweyekî (awa,cor) bêhêvîtiya xwe nîşan dide.Herwiha‘*wêneyê helbestî dibe alavek ji bo helbestvan peyama xwe di çarçeweya metnekêda ji bo xwendevan (xwêner =wergir) û guhdaran biguhezîne ta ew rewş û dîmenên balkêş û ew hestên pê dike û ew tiştên di dil û deruna wî/wê da dizîvire bigihîne xwêner*’.<sup>11</sup> Loma wêneyê helbestî peywendîyek bihêze di navbera helbestvan xwêner çimkî bi rêya wê ezmûn û behreya (bîrberî=qabîliyet) helbestvan derdikeve, di wêneyê helbestî da helbestvan temamê qudreta xwe beyan(aşkira) dike. Ewê ku helbestvan ji kesên din cihê dike li rûyê dîtin û xeyal û ziman û hestên ciwan Yên dîtina helbestvan e,‘*wêne ji aliyê mirovên asayî tê dîtin, hest pê têkirin lê hej*

<sup>8</sup> -Ferhad Pîrbal,*Şî’rî Nwêyî Kurdî,1898-1958*, Dezgay Kurdistan,Hewlêr,2005,r88

<sup>9</sup> - ko. *Beyan*: J.(31) 1975

<sup>10</sup> - Saman Îzeddîn Sa’dûn, *Binyatî Hunerî Le Şî’rekanî Letîf Helmet da*, Çapxaney Kemal, Silêmanî, 2009,r248

<sup>11</sup> -Şaxewan Ferhad, *Şî’ryetî Wêney Şî’rî*,ko.Raman,J.214,r47

(lerz) û Gumîneke demî ye û vedimire, lê li ba helbestvan dibe weke çivîkekê (çûçik, çûk) û bi tora mêjî (zîhîn, zeyn) dinivîsîne,wek pizota jêr xweliyê bi geş û gurbûna xwe dimîne. Dawiyê taqîkirin û ezmûn û rewşa (derûnî, êş û elem...) wî/wê bi xwe ye, yan babetî yan jî digel aşna dike îjar bi wêneyekî biriqandî(direwşawe)û ji bêbir (berdewam )bi bergeke nexşandî vedigerîne nav himbêza (baweş) civaka xwe''.<sup>12</sup> Dema em di gengazêda (waqî'î ) dîmeneke estetîkî dibînîn dibe ku ew dîmena bi asanî ji yad û xeyala me biçe em hest bi vî dîmenî ciwan nakin lê helbestvan gelekî (pîrr=zor) bi haweyekî(awayekî) hûrbînî hest bi vî dîmenî dike. Demekê ku baran dibare baran û dilopên (çilk) hûr yê baranê bi ronkayiyên kolanêda dibare hestê helbestvan gelekî bi awayekî hûrbînî danûstandinê (ma'melle) digel vî dîmenî dike û di kana (kanga) xeyalî da ji asteke herî berz û bilind ya ziman di metneke helbestî da ji bo xwêner dişîne û beyan dike wêneyekî ciwan dikşîne. Wata (yanî) "çavkaniya yekemin ya wêneyê helbestî waqî'î ye, lê piştî destkarîkirinan ne ku xistinerû ya waqî'î weke xwe''.<sup>13</sup>

Helbestvan di vê rewşa wêneyê helbestî da dû cihanan tevîhev dike; cîhana bûyinê (waqî'î) û cîhana taybet bi xwe,di wê gavê da helbestvan xeyala ku di bîra wî/wê da ma be û dernebirî be û hêlên (dîw) veşartiyên xwe ji bo me eşkere (berçav=aşkîra) dike û xwe hogirî (aşna)xwêner(wergir)dike."Wêneyê helbestî ji valatîyê (boşahî) dirust nabe dibe ku (belkî=belkû) ji hemanên (regezekan) nav waqî'î pêk tê ku helbestvan destkarî dike bi şêweyê hilqetîn (labirdin) yan misogerkirin (cextkirdin) li ser aliyên wan, paşê careke din li ber ronîya hilketina (helçûn) taybetiya wê da pêk tîne ta dibe wêneyekî nuh''.<sup>14</sup>

Helbestvan gelek car bi wêneyê helbestî nebe nikare berhingarîya tiştên derdor û ew cîhana ku têda dijî bigre di her gava hilketinê da,yekcar (yekser) hana (tiştên ku pêwîstî bi wan hebin) ji bo vê hemana helbestê tîne,xwe têda betal dike û aramiyê dide derûniya xwe bi sedema ew rewşa derûniya pêda derbas dibe.Her ji ber vê ye ku li gor lêkolerên derbarê helbestê lêkolînan dikin wêneyê helbestî"wek hemû hunerên din pêwîstî bi behre, rewşenbîrî, taqîkirin, karkirin, çêja perwerdekirî, taybetî,

<sup>12</sup> - Muhsîn Aware,Rengdanewey Wêne le Şî'ri Kurdî da, Ko.Roşinbîriy Nwê, J. 75, 1979,r61

<sup>13</sup> - Xelîl Îbrahîm Mistefa,Şî'ryetî Deq Be Nimûney Şî're Kurdîyekanî Mehwi,Namey Master,Zankoy Selaheddîn,2009,r108

<sup>14</sup> - Fatîh Ellaq,Mefhûm El Şî'r 'Înde Rude El Şî'r El 'Erebî El 'Hur, Menşûrat Îtî'had El Kîtab El 'Ereb,Dîmeşq,2005,s263

*şarezayî û zanyarîyên kûr û dûr heye*''.<sup>15</sup> Çimkî hîç guman têda niye wêneyê helbestî mijareke(babet) serekî yê helbestêye loma pispor dibêjin: ''*Wêneyê helbestî hunerîtirîn beşe di binyata helbestêda*''.<sup>16</sup>

Bêguman rêkeftin ji bo pênaseya her têgiha wêjeyî wek têgiha wêneyê helbestî pênase û mebest wê jî bi asanî hest pê nayê kirin. Digel çawayî diyarkirin û teknîkên yekalîkirên wê yek nayê girtin, wata wek pirranîya têgihên wêjeyiyên din şeweyekî tevlihev û pert û belav heye û ji serdemekê ji bo serdemek din guherînek bihêz bi ser da tê û ev pirsgirêk jî wek gelek wêje û huner û zanistên din tijîye (tije) ji bihevdaçûn û lihevhelweşandina berdewam, loma cudahiya bîr û raman di van cureyên lêkolînanda karekî gelek asayî ye. Ji ber wê eger em bixwazin pênaseyeke xwerû (petû, puxte) ji bo wêneyê helbestî bikin ewe ku her rexnegirek û Lêkoler û helbestvanek bi cûreyekî cuda raman û dîtînen xwe hene di derbarê wêneyê Helbestî da. Ev jî bi pê pêwîstiya çend pênaseyan em dixin rû, di serîda bi pisporên wêjeya kurdî emê destpêbikin. Dr. Kamil Besîr dibêje; ''*Wêneyê hunerî bi wê behs tekirin ku serencama (encama tiştan) taqîkirî û hestkirina bêjere (helbestvan), bêjer di jiyana xwe da wêneyê tişt û miştên cîhana hestpêkirî (tiştên şênber) di yada xwe da tomar dike û di dîtînekê da coreyên zanyarîyê rûnûs dike (dixe nivîsînê. Bi nivîsandîne ve eşkere dike). Materyalekî taybetî bi xwe bidest dixê bila di baringarî soz û hilketînek xwe û zatî bi, hêza şayişê (endêşe) kêr (wec=sûd) ji wê materyalî bidest hatiye anîn werdigire. Nêrîn û wata û hestan bi wê sedemê dihewîne, ev hewandina jî ku bi peyv û hevok û dariştina şewazî encamê dide ku jê re tête gotin *Wêneyê Hunerî*''.<sup>17</sup> Wata wêneyê helbestî berhema soz û şayiş û bîr e. Dr. Îdrîs Ebdulla di derbarê wêneyê helbestîda dibêje: ''*Wêne ew tabloye ku bi rêya soz û berdillî (xoşewîstî) û bîr û xeyalan ve helbestvan bi peyvên nazik û ciwan tîne holê ku şewazekî bandorî ji bo wî/wê dirust buye*''.<sup>18</sup> Wate helbestvan bi rêya hest û hemanên helbestê ciwantirîn tabloya wêneyê helbestî dinexşîne. Herwiha Letîf Hellmet'ê helbestvan di derbarê wateya wêneyê helbestî dibêje: ''*Nabe helbestan binivîsinin û wêneyê helbestî têda nebe û bibêjin helbesteke serkeftiye, icar helbest bi baweriya min ji xeyal û wêneyê**

<sup>15</sup> - Kakey Fella'h, *Wêney Şî'ri Çi'ye?*, ko. Karwan, 1986, J.49r24

<sup>16</sup> - Erselan Bayiz Îsmail, *Sîmay Şî'ri Kurdî Diway Raperîn*, 1992-2002, Be Nimûney Şî'rekanî Rojnamey Kurdistanî Nwê, *Çapxaney Serdem*, Silêmanî, 2002, r142

<sup>17</sup> - Kamîl 'Hesen 'Ezîz Elbesîr, *Rexnesazî Mêjû û Peyrewkrdin*, Çapxaney Korî Znyarî 'îraq, 1983, r165-166

<sup>18</sup> - Îdrîs Ebdulla, *Şewaz*, Çapxaney Minare, Hewlêr, 2012, r32

*helbestî û ji tiştêkî ji tiştên waqî'î û ew jiyana asayî ya ku em têda dijîn û ji efsane û destanan pêk tê*'.<sup>19</sup> Bêguman her wêneyekî helbestî ku xeyal têda nebe ew li guftûgo û qiseyên asayî yên navbera kesan diçe, ji ciwanîya metnek helbestî dûr dikeve. Dr.Refîq Şiwanî di pênaseya wêneyê helbestî da dibêje: '*Ji derbirîna bi şewazeke ciwan û gelekî xeyalî pêk tê di wêneyekî bilindda, wate derbirîna bûyer û dîmenê balkêş bi şewe û wêneyekî bilind û bihêz ta kar bike ser hest û hidama (nest) derûnîya mirov û têxe deryaya xeyal û hinava mirov bihejîne û bandordar be*'.<sup>20</sup>

Diyare ku helbestvan bi kameraya zûm ya rengareng û bi balkêşiya hûr û hestê ciwan dikare wêneyê me yê nuh pê bibexşîne ku digel xwendin û bînîna (dîtina) mirov di dema xwe ya asayî da bikeve wê cîhana ku helbestvan wek cîhanek ku taybet bi xwe dirust dike. Di vir da em jî têda digerin (geştê dikin), bi hoya vê binemaya helbestê ve ku em cîhana helbestvan nas bikin helbest jî çiqas nuh be ew wêneyê teze ji dayik dibe û xwêner (xwendevan) zêde giringîyê didê. Wata '*wêne rêyek be ji bo tiştên veşartî yên jêrî vetîreyan (diyarde), loma her demê mînakên civakî diguherin û binyata civakê hildiweşe yaxud bîr û baweriyên guherînan têda rû dide. Helbestvan gelekî ji wê dûrtir diherin û gelekî bi wêrekî li dû ew wênana digerin ku mînakên teze derdixin*'.<sup>21</sup>

Dibe em wê rastîyê jî bibêjin ku '*helbestvan di wêneyê helbestî da tiştêkî tarawî (namo) wernagire ji bo çend peyv û derbirînan belkî bi berevajîya wê hindik tiştê amadekirî diguherîne ji bo tiştê xerîb û li jêr ronayî û dîtinek nuh û bi şewazeke bendewarî nekirî pêşkeşî dike*'.<sup>22</sup> Wata ew peyv û ziman û soz û xeyal û bîrê di wêneyê xwe yê helbestî da bikartîne ku aşnayetiyê di nava '*peyamder û peyam û peyam wergir*' hebe ji bo ku xwêner zû û bi asanî bikeve nava rastîya wênehelbestên xwe. Hindik car jî kod û remz (sembol) jî henin ku Helbestvan wan bikartîne, taybetin bi helbestvan ji bo ku berhem û metnên xwe yên helbestî bi asanî ji dest bernede loma ev coreya wêneyê helbestî xwênerên (xwendevanên) zana û çalak divê ta bigihêje wêneyê xwe yê binetar (bineret=hîm, temel). Herwiha Dr.Necim Ellwenî

<sup>19</sup> - Şemêran Silêman, *Rûberû Legell Letîf Helmet*, Dezgay Aras, Hewlêr, 2011, r53

<sup>20</sup> - Refîq Mihemmed Şiwanî, *Edeb û Komele Witarêkî Edebî*, Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, Hewlêr, 2008, r50

<sup>21</sup> - S.D.Lîwis, *Sure El Şî'rîye*, El Tercume , Ehmed Nesîf El Canibî we Axîrûn, Dar El Reşîd lîl Neşir, Bexdad, 1982, r26

<sup>22</sup> - Samî Mihemmed Ebabine, *El Tefkîr El Uslûbî*, El'man, s160

di pênaseya wêneyê helbestî da dibêje ‘*Helbest axaftine di wêneda*’. *Wata helbest tenê di wêneda dikare tégînê (guzarişt, tabîr) li hemû beserhat û vetîreyan (dîyarde) bike, bê wê ku taybetmendiyên xwe ji dest bide û ji arasteyê dûr bikeve ku dibe li oxira wê bête nivisîn*’.<sup>23</sup> Helbestvan demekê ku di derbirîna helbestekê da wêneyekî nîşanî me dide ku di waqî’î da em nikarin baş têbigihêjin, helbestvan tê wê pencereya girtî ji bo me vedike û wî aliyê metnê nîşanî me dide. Em dikarin yekser têkevin nava diyalog digel metna helbesta wî/wê, çimkî di dema hûnandinê em bi wêne hest bi axaftinê dikin di helbestêda. ‘*Wêneyê helbestî kereseyeke ji kereseyan helbestê û zarê derbirîna helbestvane ji bo berbiçavkirina bîr û boçûnên ku pêwîst û hebûna wêneyê helbestî di nava helbestê da giringe wek giringiya avê ji bo darê*’.<sup>24</sup> Helbestvan take keseke ji take kesên di nava civakê da loma dema ku divê tiştêk yan wêneyê dîmenekê nîşanî me bide, ew take kerese û tiştêkî bikarîbi tabîra xwe ji bo me bibêje ew helbeste û ji wê wêne wek yek hemanên giring dibe xala gihîştina peyama helbestvan. Herwiha Jiwan Ebdulsalam dibêje: ‘*Mebest (armanc, meqset) ji wêne ewe ku bi sedema nexşandina wata di bîr û xeyala helbestvan da wêneyek diafire, divirda derbirî ku ew hest û soz û derûna veşartî yê hêsina (xud) helbestvane ku bi hoya peyvên yek li paş yek bi rêya ziman didarijîne, têda mebest û watayek derdikeve ku nikare yekser derbirîne lê bikirêt*’.<sup>25</sup>

Weke ku eşkereye helbestvan kar ji bo wê dike tiştên veşartî li rêya helbestê û bi ziman û xeyal û hest û hidama (nest) derûnîya xwe ewe ku em nikarin yekser bibînin yaxud bibihîsin ji waqî’î ew tê rastîya vî dîmenî yan bûyerê yan jî biserhatek ku di metnek helbestê da cîbicî dike û bilav dike.

Her weke di derbarê pênaseya wêneyê helbestî da nivîskarên ‘ereb jî boçûnên xwe îfade kirine, Ca’ hiz di pirtûka ‘*Al’ hîwan*’ da behsa peywendîya di nava helbest û wêne dike dibêje: ‘*Helbest dariştineke taybetîye û coreke ji dariştinêye*’.<sup>26</sup> Her di

<sup>23</sup> - Necim- Ellwenî, *Niwandinî Wêne*, [www.emrro.com](http://www.emrro.com)

<sup>24</sup> - ‘Adil Mecîd Mihemmed Germîyanî, *Wêney Babetî Le Hondrawekanî Goran û Seyyab da*, Namey Diktora, Kollejî Perwerdey Îbn Ruşd, Zankoy Bexda, 2000, r18

<sup>25</sup> - Jiwan Ebdulsalam Gerdî, *Şêwz le Şî’rekanî Kameran Mukrî Le Jêr Roşnayî Qutabxaney ‘Fîlolojî Lîw Şpîzter*’ da, Namey Master, Zankoy Selaheddîn, 2014, r180

<sup>26</sup> - ‘Umer Bin Ba’hir Ca’ hiz, *El’Heyewan*, Te’ hqîq: ‘Ebdulsela Mihemed Harûn, Mektebet Mistefa El Babî el ‘Helî, Qahîre, 1938, S136

vê dîtînê da wêneyê helbestî ji aliyekî pêkhateya zimanvanî ye û di dema dariştinê da bi pîvanek hunera taybet şêweyeke hunerî dibexşîne peyv û hevokan. Yan em dikarin bibêjin pêkanînen zimanvanî taybete bi naveroka ezmunên helbestvan û dîtinek taybetî ji şêweyek din berçav dike û di heşê xwe da wêneyê wê dikşîne. Helbestvanê nûjenxwazê ‘ereb Nazik El Melaîke dibêje: ‘*Nebûna wêne di helbestê da ciwanî û reseniya wê wenda dike, wêne di qesîde da ji bo wê nîye ku ew qesîdeya ciwan be belkî wêne be di wê qesîdeyê da*’.<sup>27</sup> Wêne ew taybetmendîyeye ku bi rêya dariştinê her metneke wêjeyî pê ciwan derdikeve, peyv yekser ji rastîya mebestan nakevin, Corek şênber bi temamî têda têdîtin, lê di helbestê da wêne materyal û tiştên ciwankarî lawekî (neserekî) nîye belkî pêdivîyeke hunerîye helbestvan nikare paşguh bixe û nikollîyê (înkâr) li bûna wê bike. Çimkî metnên helbestî bê merca wêneyê helbestî hîç giringiya wê ya hunerî nabe, bêguman nabe mayey balkêşan. Herwiha Dr. Îzeddîn Îsmâil dibêje: ‘*Wêneyê helbestî xewn e, lê xewnek asayî nîye belkî xewnbiro ye(zîndexewn) ku dîmenekî temamê wêne digire û tomar dike û hildibijêre û pêktîne*’.<sup>28</sup> Her weke eşkereye helbest ji hundurê mirov diafire (heldequle) û peywendî bi hêsin (xud) û hundurê kesayetîya mirov û bandora jînge û derdorê heye, îcar ji xewneke xeyalî yaxud ji rewşa asayîya xwe be ku cezba xeyal digire û hêvî û xewnek bilind tê ji neynika helbestên helbestvan da xwe dihewîne. ‘*Ew wêneyên nav helbestên helbestvanê jêhatî weke rêze neynikekê ji goşewirê binyada wê helbestê da nebirrî bin, ji bo ku bi ron (zelal)û rewani naveroka mijara xwe bihewînin. Ew wêne ger ciwan û rewşeke berçav û hest pê bêkirin û sêhrawî bin, tenê mijara helbesta xwe dernabirrin, belkî can û xuyaniya (rûxsar) xemilandî ji pê didin û wa dikin ku ew cana bikeve rewşeke berçav û hest pê bê kirin û bête dîtin*’.<sup>29</sup> Wêneyê helbestî dibe tîrêj (tîşik) û olana (rengdanewe) hest û soza helbestvane ku dide derdorê, derbarê pênaseya wêneyê helbestî da Dr. Mensur Ebdelrehman dibêje: ‘*Wêne berhema soza taybetiya nivîskar e û ewe jî ji hundur li hemberî bi tiştan hest pê dike dawiyê tevlihevî buna wan bi hest û sozan û zêdekirina rewşa derûniya wîjdanî û ji bo veguhestina wê jî ji peyv bo wata veguhestineke neyekser*

<sup>27</sup> - Îsmâil Tenya, *Wêney Şî'ri*, ko. Karwan, Xulî Raperîn, 1994, J. 11, r59

<sup>28</sup> - Îzeddîn Îsmâil, *El Edeb we Finûnehû*, Dar El Fikir El ‘Erebî, Eltabî‘e Eltasî‘e, Elqahîre, 2004, S 368

<sup>29</sup> - Kanyaw ‘Usman Mistefa, û Newzad Waqas Se’îd, *Wêney Şî'ri Le Şî'rekanî Racî da*, kovarî Ekadîmyay Kurdî, 2012, J.22, r69

*dibe û bi çend coreyên xazeyan (mecaz) dibe, wê deme jî wêne dibe tewereya ciwanî û sîfeta tak wêneyî hildigire û hêsina nivîskar têda olanê dide (dengvedide)*”.<sup>30</sup> Wêne hem watayan komî ser hev dike (bihêz dike) û hem hest û heşê xwêner tîne coş û kelecane û hem jî huner û desthelat û dest rengîniya helbestvan nîşan dide li çawaniya xemilandin û pêşkeşkirina bîrokeyên bi hoya xewn û xeyal û hestên xwe yên cor bi cor.

Bêguman gelek çavkanî henin ku helbestvan ji wê çavkaniyan bi dest tîne ji wan jî çavkaniya xweyî û mijarî û neteweyî û efsane.... Hwd. Gelek car çavkaniya wêneyê helbestî yên nivîskar ji ew bûyer û serpêhatiyên ku hîna di waqî’î da ji dayik nebûne yan ji siruştê derdora xwe rû nedane, wek serbixweya nîştîmana wî/wê, hişyarkirina neteweya xwe, gelek car jî helbestvan çavkaniya helbestên xwe digel bûyina bûyerên ku têda ji metneke tijî hest û soz ji dayik dibe ku wêneyê wî/wê têgîne ji ev rewşa ku helbestvan têda wêneyê xwe dikşîne.

Herwiha divê em wêya jî bibêjin ku ‘*her ew pêwendîya hevbeş ya di navbera helbest û wêne wa kiriye ku gelek car metneke helbestî bibe çavkanî ji bo dahênana tabloyeke hunerî û hinek car jî bi berevajî tabloyek weke li ber devê derî ji dayikbûna berhemeke helbestî da bike yan rûberiya (berawirdî) wan bête kirin*’.<sup>31</sup> Wata wêneyê helbestî ji du rewşên cuda (ciyawaz) dirust dibe, ku ‘*bi vê şeweyê "helbestvan "ek û "wênekeş "ek hevbeşin di bîr û xeyal û waqî’î û soz û hest û hidam (nest) vana heyvanê (hewên) dirustkirina tabloyek û helbestekê ni. Lê ku hat ser pêvajoya encamdana karê xwe helbestvan bi materyala xwe ku bîr û xeyal û waqî’î û Soz û hest û hidam e, ku di metneke helbestî da wan berçav dike materyala helbestvan ziman e, lê wênekêş di tabloyeke ciwan û qeşeng da wan berçav dike materyalên wî/wê jî firçe û boyax û rengin. Çiqas ji çend alî da (hêl) jî li hev dikin lê gelek cudahî di navbera wan da heye, ew jî bi pirranî ewe ku ew tiştên helbestvan bi hoya peyvên xwe can didê bi heman şeweyê ji bo wênekêş derbas nabe*’.<sup>32</sup>

<sup>30</sup> - Mensûr Ebdulrehman, Îttîcahat, *El Neqd el Edebî fî Qarin Xemas El Hîcrî*, Mektebet Encilû El Misrîyet, Qahîre, 1997, S368

<sup>31</sup> - Ferhad Qadir Kerîm, *Binyatî Wêne Le Şî’rekanî Hemdî da*, b.n., r29

<sup>32</sup> - Hawjîn Silêwêîsa, *Binyatî Hunerî Le Şî’rî Şêrko Bêkes*, Dezgay Serdem, Silêmanî, 2009, r20-21

Lêkolerên Ewropî giringiyek taybet dane wêneyê helbestî. ‘ ‘ *Lêkolîn di wêjeya Ewropî da bi babet (çêşin) û corên wêneyê hunerî li rûyê şêwaz û bîr di sedsala nozdehem (19) destpêdike û Firansîs Galton (1822 -1911) li Îngiltere weke pêşengê vî warî tê danîn*’’.<sup>33</sup> Sî Dî Liwîs yek ji wan rexnegirên ewropî ye di derbarê pênaseya wêneyê helbestî da dibêje: ‘ *Wêneyê helbestî wêneyeke ku bi peyv hatiye kşandin û bi hest û soz nuxumandîye (barge kirawe)*’’.<sup>34</sup> Wata dema wênekêş tê bi reng û pênûsên cor bi cor wêne dikşîne, helbestvan jî bi peyvên ciwan tijî ji hest û soz tê wêne dikşîne. Herwiha Sîmonds dibêje: ‘ *Wêne helbesteke bêdeng e û helbest jî wêneyekî dengdar e*’’.<sup>35</sup> Di navbera wêne û helbestê da pêwendiyê edebî û hunerî ya gelekî bihêz heye, heta helbestên helbestvan hebe nikare dev ji wêneyan berde, çimkî bi hoya wêneyan berdewamî û jiyana helbest û helbestvaniya wî/wê girêdayiyê wêneye. Wêne jî heta wê dema pêwîst bike kêr (sûd) ji xeyal û soza helbestê werdigire û dibe îlhamek heta ku wê sedemê wêneyekî ciwan û balkêş berhem bîne. Helbestvanê navdarê cîhanê Ezra Pound dibêje: ‘ *Bi dirêjayî jiyana xwe da yek wêneyê helbestî peşkeş bike, ji berhemanîna çend pirtûkan baştir e*’’.<sup>36</sup>

Helbest wênekêşaneke ku bi peyvên encam dide (tê holê) ku di encama van wênekêşana tabloyek dirust dibe. Di vir da erk û giringîya peyvê ji bo wêne derdikeve ku dibe hoya jidayikbûna tabloyeke ku ji hest û soza helbestvan tijî be herwiha Kolîrêdîc dibêje: ‘ *Helbest corekî wênekêşane bi rêya peyv û hevokan ve tête kişandin, bi wê mercê ku ev wêneya tijî be ji hest û soza helbestvan*’’.<sup>37</sup>

Divê em wê jî bibêjin ku helbestvan dema ku helbestên xwe bi rûyê xwêner û guhdaran dike pêwîste hişyar be ji derbirîna her tîp (pît) û peyvên. Pêwîste zimanekî sade û hest û soza ciwanîya helbestvaniya xwe bi şêweyekî rêkûpêk encam bide ji bo ev peyama ku li ba helbestvane bi şêweyekî ciwan û di wêneyekî zîndî da ji bo xwênerên xwe veguhezîne. Çimkî wêneyê helbestî giringtirîn binema û heman (regez) ji binemayên helbestê bi wê hoyê ku ji bo dirustbûna metna helbestvan ya hergav zîndî. ‘ *Helbest wênekêşana tabloyeke hunera şêwekarî ye, bê reng û*

<sup>33</sup> - ‘Adil Mecîd Mihemmed Germîyanî, *Wêney Babetî Le Hondrawekanî Goran û Seyyab da*, b.n, r41

<sup>34</sup> - S.D, Liwîs, b.n, s150

<sup>35</sup> - Semîr ‘Elî Semîr Dilêmi, *El Sûret fî El Teşkil Şî’rî*, Dar El Şûewen El Seqafet El ‘Am, Afaq ‘Erebîye El ‘Iraq, Bexdad, 1990, S68

<sup>36</sup> - S.D, Liwîs, b.n, s29

<sup>37</sup> - Hemîd Hesên Mihemmed, *Layê Hunerî û Naveroka Hozana ‘Sebrî Botanî’*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r103



xêzkêşanê tête holê û em ji vê tabloyê ra dibêjin: "helbest , wênekêşana vê jî li cihê (şûna) pênûsê boyaxên rengareng û ev wêneya bi peyvên siruştî û nazik encam dide. Wata helbestvan behremendtirîn kese ku dikare tabloyeke helbestî ya xwe bi peyvê bikşîne, baştirîn helbestvan jî ew helbestvane ku baştirîn teknîk û guncawtirîn peyvyan di wêne da ji bo helbestên xwe bikarî tîne".<sup>38</sup> Di encama ev raman û boçûnên serê ku derbarê rêman (çemk) û têgih (zarawe) û pênaseya wêneyê helbestî da me xiste rû em jî dikarin wiha pênaseya wêneyê helbestî bikin: " Helbest deryayeke ku helbestvan bi keştîyeke tijî ji hest û soz û xeyal têdaye û bi pêla (şepolle) wêneyê helbestî dunyayekê diafirîne ku her dilop dibe tîpek û baran jî dibe û peyv bi wan wêneyekî dinexşîne".

## 1.2. Giringîya Wêneyê Helbestî Di Rêbazên Wêjeyî da

Her digel dirustbûna (çêbûna) dîroka wêje rêbazên cihê cihê ser bi ekolên wêjeyî serîhildan, ev rêbaz di serdemên diyarîkirî û qonax bi qonax hatine qada (meydan) cureyên wêjeyê ku di serdemên cuda da hest bi hebûna wan dihate kirin. Dîroka ev rêbazên wêjeyîyan ewqas ne kevne; 'yekem car lêkolerên rojavayî wata wêjenas û hunernasên Ewrûpî bûn ku hatin ew rêbazên wêjeyî û ew ekolên (qutabxane) huneriyane her yek û pê binemaya felsefe û ramaniya wan û taybetiyên xwe ji hev cuda kirin û dabeşî çend polên cuda kirin. Ev ji bilî çend wan rêbazana her ji aliyê damezrînerên Ewrûpî yên ew rêbazane nav lê hatine danîn û herwiha binemayên estetîkî û taybetmendiyên wan jî hatine darêjtin".<sup>39</sup> Ev rêbazên wêjeyî xwedî (xawen) sîma û taybetmendiyên cudane ku helbestvanan ji hev cuda dike ji wêneyên wan yên helbestî, loma helbestvanên ser bi her rêbazekê dixebite ku wêneyên wan yên helbestî bibin xala cudahî ya navbera rêbazên wêjeyî.

'Peyva "rêbaz" di kurdî da em gelekcaran jê redibêjin" qutabxane" ji "medrese" û "mezheb" a 'erebî hatine wergerandin, di zimanê farisî jî da jê re dibêjin "mekteb" ku hemû ji 'ekol=ecole' ya ferensî hatine wergerandin. Ekol (ecole) di Ferhenga Laurruse ya ferensî da di rûpela 467 da; "Wate hemû ew alîgirên ku ser bi yek komele binemayên felsefî yan wêjeyî yan jî hunerî nin yaxud komele binemayên feylesofek yan yê hunermend û nivîskarekî û herwiha wata hemû ew

<sup>38</sup> - Kerîm Mistefa Şareza, *Wişey Şî'ri Le Honrawey Kurdî da*, ko. Beyan Dezgay Roşinbîrî û Bilawkirdnewey Kurdî, 1989, J. 156, r38

<sup>39</sup> - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, Çapxaney Endêşe, Silêmanî, 2009, r8

*nivîskar yan hunermendên ku xwedî yek cor têgihîştina ciwannasî (estetîka) nin*”<sup>40</sup>. Ev rêbazên wêjeyî çend yasa û binema anîn nava corên wêjeyê, loma helbest û wêneyê helbestî ji serdemekê bo serdemeke din guherîn bi ser da hat û şeweyê taybetîyê ekolên wêjeyî wergirt. ‘*Eşkereye helbestvanên ser bi ew rêbazana hewldane liber ronahiya ew rêman û binema û taybetmendîyan ma’melê digel wêneyê helbestî da bikin, wate rêmana (çemk) wêne her tim (hemîşe) ji aliye wan ve her tim bi rêmana helbestê ve hatiye girêdan. Ev jî xwe bi xwe alozî anî nav rêmana wêne û dem li ber devê rexnegiran nehişt,ku pênaseyek zexm tamam bibe*’<sup>41</sup>. Ev rêbazên wêjeyî ji çavkaniyên cuda yên helbestvanan wêneyê helbestî werdigirtin loma em giringîya wêneyê helbestî di van çend rêbazên wêjeyî da dixine rû ku ji rêbazên ‘kilasîzm,romansîzm,riyalîzm,parnasîzm, sîmbolîzm, dadayîzm, suriyalîzm’ pêk tên.

### **1.2.1.Rêbaza Klasîzim**

Rêbaza kilasîk ku weke bi yekem ekola wêjeyî tê danîn wek binemayeke wêjeyî û felsefî û hunerî li aliyê nivîskar û helbestvan û rexnegirên wê deme dihate peyrewkirin (dihate qebûlkirin), kilasîk di huner û wêjeyê da ji rastîyên mirovayetîyê ve bi taybetî di derûnîya helbestvan da wekhevîyekê di navbera hêza dahênana hunerî û bi hevdu ra guncandina naverok dirust dike. Di derbarê heman û binemayên jîrî û xeyal û hestan ve bi hevdu ra guncanek ku di şewaza hunerî da berçav dibe herwiha corê rêkkeftina wê di teknîka dahênana helbestê da. Di nav hemû corên huner da wêjeya kilasîk ji hemû ew coreyên wêjeyî re tete gotin ku mîsoger û guncaw û berhemên terwende (danisq, nadîr) ne. Wata ew berhemên ku wêneyê bilind û çê têda hene bi taybetî di coreya helbestê ku têda wêneyê helbestî tete holê (berhem). Têgînkirina taybetîyên pêvajoya kilasîk bi giştî di wêje û hunera pîrrianiya gelan da bi taybetî bi bê guhdan bi cudahîyên taybetîya hunerê di berhemên wêjeyî yên her mîlletan da bi eşkereyî (bê mihnetî) derdikeve.

Di klasîka Ewrûpî bi taybetî ew ‘*helbestvanên kilasîkî yên Ewrûpî bi mebesta dahênana helbestê piştî xwe bi zarîkirina(lasayîkirdnewe)berhemên kevn û*

<sup>40</sup> - Ferhad Pîrbal ,h.b,r8

<sup>41</sup> - Ferhad Qadir Kerîm, b.n,r53

*kêmpeyda(nayab)yên Yonanî û Romanîyan girê didan(ji berhemê wan çavkanî disendin)''*.<sup>42</sup> Ev jî ji ber wan boçûnên ku li gorî wan wa bû berhemên wêjeya Girîkî (Yonanî) û Romanî mînakên bilindên wêjeya ne. Loma pêwîste zarî wan bête kirin, kilasîka Ewropî li ser binemaya zîndîkirina zarvekirina wêjeya Girîkî û Latîniya kevn li rûyê teknîkî û nirxên mirovayetî berçav bû, her li vî rûyî rexnegir û pisporên wêjeyê nepenî(nihênî)manin û berdewamiya wan rêbazana destnîşan kiriye ku ji çend binema û xasîyetên taybet û diyarîkirî pêk tê.

Destûr û yasayên kilasîka Ewropî di wateyê da xwe dibîne (zarîkirina xwezayê), Biwalo ku yek ji tiyordarêjê kilasîzma Ferensa di beşa sêyema "Hunera Helbestê" (L'Art Poétique) da dibêje: *'Tenê yek çirke jî ji siruştê neqetin (dûr nekevin)''*.<sup>43</sup> Wata helbestvanên kilasîka Ewropî di wêneyê helbestî da siruştê xwe dikişandin bi hemû şeweyên ciwanîya çê ne wek xwe belkî ji wê baştir ku heye. Herwiha ku me behsa zarvekirinê kir bi taybetî *'zarîkirina kevnan (kilasîkan) ku dibêjin: ' Ji bo dîtina ciwanîya nemir pêwîste em di nav berhemê kilasîk da bigerin wate pêwîste berhemên "Homîros, "Horas, "Eristo" bikin rê û rêbaz''*.<sup>44</sup>

Herwiha yek ji binemayên din yê wêjeya kilasîk ji heş (eql) pêk tê, çimkî *'heş li aliyê kilasîkan binemaya felsefîya ciwanî ye di wêjeyê da, wêje jî olana (rengdanewe) rastî ye û rastî jî di hemû dem û cîh da heye''*.<sup>45</sup> Li gorî kilasîkîyan waye ku pêwîste helbestvan li jêr ronkaya heş berhemên wêjeyî û wêneyên helbestî yên xwe arasteyê nava civakê bike ne hest û soz, çimkî heş mirov ji tevgerên (helsûkewt) xirap dûr digire (dixe).

Herwiha yek ji wan binemayan *'ronî (zelalî) û kurtbêjî wata berhemên baş ewin ku hem şewaz hem mijar û hem zimanê derbirîn ron û eşkere be, ev jî wateya wê nîye neserdest û sade be belkî mebest ewe ku hevok bi hûrî û ziravbîniyeke hunermendane werin darijtin''*.<sup>46</sup>

Diyartirîn cora helbestê di serdema kilasîkîya Ewropî da bi pirranî wêneyên helbestî li şeweya dramî da bû wata li ser sekoya şano dihate pêşkêşkirin, her ji ber

<sup>42</sup> - Mihemmed Xenîmî Hîlal, *Dîrasat we Nemazic Fî Mezheb el Şî'r we Neqdihû*, Qahîre, s66

<sup>43</sup> - Ferhad Pîrbal ,b.n,r28

<sup>44</sup> - Ferhad Pîrbal ,h.b,r29-30

<sup>45</sup> - Mihemmed Xenîmî Hîlal, *El Edeb el Meqarin*, Nehzet Mîsir Lîl Teba'et wel Neşir, 1998, s229

<sup>46</sup> - Ferhad Pîrbal ,b.n,r32

wê giringtirîn binema û taybetîyên kilasîk ji ‘*mewzû’îbûn-objectivite=babetî,mijarî*’, *mewzû’î bûn wata dûrbûn ji bînîn û bîr û ramana xwe û zatîyane û ji hewa, hewes, xem û xeyala xwe derbûn, giringîdan bi gişt û bi civakê ne bi takekes*’<sup>47</sup> Wata divê berhemên helbestvan di xizmeta civakê da be, helbestvan nabe di helbestên xwe da wêneyê helbestî yên xwe da têgîna hêsina xwe bike belkî wêneyên helbestî yên wî/wê têgîne li rewîşt bilindi û tiştên çê (çak) û baş bike di oxira bîra giştî ne ya takekesî û hêsina xwe. Bi watayeke din li rûyê naverokê helbesta wêjeyî ya kilasîkî yên Ewropî mijarî bû wata berjewendîyên giştî giringtir bûn ji berjewendîyên hêsînî û taybetî.

Sebare (derbarê) bi wêjeya kilasîkiya Kurdî hîç guman têda niye dibe ev wêjeya sereta û binemayek wê hebe ku seretaya wêjeya kilasîkiya kurdî ji wê destpêbîke, ‘*Çarîne" yên Baba Tahîrê Hemedanî weke seretayên wêjeya kurdî tê danîn (tê qebûlkin).* Li rûyê dîrokî sirûdên dînî yên “*Serincam*” û helbestên *Mela Perêşan* û wêjeya “*Yarsan*” di qonaxa yekemin ya helbesta kilasîzmîa kurdî da mînakên diyar û giringin. Paşê jî wêjeya kurdî û bi taybetî helbest bi şewezarê *kirmancî* û mînakên helbestên neteweyî yên *Feqiyê Teyran*, ‘*Elî Herîrî* û mînakên bilind yên helbestên *Melayê Cizîrî* û *Ehmedê Xanî* bi zarîkirina ruxsar û naveroka helbestên *gelên rojhelat yên musulman wêjeya me ya kurdî dewlemend kir*’<sup>48</sup> Wêjeya kilasîka kurdî wata helbesta kilasîka kurdî bi berevajiyê wêjeya kilasîzma ewropî soz û xeyal têda xala giring û destpêk û pêkhatina wêneyê helbestî ye ku ev berevajiyê kilasîzma ewrûpiyan e, ku wêneyên wan yên helbestî li ser binemaya heş (eq) berhem dihat. Herwiha pîraniya helbestên kilasîka kurdî lîrîkî ne, Marûf Xeznedar di “*Mêjûy Edebî Kurdî*” (Dîroka Wêjeya Kurdî)pê waye(li gor wî): ‘*Berhema wêjeya kurdî li rûyê naverokê ve li gor diyalektên zimanê kurdî tête kirin du beş ev jî helbesta lîrîk û epîk*’<sup>49</sup> Helbestvanên kilasîkiya kurdî gelekî bi ronî ev du corê helbestê di wêneyên helbestî yên xwe da diyar kirine bi taybetî helbesta "lîrîk" bikaranîne û xistine nava dîwanên xwe. Herwiha bi berevajiya wêjeya kilasîkiya ewropî bi giştî helbestên wan li ser binemaya hêsînî ye (xudî ye) wata wêneyên helbestî yên wan li ser binemaya hundurê taybetîya hêsina helbestvane,herwiha

<sup>47</sup> - Ferhad Pîrbal ,h.b,r34

<sup>48</sup> - Hîmîdad Hisên,*Rêbaze Edebîyekan*,Çapxaney Dezgay Aras,Hewlêr,2007,r59

<sup>49</sup> - Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Yekem ,Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr, 2010,r181

helbestvanên wêjeya kilasîkiya kurdî li oxira pere û pûl helbestên xwe nehûnandine. ‘*Yek ji taybetiyên wêj-eya kevna kurdî ew bû ku her çiqas di çarçeweya deselata mîran da peyda bûye, lê ew wêjeya bindest (bandordar) nebû helbestvanên kurd helbestên xwe bi pûl û nan neguherîne*’.<sup>50</sup> ku ev di wêjeya kilasîkî ya ewrûpî da bi ronî (eşkere)di wêneyên helbestî yên wan berçav dikeve ku di xizmeta çîna desthelat û aristokratiyet da bû, herwiha li ser sekoya şanoyê pêşkeş dikirin. Li vî rûyî mînaka helbesta "Mehwî " heye ku dibêje:

‘*Bo pare heyfe xo dekeye pûlî narewac  
bo parwêkî nan esefe rû dekey be sac*’.<sup>51</sup>

Me’hwî di vê malika helbestî (beyte şî’r) gelekî bi ciwanî tê hestên taybetî yên xwe ji bo me derdibire (îfade dike), derbarê serwet, saman (mal-mulk) loma gel şiyar dike ku ewên bi dû pere pûl bikevin her dem kesên şermezar û sersem dibin di nava civaka xwe da. Di vir da ev malika hestê ciwan yên helbestvanên kilasîk derdixe ku ji bo pere û pûl helbestan nehûnin, derbarê wêneyê helbestî yên wêjeya kilasîkî ya kurdî ku pirranî xwe di wêneyê helbestî ya "lîrîkî " da dibîne. Diyare ev şewazê wênehelbestî ku çend corên wê hene, yek jî ji wan "lîrîka dînî (olî) ” ye ji aliyê gelek helbestvanên kilasîk berçav dikeve ‘Hemdî yê helbestvan ku yek ji wane ev wênehelbesta wî di dîwana wî da dengvedaye wekemînak dema dibêje:

‘*Ya Mi’hemed rûreşî derganekey tom tobe bê  
Herçî hem bêşik segî asanekey tom tobe bê  
Zerrey şu’ley cemallit ka’înatî kirde nûr  
Her weku zerre minîş perwanekey tom tobe bê*’.<sup>52</sup>

Di vê çarîneya ‘Hemdî da em dibinin, helbestvan wênehelbesta xwe li ser binemaya olî (ayînî) nivîsiye û corek bergerîn (parranewe) û peşîmanî li xwe digire û arastey pêxemberê xwe dike, ku Mi’hemed Pêxember e (Dirûd û silava Xwedê li ser be). Helbestvan bi corekê xwe tawanbar û gunehbar nîşan dide, loma li ber deriyê pêxember doza lêxweşbûnê dekat, ji ber wê dixwaze lê xweş be (bibexşîne, ‘efû bike)

<sup>50</sup> - Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Edebî Konî Kurdî*, Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 2012, r14

<sup>51</sup> - Mela Ebdulkerîm Muderîs, û Mihemmedî Mela Kerîm, *Dîwanî Mehwî*, Çapxaney Întîşaratî Kurdistan, 1381K, r126

<sup>52</sup> - Cemal Mihemmed Mihemmed Emîn, *Dîwanî Hemdî*, Ehmed Begî Sahêbqiran, Çapxaney serkewtin, 1984, r4

û rizamendî û xweşdivîya Mi'hemed (D.S.X.L) bi dest bîne. Herwiha şêwazî "lîrikî" ku binemayeke serekî ya pêkhateya pîraniya metnên helbestên serdema wêjeya kilasîk pêktîne, weka rêçkeyeke siruştî xwe di wênehelbestên serdema kilasîk da dibine.

Herwiha derbarê helbesta "lîrikî ya xezel" ku helbestvan di wêneyekî helbesta taybet tê derbarê evîndariya xwe di ciwanî û bejnîlindî û hestê di navbera wan da ji maç û destbazîyê ve helbestê dihûne, wekemînak "Nalî" yê helbestvan di vê çarîneya "lîrikîya xezelî" da dibêje:

*‘Ke toy qîble, demit sabêne qurban!*

*li ser quble dillim meşkêne, qurban*

*Were binwarre dû destî henayîm*

*Henayî çî? Hemû xo xwêne qurban! ”<sup>53</sup>*

Helbestvan di çarîneya xwe da wêneyekî ciwan yê evîndarî (xoşewîstî) û dildariya xwe û evîndara xwe dinexşîne, dema yarê dike qîble û doza maçekê li yara xwe dike ku li ser pênedana maçekêk dile wî neşkîne. Herweha dozê li yara xwe dike ku were li du destên min binere ku weke hineyê ne ku di rastîda ne hineye, ji ber evîndariya yarê birîndare û desten wî xwîn girtine çimkî deste xwe bervî her hêlên laşe xwe dibe xwîn jê tê loma desten wî bi xwînê sor bûye. Ev her du cor beşek bûn ji corên helbesta "lîrikî" ya wêjeya kilasîka kurdî, herweha pêwîste em amaje bi çend taybetiyên din yên helbesta kilasîkiya kurdî bikin ku *‘wêneyên wê bi piranî tek û parçe ne, ev jî bi hoya hukumkirina yekîtîya dêrên helbestê ne ku wa dike wêne ji sînorê dêrên xwe da asê mane û derbasî nav dêrên din nabin û herwiha rêmana (çemk) huner û xemilandinê di dahênana helbestê da wêne helbest ciwan (rengirêj) kiri bû’*<sup>54</sup>.

Taybetiyek di nîya wêjeya kilasîkiya kurdî ewe ku bandora (karîgerî) helbestvanên kilasîkên kurdî li ser hev hebû, wata wêneyê dúbare ku ev taybetiya tişteki serdeste di nav helbestvanên kilasîkê wêjeya kurdî û gelekî be ronî û eşkere di dîwan û metnên helbestî yên wan da diyar dibin. Ev taybetiya ji alîyê gelek

<sup>53</sup> -Mela Ebdulkerîm Muderîs, û Fatîh Ebdulkerîm: *Dîwanî Nalî*, Çapxaney Întîşaratî Kurdistan, 1379K, r326

<sup>54</sup> - Ferhad Qadir Kerîm, b.n, r56

helbestvanên kurd da tête bikaranîn ev jî bi hoya berzî, bilindî û ciwanîya ew wênehelbestana ne ku di sereta da helbestvanekî/ê bekaraniye û paşê jî helbestvanekî/ê heman wêne metnên helbestên xwe bikar tîne. Weke rêçkeyekê bekar tînin û bi vê şêweyê helbestvan dibe ekol (qutabxane) û mamosta ji bo helbestvanên paş (dawî) xwe ku ew helbestvanên wênehelbestiya wî/wê dúbare bikar tînin dibin xwendekar. Bi vê corê wênehelbestên wan dúbare dibin, îjar di vir da pêwîste em wiya ron bikin ku dúbare bûna wênehelbestan bi çend şêweyan dibe yek ji wan dúbare bûna wêneyê wî/wê ye ku ser bi heman wêje û heman zarin, wata her du helbestvan ser bi heman wêjeyê ne. Li jêr çend bandorên diyarkirî yên wênehelbestên helbestvanan dúbare dibin wekemînak "Cizîrî" dibêje:

*‘Nêrgizîn şeng demestî çep û rast  
saqîyan cam didestî çep wirast.*

*Cegerxwîn dibêje:*

*Meygeran mey digerlandî çep û rast  
meyxuran mey difirandî çep û rast”<sup>55</sup>.*

Di van her du metnan da wêneyekî têdaye ku her du helbestvana bikaranîne bêguman Cegerxwîn di jêr her bandorekê da be hatiye wêneyê xwe bi çend peyvên dúbare kiriye li ser heman wêneyê Cizîrî, ev wêneya jî ji “meygeran û saqîyan” pêktê ku her du heman wêne ne têda "meygêr bi rast û çep mey digêrînin". Herwiha şêweyekî din yê wêneyê helbestî ku dúbare dibe ev jî di nava helbestvanan da ku ser bi heman wêjenin lê di zaravayê (zarawa, diyalekt) da cuda ne wekemînak "Xanî" dibêje:

*‘Leb teşene ge leb dikin zelallê  
wê dane û damê, zilif û xalêj.*

*"Nalî" dibêje:*

*Aşiq dellê nabê ke bida xoy le dawim  
zulfîm ke hemû dawê, hemû daneye xallim”<sup>56</sup>.*

<sup>55</sup> - Ebdulla Xidir Mewlûd, *Karîgeriyê Şa'îranî Kilasîkî Kurd Le Ser Yektir da*, ÇapxaneyRojhêllat, Hewlêr, 2013, r19-20

Di van her du metnên helbestî da em dibînin ku wêneyê helbestî dúbare henin, di her du helbestan da "dan-dan" wata 'xall' û herwiha "dam-daw" wata 'zulif' bikarhatine.

Wêneyekî din yê helbestî ku ji aliyê helbestvanên kilasîk dúbare dibe ev jî di nava ew helbestvanane ku hem ziman û hem wêjeya wan cudane, wata helbestvan bi her hoyê ew wêne Helbestên ku ji helbestvanê jê bandordar bûye tîne nav wêjeya xwe û di metnên helbestên xwe da bikar tîne, wekemînak "Sa'dî" dibêje:

*'Çun tu haçir mîşwî, min xayib az xud mîşum  
biskih hîran mî bimand wihim dirisîmay tû.*

Me'hwî dibêje:

*Ke to xayib le ber çawim debî çîm bê le to xayib  
qiyamet hazirî berçawime xomim le xo xayib''.*<sup>57</sup>

Her du di wê da hevbeşin ku wa dema yara xwe dibînin û li ber wan amade dibin û ew berge nagirin û ji heşê xwe deçin, herwiha ku yar amade nebe wê demê xwe ji xwe xayib dibin wata xwe li pêş çav nabînin. Diyarê ev wêneyekî helbestî ye ku hatiye dúbarekirin li jêr bandora helbestvanekî/ê vî wêneyî dúbare dike, wekemînak bi wê hoyê ziman û wêjeya farisî di hucreyan da dihate xwendin û ketibû jêr vê bandorê ku bû hoyê wêneyekî helbestî ji wêjeya bêgane veguheziye nava wêjeya kilasîkîya kurdî.

### **1.2.2. Rêbaza Romansîzm.**

Rêbaza romansîzm yaxud romantîk ew ekola bû ku piştî wêjeya kilasîk binema û yasayên di kilasîkî bi temamî guherî, weke şoreşekê bû bi ser binema û taybetmendiyên wêjeya pêş xwe ku ev rêbaza li piştî rewşengerî di dawîya sedsala hîjdehem serîhilda. Weke rêbazeke wêjeyî li pîrrianiya welatên ewrûpa peyrewa wê dihate kirin (li kar bû, giringiya wê hebû), helbestvan weke qonaxekê nû ya wêjeyî li ser yasa û peyrewa (pîvan) vê wêjeya nû berdewam bûn.

---

<sup>56</sup> - Ebdulla Xidir Mewlûd, h.b, r20-21

<sup>57</sup> - Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Berawirdî Edebî*, Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 2014, r161



Em dikarin bibêjin;serhildana vê rêbazê li Ewrûpa guherîna tabloya helbestan bû ku bi şeweyekî berçav guherîn bi ser wênehelbest da hat. Li rûyê naverokê ve bi hoya ew yasa û destûrên kilasîzm weke bendekê(girêdanekê) ji bo wênehelbestên xwe danî bûn,wata ew cîhana wêjeyê fireh kir çendîn wênehelbestên cuda û nû anîne berhem. ‘*Rêbaza romantîk ku doza serxistina soz û xeyal bi ser heş da kir her li serî da romansîzm weke şoreşekê li dijî kilasîkiyet hate holê, ew bendên têkşikand ku kilasîkiyan çespandebûn bi ser wêje û huner û nehiştina ew qalibên helbestî yên kelepeçê kiri bû,derbasî wî alîyê sînorên wê bû û yasayên wê retkir.Banga azadiya wêjeyî da ji bo vekirina derwazeyên dahênana derbarê efirandinê da*’.<sup>58</sup> Loma ewên ku pêşeng bûn di dirustbûna rêbaza romantîkî weke Şekspîr ku roleke wî ya serekî hebû di pêşwazîya vê wêjeyê da ku bi hoya şanogerên wî ev rêbaza gelekî pêşxist û paşê jî Wirdzors, Şîlî,Can Cak Roso(Jean Jacques Rousseau),Şilîgil...Hwd.

Diyartirîn yaxud binemayên serekîyê wênehelbestî yên vê ekolê ji ‘siruşt’ê pêk dihat,her weke Roso di pênaseya romansîzm da dibêje: ‘*Romansîzm vegeerîne bo siruştê*’.<sup>59</sup> Lê siruşt bi pê azadî wata siruşt bi hemû tiştên baş û xirap û tiştên naşirin û ciwan herwiha ew xewn û xeyalên ku li wî alîyê bêhêvîtiyê ve wênehelbestên xwe têda berhem dianîn. Herwiha di wênehelbestên rêbaza romantîk da reşbînî pêve diyar bûn,romantîkiyan gelekî giringî didan hest û soz û xeyal û çavkaniya wênehelbestên xwe jê werdigirtin ku ‘*romantîkiyan hest û soz Di ser eqil da dibînin û baştir û ciwantirîn dizanin, herwiha meyleke wan ya pîrr hebû ji bo derbirîna xem û kovanan ku paşê ev xem û kovan û şûngerandina bû yek ji nîşanên wêjeya romantîkî.Tenahî,goşegîrî û reşbînî taybetmendiyên diyarin di romantîkî da*’.<sup>60</sup> Diyare ku rêbaza romantîkî gelekî giringî dida takekes ev jî berevajiyê wêjeya kilasîk bû ku hemû girîngiya wê li oxira civak û giştîyê da bû. ‘*Her ev giringîdana bi nêrîna takekes rê li ber wê vekir ku helbesta "lîrîkî" diyartirîn berhema romantîkiyan be di vê coreya helbestê jî da derbirîn li hest û soza tak da bûye sîmay ev core helbeste*’.<sup>61</sup> wata helbestvan di vê rêbazê da azadane dikare bi hest û soz û xeyal cor bi cor yên aramî bidil û bi canê bide di rêya wênehelbestên xwe da ku

<sup>58</sup> -Îdrîs Ebdulla,*Qonaxî Pêş Romansîzmî Kurdî (1851-1921)*, Çapî Yekem,Çapxaney Roşinbîr,Hewlêr, 2006,r61

<sup>59</sup> - Lîlyan Firêst,*El Romantîkiye*,Tercume:‘EdnanXalîd,Mîn Menşûrat El Merkez El Seqafî El Îctîma’î Bexdad,1987s15

<sup>60</sup> - Ferhad Pîrbal ,b.n,r62

<sup>61</sup> - Nesrîn Raûf Îsmail,*Erkî Şî’rî Le Edebî Kurdî da (1920-1958)*, Çapxaney Rohellat,2010,r21

arasteya tak dikir û bitaybetî eger ji bo evîndara/ê xwe be, çimkî di wêjeya romantîkî da gelekî giringî didan jinê yaxud li hemberî siruşt û dengvedana (olan) hêsina jiyana xwe dadanîn. Wata wênehelbestên xwe bi kereste û peyva xeyal û aşopa (endêşeya) tijî hest û soz dinexşandin herwiha ev rêbaza di wêjeya kurdî da jî piştî Cenga Yekem ya Cîhanî di navbera helbestvanên kurd binaxe û binemeyên xwe danî.

‘Ev rêbaza nû bi rêya wêjeya turkî ji aliyê Şêx Nûrî û Goran hate nava wêjeya kurdî, her evan guh nedan ew hêrişên ji aliye êniya (bere) kilasîkî ku davetin ser wan’.<sup>62</sup> Li ba helbestvanên kilasîk zehmet bû ku dev ji wêjeya kilasîk berdin, çimkî wênehelbestên wêjeya kilasîk zêdetir sîmaya îslamî pêve diyar bû, ev jî eşkereye ku ji derketina tiştên nava helbestvanê kurd serîhilda bû çimkî pîrraniya helbestvanên kurd di dibistan û hucreyên îslamî da wane xwendî bûn. Loma pejirandina (qebûlkirin) vê wêjeya bêgane ji aliyê helbestvanên kurd zehmet bû paşê bi hoya xweguncandin û şarezayî (pisporî) helbestvanan digel wêjeya romantîkî da pêde pêde ev rêbaza peyrewkirî cihê wêjeya kilasîkî girt.

Herwiha bi hoya sitem û paşverûyî ya gelê kurd ku di pêvajoya Cenga Yekem ya Cîhanî da bi ser kurd da hat rê vekir ji bo serhildana vê rêbazê, çimkî di wê demê da her çar parçeyê Kurdistan keti bû ber zilm û nexweşî ya sitema dujminkaran ku ev jî bû hoya bêhêvîti û xem û xefeta reşbînîya helbestvanên kurd. ‘Goran ku behsa tazekirina helbesta kurdî dike behsa bandora helbestvanên “Fecr-î Atî” ya turk dike bi ser helbestvanên kurd da, ew jî destnîşan dike ku ev tazekirina li Turkiyê li jêr bandora Şoreşa Ferensî û lêkolînên romantîkîya helbesta ewrûpa da bû ku hemû aliyê naverok û ruxsara wê girtibû’.<sup>63</sup>

Di wêjeya kurdî da jî weke wêjeya romantîkîya ewrûpî bi hoya vê rêbaza nû ve gelek wêneyê helbestî yên teze ji dayik bû, di çarçeweya ev taybetmendiyên tabloya helbestan da berhem dihatin holê ew jî ji "nîştîmanperwerî, jin, endêşe, siruşt, xewn û xeyal” pêk dihatin ku wêneyê helbestî diyarî yên helbestên serdema romantîk bû. Di wêjeya romantîkîya kurdî da çend wêneyên helbestî yên helbestvanan bi mînak em tînin ku rola wan di vê wêjeyê da hebû di pêş serhildana rêbaza romantîk wekemînak:

<sup>62</sup> -Xurşîd Reşîd Ehmed, *Rêbazî Romantîkî le Edebî Kurdî da*, Çapxaney Bexdad, 1989, r6

<sup>63</sup> - Îzeddîn Mistefa Resûl, *Edebîyatî Nwêy Kurdî*, Xwêndinî Bala, Hewlêr, 1989, r39

## Mewlewî

Yeke ji helbestvanên kilasîk lê bi şeweyekî siruştî bêhay (bêaga)lê bûn di vê wêjeyê da, di beşek helbestên wî da wêneyê romansîzmî têda ye herwiha li gor Marif Xeznedar ku 'Şewaza romantîkî di helbestên Mewlewî da dilivin, ev jî diyare romantîkî wek şewaz ne ekol'.<sup>64</sup> Wata Mewlewî wêneyê helbesta romantîkî di helbestên xwe da bikar tîne, ne wek xwendevanekî ser bi vê ekola wêjeyî be. Herwiha li gor 'Elaeddîn Secadî,' *Eger rûberîya xeyala helbestên Mewlewî digel helbestên sedsala nozdehemî ji bilî kurdan bête kirin, hemû ziman û pênuş vi ya dihewînin ku ramana bilind ya Mewlewî li ser hemûyan heye, nazikîya xeyal, tûjîya bîr, hûrîya (hûrbînî) wata, ciwanîya peyvê, rakêşana dil bi îbareta rengîn û bi liva têla atîfe, ku ji destê Mewlewî hati be*'.<sup>65</sup> Diyare di helbestên Mewlewî da ziman û şewazeke ciwan û xeyal û hest û sozeke binirx hebû ku bûne hoya balkişandina wêjevanan, 'pirranîya malikên (beyt) helbestên Mewlewî xem têda hene û bêhêvî perdeyê bi ser wan da dadide'.<sup>66</sup> ev jî yek ji wan taybetmendî û sîmayên wêjeya romantîkî ye wekemînak dibêje:

*'Baqey ziwêrî û zarî dillgîrim*

*pey pey ziyad kerd pejarey pîrim*

*axir roy wehar newicwanîmen*

*ewell roy payizî zîndeganî men.*

*Dêrî yekem wata: Xem û xefetîya pîrîya min pêda pêda desteya 'acizî û wek xefet bar li ser milê min zêde kir. Herwiha dêra duyem wata: Roja dawîyê ya biharê ciwanîya min e, yekem roja payizê jiyana min e (zindîbûna min e)'*.<sup>67</sup> Eger em li ser ev her du malikên Mewlewî kûr bibin ewe derdikeve ku helbestvan têda çend peyvên ku taybetmendiya wêjeya romantîkî ye derdixe holê, ew jî peyva "pîrî" ku amajeye ji bo hesta xem û xefet herwiha peyvên "bihar" û "payiz" jî amajene ji bo siruştê ku di van her du dêrên Mewlewî da derdikevin. Dr. Enwer Qadir Mehemed di pirtûka "Lêrika Helbestvanê Mezinê Kurd Mewlewî" da dibêje: 'Wesfa siruştê li

<sup>64</sup> - Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî sêyem, Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr, 2010, r441

<sup>65</sup> - 'Ellaeddîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Întîşaratî Kurdistan, Sine, r280

<sup>66</sup> - Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Edebî Konî Kurdî*, b.n, r129

<sup>67</sup> - Mela Ebdulkerîm Muderîs, *Dîwanî Mewlewî*, Çapxaney Întîşaratî Kurdistan, Sine, 1377Ko, r508

*alîyê Mewlewî di çarçeweya mijar û coreya xezela teqlîdî da gelekî weke hevin û teze, terwende û nayab e, diyare ev jî bi wê hoya amûra hunervaniya bilind û cewherîya pisporiya helbestvaniya Mewlewî ye*”.<sup>68</sup> Herwiha Mewlewî dibêje:

*“Wey min diyaren pencey tarmen  
serwextî hamin new wehar men  
subhim netoy şew me xino we keridem  
we kerdekey bed umirî wiyerdem”*.<sup>69</sup>

Wata: Wa diyare ev çend rojê temenê (‘emir) min ku maye wek pencey tar e û li ser hîç hesab nîye, ku hîna ez vê jiyana xwe bi dema biharê zanim û li ba min wa nîye mirina min Nizîk bûye. Dêra duyem wata: Berebeyaniya (destê sibê) min di nava tarîkîya şev da bi kirina nexweşiya ‘emrê mine derbasbûyî pê dikenê’. Eger em li van her du malikana jî hûrbibin ew derdikeve ku Mewlewî bêşik stêrkekî geşe li ser wêjeya romantîk çimkî peyvên ‘‘mirin’’ û ‘‘şev’’ bikaraniye ku diyartirîn wêneyê helbestîne di wêjeya romantîkîya kurdî û ewrûpî da ku têgînê li bêhêvîti û reşbînîyê dike loma eger em bibêjin Mewlewî pêşengê helbestvanên romantîkîya wêjeya kurdîye ev gotina di cihê xwe da ye. ‘‘Pirraniya helbestên Mewlewî rewş û hewayeke romansiyaneya tijî soz û raman û hemû hemanên romansîzmî têda hene’’.<sup>70</sup> ku her çiqas Mewlewî agahdarî wêjeya romansîzm nebû.

Yekê din yê ji wan helbestvanan ku di vê wêjeyê da weke pêşeng tê danîn Pîremêrde. Yek ji helbestvanê wêjeya teze wate wêjeya romansîzm ku wek pêşengekî vê rêbazê tete danîn û peyrewa vê wêjeya kiribû, roleke wî ya diyar hebû di anîna romantîk nav wêjeya kurdî. ‘‘Bandora bêgane li ser helbestên Pîremêrd li rêya bizava helbesta romantîkîya nû ya Osmanî bû ku Pîremêrd agahdarî rêbaza romantîkîya Ewropa bû, bi taybetî wêjeya ferensî eger heta pileyekê vê rêbaza kar lê kiri ba bandora bizava helbesta nû ya osmanî kêmtir bû bi taybetî li rûyê zimanê helbestî ve’’.<sup>71</sup> Beşik pirr yê helbestên niştîmanî ku bi pisporî û jîrî wênehelbestên li

<sup>68</sup> -Yûnis Silêman Ehmed, *Rengdanewey Romansîyet le Şî'rî Mewlewî da*, Govarî Raman, 2013, J.198, r81

<sup>69</sup> - Mela Ebdulkerîm Muderîs, *Dîwanî Mewlewî*, b.n, r528

<sup>70</sup> -Umer Emîn, *Romansîzm li Şî'r Hêmin û Mihemmed Nuri da*, Çapxaney Mukiryar, Hewlêr, 2013, r41

<sup>71</sup> MarifXeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Pêncem, Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr, 2010, r113

ser mijara "Azadî û nîştîmanî " xem û kovanên gele xwe hûnandiye ku ciwantirîn hest û soz û xeyal tabloya wênehelbestên xwe kişandiye ku di berhemên wî da dengvedane dema div ê helbesta xwe da dibêje:

*‘Hatî şehîdekan be cilî surî xwênewe  
dayikî weten de hellse silawîyan bisênewe’*.<sup>72</sup>

Di vê parçe helbestê da Pîremêrd gelekî bihêzî û ciwantirîn hesta romantîkîya helbestvaniya xwe ji bo şehîdên Kurdistan hûnandiye, ev jî amajeye bi diltengî û xem û kovanan ku bi armanca şehîdbûna zarokên kurd li oxira azadî û nîştîmana xwe.

Herwiha helbestvanekî din yê ku rola wî ya serekî hebû di wêjeya romantik da ew jî helbestvanê ciwanperest Gorane. Goran'ê helbestvan bi sereta û destpêka wêjeya romantîkî tête danîn ku rola wî di jidayikbûna vê wêjeyê da hebû, ku yek ji pêşewayên vê wêjeyê ku bi hest û soza xeyal û ramanên helbestvaniya xwe cîhaneke binirx di wêjeya romantîkî da afirandiye ku mînakên wê kêma e, herwiha divê em wê jî bibêjin: *‘Ew wesfa navenda wêjeyê ji bo Goran kiriye di nivîya yekema sedsala bîstem da "helbestvanê jin û ciwanî " bibe pîvan ji bo nasîna vî helbestvanî’*.<sup>73</sup> Goran'ê helbestvan ta wê qonaxa peyrewa romantîkî kiriye, çavkanî û îlhama helbestên xwe ji ciwanîya jinê û siruştê wergirtiye, gerçê Goran ji helbestên siyasî û nîştîmanî bêpar (bêbeş) nebû û bi van corên helbestê helbestên wî hebûn, ev jî bi eşkere di wênehelbestên wî da derdikeve dema di helbesta "Afret û ciwanî=Jin û ciwanî " da dibêje:

*‘Be asmanewe estêrem dîwe  
Le baxçey behar gullim çinîwe’*.<sup>74</sup>

Di vê parçe helbestê da diyare ku ji bo Goran'ê helbestvan siruşt bûye îlham ta ev parçe helbesta ji dayik bibe, herwiha dibêje:

*‘Kam estêrey geş, kam gullî kêwî  
alle wek kullmî? Goy memkî? Lêwî?*

<sup>72</sup>-Umêd Aşna, *Pîremêrd Pêdaçûneweyekî Jiyan û Berhemekanî*, Bergî yekem, Çapxaneya Aras, Hewlêr, 2009, r131

<sup>73</sup>- MarifXeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî şeşem, Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr, 2010, r610

<sup>74</sup>-Ebdulla Goran, *Dîwanî Goran*, Çapî Çiwarem, Bilawkirawey Panîz, 1389 K, r43

*kam reşî ega be reşî çawî?*

*pirjangî? Biroy? Egirîcey xawî? ”.*<sup>75</sup>

Di vê parçe helbestê da diyare ku Goran wênehelbesta xwe li ser binemaya siruşt û ciwanîya jinê binyat daniye, wek helbestvanekî romantîkî xwe hewandiye û helbesta xwe hûnandiye ku hest û soz û bîr û xeyaleke ciwan bikar aniye.

### 1.2.3 Rêbaza Riyalîzm

Ev rêbaza wek ekoleke wêjeyî, hunerî, felsefî li paş Şoreşa Rênesans heye ta îro, wata ekolek tevlihev û tevî hemû rêbazên din e, ‘*têgiha ‘riyalîzm’ di wêjeyê da yekem car di sala 1798 da ji aliyê her du bira Şîler û Firîdirîk Şilîgil hatiye bikaranîn. Şîler amaje ji bo wê kir ku riyalîzm helbestvan naafirîne lê Firîdirîkî birayê wî di wê baweriyê dabû ku tew (hîç, qet) riyalîzmek rasteqîne nîye ji bilî riyalîzma helbestê*’.<sup>76</sup> Loma em dikarin bibêjin ev ekola binemaye ji bo hemû rêbazên wêjeyî, ‘*di rewşenbîrîya ewrûpa da riyalîzm bi ser sê qonaxda derbas dibe: Riyalîzma rênisans, riyalîzma serdema rewşengerî, riyalîzma rexnegirên sedsala 19*’.<sup>77</sup> Wate bi şeweyekî neyekser binaxe û binemaya vê rêbaza ji rêbazên pêş xwe hebû. Loma weke her retkirinekê li hemberî wêjeya kilasîk û romantîk wek rêbazeke serbixwe serîhilda ku binema û bîra wê ya serekî ji ‘*Dîtina waqî’î bi şeweya ku heye*’.<sup>78</sup> pêk hatibû.

Di vê ekole da nivîskaran bi pirranî giringî didan roman û çîrokan lê dîsa giringiya xwe ya taybet ya wêneyê helbestî hebû ke cuda bû ji êkolên pêş xwe. Wata rêbaza kilasîk taybet bû bi çîna arîstokrasî ku çîna serê civakê herwiha rêbaza romantîk taybet bû bi çîna bûrjûwazî loma rêbaza riyalîzm wek rêbazeke wêjeyî giringî dida bi her du çînan, lê di waqî’î da çawa didî wiha di wênehelbestên wan da olan dida û wata li jêr hîç hest û sozekê da nebû tenê di xizmeta waqî’îya wek xwe da bû ev jî wek xwe bi hemû başî û xirabiyan ve. Wata wênehelbestên vê rêbaza bi şeweyekê bû ku cuda bûn ji rêbazên din yê wêjeyî wekemînak helbestvanên kilasîk dema ku wêneyên xwe dinexşandin li oxira çîna serê civakê da bû herwiha

<sup>75</sup> - Ebdulla Goran, h.b, r43

<sup>76</sup> - ‘Adil Germîyanî, *Çemkî Rîalîzm Le Nêwan Felsefe û Huner û Edeb da*, Dezgay Newşafaq, J.86r10

<sup>77</sup> - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, b.n, r84

<sup>78</sup> - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, h.b, r84

helbestvanên romantîk dema wêneyekî helbestî dinexşandin siruşt li oxira ciwanîya xwe bû lê rêbaza riyalîzm wênehelbestên xwe wiha dinexşand ku di waqî'î da çawaye bi wî avayî dinexşandin wata peyama riyalîzmîyan gihîştina rastî bû di berhemên xwe da.

Herwiha di wêjeya kurdî da jî reh û rîşeyên vê rêbazê bi coreke ku di seretaya wêjeya kurdî bi taybetî di helbestên helbestvanên kilasîzma kurdî da têne dîtin. ‘ ‘*Ji çarîneyên Baba Tahîrê Hemedanî ve ta helbestên Hacî Qadirê Koyî helbestvanên seretaya sedsala bîstem ji aliyê gelek helbestvanan ji bo reh û rîşeyên riyalîzim giringî tête dayin*’’.<sup>79</sup> Herwiha wek rêbazeke Wêjeyî û hunerî ku helbestvan û nivîskaran giringî danê diyare ‘ ‘*digel serhildana bizava rojnamegerî ji "1898 " an vir de serhilda. Di navbera her du cengên cihanî jî da bi taybetî di navbera salên 1920 -1940 da gihîste asta xwe ya bilind ya peydabûna lêkolînên rojnamenivîsên kurd, di Rojnameya Kurdistan û paşê bi rêya rojnamenûsên kurd yên li Stenbol ku di kovar û rojnameyên wê da dixebitîn roleke wê ya giring hebû di serhildana riyalîzim di wêjeya kurdî da*’’.<sup>80</sup> Ev rêbaza wêjeyî li jêr rewşeke fikra marksîzm serhilda bi giştî riyalîzma sosyalîstî û bi taybetî Partîya Komunîst ya Êraq ku wa li helbestvanên wê serdemê kir peyrewa vê rêbaza wêjeyî biken, diyare ev rêbaza wêjeyî taybetmendî û wênehelbestiyên xwe di çarçeweya nîşandana waqî'î bû wek xwe lê digel vê da jî da ev wêjeya xallî ne bû ji hest û soz belkî ji kangeha hest û soziyane ve wênehelbestên xwe berhem dianîn ji bo nîşandana rastîya waqî'î ku bi wê şeweya heye. Herwiha riyalîzma di helbesta hewçerxa kurdî çend cor li xwe digire ku ev in; ‘ ‘*riyalîzma fotografî (wêneyî),riyalîzma rexnegirane, riyalîzma sosyalîstî,riyalîzma şoreşgêrrane*’’.<sup>81</sup> Wekemînak di ‘ ‘helbesta riyalîzma fotografî"da Helbestvan di coreya riyalîzmê da bi şeweyeke fotografî waqî'î ji bo me vediguhezîne nava wêjeyê û di helbestê da dûbare nîşanî me dide, dema ku ‘Ebdulla Peşew di helbesta "Nîştîman"da dibêje:

---

<sup>79</sup> -Hîmdad Hisên,*Rêbaze Edebîyekan*,Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr,2007,r169

<sup>80</sup> - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*,b.n.,r110

<sup>81</sup> - Ebbas Mihemmed Qadir, *Riyalîzm Le Şî'ri Hawçerxî Kurdî da 1946-1947*, Çapxaney Melbendî Kurdolojî, 2010,r121

‘ *Nîştîman*

*Beheşt û dozex bo min taze nîn*

*hawkat û hawcê ewîşim dîwe emîşim dîwe*

*nîştîmanî min, le wetî heye*

*beheşte û dozex dewrî tenîwe!* ’<sup>82</sup>

Peşew’ê ser bi ekola riyalîzim gelekî bi ciwanî ew wênehelbesta ji bo me kişandîye ku di waqî’î da hebûna wê heye ew jî ‘‘Nîştîmana Kurdistan’’e ku wek biheşte lê bi hoya sitem û zordarîya dagîrkarên ji alîyê dujminan ve dikin weke dojhê û xweşî û şadîya ciwanîya Kurdistanê nahêlin.

Herwiha di "helbesta riyalîzmîya rexnegirane" da helbestvan tê ew waqî’îyên naşîrîn ji bo me beyan dîke di tabloyeke wêneyê helbestî da ku rewîştî naşîrîn û taybetîyên di nav civakê da li karin û waqî’îya di nava gele wî/wê da heye, wekemînak dema Faiq Bêkes di vê parçe helbestê da dibêje:

‘ *Mellê min kişim, toş weku minî*

*muhtacî îlim û fen û xwêndinî*

*mecburî îş û xizmet kirdinî*

*heste têkoşe ta xwênit germe*

*serpoş firêde key wadey şerme* ’.<sup>83</sup>

Di vê wênehelbestê da Bêkes ew ji bo nexşandîye ku rewîşteke di nava civaka kurdî da li kar bû ku jin gelekî kêr yan jî tew (hîç) nedîçûn xwendinê ji bo wê rola wê hebe xizmetkirina welat û pêşxistina nîştîmana xwe loma helbestvan bi şeweyeke riyalîzmîya rexnegirane arasteyî gelê xwe dîke û şiyar dîke ji wê waqî’îya ku heye loma bi wêneyê helbestî ji bo dinexşîne.

Herwiha "riyalîzma sosyalîstî" peyama yeksanî ye di waqî’î da loma ev hest di helbestên wan da têtê bikaranîn ‘ ‘bi wataya kûr riyalîzma sosyalîstî ji wêjeya xeyal û dahênan pêk têtê, wêjeyeke ku li wê hêla çalakî û hişyarîyê ve ji bo wê dîtekoşe îdea

---

<sup>82</sup> -Ebdulla Peşew, *Hespim Hewre û Rikêfîm Çîya 1980-2005*, Çapî Çiwarem, Çapxaney Rojhellat, 2014, r250

<sup>83</sup> -Faiq Bêkes, *Dîwanî Bêkes*, Întîşaratî Kurdistan, r129



(bîr, aydîya) li gencîneyên ademîzad da bike bi heqîqetek ku hemûkes di jîyanê da hest pê bike”.<sup>84</sup> wekemînak dema Hejar’ê helbestvan di vê parçe helbestê da dibêje:

‘ *Kurdîn rolley Kurdistanîn, be dill azadîman dewê  
Heta le ser dinya zîndûyîn ser man bo dujmin nanewê  
Le rêgey em nîştîmane ser û mal man la herzane  
Kurdistan dîne, ayîne, Kurdistan, jîne, jiyane*’.<sup>85</sup>

Ewê ku helbestvan di vê wênehelbestê da nexşandîye ji bîra azadî û serbixwe ya nîştîmane ji bo hemû gelê kurd pêktê,ta wê radeyê ku helbestvan dibêje; "Kurdistan"dîne,ayîne, jiyane".Diyare ev jî li jêr rêbaza riyalîzma sosyalîstî û binemayên vê rêbazê da ev wênehelbesta berhem hatîye (hatîye holê).

Herwiha "riyalîzma şoreşgêrane"mebest di vê coreya riyalîzmê da ewe ku tevhevkirina bîra neteweyetî û pîrsgirêkên neteweyetî ne digel wêjeyê da, wate helbestvanên her neteweyekê di wêjeyek rîyalîstî da pîrsgirêkên neteweyetîyên neteweya xwe tevhev dike”.<sup>86</sup> Wekemînak dema ku Hêmin’ê helbestvan dibêje:

‘ *Gerçî tûşî renceroyî û hesret û derdim emin  
Qet le deste çerxe siple nabezim merdim emin  
Aşiqî çawî kejall û gerdenî pirrxall nîm  
Aşiqî kêw û telan û benden û berdim emin  
Ger le birsan û leber bêbergî îmro req hellêm  
Nokerî bêgane nakem ta le ser herdim emin  
Min le zincîr û tenaf û dar û bend bakim niye  
Let letim ken, bimkujin hêşta dellêm kurdim emin*’.<sup>87</sup>

Eger em li ser vê helbestê hûr bibin Hêmin aware û derbederîya xwe û xerabîya rewşa serdemê tevî hestên nîştîmanî kiriye,heta nefesa xwe ya dawî şanazîyê bi kurdbûna xwe dike di vê da jî diyare helbestvan wêneyekî ciwan yê hestên

<sup>84</sup> -Kemal Mîrawdêlî, *Rîyalîzmî Soşyalîstî*,kovarî Bîri Nwê,J.68,r3-4

<sup>85</sup> -Hejar Mukiryani,*Hejar Bo Kurdistan*,Çapî Noyem,Întîşaratî Hejar, 1392 Koçî

<sup>86</sup> -Ebbas MihemmedQadir,*Rîyalîzm Le Şî`ri Hawçerxi Kurdî da 1946-1947*, Çapxaney Melbendî Kurdolojî,2010,r142

<sup>87</sup> -Hêmin Mukiryani,*Dîwanî Hêmin*, Çap û Pexşî Çiwarçira,Silêmanî,2708Kurdî,r89

netewayetî û niştîmanîya li dijî dagîrker û ji bo ax û gelê xwe nexşandîye. Helbestvan bi dil û can dibêje ku ew "Aşiqê çavê Ciwan nîye" belkî aşiqê azadî û serbestîye ye, loma bêtirs dibêje "Eger min bikujin jî ew her kurde" diyare ev jî ji ber rêbaza riyalîzma şoeişgêrane ev wêne û tabloya helbestî nexşandîye.

#### 1.2.4. Rêbaza Parnas

Ev rêbaza mil bi mil (hawşan) digel rêbaza riyalîzm li dijî romansîzm serîhilda paşê wek rêbazeke serbixwe binemayên xwe darişt, girintirîn taybetiyên vê rêbazê "ji aliyê Viktor Hugo ve di sala 1829 da di berhema xwe ya bi navnîşana "Rojhelatîyan " da dariştî bû".<sup>88</sup> ku bi binemaya "huner li oxira huner". Giringtîrîn wêne helbestîyên vê rêbaza wêjeyî li ser binemaya rûxsar bû ne nawerok, wata tenê giringî bi rûxsar û teknîk didan ev jî diyare bi berevajîya rêbazên pêş xwe ye.

Herwiha taybetîyeke din ya wêneyê helbestî yên parnasîyan ji pûtedan (bayexdan) bi ciwankarî û estetîkê pêk dihat ku helbestvanekî ser vê rêbazê Lîkonit Dî Lîsil (Leconte de Lisle) dibêje: "Bihaya huner di ciwanîya wê da ye, di şeweya wê da ye ne di sûda wêda ye".<sup>89</sup> Parnasî bi pirranî giringî bi rûyê derveyê wênehelbestên xwe didan û hewqas giringî bi hundur û rûyê nava deq (metn, tekst) ne didan, wata tenê pûte bi ciwannasîya (estetîk) deqa helbestê didan. Herwiha parnasîyan çavkanîya wêje û huner ji bo ciwanîya wan vedigerandin (bi ciwanîya wan ve girê didan) ji bo kilasîkiyan ku li gor wan wa bû ku divê li pê ciwanîya wêjeya Yewnana Kevn bête gerîn. Herwiha "yek ji pîrensîbên din yê parnas ewe bû ku huner pêwîste bi temamî serbixwe be. Nabe bikeve jêr fermana sinc (exlaq), siyaset û nerîtên (kevneşopî) civakê, nabe gel hevîya wê ji huner bike ku huner bête kirin amûrek ji bo cîbicîkirina armancên civakî, siyasî, exlaqî û îdeolojîyan û wek riyalîstan doza vi ya dikirin".<sup>90</sup> Wata li ba parnasiyan wêje û huner nabe ji bo hîç mebestek xweyî yan mijarî bête bikaranîn, çimkî eger ev wêjeya li oxira sûd û armancan bikar hat ev tiştêkî ne çê ye, loma parnasan di wênehelbestên xwe da gelekî pûte didan ciwankarîyê.

<sup>88</sup> - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, b.n., r128

<sup>89</sup> - Elî Cewad Tahîr, *El Xulase fi Mezheb Edeb El Xerbî*, Dar El Hurrîye lîl Teba'e, Bexdad, 1983, s38

<sup>90</sup> - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, b.n., r131

Diyare ev wêjeya jî li ba kurdan gelekî kêr li kar e, ji ber wan binema û taybetmendîyan neket nav wêjeya kurdî em dibînin gelekî bi kêrî helbestvanên kurd olandana vê wêjeyê di berhemên xwe da bikaranîne, wekemînak Goran piştî rizgarbûna ji wêjeya kilasîkî û romantîkî li ser vê rêbazê xebitîye. ‘*Nêrîna parnasîya Goran her yekser li hilbjartina navnîşana helbestên xwe yê salên 1930 î heye ku pêwendîya hemûyan bi ciwanîyê ve heye: “Afret û ciwanî, rewteke ciwan, ji bo ciwanî sererê, ciwanî li gund”*, wek em jî dibînin bi xwe di pêşekîya dîwana xwe ya sala 1950 da dibêje: “Dîwana min seranser digel mijarên ciwanî û dildarî xerîk e (meşxûl e)”’.<sup>91</sup>

Goran bi şeweyekê pûte dida ciwanîyê ku ciwanî bûye hêmaya diyarî ya helbestên wî ku bi hoya vê sîmaya diyare ku zêdetir peyva "ciwanî" di wênehelbestên wî da tête pêş û ji helbestên helbestvanên din cuda dike û tête naskirin. Goran helbest ji ciwanîyê deranîye, îjar di deqek helbestî da beyan kiriye wata Goran ji wesfa gelekî tiştan da ciwanî bikaranîye; ji wesfa jin, nîştîman, ji wesfa siruşt wekemînak dema ku ji wesfa siruştê da dibêje:

‘*Kanîyekî rûnî ber tirîfey mangesew  
le biniya bile rizê mirwarî zîx wiçew  
le lay min ciwantire le deryay bê sinûr  
şepollî bate ber tîşkî xor*’.<sup>92</sup>

Yan ji wesfîa jinê da dibêje:

‘*Jinî Hewraman: Sertapay xişil, serçawey bonî mîxek simil  
ta billê terpoş û, all û wala cil, bejin û bala ciwan, beden nerim wişil!*’.<sup>93</sup>

Diyare wêje gelekî bi zelalî di wênehelbestên Goran da gelekî bi ronî denvedaye, Goran gelekî bi kûr û dûrîyê rêbaza parnasîzm di berhemên xwe da bikaranîye.

<sup>91</sup> - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, h.b,n134

<sup>92</sup> - Ebdulla Goran, *Dîwanî Goran*, b.n,r65

<sup>93</sup> - Ebdulla Goran, h.b,r93

### 1.2.5.Rêbaza Sîmbolîzm (remzî)

Ev rêbaza wêjeyî jî di serî da wek cêwîyan digel rêbaza parnasîzm serîhilda, paşê wek rêbazek nû ji alîyê nivîskar, helbestvan û hunermendan pêşwazîyeke germ lê hat kirin ku pirranîya wan kesan ser bi rêbaza parnasîzm bûn û derbasî nava vê rêbaza wêjeyî bûn, hinek ji wan nivîskar û helbestavan; Vêrlîn (Paul Verlaine), Arthur Rimbaud, Jol Lafurg (Jules Laforgue), Morîs (Jean Moréas) û Meterlîng (Maurice Maeterlinck). Bikaranîna remz di wêneyên helbestî da gelekî kevn e lê di helbestên nû û hevçerx da hîn zêde bikarhatiye, herwek Liwîs Hutirîk dibêje: ‘*Hîç helbestek tune ku hinek remz têda nebe*’.<sup>94</sup>

Helbestvanên ser bi vê rêbazê pirraniya hêma û remzên xwe di wênehelbestên xwe bikaranîne ku giringî didan xewna xeyalawî (xewnên nêzikî xeyalan), ‘*sembolîzm bi corekê (haweyekî) çavkanîyên xwe yên estetîkî ji sofîzm û hêzên ruhî yên bûyinê wergirtibû û cîhanek wê ya sêhrî, xamûş û xewnawî hebû. Bi dîtina wan desthelata hêzeke nediyar herdem li ser mirov da heye*’.<sup>95</sup> Gerçî rêbaza sîmbolîzm bi rêbaza romantîk diçe ku bi corekê ‘*rêbaza remzî bi romansîyet destpêkir û li rûyê naverokê ve hevrêyên hev bûn lê di şewaza derbirînê da jê cuda bû. Bi awayekê di mîsogerkirina li ser hêsîna da û di nêrîna wan da cîhana derekî jî tune tenê bi hoya hêsîna helbestvan û taqîkirinên hêsîna yên wan nebe. Loma mijarên derekî ne mijara qesîdeya remzî ne ji ber wê siruştî taqîkirina wan jî kêmdîtî û aloz bûn, loma zehmet bû ku bi şewazeke yekser werine derbirîn, belkî pêwîstîya helbestvanê remzî tenê bi wan remzana dibe ku hildibijêre*’.<sup>96</sup>

Helbestvanên sîmbolîzm guherkarîyeke serekî kirine ku helbestên xwe ji wê qonaxê derbaz kirine ku bi asanî mana û wata bidest bixin, loma di wênehelbestîyên xwe da remzên wiha bikaranîne ku bûye hoya wê mêjîyê xwendekaran bilivînin û li dû watayên weşartî bigerin û Bi destên xwe bixin. Bi corekê ku ‘*helbesta remzî hêsîna ye lê bi wateya xwe ya romansî Hêsîna niye, belkî bi wateya xwe ya felsefî hêsîna ye, wata (yanî) ger bi dû ew cudahîyên weşartî yên derûnê da ku ziman nikare*

<sup>94</sup> -Roz Xerîb, *Temhîd fî el-Neqd El Hedîs*, Dar el- Mekşûf, Beyrût, 1971, s229

<sup>95</sup> - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, b.n., r145

<sup>96</sup> -Tîfa ‘Eta Bin ‘Ude, *Mewqîf Neqd el Edebî mîn el Herekat el Tecdîd fî Ş’ir el ‘Erebî (1918-1945)*, Rîsalet Macester, Camî’e Bexdad, 1985, s154

wan derbirînin, sîmbolist jî weke parnasîyan pûteyê nadin gel belkî ji bo desteyeke hîlbijarde dinivîsînin”<sup>97</sup>. Herwiha sîmbolîst gelekî giringî didan reng her vana jî wa kirin ku reng bi ber peyv û tîpan da bikin ku di wênehelbestên wan da diyar bibin.

Di wêjeya kurdî da jî sîmbolîzm weke rêbazekê derneketiye lê di helbestên helbestvanên kurd da ji helbesta kilasîk heta nika jî heye û di wênehelbestên wan da olan daye bi taybetî di helbestên Hacî Qadirê Koyî, Cegerxwîn, Şêx Rezayê Talabanî û Şêrko Bêkes...hwd. Olandana (dengvedana) vê rêbazê jî di wêjeya kurdî da diyare ku bê hoy nîye, di encama rewşa jiyana civakî û ramiyariya gelê kurd derketiye çimkî ‘ew zemîna bi dirêjayîya qonaxan û di encama nebûna serbestîya derbirîne hatiye holê, rêya neyekserî û şelî kirîye rêyeke berdewamiya şewaza nivîsînê. Remz û baş bikaranîna sîmbolîzm vedigere dawîya Cenga Duyem ya Cîhanî, herçend li ba kurdan hemû demê derîyekî vekirî bû bi mebesta dûrketina ji êş û azara dagîrkerên Kurdistan”<sup>98</sup>.

Diyare kurd bi hoya ev sitem, zilm û zordariyên ku berdewam lê hatinekirin loma bikaranîna rêbaza sîmbolîzm (remz) di helbestên kurdan da hokareke giring bû. Ji bo ji dayikbûna wênehelbestên xwe bi şeweya remiz bi corekê ku ‘hêmagerî hunera kelecana (heyecan) tiştane ji bo xistina rûyê rewşek derûnî, ev dahênana rewşa derûnî jî di gava (hengawî) yekem da derbirîna alîyên kesayetîyê û di gava duwem da jî derxistina hêmayên kişandî ne (Transcendental symbol) ku têda wênehelbest wek hêma bikar nayên ji bo derbirîna ji hundur. Belkî ji bo cîhaneke aydialî (îdeolojîk) bikartên ku nivîskar di mêjîyê xwe da û di dil û derûna xwe da hêvîxwaz û bi rêya helbestê ve bidestê xwe bixe<sup>99</sup>”. Pêwîste em amaje bi wê jî bikin ku remz di helbestên helbestvanan da bi şeweya siruştî di wênehelbestên wan da derdikevin, wekemînak helbestvan li oxira evîndara/ê xwe yan serkirdeyê/a xwe yan siruştî ciwan yan jî li oxira nîştîmana xwe bikartîne ku bi hoya her hokarî be sitarê ji bo remz dibe. Wekemînak; Bihar nîşaneyê keskeyî û ciwanî û seretaya jiyana e, payiz remze ji bo weşana pelan (gela rêza) û kewa spî hêmaye ji bo aşitî loma em dibînin

<sup>97</sup>-Kemal Mîrawdêlî, *Felsefeyê Ciwanî û Huner*, Çapxaney Zankoy Silêmanî, 1979, 291

<sup>98</sup>-Pexşan Sabir Hemed, *Remz Le Şî'ri Hawçerxi Kurdî Kirmanciyê Xwarûyê Kurdistan* 1970-1991, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r97

<sup>99</sup>-Tahîr Mihemmed Elî, Qumrî Se'îd Ezîz, *Riwanîn le Deq*, Çapxaney Silêmanî, Silêmanî, 2011, r170-171

Cegerxwîn di helbesta ‘‘Qiblegaha Şaîran’’ da dibêje:

*‘‘Piştî Kurdistan xelas kî qiblegaha şairan  
sed Cegerxwîn û hejar demsazên dîwana te bin’’*.<sup>100</sup>

Eger em li ser vê malike hûr bibin em dibînin helbestvan Mela Mistefayê Barzanî kirîye remzek ji bo piştevanîya helbestvanan ku piştî nemana wî dibe pişt û sitara (penay) helbestvanan. Loma em dibînin wêneyê remzê bi şeweyekî siruştî di helbestên helbestvanan da derdikeve, wek hunereke ciwan û bihêz bi giştî di derbarê wêje û hunerê da û bi taybetî di helbestan da bikaranîne, wekemînak; ‘Ebdulla Peşew dibêje: ‘*Min tu (hîç) demê bikaranîna remz nekiriye armanc qet li dû jî negerya me meger xwe bi şeweyekî siruştî û di pêvajoya Dahênan da ji bilî ewên bê haya min hatibin, yan jî ewên bi xwe keti bin nav wêne û tablo û wênehelbestên xwe ve. Ji ber wê jî remz di pirranîya helbestan da xwe veşartîye digel wêne, keriste û hemanên din yekîtîyeke bihêz pêk tîne û yekser di xizmeta gihandina îdeolojîya (aydiyay) helbesta xwe û kûrkirina ezmûna dahênan da ye’’*.<sup>101</sup> Herwiha remz di wênehelbestên kilasîkîya hunera rewanbêjî da bi hunereke ciwan û bihêz bikar tê.

### **1.2.6.Rêbaza Dadaîzm**

Ev rêbaza wêjeyî û hunerî di sala 1916 an da li Swîstre li bajarê Zurîx serîhilda, yekem car Trîstan Tzara bikaranîye helbestvanên ser bi vê rêbaza wêjeyî qerfên (tinazî, tirrane, galte) xwe bi hemû bawerî û pîrozîyên serdema xwe dikirin. Loma wênehelbestên wan bi corekê bû ku têgeyîştina wan gelekî zehmet bû, çimkî ev rêbaza li ser binemaya dijayetîkirina hemû tiştan serîhildabû ku bi corekê hetta dijayetî li hêsina (xudî) rêbaza wan jî hate kirin ew dîsa her dadaîzm e. Dadaîzm li dijî hemû rewîştên ciwan û serdestên civakê bû ku berhemên wan bi şeweya tinazî û pêkenînawî bû ku ‘*binyada vê rêbaza ji nefî pêk dihat loma divê hêsina xwe jî nefî bike, di sala 1920 an da rêveberên vê rêbaza bi eşkere ragihandin ku ekola dada li*

<sup>100</sup> -Cegerxwîn, *Cegerxwîn Şa’îr û Mirov û Kurdperwer*, Dezgeha Spêrêz ya Çap û Weşandin, Çapxaneya Wezareta Perwerdê, Hewlêr, 2004, 42

<sup>101</sup> - Pexşan Sabir Hemed, b.n, r210-211

*dijî wêje û derewa wêje ye herwiha di beyannameya xwe da dibêjin: 'Dadaya rasteqîne ewe ku li dijî dada jî be'*.<sup>102</sup>

Bi hoya Cenga Yekem ya Cîhanî hinekî bêhûdeyî û bêhêvîti li dadayîyan diyar bû ku bi eşkere di wênehelbestên wan da olana wê berçav dibûn û ji rûxana wêje, rûxana huner û rûxana hemû ew azadî û serbestî yên ku hêsina tak hebû pêk dihat loma dadaîzm ji "hîç" pêk dihat ku hemû tişt li ser vê binemaya serekî ya rêbaza xwe dikirin pîvan. *'Vê grûbê hemû pîvanên îdeolojîk (aydiyolojî) û estetîkî yên serdema xwe refîz dikir, dixwastin bêhûdeyî û bêwatayî û bêhurmetîya serdema xwe ya tijî şer û hemû şêwaz, teknîk û amûrên kevî û serdest yên derbirinê têxin jêr pirsîyarê'*.<sup>103</sup>

Dadaîzm hemû tişt dixist ber pirsîyara "çî ye?" paşê her bi xwe jî bersîva wan ji "hîç" pêk dihat. Herwiha *'helbestvanên dadayî corek helbesta wêneyî berçav kirin û anîn nava wêjeyê ku navê wê 'Helbesta Konkirîti' (Concrete Poetri) bû, di wan helbestana da bi şeweya qebareya berçavkirîya dîtbarî (bînraw) peyv tene rêzkirin. Bi pê boçûna helbestvanan ew coreya helbestê coreya helbesta konkirîti ye, berçavkirîne, berbest (yasa, destur) û sînora nava gelen cîhanê cîhan dibirrin, hemû kes dikare bi mezene bixwînin ta radeyekê ji wan têbigê'*.<sup>104</sup>

Ev coreya helbestê bi şeweyekî taybet û awarte (şaz) ji alîye dadaîzmîyan berhem anî holê mebesta mezin û serekî ya wan bilez (xêra) gihandina peyama wan bû ku bi şeweya helbesta wêneyî bîr û hestên xwe derdibirrin. Çimkî wêneyê helbestîya serekî yên wê serdemê ji bêhêvîti û reşbînî zêdetir hîç tiştekî din bi başî nedikirin ev jî bi hoyê ye ku wê serdemê ku hêdî hêdî ev wênehelbestana xwe xistine nav berhema helbestvanên dadaîzm.

### **1.2.7. Rêbaza Suryalîzm**

Ekola suryalîzm ku ji dayik bû heman ekola dadaîzmê weke tamamkerê vê ekola dihate danîn ev jî bi hoyê bû ku ji gelekî alî da li hev diçûn, bi taybetî di dijayetîkirina 'eql û waqî'î da. Peyva suryalîzm *'yekem car ji alîyê Helbestvanê*

<sup>102</sup> -Reza Seyyid Huseynî, Qutabxane Edebîyekan, Wergêranî: Heme Kerîm Arif, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2006, r213

<sup>103</sup> - Ferhad Pîrbal, Rêbaze Edebîyekan, b.n, r315

<sup>104</sup> -Ednan Mibarek, el-Şî'r El Konkirêti, Mucele el-Eqlan, Bexdad, 1982, s99

*ferensî Guillaume Apollinaire (Gîwim Apolêner) di sala 1918 an da bikarhatîye û bi wateya 'Dererastî' tê''.*<sup>105</sup> Ev ekola wêjeyî li ser binemaya rexnegirtin li waqî'î û retkirina hemû tiştan damezrabû lê xaleke giring pîvan dikir ew jî dûbare binyatdanîna tiştan bi şêweyeke nû û ciwan, bi piştgirêdan bi "hidam" (nest) ku bi şêweyekê wênehelbestên xwe bi temamî guherîn, sîma û şêwazek taybet bikaranîn. 'Rêbaza suryalîzm li dû damezrandina estetîkîya naaqilî û ciwanînasîyê digerîya ku êdî pişt bi 'eqil û lojîk girê nede, belkî hewl bide ku hesta neagahî, xewn û şiyânên veşartî û înyatkirinên hinavî (hundur, nax) biteqînin. Ev teqandina xwe di xwe da ciwanî ye! Anîna nava nivîsandina otomatîkî li ba suryalîstan encama vê em prensîpê bû''.<sup>106</sup>

Yek ji sîmayên diyar yê vê rêbazê "nivîsandina otomatîkî" bû wata derbirîna ji nişkave (bê amadekarî) bi wateya bê bîrkerin (fikirîn) bê ketina jêr bandorên lojîkî yên bîr, di wênehelbest û tabloyên xwe da hest bi vê dikirin. Herwiha pûte (bayex, giringî) didan xewn û xeyal çimkî li gor wan wa bû mirov li jêr hemû girêdanên (sînorên) eqill waqî derbas dibe, herwiha li gor wan wa bû bi hoya xewnan ve mirov digihêje hemû azadîyên reha (mûtlaq) ku li cihana waqî'îya rasteqîne nikarin bigihêjinê.

Herwiha suryalî gelekî pûte didan ziman, 'dema ku Paul Îlward behsa dahênan û rola giringîya ziman dike bi şêweyekî bihêz û di asteke bilind da derbarê helbestê da dibêje: 'Nivîsandina helbestê êdî derbirînek nîye, yan ramanek yan pêşandana hestekê belkî nexşandina wêneyekî heralî yê cidî ye''. Suryalî bi rêya zimên ve xebatên xwe liser her alîyên corên naxa (hinav, hundur) mirov û xewnên mirov dikirin yan wêneyê rastîyeke hêja (şayiste) bi mirovan di nava xewnên wan da wêne dikirin. Loma ziman di asteke bilind ya dahênan û nûbûnê da bû''.<sup>107</sup>

Diyare ev rêbaza jî di wêjeya kurdî da bi şêweyeke fermî berçav dikeve ku di nava wêjeya kurdî da weke rêbaz û ekolekê di sala 1991 ta 1994 xuya dike.

<sup>105</sup> -Wertzêr Mensûr, *Hokarekanî Serhelldanî Rêbazî Suryalîzm*, Govarî Gelawêjî Nwê, Çapxaney Hemdî, Silêmanî, 2013, J.61, r17

<sup>106</sup> - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, b.n, r227

<sup>107</sup> - Nale Hesên, *Suryalîzm Wek Bîr Wek Dahênan*, Govarî Henar, Çapxaney Silêmanî, 2009, J.40, r15



Serdesteyê vê rêbazê jî ku giringî dayê û di nava wênehelbestên wî da olan daye Ferhad Pîrbal e, ev jî bi hoya xwendina li Ferensa dikeve jêr bandora vê rêbazê. Herwiha mînakên vê rêbaza wêjeyî û hunerî di nava berhemên helbestvanên wek Enwer Mesîfî, Ferîd Zamdar, Sebah Rencder û...Hwd . tê dîtin.

### **1.3. Pêkhatyên Wêneyê Helbestî**

Helbest ew cureya (cor) wêjeyî ye ku karkirin, şîrove û têgihîştina wê ta radeyekê zehmet û dijwar e û berpirsyareke mezin li sere, ji ber vê yekê ev cureya giring nîvî yan jê zêdetir wêjeya pîrraniya gelan dagir kirîye. Ev jî bi hoyêye ku ev awaz û muzîka xweşe ku di cureya helbestê da tête dîtin û li kar e, herwiha gelek car helbest ji bo derbirîna hilçûnan (helçûn), ji bo xweşî û şadî, xem û kovanan bi kar tê û coreke evîndarî, matbun (mitmane) û zêmar (mersîye) û azadîya takekes û civakê ji wê tê bidestxistin. Her vê ya jî wa kirîye ku zêdetir pûte bête dayîn helbestan bi taybetî wênehelbest, bi hûrbînî şîroveya wata û lêkdanê ji bo wê bête kirin çimkî divê bi hemû taybetmendiyên xwe digel wê tevbigere ku ji bo bigihêjîn bi rastî û naverok û wataya wê ya serekî. Pêwîste em wê jî bibêjin ta jiyan berdewam be helbest û wênehelbestên nû ji dayik dibin bi pê qonax û serdemên cuda û yawazekan şeweyê xwe yê taybet jî dibin. Herwiha loma xwendevanê/a bi ezmûn dema ku li deqek wêjeyî bi taybeti li deqek helbestî hûr bibe j bo bi temamî têkeve nava deqa helbestî hana ji bo pêkhatyên wê dibe. Wêneyê helbestî jî çend pêkhatyên giring pêk tê ku ev pêkhate nirx û ciwanîya helbestê destnîşan dike, her çiqas wêneyê helbestî bi xwe yek ji binyatdanînan helbestane ku çend hemanên serekî û pêkhatyên wê hene nikare bê hîç yek ji wan berheman bîne holê. Her yek ji van pêkhatana erk û giringîya xwe hene ku helbestvan û helbest bi hîç corekê nikarin dev ji hev berdin, çimkî bi nebûna her yek ji vana dibe sedema mirina navê vê coreya wêjeyê herwiha nakeve nava deqên helbestî yê biriqandî û zindî loma divê helbestvan di bikaranîna van hemanana da şiyar be û bi şeweyeke ciwan û rêkûpêk wan bikar bîne. Her yek ji wan pêkhatyên wêneyê helbestî wek binema û keresteyekî pêwîst di wêneyê helbestî da hemû wek hev in di nexşandina tabloyeke wêneyê helbestî da çimkî ev binaxe û avahîya helbestê li ser wan da binyat tene danîn. Loma divê helbestvan di bikaranîna wan pêkhatana da xwe di bijarkirina hemû tiştên ciwan û baş da bibine û kîjan wataya gelekî ciwan dibexşîne wê bikar bîne. Wêneyê helbestî ji ev pêkhatana pêk tê "ziman, bîr, aşop (endêşe), waqî'î, soz, hidam (nest) " ,ev pêkhate di rastî da li

rûyê hebûna serbixwe ve ji hev gelekî cuda ne lê di dirustkirina avahîya wêneyê helbestî da pêwendîyeke temamkar û bihêz di navbera wan da heye ku bi şêweyê xelek xelekî bi heve girêdayî ne ku wataya temam ya helbestê li ser ev pêkhatana bidest dikevin. Xirap bikaranîna pêkhatayên helbestê wataya wê aloz dike û ji ber wê xwendevan bêzar dibe û ji deqa helbestê dûr dikeve, loma emê li jêr bi hûrbînî behsa ev pêkhatana bikin û rol û erkê wan destnîşan bikin. Guman jî ji pûte û giringîya ev pêkhatayên helbestê tune ye çimkî bi hoya wan peyama helbestvan bi ronî digihêje me em baş têdigên.

### 1.3.1. Ziman (Language)

Ziman pêkhateyeke giringe di wêneyê helbestî da ku bi hoya wî peyam tête beyankirin ta ku ew bîra helbestvan veguheze ji bo derdorê, çimkî ziman xaleke bihêz e di navbera xwendevan û deq (metn, tekst) da ev jî bi hoya wê ye ku ‘*helbestvan bi rêya zimên ve hewlê dide cîhaneke tijî ciwanîya tase bexş binyatê bîne, ji hinava (nax) tişteki mijareke din misoger bike heyvana (hevîrtirş, hewênî, maya) wê mijarê jî helbest e, di hunerê da biha û nirxa wê çê dibe*<sup>108</sup>’. Diyarê ew mebesta (armanç) ku helbest têdigihîne ev jî li oxira mebest û armançeke Diyarîkirîya helbestvan e ku bi hoya hemana (regez) ziman ciwantirîn cîhanê diafirîne ji ber wê yeke xwendevan tevî nav deqên xwe dike. Herwiha zimanê helbestê zimanekî diyarkirîya taybetî nîye li rûyê rêziman û zimanvanîyê ve, belkî heman zimanê rojane yê gel e ku helbestvan bikar tîne her wek Aristo di ‘‘Hunera Helbestê’’ (Poetica) da amaje bi wê dike û dibêje; ‘‘*Mezintirîn taybetîya baş ya zimanê helbestê ew ku ron û eşkere be, bê wê ku sade be. Zimanê helbestê ji peyvên rojane dirust be wê demê ron û eşkere dibe lê ev tişteki sade ye. Ji aliyekî din, ew zimanê helbestê peyvên neserdest têda bikar were bilindî û hêjayî têdaye û di ser asta zimanê rojaneda ye*’’.<sup>109</sup> Aristo jî wêya jî misoger dike ku zimanê helbestê zimanekî nav gel û rojane ye dema peyvên ‘‘neserdest’’ wata peyvên awerte û kêmpayda bikar tîne, ew zimana corek peyvên ast bilind têda hene. Herwiha wênyê jî destnîşan dike ku divê helbestvan dema ew peyvên ‘‘neserdest’’ bikar tîne şiyar be, çimkî eger gelekî bikar hat dibe corek

<sup>108</sup> -Azad Ehmed Mehmûd, *Binyatî Ziman Le Şî'ri Hawçerxi Kurdî da*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r10

<sup>109</sup> - Eristo, *Hunerî Şî'r*, Wergêranî: Ezîz Gerdî, Çapxaney Genc, 2004, 83

"metelok" ê ku di wê da alozî û tevlihevî çê bibe. Lê dîsa jî ‘ *Helbest zimanekî Yezdanî ye- Ji zimanê asayî yê gel ji dayik dibe û di ser hemû babet (bas) û wateyan da ye*’<sup>110</sup> çimkî weke ku eşkere ye hîç rêzimanekî taybet bi zimanê helbestê nîye belkî hunerek ciwan heye ku helbestvan weke pîvanê bikar tîne, loma ‘ *zimanê rasteqînê helbestê ew zimana ye ku gel pê diaxive , ew zimanê ku dike zimanê helbestê jî bikaranîna çilotîya ziman e*’<sup>111</sup>

Ewê di zimanê helbestê da hest pê tê kirin ji bîr,şayş (endêşe) hest, hidam (nest) û muzîka helbestî ku ev jî bêguman di zimanê asayî yê gel da ne li kar e û hebûna wê nîye. Herwiha digel bikaranîna huneran di zimanê helbestî da herwek di helbesta kilasîk da zêdetir hunera "rewanbêjî "bikar tê," xaze (mecaz)" û "xwastin(alegorî)" û digel hemanên ciwankarîya helbestê. Herwiha di helbesta nû da jî "hêma "diyartirin hunere ku helbestvan bikar tînin lê li rûyê şêwaz û bikaranîna ve ‘ *zimanê helbestê li rûyê bikaranîna peyvên ferhengî yên wata dar û bandordar ji zimanê rojane yê axaftina gel cuda dibe. Herwiha bikaranîna destewajeyên xwedî îdyoma taybet û bikaranîna hevokên balkêş yên tijî şayişa hunerî, bi berevajîya axaftina rojane ya gel ku tijî peyvên sade, destewaje û hevokên xwedî wateya yekser*’<sup>112</sup> Ewê helbestvan bikar tîne hostayanetire ji ciwanîya peyvê û derbirîna ku bi hoya vê şêwaza taybet zimanê helbestê tête cudakirin ji zimanê axaftina rojane, her loma ‘ *wêne hemanêke (regez) bingehîn e di zimanê helbestê da*’<sup>113</sup> Pêwîstîya helbestvan herdem bi zêdetir zanîn û fêrbûnê heye, weke ku eşkere ye cîhana mirov gelekî fire û biber (berîn, berîne) e loma divê ferhenga ziman û ferhenga helbestê û peyvên helbestvan dewlemend bin, ev wêneyê helbestî yên helbestvan bi şêweyê ciwantir rengareng diyar dike. Wek tê gotin ‘ *wêne hem gelek wata li xwe digre û hem hest û heşê xwendevan dicoşîne û dibezîne. Herdem huner, desthelat û destrengîniya helbestvan*

<sup>110</sup> - Ebdulxaliq Sersam, *Le Lêwarî Gerdûn da*, Dar el-Hurrîye lîl Teba'et, Bexdad, 1990, r8

<sup>111</sup> - Sa'd Farûq Yûsif Şêxbizênî, *Binyatî Hunerî Şî'ri Ehmed Muxtar Begî Caf da*, Çapxaney Roşinbîrî, Hewlêr, 2011, r34

<sup>112</sup> - ‘Adil Germîyanî, *Xesletekanî Zimanî Şî'ri Kurdîy Hawçerx*, kovarî Henar, 2013, J. 91, r13

<sup>113</sup> - Sellah Fezil, *Nazarîye El Bînaîye fî Neqd el-Edebî*, Dar El Şûewen el-Seqafe El ‘Ame, Bexdad, 1987, s467

*nîşan dide di çiloyîya xemlandin û pêşkeşkirina bîrokeyên xwe bi hoya ew listokên zimanî yên ku di deqa xwe da disazîne*”.<sup>114</sup>

Ron û eşkere ye helbestvan ew bîra ku heye bi rêya ziman dixê ser rûpelên sipî, li wir li rûyê rûxsar, naverok û çilotîya (çoniyetî) bikaranîna peyvên dest bi hemû beşên din dike. Dema ku helbestvan kelecana (taya) helbestê digire û îlhamek ji bo wî/wê tê eger ferhenga peyv û zimanê helbestê yê wî/wê bihêz û dewlemend nebe em dibinin ku helbestên wî/wê di çarçeweya çend peyvên diyar da dizîvire , zêde gavan ji bo wêneyên teze navêje lê bi berevajî dema ku ferhenga ziman ya helbestvan dewlemend be wêneyê helbestî yên nû ji dayik dibin ku em wênehelbestên wan di tabloyeke rengareng yê peyvên cor bi cor da dibinin. Herweha helbestvan bi awayekî pîspor be li ser ziman ku di dema nivîsandina her deqeke helbestî da raneweste û pêwîstî pê neke, ‘*divê helbestvan bi hevwatera peyvên bizane ji bo her peyvekê û peyveke din yan hîn zêdetir, çimkî bikaranîna hevwatera ew peyvên ku gelekî bikar hatine nûbun û ciwanîyekê dide helbestên helbestvanan*’.<sup>115</sup> Ev jî wê rastîyê ji bo me derdixîne dema ku ferhenga zimanî ya helbestvan dewlemend be dibe helbestvanekî/e serkeftî, çimkî çawa bixwaze wiha listoka bi peyvên dike bi şêweya cîguherîn û paşûpêşkirina wan ku bi mebesta deqên helbestên wan pê ciwan û mûsîqadar be û awaza xweş bide deqan. Ev jî helbestvan dixê rewşeke asayî nivîsandina helbestê ku bê xwe westandin û ‘acizkirin li xwe û westan û dudilî di deqa helbesta wî/ê da hebe, awaz û muzîka helbesta wî/ê rêça xwe digire û wêneyekî ciwanî yê helbestî jê berhem tê.

Bêguman helbest hem îlhameke Yezdanî ye û hem huner û corek ji pîşeyî ye her ji ber wê coreke ji huner e gelek car helbestvan di temambûna deqa helbestê da dúbare dêt ciwankarî û destkarîyê li peyvên dike. Wata gelek car helbestvan peyvekê bikar tîne lê ku çend caran dixwîne, dibe ku di hindik peyvên da dudil dibe hest dike ku ev peyvên bikaranîye wêneyekî helbestî yê tamam nade berdest loma tê cîguherîna van peyvên dike û şêwe, ziman û wataya wêneyê wî/wê bihêztir û rontir dike. Lê ‘*hemû listokên nava zimên deq nagêjîne asta bi helbestbûnê*’.<sup>116</sup> loma

<sup>114</sup> -Osman Deştî, *Lebarey Binyatî Ziman û Şewazî Şî'r*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r208

<sup>115</sup> -Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyatî Hunerî Le Şî'rî Şêrko Bêkes*, b.n, r40

<sup>116</sup> -Fûad Reşîd, *Deqî Edebî (Edgar, Çej, Beha)*, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2007, 104

helbestvan di dariştin û bikaranîna peyvên da divê şiyar be û zanibe çawa dixê nava wênehelbetên xwe ji bo wê wataya bingehîn ya peyvê wenda nebe, çimkî gelek car helbestvanê kêmezûn bi rêzikirina peyvên hem zimanê peyvên têk dide (xera dike) hem di helbesta wî/wê da hîç wêneyek têda nayê dîtîn, pêwîste bi jîrî peyvên bikar bîne. ‘*Gelek car di nav nivîskar û rexnegiran da em peyva helbestî û peyva nehelbestî dibihîzin wate li gor wan waye ku ew peyvên wateya ciwan dide helbestê peyvên helbestî ne lê ew peyvên ku nehelbestî ne di kirdar û dariştina helbestan da hîç ciwanîyekê nadin dest, lê ew derbirîn ji rastîyê dûrin çimkî peyva rût bi tene wateya xwe ya rasteqîne wernagire ta nekeve nav hevok û derbirîna helbestê*’.<sup>117</sup>

Hinek car helbestvan rastî corek kêmpêdaya peyvên tê ji bo wê armanca ku heyê bête derbirîn, ev jî bi hoya wan peyvane ku bi destê helbestvan nekeve loma rastî awayekî westan û têkçûna sîma û wataya deqa helbestê tê. Loma ‘*ziman çiqas dewlemend be di peyv û têgihê da hîna nikare ewê ku helbestvan hest pê dike werbigre, gelek car helbestvan radiweste (tiştêkî nanivîsîne) yan ji xwe diçe bi şûna peyvekê da ku gelekî mebestî be û hest, soz û bîra nava helbestê bête derbirîn*’.<sup>118</sup>

Ziman wek serekîtirîn hemana wêneyê helbestî rola wê heyê di bûyîna pêkhatiyên din da wek bîr, endêşe û soz wek eşkere ye dema ku hest û bîreke ciwanî di mêjîyê helbestvan da dizivire û di nava dile xwe da hejîna (lerze) derbirîna wêneyê helbestî yê xwe digire bêguman ew amûr û destgeha ku wêneyê helbestî yê wan dinexşîne ziman e. Çimkî dema ku zimanê helbestvan nebû bila her bîra ciwan û hesta wî/wê ya ciwan hebe loma ziman dibe hoyê jidayikbûna tabloya helbestî û nasandina helbestvanê tabloyê, bi şêweyekê ku ‘*felsefeya helbestvan her çi be, mewdaya wateyên helbestvan çiqasî fire be jî bi rêya zimanê xwe tê nasîn*’.<sup>119</sup>

Diyare her helbestvan bi pê bikaranîna peyvên û serdema wêneyê helbestî yê xwe û bi taybetîya xwe ya nava civaka xwe da dike tê nasîn. Çimkî ziman vetîreya civakî ye û berdewam di guherînê da ye roj bi roj peyv û têgihên teze berçav dikevin, ev jî bi ronî di zimanê helbestvan û helbestan da derdikevin û hest bi wan tê kirin di

<sup>117</sup> - Kerîm Mistefa Şareza, *Wişey Şî'ri û Wişey Naşî'ri, kovarî Raman*, J. 128,r128

<sup>118</sup> - Tenya Es'ed Mihemmed, *Diyardey Xem Le Şî'ri Hesib Qeredaxî da*, Çapxaney Aras,Hewlêr,2012,r64

<sup>119</sup> - Mihemmed Kurdo, *Geran Be Diway Şî'r û Ciyawazî da*, Berêberayeti Çap û Bilawkirdnewey Silêmanî, Silêmanî, 2004,r21

şêwaz û wênehelbestî yên her serdemê da goranên zimanî derdikevin holê. Her wek Horas dibêje: ‘*Zimanê helbestê giringî daye "peyv" ê helbestvan agahdar dike ku peyvên wan bêtam(bêçêj) û mirî nebin. Dema ku erka helbestê derbirîn û ronkirin e, divê peyvên wê jî berdewam, zîndî û tijî wata û jîyan bin, di vî warî da ziman dişibîne darê û peyvên jî dişibîne pelên darê*’.<sup>120</sup> Diyare ev agahdarkirina Horas ji bo helbestvanan di wê da xwe dibîne ku berdewam ziman di guherînekê da ye û peyvên nû û teze ji dayik dibin pêwîste helbestvan ev tiştana bigire berçavê xwe ku ji bo wêneyê helbestî yên nû werin holê.

Yek ji pêştir(berpêş,pêşrew)û raberê Koma Riwanîyan(Grûpî Riwanîyîyekan) Şêrko Bêkes di derbarê asta têgihîştina zimanê helbestî da dibêje: ‘*Asta hunera helbestê divê li asteke navendî da be, nabe bi şeweyekî kutal (kala) û bazirganîyê seyrî wê bê kirin, bi corekê ku asta wê ya hunerî hewqas nesade û hêsan (sakar) be ku hemû gel têbigê û di heman deme da jî nabe asta wê ya hunerî hewqas giran be weke girêkek kor (kwîr, kiwêr) be ku bi asanî nêvekirin, baştir waye di asteke navendî û herwiha guncaw be*’.<sup>121</sup> Ev ramana Şêrko Bêkes ku hemû pêkhatayên wêneyê helbestî têda heye ku bîr, aşop (endêşe), hestên û bi taybetî zimanê helbestvanan e çimkî ‘*wêneyê helbestî bi rêya zimên kontakê (pêwendî) digel xwendevanan çê dike (dirust dike)*’.<sup>122</sup> Ji ber wê ziman xala bi hev gihandin û dirustbûna wê peywendîyê ye ku di nava wêneyê helbestî û xwendevanan da dirust dibe, herwiha ziman afirînerê wêneyên helbestî ye loma pirtirîn û mezintirîn şiyarîya zimanî pêwîste di wêneyê helbestî yê helbestvan da çimkî ‘*helbest coreke ji ziman, deste hemû kesî nagêjê (nagatê) tenê ewên ku corek şiyana wan ya mînakî ya taybetî hene digêjênê*’.<sup>123</sup> Bûyina (hebûn) ziman aloz û tevliheve, zimanê helbestî jî asteke wê ya hunerîya bilind heye ji ber wê di têgihîştinê da kesên behremend divê, bi şeweyekî ku di wênehelbestan da bi zehmetî dereng têgeyîştin Heye. Her çiqas asta têgihîştina xwendevanan ji hev cudatirin ev cudahiya ji ber wê rewşa siruştî ye

<sup>120</sup> - Mihemmed Ebdulkerîm Îbrahîm, *Pêkhatay Zimanî Şî'rî Le Riwaney Rexney Edebi Nwêwe*, Ezmûnî Şa'îranî Heştakanî Hewlêr Wek Nimûne, Çapxaney Mukiryar, Hewlêr, 2012, r15

<sup>121</sup> - Şiwan Silêman, *Edebi Hawçerx*, Waney Qonaxî Çiwarem, Zankoy Selaheddîn, Kollêjî Ziman, Beşî Kurdî, 2014

<sup>122</sup> - Soran Azad, *Guzariştî Xud*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2012, r95

<sup>123</sup> - Îbrahîm Sameraî, *Fî Luxe El Şî'r*, Dar el-Fikir, Emman, 1404 Hicrî, s15

ku têda dijî û herwiha asta rewşenbîrîya kesan jî rolê dibine di wergirtin û têgihîştina wêne helbestên wan da.

Loma bi hoya bikaranîna peyv û zimanê bêgane di helbestên helbestvanên kilasîk ku yek ji taybetmendiyên diwanên helbestvanên kilasîk tê danîn ku têgihîştin û bi destê xwe danîna wênehelbestên wan ku têda peyvên 'erebî, farisî û tirkî bikar dianîn hêsan nîye, belkî pêwîstî bi lêhûrbûn û xwendineke baş heye. Diyare ku zimanê helbestî jî li ser şiyana helbestvan radiweste ku asta şiyana wî/wê ya zimanî çawa ye li rûyê ferheng, peyv û asta bikaranîna peyvên di wêneyê helbestî da şiyana helbestvan derdixe. 'Kewate (yanî) helbestvan di binyatdanîna wêneyê hunerî da wî zimanî bekar tîne ku zimanekî kurtekirî (kurtkirawe) ye û cuda ye ji zimanê axaftina rojane. Zimaneke li rûyê têgihîştinê ve pehnîyeke (pantîyekî) fireh digire û xwe dîr dixê ji zimanê teng yê deverî ku têgihîştina wê bi jimareyê diyarkirî ve hatiye girêdan, belkî zimanekî bi başî tîpên dewlemend bikar tîne wê deme jî rûxsareke ciwan û naverokê xurt bi wêneyê xwe dibexşîne'.<sup>124</sup> Wekemînak ev cudahiya jî di navbera bêjeyên asayî yê rojane û bêjeyên helbestvan da di vê da derdikeve ku helbestvan corek ji hest, soz û aşopê (endêşe) tevî peyvên xwe dike, dibe wêneyekî helbestî yê ku cuda ye ji wan ên kesekî asayî yê kêmpêyv bikar tîne her wek Dr. Hîmîdad Husên di helbesta nû ya kurdî da du şewazê zimanê helbestî destnîşan dike ew jî 'Şewaza qiseyê gelê sade (asayî) û şewaza zimanê wêjeyî edebî'.<sup>125</sup> Wekemînak dema ku helbestvan dibêje; "ezman girya " digel qiseyên kesê/a asayî dibêje "baran barî ", ev gelekî bi ronî û bi eşkere hest bi wan du şewaza tê kirin ku bi şeweyekî eger em li ser ev her du hevokana hûr bibin em wê dibînin "ezman girya " ji yekê zêdetir bîr, hest, endêşe, wata û wêneyê helbestî têdaye bi berawirdîya digel "baran dibare "ku bi qise û peyveke asayî yê nava gel diçe. Diyare ewê helbestvan ji gele din cuda dike ku ew nixim e (poşak) ferhengî û ciwankarîya zimanî ye ku dixê nava helbestan e, zimanê helbestê ku 'derbirîn di vî zimanî da çalax, zêde û firetir e ji wê derbirîna di zimanê asayî da heye çimkî ji bilî derbirîna wataya xwe ya bingehîn amaje ji bo alîyê nedîbar (nebînraw) dike. Herwiha alîyê hilçûn û xeyalkirinê jî têda heye ku derbirîn di zimanê asayî da tenê amaje bi wê waqî'î yê

<sup>124</sup> -Serdar Ehmed Hesên Gerdî, *Binyatî Wêney Hunerî Le Şî'ri Kurdî da (1970-1991)*, b.n., r67

<sup>125</sup> -Hisên, *Derwazeyek Bo Rexney Edebî Kurdî*, Çapxaney Xanî, Dihok, 2007, r278

*dike ku yekser li ber çavê me ye*”.<sup>126</sup> Loma eger zimanê helbestê bi vê şêweyê nebe ew hemû kesên wî zimanê sade û asayî bikar bîne ew helbestvan e. Zimanê helbestê kangeha derbirîna hemû tiştên têdîtî (dîbar, bînraw) û nedîbarin ku helbestvan bi wêneyê helbestî arasteyî xwendevanên xwe dike. ‘*Wata divê helbestvan bi hoya şarezayî û rewşenbîrîya xwe xêlîyê ji ser watayên veşartî yên tégihan hil bide û ciwanî yên wan derbixe ta xwendevan li mebesta helbestvan têbigê (jê fam bike) û ew jî wateya tégihan bi wê şêweyê bibînin ku helbestvan wan dibine çimkî hemû kes nikare ciwanîya tégih û wateyên wan bibine û hest bi wan bikin*’.<sup>127</sup> Zimanê helbestê ew pêwendîya bihêz e di navbera nivîskar, deq û xwendevan da loma dema helbestvan zimanekî taybet bi xwe di deqek helbestî da bikar tîne pêwîste nîzikbûn û tégihîştinek di navbera wî/wê xwendevanên wî/wê da hebe.

### 1.3.2. Aşop-Endêşe (Imagination)

Wêneyê helbestî lihevxiştîyeke tevlihev e, yek ji pêkhatayên wê aşop e ku bi hoya wê çavkanîya wêneyê helbestî ya wê tê nexşandin. Hiç guman têda nîye ku aşop yek ji girîngtirîn pêkhatayên wêneyê helbestî ye, herwek ‘Elaeddîn Secadî dibêje: ‘*Aşop ku xeyal e guman û herikandineke tij e û derbasîyeke veşartî ya nav dil e, yan jî hêzek veşartî ye, tapoya wan yadana (bîrana) dihêle ku sermîyana wan wenda bûne. Bêguman eger aşop nebe xebata beyan û wêjeyê radiweste, ji ber wê ye aşop bûye payeyeke gelek mezin ya wêjeyê, dewê (tenanet) eger aşop nebe peyv nikare wêneyê watayî bikişîne û tijî bike çimkî dibe ku peyv ji jimareyan be û pîvanek wan hebe lê wata ne ji jimareyan tê û ne jî pîvanên wan hene*’.<sup>128</sup> Çimkî bandoreke bihêz û şîyaneke wê ya mezin heye bi giştî li ser wêjeyê û bi taybetî li ser coreya helbestê.

Wek rohn û eşkereye aşop derbirîna derûnî nava hundurê mirove, di rawestgeha wêje û qanala helbestê da xwe dihewîne û xeyala helbestvan di nava deq û dêrên

<sup>126</sup> - Perêz Sabîr, *Rexney Edebi Kurdî û Meselekani Nwêkirdnewey Şî'r*, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2006, r286

<sup>127</sup> - Xanzad Elî Qadir, *Zimanî Şî'riy Hacî Qadirî Koyî û Mehwi û Şêx Rezay Talebanî*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012, r29

<sup>128</sup> - ‘Elaeddîn Secadî, *Edebi Kurdî û Lêkolînewe Le Edebi Kurdî*, Çapxaney Ma’arif, Bexda, 1967, r78



helbestê da beyan dike, herwek Wirdiz Wirip dibêje: ‘*Aşop mercegeke (edese) zêrîn e helbestvan mijarên xwe di nav wê da dibîne û di şêwe û reng da bala xwe dide wan*’.<sup>129</sup> Bi vê şêweyê aşop pêwîstîyeke seretayî û dawî û berdewamîya wêney helbestî ye ku hergîz nikare dev jê berde, çimkî bi nebûna aşopê wêneyê helbestî çê nabe. Bi hoya aşopê ve helbestvan dûbare ew wêneyên di waqî’î da hest bi wan dike bi hoya xeyal û aşopek ciwan wêne helbesteke ji ewên k udi rastî da hest pê tê kirin û têne dîtin baştir û bilindtir dixe nav tabloyek wêneyê helbestî. Dema ku helbest ji aşopê vala be wataya wê jî vala dibe, wê demê gelekî zehmete ku em van qiseyên rojane û deqên helbestî ji hev cuda bikin çimkî ‘*Wêne ji dayik bûyîya xeyal e û xeyal jî danerê binemaya wêneyê wêjeyî ye*’.<sup>130</sup> Aşop serperîştîyê (şêwirmendîyê)li dayik bûna wêneyê helbestî dike, demekê ku helbestvan dîmenekî ciwan dibîne di vir da xeyal radibe (heldestêt) bi cîbicîkirina erka xwe ya ku helbestvan wek pêkhate û materyalekî serekî pêwîstîya wî aşopê heye di dariştina helbesta xwe da, eger em bibêjin: ‘*Helbest berhema xewn û xeyal e*’.<sup>131</sup> di ciyê xwe da ye. Çimkî ta helbestê da aşop û xeyala bihêz berçav be û bi şêweyê bilind û ciwan balkêş be hêz, çêj û wateya helbestê zêdetir dibe çimkî eger avahîya xeyal û aşopa helbestvan fireh û mezin nebe ew xeyala helbestî li dor çend xeyalê sînordar da dizîvire. Gera wî/wê ya xeyalî kêmbê û kêmbê bigere ew kêmezmûn dibe ev jî bi vê şêweyê ku demekê mirov bi gerê geştê dike eger şarezayîya wî/wê di derbarê vî welatî kêmbê be jê wendê (wednê, boy deçêt) ewe tiştêkî rohn û eşkere ye, tenê çend cihê diyarkirî dibîne û cihên din nabîne. Lê eger şarezayîya wî/wê zêdetir be bi kêfa dile xwe temamê wan cihên ku mebesta wî/wê ye li hemûyan digere, bi heman şêweyê helbestvan dikeve nava rewşeke wêjeyî ya bi vî corî (cureyî) loma xeyal û aşop girînge ji bo ji dayik bûna wêneyekî helbestî xeyalî, wata (yanî) aşop û xeyal wênehelbestên wî/wê himbêz kiri bin. Loma ‘*Eger aşop nebe beyan û wêje radiwestin çimkî eger aşop neçe peyker ji bo çê bike*

<sup>129</sup> -Mihemmed Xenîmî Hîlal, *el-Neqd El Edebî El Hedîs*, Bila Seras lîl Neşir, 1985,

<sup>130</sup> -Mihemmed Sûbhî Es’ed Ebû Husên, *Sûre el Meret fi Edeb Endelûsî fi ‘Esr el- Tewaîf we El Merabitîn*, ‘Alem el-Keteb lîl Neşir we el-Tewzî Erîd-Erden, 2005, s281

<sup>131</sup> -Şêrko Bêkes, *Çepkêk Hevpeyvîn*, Ezmûn (1985-2000), Kokirdnewe û Amadekirdinî Yasîn ‘Umer, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî, 2001, r191

*paşê peyv an derbibirrin, peyv bi tenê nikarine wan watana bîne û bi şêweyekî bandordar têxine rû*”<sup>132</sup>.

Aşop û xeyal herwek tiştêkî giring û pûte ji kesên asayî bigre ta helbestvan ‘hez û daxwazên wan yên bêsinor ji bo vê pêkhatiya giring ya helbestê heye. Her ji ber vê jî aşop di pirranîya dem û cîh da di nav mêjîyê mirov da dizîvire bi şêweyê cor bi cor û rengareng, dema ku mirov xeyala xwe bi wê xerîk (meşxûl) dike ku navê kes yan tiştêkî bê bîrê yan di mêjîyê xwe da bibine her çiqas xeyal û aşopa helbestvan di asteke bilind û aloz di xezneya cihana helbest û derbarê hêsina xwe û deqa xwe da heye ku corek ji coş û kelecane dide xwendevanê deqên helbestî. Loma em dikarin bibêjin: ‘*Xeyalkirin dikare tiştan biafirîne û ji wê zêdetir li ser hev kom bike. Bi nehîştina tiştê misoger (çespaw) û diyarkirî ew wêneyên xêvî (zeynî) ji wateyê wergeryane û ji yekeyeke giştî taze da wek hev dike*’<sup>133</sup>.

Ev jî demekê helbestvan di nav cerga xweşî û nexweşîya civaka xwe da ye bi wê hoyê xeyalê cor bi cor derbarê civakî, dînî û evîndarî ji dayik dibe û bi wê hoyê ve xeyal pirranîya wêne û helbestan dibezîne û tabloyên helbestî pê tene nexşandin û bi şêweyekî tijî ji hest û soz berhemên xwe arasteyî xwendevanên xwe dike. Loma ‘*rola giring ya aşopê heye di Aûnandina deqên helbestî da û hêza derûnî ya helbestvan e*’<sup>134</sup>. Herwek rohn û eşkere ye ku xaleke bihêzîya helbestvan ku bi wê hoyê ve xwendevan peywest bi xwe bike ew aşop e, çunke derûnîya helbestvan dareke keske û bi hoya aşopê berhemên xwe digîne. Herwiha xeyala geş ya peyvê ye ku di nava hundur û derûna xwe da dinasîne. Loma ‘*’aşop radibe bi kirdara şîroveyê û pêkanîne ve, pêwendîyên kevn hildiveşîne û peywendîyên nû binyat tîne, wêneyekî nû û cuda diafirîne*’<sup>135</sup>. Aşop xalek bihêze ji bo gihandina wênehelbestên helbestvan e, loma giringîya aşopê bêsînore.

Aşop weke pêkhatyeke ku hemû cor û celebên huner û wêjeyê têda heye, loma binçîneya estetîkîya her deqî û her corên din yên wêjeyî li ser mezinî û ciwanîya aşopê rawestyaye. Rola aşop û xeyalê tenê di ciwankirinê da nîye belkî

<sup>132</sup>-Şukurye Resûl, *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, Metbe’et Ta’lîm ‘Alî, Hewlêr, 1989, r11

<sup>133</sup> -Azad Ehmed Mehmûd, *Şeş Lêkolînewey Şî’rî*, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2008, r, 121

<sup>134</sup> -Kemal Merûf, *Edebîyatî Cîhanî*, Nûsîngey Mîlo Bo Karûbarî Kompyuter û Çap, r95

<sup>135</sup> - Fatîh Ellaq, *Mefhûm el-Şî’r ‘Înde Rude el-Şî’r el-‘Erebî el-‘Hur*, b.n, s262-263

wênehelbestên helbestvan watadartir û firetir dike loma nexşandina wêneyê helbestî bê aşop tişteki bêderfete, hergîz bê aşopê deqên watadar û ciwan nayêne holê. ‘*Aşop handereke ji teqîna hestan û xweragirîya (xurtbûna) helbestvan û reşebayê sozane*’.<sup>136</sup> çimkî bi hoya aşopê ve hest di hinava helbestvan da dikeve rewşa livandin, derbirîn û eşkerekirinên wî/wê, wata derîyê veşartîyê hinava helbestvan bi hoya aşopê ve vedibe. Bi wê hoyê xeyala zindî ya helbestvan derî li rûyê xwendevanên wî/wê vedike, ev jî dema ku ron û eşkereyî ya aşopê diyar dibe ku ‘*pirrtirîn jimare ji hestên mirov di çêkirina wêne da hevbeşîyê dikin û diyartirîn serkeftina xeyalê di derbirîne da wê deme dibe ku wêneyê wî/wê bi ber hesta dîtin û bihîstinê da be*’.<sup>137</sup>

Dîtin û bihîstin bihêztirîn hesta helbestvan e û bandordartirîn amûra wergirtin û gihandina peyama navbera takekes û xwendevanan e. Rexnegir û pisporên warê wêjeyê heta nika bi şêweyê yek bîr û raman nikarin li ser celeba aşopê rêk bikevin (li hev bikin), diyartirîn û rontirîn destnîşankirina celebên aşopê vedigere ji bo Samuel Taylor Coleridge (Kulirdic) ku aşop dabeşî ser du cureyan dike.

Yekem; Aşopa serekî-fancey= ev cureya aşopê ku di navbera hemû mirovan da hevbeşe aşopa serekî; ‘*Ew şîyan e ku navbendîyê di navbera têgihîştin û hestkirinê da dike, hêzeke çalak e û hokareke ji bo têgihîştina mirovayetî bi giştî ev şîyanên aşopa serekî jî ji ber wê ye ku em hemû bûnewerîn (zindî) ne û têdigên loma bandorê li hemû kesî dike*’.<sup>138</sup> Wata bûna (bûyîn, hebûn) vê cureya aşopê di navbera kesekî asayî û helbestvan da heye, divê em wê jî bibêjin: ‘*Aşopa serekî ji bilî wê ku hemû gel têda beşdarin û desthelata wê jî li ser helbestvanan heye, ev cureya aşopê hestî ye (di heşê mirovda ye) û li rûyê hestan ve zanyarî kom dibin, rolekî baş dibîne di karê têgihîştinê da herwek Dr. Adil Germiyani dibêje: ‘*Aşopa hestî li ba Coleridge weke aşopek serekî ye çimkî bi rêya têgihîştinê ve zanyarîyên di nava wê cureya aşopê kom dibin û têgihîştina wê jî bi rêya endamên hestî yên mirov dibe. Wata aşopeke vîyanî ye (îrade) û mêjîyê mirov di vî warî da dikare fermanên xwe yên taybet ji bo**

<sup>136</sup> -Sasîn Esaf, *Wêney Şî'ri Le Rêbazî Romantîk da*, Wergêranî: ‘Adil Germiyani, kovarî Raman, 1999, J.27, r174

<sup>137</sup> - Serdar Ehmed Hesên Gerdî, *Binyatî Wêney Hunerî Le Şî'ri Kurdî da (1970-1991)*, r76

<sup>138</sup> -R.L Brêt, *el-Teswîr we el-Xeyal*, Tercume:Dr. ‘Ebdulwahîd Lulue, Dar el Hurîye lil Teba’e, Bexdad, 1979, s52

*raperandina van cureyên kiraran (kirde) bide û çendîn wêneyê hestî yên rojane di mêjîyê mirov da kom dibe û ewên sade û sûdbexş (bikêr, kêrhatî) bin xêra (zû) werdigire lê fermana hilgirtinê nade”.*<sup>139</sup>

Cureya duyem: Aşopa neserekî (lawekî)–Imagitation= Ev cureya taybete bi helbestvanên hilketî, taybet û awerte (şaz) ku giringî, şêwe û şêwaza xwe ya taybetî heye, herwiha bihêzî û bilindiya helbestê li ba van helbestvanan diyar dikeve, dibe hoya dahênana helbestê û jêhatî û jîrîya helbestvan têda derdikeve holê. ‘*Digel wê da jî aşopa neserekîya wê ew hêza têda ye ku bi hoya wê wêneyekî diyarkirî yaxud hesteke diyarkirî bervî wê dibe ku komek wêne û komek hest di deqek helbestî da kom bike û tene di nava hev da jî bihewînin, li gor vê aşopa neserekî ew aşope ku yekîti dibexşîne deqa helbestê”.*<sup>140</sup> Wata taybetmendîyeke bihêz û cuda ya aşopa neserekî heye, ew jî di komkirin û tevlihevkirina zêdetir hest û xeyal û wêne di binyatdanîna peykerê deqeke helbestî di tijî ji xeyal û ciwanîyê ‘*ku Kant ji vê cureyê re dibêje “Xeyala Estetîkî”.*<sup>141</sup> Loma ev ramana Kant ji bo me wê eşkere dike ku rola bingehîn ya aşopa neserekî heye di çêbûna wêne da li hizir, bîr û soza helbestvan da ku ‘*helbestvan ji waqî’îya serdest wêneyekî nû di çend peyvan da pêşkeşî me bike helbestvan di vir da xeyala helbesta xwe bi şêweyekî dadirêjê ku bi ser sîma û watayên can da diherike, bi corekî wa ku kar li derûnê bike bi watayeke din diçe nava kûrbûna (qûlayî) tiştan û digêje cihê jîyanê”.*<sup>142</sup>

Loma rastîyeke eşkere ewe ye ku xeyala ciwan vedigere ji bo kûrî û firehîya soz û hezkirina jiyana derbasbûyî, nika û dahatû ya her helbestvanekî di siruşt, keş, hewa, civak û derdora cihana helbestvan ku bûyîna wan heye. Her bi hoya van jî ta ew hêla (per, alî) xeyala helbestvanîya xwe bikar bîne, dahênanê li deq û wêneyê helbestî bike. Çimkî dema ku her yek ji van û zêdetir jî eger li ber destê helbestvan nebû yaxûd bûyîna wan nebû bêguman aşop û xeyaleke qisir û bê berhem deqa helbestî û wêneyê helbestî çê dibe. Loma em dibînin helbestvanên Kurdistan di rastî da li jêr bandora hejarî, zilm û zordarî, dagîrkarî da bûn lê bi hoya siruşt ciwan ya

<sup>139</sup> - ‘Adil Mecîd Mihemmed Germîyanî, *Wêney Babetî Le Hondrawekanî Goran û Seyyab da*, b.n.,r125

<sup>140</sup> -Rêzan Salih Mewlûd, *Endêşey Şî’rî Le Nêwan Rêbazî Kilasîk û Romantîkî Kurdî Le Kirmanciy Xwarû da*, Çapxaney Şahab, Hewlêr, 2009, r40-41

<sup>141</sup> -Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyatî Wêney Hunerî Le Şî’rî Kurdî da (1970-1991)*, b.n., r72

<sup>142</sup> -Dilêr Ehmed Qeredaxî, *Wêney Şî’rî Lay Nalî*, kovarî Raman, 2002, J.74, r54

nîştîmana xwe siruştaxaka xwe bîra (fikir, raman) takekesên kurdên bihêz û bi şîyan bûne hoyawê ku bi aşopên cuda cuda û bi şêweyê ciwan ciwan li her derê vê xakaciwan çendîn helbestvanên hestxurt û xeyalciwan çê be,berhemên wan di nava pirtûk û dîroka wêjeya kurdî da bi cudatirîn û dewlemendtirîn xeyal binivîsîn ji ber wê jî loma dîwanên helbestvanên me şahîde.

### 1.3.3.Bîr (Idea)

Bîr yek ji bi şîyantirîn û bihêztirîn materyal e (keriste) ku bi şêweyekî ji xwe ve û siruştî ku mirov di karûbar û plana xwe ya rojane da pêwîstîyê pê dike (pêwîstîya mirov jê heye), loma nirx û giringîya vê pêkhatyê ji aliyê helbestvan ve zêdetir û pirtir kar li ser tê kirin û binemayeke giring ya wêneyê helbestî ye. Herwek eşkere ye hemû pêkhatyên helbestê wek hev di derbirîn û ji dayîk bûna wêneyê helbestî da hevbeşin û beşdarî pêvajoya (pirose) pêkhatyê helbestê dikin loma em dibînin giringî ya taybetîya "bîr" heye , çimkî pêwîstiyê serekîya helbestê ye. Wek em zanin eger helbestek "bîr " têda nebe hem helbestvan kar li ser deqa xwe ya helbestê nake ji bo ciwankirin û wênekirina wê û hem jî xwendevan di deqeke helbestê da ku "bîr" têda nebe yekser û bi şêweyekî otomatîkî dev ji xwendina deqê berdide, haweyekî (corek) bêzarbûn û dûrketin pê diyar dibe û dibe ku careke din bervî vê deqê neçe. Herwiha li ser helbestvan pêwîste di bikaranîna "bîr " da şiyar û agahdar be, wata "bîr " neke keristeyeke serdest ya nava deqa xwe ya helbestî ku bi hoyaw mebesteke xwe ya taybet bikar bîne, yaxud bi hoyaw "bîr"ê ve hemanên din yê wêneyê helbestî ji bîr bike. Çimkî paşê xwêner bi haweyekî ji deqê dûr dikeve, hinek car jî "bîr" hewqas ciwan, bihêz, şîrîn û biçêj dikeve nava deqa helbestê xwendevan wek xurek (xorak) û aramî û bi can çêjeke pirr jê digre ji carekê zêdetir dixwîne, ta digêje radeya tevlibûna digel vê wêneyê helbestî ku bi pêkhatyên wêneyê helbestî binyata wan hatine danîn û bi taybetî ku "bîr "xala giring ya deqa helbesta wî/wê ye.

*‘Dîroka wêjeya mirovayetî tijî ye ji wêneyan bi taybetî jî ew wêneyên ku meseleyên zindî yên mirovayetî têda berçav dibûn, ev hemana her çiqas weke hemanekê ‘hidamî’ (nest, laşû’ûr) nav lêkirine lê bilindi û mezinîya helbestên xwe bi vê hemanê pîvandine. Çimkî ezmûna helbestê bê "bîr" dibe tevlihevek bê serûber*

*û hîç rêkxistinek têda nebe*”<sup>143</sup> loma eger helbest ji ziman, aşop, hest, hidam û sozê pekhati be, bêguman "bîr " jî ji wî ‘can’ ê ku pêkhatiya helbestê weke kincan li xwe kirî be pêk tê. Loma "bîr" ‘*ji mebest, hevî, bendewarî, armanc û xulyaya helbestvan pêk tê...*, *Herwiha ji peyam û felsefeya helbestvan pêk tê çi digel xwe û çi jî bilî xwe da. Yan dilê xwe bi wan dide axaftin yan jî dixwaze bigîne guhdar û xwendevanan yaxût bi mebesta her duyan*”<sup>144</sup>

Diyare ku helbestvan peyameke diyarkirî û hinek car giştî û hinek car taybetî pêve ye ku arasteyî xwendevanên xwe dike ku bi hoya "bîr " ve vê peyama xwe digêjîne deq û wêneyekî helbestî. Ev bîra jî di helbestên helbestvanên kevn û nû da cuda ne ‘*bîra helbestên kevn şewazeke taybetî ya rijêma (rejim) derebegî pêve ye, ji aliyekî jî îdeolojîk e (aydiyalî=mîsalî) û hemberê (weke) riyalîstîya bîra helbesta teze ye. Li aliyê din jî pirranîya vê bîra kevn (hizira kevn) demekê pirranîya bîra helbesta teze ji cihana mijarî=babetî (mewzû’î) werdigirin, di rastî da ji derbirînên rengê qalibê hunerîya bêjer werdigre*’<sup>145</sup> Çavkanîya helbestên helbestvanên kevn wata pêş qonaxa nû li dora çend bîr û mebestên diyarkirî da dizivirî, lê di helbesta modernîzm wata ‘nû bîr’ ya helbestê azad bû wata bi şeweyekî giştî hemû tişt digirt û helbestvanan guldanka helbestên xwe fireh kirin; bi pê hemû naverok û mijarên cîhanî, siruşt, nîrxên ciwan û sîmayên diyar yên nava jiyana rojane birin. Loma "bîr" "giringtirîn hokara gihîştina navbera helbestvan û xwendevanan e, çimkî bi hoya vê bîrê ve em şarezayî ya asta rewşenbîrîya wan helbestvana dibînin ta çi radeyê "bîr" a ciwan di nava deqeke wêjeyî da dikine pîvan. Herwiha bîr tişteki hevbeşe di navbera karên wêjeyî û hunerî da bi corekê ku helbestvan demekê bîreke ciwan di nava wêneyekî helbestî, yan romannivîsek di roman û çîroka wêjeyî da bikar tîne. Ew heman bîr dikare li ser sekoya şano û bi rêya şanogerîyê were bikaranîn, ji bilî wêneyê helbestî yên xwe wêneyekî dîtbarî yê hunerî yekser yê wê "bîr " ê tê dîtin. Loma bîr heyvan (hevîrtirş, hewên, maya) û ji dayik bûna pirranîya cureyênwêjeyî û hûnerî ye, bêguman ev ‘bîr’ jî bi şeweyê cor bi cor dibe. ‘*Bîr livînerê (culêner, hereketvan) bûyeran e, di nava hinava bûyeran da ji dayik dibe, encameke mîsoger*

<sup>143</sup>-Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Wêney Hunerî Le Şî'ri Şêx Nûrî Şêx Salih*, Namey Diktora, Kollêjî Ziman, Zankoy Silêmanî, Silêmanî, 2006, r25

<sup>144</sup> -Cemal ‘Hebîbûlla Bêdar, *Derwazey Şî'rnasîn*, Çapxaney Narîn, Hewlêr, 2013, r35-36

<sup>145</sup> -*Goran*: kovarî Rovar, Be Hawbeşiy Çapxaney Aras û Serdem, 2710K, J.60, r3

ya mentiqî ye û tevî jîyan û hawirkariyên (milmilane) jîyanê dibe, gelekî bi alozî ji dayik dibe û mêjîyê xwendevan dilivîne û kelecane dide, xwendevan bervî xwe dikşîne û tevî xwe dike”.<sup>146</sup> Wekemînak helbestvan bi rêya vê “bîr” ê ve divê peyameke şîretî yan peyameke hest bilind û bîreke ciwan û şoreşgerane û nîştîmanî din ava deqa xwe da beyan bike, wek sirûda nîştîmanî ya “Ey Reqîb” ya Dildar ku ev “bîr” a bi şeweyekê ta gelê kurd hebe ev “bîr” a ciwan nifş bi nifş (newe) dimîne û dibe sembola sirûda nîştîmana kurd. Peyameke cîhanî ye ji bo hemû neteweyan ku “Kurd Zindî” ye û namire, navnîşana vê jî di deqeke wiha bi wataya binirx ya “bîr” ê derdixîne di wêneyê helbestî da bi hemû heman û pêkhateyên xwe ve.

Mamellekirina helbestvan digel vê hemana wêneyê helbestî gelekî hestîyar e çimkî pêwîstiya vê hemana helbestê bi perwerdeyeke ciwan ya helbestvan heye ku bi şeweyekî wêjeyîyane û perwerdane bîrên xwe derdibirin. Çimkî demekê ku helbestvan bîrek dûrî kevneşopîyên (dabûnerît) civakê di deqeke helbestî û wêneyekî helbestî da beyan bike metirsîdar e, herwek Eflatun helbestvanan weke tiştên xerap nişan dide çimkî li gor wî wa bû ku helbestvan “bîr” ên xirap di nava civakê da belav dikin. Lê di rastî da hebûna vê vetîreyê (dîyarde) di nav helbestvanan da gelekî kêma e, çimkî hîç guman têda nîye ku helbestvan bi perwerdeyeke ciwan tê nava cihana wêjeyê û bi taybetî ya helbestê eger helbest “gul” be bîra helbestvan jî “bêhna gulê” ye.

#### **1.3.4. Soz (Emotion)**

Soz hemanke din e di binyatanîna wêjeyê da bi giştî û helbest bi taybetî, loma rolek bilind dibîne di pêkhateya wêneyê helbestî da ku bi alîkarîya hemanên din û bi giringî û pûteya xwe ta'm û çêjeke nebirrî dide helbestê. Soz bi hemû corên xwe xala serekîya ji dayik bûna wêjeyê ye herwek li gor Kamîl Besîr : ‘*Rexnesaz û dîroknivîs (mêjûnûs) li ser wê yekin ku lekeya wêjeyê di dema ji dayik bûnê da taqîkirinek e û ev taqîkirina jî li ser binaxeya sozekê damezraye. Ku wa bû wêjevan (wêjer) ji ber wê berhema xwe saz bike li hember sozekê dibe û vê sozê bervî taqîkirineke taybet*

<sup>146</sup> -Dr. Antonyos Betres el-Edeb *Te'rîfe Enwa' Mezhebet*, el-Muesseset el-'Hedîset lil Kîtab, Lubnan, 2005, s139

*vedikişîne*''<sup>147</sup> Diyare ku soz xaleke ji bo destnîşankirina coreyên wêjeyî çimkî dema ku soz di wêjeyê da bikar tê şêweyekî wê ya giştî heye, lê dema ku helbestvan yan çîroknivîs sozê dikin berhemên xwe soz xwe ji wî warê giştî yekalî dike û ji şêweyê giştî bervî şêweyê taybetî ve diçe, bi vê şêweyê soz yeke ji taybetmendtirîn xasîyet ku Xwedayê Mezin bexşandîye bi hemû mirovan. 'Soz tayeke (nexweşî) germe di nava rehên laş da tê û cerg û dil dihejîne, pêtiya agirekî ye dil coş dide hêzeke ku kar li dil dike û rastî hilçûn û têkçûnek dike û ev hilçûn û têkçûna bilind dibe û di rûxsarek zer û çilmisî û hêsirên (firmêsk) ron û germ xwe nimayîş dike''<sup>148</sup>

Soza mirov hesteke efsûnawî ye, bi taybetî li ba helbestvan çimkî soz di nava şahdemar û temamî dil û derûna mirov da diafire. Demekê jî ku pêtiya soz bi helbestvan dikeve ta nefesa xwe ya dawî bi şêweyekî ciwan sozan bikar tîne, weke ku em zanin helbest ta sozên zêde têda be zêdetir baran û hêsirên sozê dibare bi ser deqa helbestî da loma bi pê bikaranîna sozê ta'm û cêja deqa helbestê û bihêzî, ciwanî û xweşî têda olanê dide û temenê deqê li ba xwendevan zindî dimîne. Loma 'wêneyê helbestî çiqas ciwan be helbestvanê serkeftî destnîşan nake, tenê di wê demê da nebe ku bi soza nazik û aşopa afirêner xemilandî be û ta bikaribe hest û soza guhdar yan xwendevan veciqîne (bilerzîne)''<sup>149</sup> Li vir pêwendîyeke bihêz dikeve nava soz û aşopê di wêneyê helbestî da, çimkî hebûna her du pêkhatayên wê bi heve girêdayîne ku nabe yek bikar were ya din bikar nê. -Çimkî 'Soz paş nemana hilçûna demê di sînorekî diyarkirî da radiweste, loma pêwîstîya wê bi hêza aşopê ye ji bo ku bijî, pêkeve (vêkeve, dabigirsêt)û dabirêje bi dariştineke hunerî ya cuda''<sup>150</sup> Em peywendîya di navbera soz û aşopê da bi şêweyekê ku 'ta soza wê bihêztir be pêwîstîya wê bi aşopeke bihêztir jî heye, bihêzîya her yekê jî kar (bandorê) li ya din dike''<sup>151</sup> Soz peyama helbestvan bi şêweyekî ron û eşkere û rastgoyane digîne xwendevan û bihîserên xwe, ev jî di wê da diyar dibe ku em dibînin helbestvan bi sozeke ewqas bilind û bihêz û hesteke xurt helbesta xwe dixwîne û em dibînin aşop û soza xwendevan bi şêweyê gelekî bandordar tevî nava

<sup>147</sup> -Kamîl 'Hesen 'Ezîz Besîr, *Wêjey Kurdî û Rexnesazî*, Çapxaney Dar el Ca'hiz, 1991, r280

<sup>148</sup> -Hawjîn Silêwe, *Soz Le Şî'r da*, kovarî Raman, 2010, J.159, 115

<sup>149</sup> -Kerîm Şareza, *Wêney Şî'rî Le Honrawey Kurdî da Çon Dirust Debê û Be Çi Hestêk Werdegîret*, kovarî Raman, 1997, J.9

<sup>150</sup> -Ferhad Qadir Kerîm, *Binyatî Wêne Le Şî'rekanî Hemdî da*, b.n., r50

<sup>151</sup> -Dilşad Elî, *Dilan û Taqîkirdnewey Şî'rî*, Çapxaney Serdem, Silêmanî, 2007, r169



hinav û hesta wî/wê dibe ku bi şêweyekî wiha dizane rasterast helbest ji bo wî/wê hatîye nivîsandin.

Soz di helbestên helbestvanên kevn û nû da bi şêweyên cuda derdikevin ku; *‘ ‘di helbestên kevn da tişteki hêsini (xûdi) bû, ji hinav û derîniya helbestvan diteqe, ew hest û hidama (nest) zêde dibe derûna hember evîndarê/evîndara xwe bi şêweyekî derdibire ku li ber wî/wê da dibe ax (xak) û xwelî. Lê di helbestên nû da guherîn bi ser van tiştana da hat , bi haweyekî din bê tirs û bi xurtî soz û hesta xwe li hemberî yara/yarê xwe derdibirîne ‘ ‘.*<sup>152</sup> Bi pê cî (şiwên), dem û gavan guherîn bi ser sozê da tê, ev jî tişteki siruştî ye çimkî bûyer û hestên cor bi cor û bi hokarin ku soza wêneyên helbestî bi yek şêweyê nemîne. Herwek di wênehelbestan da bi pê serdem û helbestvanan guherîn bi ser bişir (zerdexene), xweşî, şadî, serkeftin, rûgeşî, girî û hêsirên (firmêsk) rûtirşî da tê. Wekemînak li ba helbestvanên romansî pûte û giringîya sozê gelekî heye ku ta wê radeyê ku eger ew helbestên soz têda nebe tu (tew, qet, hîç) wataya wan tune ye diyare ev jî nagunce û rast nîye çimkî em li ser şîrovekirina deqên helbestî hûr bibin ji bilî sozê, xeyal, bîr û ziman beşdarîyê têda dikin, lê bi nebûna sozê di helbestê da ta’ m û çêja helbestê lawaz dibe, wê ciwanîyê nade.

Pêwîste em amaje bi wê bikin ku erk û (rol) çalakîya sozê di wênehelbestên fêrkinê da kême, çimkî di helbestên fêrkinê da erka perwerde û fêrkirina mijarî pêve diyare, ji soza hêsini (xudî) dûr dikeve. Loma *‘ ‘helbestên fêrkinê erka pirralî (hemelayen) dibine û piştta xwe dispêre hemû hemanên helbestê, ji bilî wê ku soza helbestvan nebe ku ew jî bi plana zanistîyê ve vê valahîyê (boşayî) tijî dike ‘ ‘,*<sup>153</sup> di vê cora helbestê da jî ku ron û eşkere ye tu hilçûn û daketinekê (bilindbûn û nizmbûn) di xwe da nabîne. Dema ku hest û sozek bilind di helbestê da bikar tê pêwîste helbestvan di helbestê da li derbirîna soza xwe da şîyar be ku bi ser pêkhatayên din yê helbestê da serdest bike. Herweha pêwîste helbestvan agahdarê zimanê sozê be, herwek *‘ ‘diyare zimanê sozê jî nazik û dilgîr be û dûr ji têgihên zanistî û peyvên*

<sup>152</sup> -Şermîn Îbrahîm Ezîz, *Peşew û Tazekirdnewe le Şî’rî Kurdî da*, Çapxaney Roşinbîrî, Hewlêr, 2006, r157

<sup>153</sup> - Ehmed Mihemmed Mam Usman, *Şî’rî Fêrkirdin Le Edebî Kurdî da (Nîwey Yekemî Sedey Bîstem)*, Namey Master, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 2007, r15

*bihêz yê biyanî, çimkî hest û soz cihê zayîna wîjdan e û hêsina helbestvan e, loma divê bi şêweyekî gelekî ciwan û dilgîr were derbirîn*”<sup>154</sup>.

### 1.3.5.Bûnmend (Waqî’î, real)

Bûnmend çavkanî û ji dayik bûna deqa helbestê ye bi hemû xweşî û nexweşîyên xwe ve, loma pêwendîya di navbera bûnmend û pêkhatiya wêneyê helbestî ji peywestbûna helbestê bi bûnmendê vê pêk tê. Herweha li gor ‘Adil Germiyanî wiha ye ku : ‘*hêsina bûnmendê nikare bi yekcarî serdest bibe li ser hêsina helbestvan da bi şêweyekî ji şêweyên olandana di nava hêsina helbestê da xwe dixê rû. Bi vê şêweye hêsina helbestê di navenda xeta di navbera hêsina helbestvan û hêsina bûdmenda wî/wê bi rêya hêsina helbesta xwe kar li hêsina peyamê û wergirê/wergira xwe dike bi hoya wê bîr û çêja hunerî ya pê dibexşîne*’<sup>155</sup>. Îcar merc nîye ev bûdmenda şîrîn e yan tal e...Hwd. Helbestvan weke xwe werbigire li deqeke helbestî binexşîne belkî helbestvan li ser binemaya kavdan (keş) û hewayê û ciwanîya siruştê ew bûdmenda ku bi ciwanî tê ber soz û aşopê û bîra helbestvan ji bûdmendê sûd werdigire û wêneyekî helbestî bidest karkirin û bi ciwankirinê tête holê ku hem olandana neynika bûdmendê be û hem jî olandana nava hêsina helbestvan be. Loma ‘*berhemên her wêjevanî heta radeyekê olandana jîyana wan e*’<sup>156</sup>. Di vir da jî giringîya bûdmendê di wê da derdikeve ku bûdmend nebe helbest jî nabe, pêwendiyê duyanî ya bihêz di navbera bûdmend, helbest û pêkhatiya wê da heye ku jihevqetîna wan bêderfet e. Loma ta ku helbestvan wêneyê bûdmendî dike wêneyê helbestî ev jî bi wê ciwankirinê ye ku di bûdmendê da heye bi hemû wêneyên siruştî, civakî û cor bi cor ve. Loma ‘*helbest cîhandîtineke gerdûnî ye û jîyanê bi giştî dike qad û wateyên wê helgirîya tiştêkî diyarkirî nîye, loma bi pê pêgeha civakî helbestvan dikeve nava bûdmendê û dîtîna û ramanên wî/wê diguherin. Ji ber wê yeke bûdmend belgeyeke dîrokî û civakî nîye, belkî olandana ezmûnekê ye helgirê kare hêsina mirov e û hilçûnên wî/wê jî derbirî ya rêyeke taybete bi civaka xwe ve ku di encama tevlihevbûna hêsîna û mijarê da hatîye*’<sup>157</sup>. Helbestvan bi rêya

<sup>154</sup> - Serdar Ehmed Hesên Gerdî, *Binyatî Wêney Hunerî Le Şî’rî Kurdî da (1970-1991)*, b.n, r87

<sup>155</sup> - ‘Adil Mecîd Mihemmed Germiyanî, *Wêney Babetî Le Hondrawekanî Goran û Seyyab da*, b.n, r103

<sup>156</sup> - ‘Husên Arif, *Koktêl*, Çapxaney Serdem, Silêmanî, 2005, r226

<sup>157</sup> - Ebdulqadir Heme Emîn Mihemmed, *Binyatî Karnameyî Le Deqî Nwêy Kurdî da*, Çapxaney Tîşk, Silêmanî, 2008, 54

bûdmendê ve ew pêwendîyên civakî bi hoya wêneyên helbestî bihêztir dike, çimkî guman têda nîye wêje ji wan bûyerên rojane yên ku bi ber bîr, hest û soza helbestvan dikeve pêk tê, di cihana bûdmendî û wêjeyê da olanê dide. ‘*Pêwendîyeke tûnd û xurt ya helbestê bi bûdmendê ve heye, helbestvan berî binivîsîne hest dike ku girêyeke (pirsgirêk) derûnî li ba wî/wê çê bûye û ev pirsgirêka jî ji vetîreyeke bûdmendî çê bûye, hest û soza xwe derdibirîne û tiştên navekî (nederekî) nîşan dide, girêya derûnî vedike û xwe dispêrîne helbestê*’.<sup>158</sup>

### 1.3.6. Hidam, Hişmendî, Nest (Unconsciousness)

Yek ji pêkhatayên helbestê ye ku bi rewşeke bêagahîya helbestvan tê zanîn û bi wê hoyê çavkanîya wêneyê helbestî ji dayik dibe, hidam kogeha ew hez û daxwazîyên mirov e ku di bûdmendê da nikare bigêjê. Loma ‘*’asta bêagahîya wê gavê ye ku ji bêagahîya karê xwe encamê dide weke di xewnê û di dema bedmestî û bêheşîyê da derdikeve, tiştên qedexekirî bi pê civakê di nava cîhana bêagahîyan vedişêrin*’.<sup>159</sup> Loma hidam dibe mezintirîn xezneya helbestvan ev jî bi vê şêweyê ku ‘*’demekê ku cesteyê (laş, beden) mirov tijî dibe û dixwaze li rûyê cînsî ve xwe vala bike wê demê hidam weke xezneyek tijî wêne, wêne dişîne ji bo xeyala mirov êdî ew mirova cesteyê xwe vala dike. Îcar bi rêya wê be ku wiha baran barînek heye yan wêneyê ewên li hemberî xwe amade dike weke di xewê da yan di xewnbiro da wê demê karê wan encamê dide*’.<sup>160</sup> Ev rewşa jî li ba helbestvan gelekî û zêdetir hest pê tê kirin û tê dîtin, ‘*’ev asta li alîyekî weke asta pêş agahîyê ye, li alîyekî din jî ji hev cuda ne ku li wî rûyî hinek ezmûnên jîrî hildigire. Di wî rûyî da jî jê cudatir e ku ew ezmûnên komkirîne daxîne asta bêagahîya ezmûna tal û êşê, pirranîya wan ezmûnana ew daxwazî bûn ku nehatine cî yan ew tirsane bûn ku canê wan kesana hejandîye yaxud ew hêvîyana bûn ku di civakê da rê li ber wan girtîne û nehiştîye bend û sînorên jiyana civakî nehiştîne cî bi cî bibin*’.<sup>161</sup> Wekemînak helbestvan di xortanîya xwe da ji evîndarîya keçan ‘*hez dike dema ku ew ‘heza wî nayê cî û li ba*

<sup>158</sup> - Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyatî Hunerî Le Şî’rî Şêrko Bêkes*, b.n., r66

<sup>159</sup> - Hawjîn Silêwe, *Rehendî Derûnî Le Şî’rekanî Letîf Helmet da*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2013, 50

<sup>160</sup> - Pêşrew Ebdulla, *Edeb. Şêwekarî. Tîyor*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2014, r58

<sup>161</sup> - Şukrî Ezîz Mazî, *Tîyorî Edeb*, Wergêranî, Dr. Serdar Ehmed Gerdî, Çapxaney Mardîn, Hewlêr, 2010, r152

keçan pûte pê nayê dayîn hidam dibe giringtirîn çareserî û amûra (alav, amraz) ta ew rewşa derûnîya ku têda ye xwe jê vala bike û herdem helbestvan jî bi hoya vê hidamê ve xwe ji wê rewşa derûnî rizgar dikin û corek ji wêneyê helbestî jê tînin holê (çê dikin), her di derbarê vê da Dr. Mihemmed Xinîmî Hilal dibêje: ‘*’Reh û rîşeyên hemû wêneyan di dahênana hunerî bi cîhana nest da daçûye (çûye xwar) , çimkî li piştî wê çirûskê , ku di derûna xwe da em hest dikin warekî wê yê tarîkî û nayê zanîn heye, ku tijî vetîreyên derunî ye û tenê olandana wê ya alozî nebe em di derbarê wê da tiştêkî nizanin’’*.<sup>162</sup>

Eşkere ye ku hidam jî tene wêne ye, tu watayeke ron û eşkere nade dest loma têgihîştina hidamê hinekî aloz e dewê (tenanet) ev rewşa li ba hêsina xwe ve jî zehmet û giran e (qurs). Çimkî ev hidama olandana komek wêneyê rabirdû ne ku bi rêya xewnan ve tê bîra mirovan û berbiçav dibe. Diyarê alîkarê serekî yê ji bo derxistina hidamê ji aşop, xewn, xeyal û bîrê pêk tên ku helbestvan bi hoya wê hidama ku zêde bûye ve der tîne. Her çiqas hidam pêwendîyeke hevsenge di navbera wêje, zanist û derûnê da ji bilî wê wêje bi giştî beşeke sîmaya derûnî pêve diyarê, helbestvan yaxud romannivîs di dema berhemênê da rewşa xwe ya derûnî derdixe (diyar dike) her loma ‘*’hidam hilgirê ew beşa tiştên mat (bêdeng) û mîsogerin, her ji qonaxa zaroktîyê ve bandora wan heye bi asanî ew ‘hez û daxwazîyên tîr nekirî hewla xwedexistin didin bi rêya xewnan xwe ji wan zîndanên rizgar dikin dîr ji çavdêr (sensor), ev jî bi wêne û derbirînên cor bi cor xwe di xewnan da bi şeweyê remz û alozî rê didin (nişan didin), xewn dibe sekoyeke azad ji bo hemû ew tiştên ku di hidamê da ne û di wir da xwe veşartine’’*.<sup>163</sup> Loma hidam kogeh û xezneyeke baş ya helbestvan û nivîskarane herwiha rewşeke dewlemende ji bo ji dayik bûna wêneyê helbestî. Freud (Froyid) -1856 -1939 di derbarê hidamê da gelek raman û boçûn xiste rû û di derbarê hidamê da dibêje: ‘*’Wêneyê helbestî remzeke, sermîyanê hidamê ye’’*.<sup>164</sup> Herwiha Freud du cor hidam diyar kiriye paşê jî hest ji hidamê cuda kirîye ku ev in.

<sup>162</sup> -Mihemmed Xenîmî Hilal, *el-Neqd El Edebî El Hedîs*, b.n., s371

<sup>163</sup> -Helmet Bayiz Resûl, *Rehendekanî Derûnî Le Çîrokekanî Şêrzad Hesenda*, Zankoy Bexda, Kollêjî Îbn Ruşd, Namey Master, 2006, r88

<sup>164</sup> - Serdar Ehmed Hesên Gerdî, *Binyatî Wêney Hunerî Le Şî’rî Kurdî da (1970-1991)*, b.n., r90

### 1 –Hidama Veşartî:

Li gor Freud ev cureya hidamê tişteke ku bi şêweyekî siruştî di mirovan da heye û şîyana wê heye were nav cîhana hestî... Ev jî bi komek wizeyên (enerjî) veşartî yên wesifkirinê di nava mirov da heye, wata hidama veşartî komek wizeyên veşartî ne ku dixwaze derkeve. Bi watayêke din hidama veşartî ku ji bo xwe...Tiştên derûnî yên nava mirovan da her wiha bê liv rûnanin, belkî hewlê didin ku li ser asta ceste derkevin û bêne nav bûnmendê ve.

### 2 –Hidama Mîsoger (Selmandî):

Şîyana vê coreya hidamê tune ye bête nava bûdmendê “hest” çima ? Çimkî ev coreya hidamê ku paşê xwe di “ew” da dibîne dibe parzinê (filtre) “ez=ego” biçe û “ez” jî nunerê cihana bûdmendî ye, rê nade ku hemû hidam di bûdmendî ye da derkevin çimkî mercên bûdmendê heye ji bo derketina tiştan û azadîya mirov di bûdmendê da nîye di wê da çî bibêje û çî bike , ewê ku dike dibe bi pê çawayî û formek hebe ku di bûdmendê da rê pê hatîye dayin ”.<sup>165</sup>

### 1.4. Jiyan û Serdema Mistefa Begê (Kurdî)

Mistefa Beg yek ji stêrk û sê kuçkeyê binavûdeng yê Baban e, hevamilê Nalî û Salim e ku rola wan ya giring û bilind hebû di coreya helbesta kilasîkîya kurdî û dewlemendkirina wêjeya kurdî da. Di derbarê jiyana û cî û sala ji da yik bûna wî da çend rayên bihêz yê lêkoler û rexnegirên kurdî heye ku cihê bawerpêkirinê ye bi hemû mezende (texmîn), rast û gumanên wan, ev jî bi wê hoyê ye ku serdema ew helbestvan têda jîyane tomar nebû. Herwek Gîwî Mukiryani di çapa yekem ya “Dîwana Kurdî” da dibêje: ‘*Navê wî Mistefa Beg e, kurê Mehmûd Begê kurê Ehmed Begê Sahêbqiran e, hîna bi tamamî roja ji dayik bûn û wefata wî nayê zanîn, lê bi ramana hinek kesan di sala 1809 ê zayînî ji dayik bûye*’.<sup>166</sup> Herweha ‘Elaeddîn Seccadî heman raya wî heye di derbarê ji dayik bûna Mistefa Beg da ku dibêje: ‘*Di sala 1809 ê zayînî li Bajarê Silêmanîyê hatîye cîhanê*’<sup>167</sup>, Emîn Feyzî di pirtûka Encumena Wêjevanên Kurd (Encumenê Edîbanî Kurd) da raya wî waye: ‘*Di sala*

<sup>165</sup> -Pêşrew Ebdulla, *Qutabxaney Derûnşîkarî Le Rexney Edebî da*, kovarî Ayînde, J.89,r25

<sup>166</sup> -Gîwî Mukiryani, *Mistefa Begî Sahêbqiran Dîwanî Kurdî*, 1387 Koçî

<sup>167</sup> - ‘Elaeddîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, b.n,r322

1812 da ji dayik bûye û 1851 an da wefat kirîye”<sup>168</sup> Herwiha ramana nivîskar û zanayê wêjeya kurdî Dr. Marûf Xeznedar waye ku: ‘1812 an da li Silêmanîyê ji dayik bûye û di 1850 da li Bajare Silêmanîyê wefat kirîye, li Girê Seywanê hatîye veşartin’<sup>169</sup> Herwiha Dr. Mihemed Arif di pirtûka Teksta Wêjeya Kurdî (Têkstî Edebî Kurdî)da dibêje: ‘Di sala 1809 an da li Silêmanî ji dayik bûye, Kurdî cara dawî vedigere Silêmanîyê û li wir cîgir dibe û di sala 1849 an da wefat kirîye’<sup>170</sup>

Bihêztirîn raman û boçûn di derbarê ji dayik bûn û wefata Mistefa Begê Kurdî da Mihemed Mistefa Hemebor ku lêkolîn û şîrove ji bo dîwana Kurdî li du bergan da bi vî şeweyî behsê dike: “Sebaret bi ji dayik bûna wî niv dereke helbesteke bavê Kurdî ku bi farisî nivîsîye û bi lihevdana hirûfa ebcedî sala jidayikbûna Kurdî derdikeve ev jî bi vî şeweyî= ‘ احمد است جد و ثمر محمود نام مصطفى ’ = Ahmed ast ced û peder Mehmûd namim Mustefa” wata “Ehmed bavpîr û bav Mehmûd û navê min Mistefa ye”. Ev jî guherîna wê nivîsê ye bi tîpên ebcedî, Ahmed est - احمد است = 514 + cedû- احمد = 13 + peder- ثمر = 206 + Mehmûd- محمود = 104 + namim- نام = 131 + Mistefa- مصطفى = 229. Komkirina hemû van jimarana dike “1197” û ev jimareya jî bi sala koça îslamî ye (hîcrî), li gor sala zayînî (mîladî) jî dike 1782. Di derbarê wefata Kurdî Hecî Qadirê Koyî “Çarîne”yek bi mînakekê anîye ku weke destnîşankirina sala wefata wî di helbestekê da bi nivdêrekê; “**Îsmî sahebqirran xasî ewe = Navê wî sahebqirran taybete bi wî**” wergirtîye bi hesabê hirûfa ebcedî û rênûsa kevn tîpên peyvê “asmî sahbqirran xasî ewe” dike “1276” ew jimareya jî ew sala koçî ye ku Kurdî têda jîyaye, ew sala koçî (hîcrî) li gor sala zayînî dike ‘1859’<sup>171</sup> Herweha sebaret bi peyvê “Sahêbqirran” navê gundêkî Rojhelatê Kurdistanê ye.

### **Xwêndina Kurdî:**

Xwêndina wî bi du qonax bû, di derbarê xwendina wî da Hemebor dibêje: ‘Di 4-5 salîya temenê xwe da çûye hucreya di nava mizgefta Hacîxan ku bavpîrê wî çêkiri bû. Bi jîrî di 8-9 salîya xwe da sê cuzên Qur’anê xwendîye, ku mala wan diçe Kerkûkê ji ber cudahîya Kerkûk û Silêmanîyê qonaxa duyem ya xwendina wî diqede û dev ji

<sup>168</sup> -Emîn Feyzî, *Encumenî Edîbanî Kurd*, Çapxaney Korî Zanyariy ‘Iraq, Bexdad, 1983, r22

<sup>169</sup> -Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Sêyem, b.n, r215-217

<sup>170</sup> -Mihemmed Nûrî Arif, *Têkstî Edebî Kurdî*, Çapxaney Zankoy Silêmanî, 1981, r97

<sup>171</sup> -Mihemmed Mistefa Hemebor, *Dîwanî Kurdî*, Bergî Yekem, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2010, 15-26

*xwendinê berdide*''.<sup>172</sup> Marif Xeznedar dibêje: '*Helbestvan xwendevanîya xwe di hucreya mizgeftê da wergirtîye , mebesta wî ew nebe ku bibe melle û digel wê da jî gelekî giringî daye xwendinê, daxwazîya wî zanistiyane bû ku pêwendîya wê bi felsefe, sofizm...ve girêdayî bû*''.<sup>173</sup>

### **Bernavên Kurdî:**

Kurdî di dîwana xwe û pirranîya helbestên xwe da bi du bernavên xwe ron û eşkere derdikeve û tê naskirin ew jî:

**1 –Kurdî:** Helbestvan ev bernava ji bo hestên xwe yê nîştîmanperwerî ku weke şanazî û serbilinidîyê hilbijartîye.

**2 –Hîcrî:** Tu (hîç) guman têda nîye ku bi hoya ew awarebûnî yên ku di maweya jîyana wî da bi ser da hatibûn bandoreke bihêz li ser wî kiribû ji ber wê ev bernava li paş çûyîna xwe ya çend bajarên Îran û Kerkûkê di helbestên xwe da bikar anîye.

### **Rûxsara Helbestên Kurdî:**

**1 –**Weke pirranîya helbestvanên kilasîk zimanekî aloz û tevlihev bikaranîye ku peyvên bêgane têda hebû.

**2 –**Ji bilî zimanê kurdî helbest bi zimanê farisî jî nivîsandîye.

**3 –**Kêşa helbestên wî 'erûz in, qafîye yê wan sitûnî ne û yekîtiya hevdengî (qafîye) jî parastîye.

**4 –**'*Xezel, qesîde, çarîne, pênc xiştekî, parçe û tek (tak) malikî (beytî) nivîsandîye, eger hesabê xezela tek û nozde malik bête 115 xezel, yek qesîde û şeş bendîyek bi farisî nivîsandîye ku 145 malike û çarçeweya sofîgerî da ye herwiha rengama (mulema') jî bi kurdî û 'erebî, kurdî û farisî, kurdî û turkî nivîsandîye*''.<sup>174</sup>

<sup>172</sup> -Mihemmed Mistefa Hemebor, *Dîwanî Kurdî*, Bergî Yekem, h.b,r18

<sup>173</sup> - Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Sêyem, b.n,r215

<sup>174</sup> - Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Edebî Konî Kurdî*, b.n,r302

### Evîndarîya Kurdî:

Di derbarê eşq û evîndarîya Mistefa Begê Kurdî da hinek tiştên nihênî û veşartî hene, derketina vê evînê zêdetir ji ber wê ye ku navê "Qadir" gelekî di helbestên xwe da bikaranîye, loma rexnegiran bi pê boçûnên taybetî behsa vê evîna Kurdî kirine. Di vir da em tînan wan boçûnana werdigrin, Marif Xeznedar, Gîwî Mukiryânî û 'Elaeddîn Secadî bi şêweyekî sade behsa vê evînê kirine ku evîna Qadir navek bû her çiqas bi şêweyê neyekser gotinê lê dixin ku helbestvan evîndarê cîhanê bû.

Herweha Dr. Îbrahîm Ahmed Şiwan dibêje: "Evîndarîya Kurdî pak û sofîyane bû, ev jî bi wê hoyê ku anîna çend belgeyên rast û durist ve". Herwiha Osman 'Ebdul Berzincî amajeyê bi evîndarîya Kurdî dike û dibêje: "*Evîndarîya Kurdî weke evîndarîya wan helbestvanan nebû ku divê di berhemên wan da helbestên dildarî û evîndarîyê têda be, weke çawa serdest bû li ba helbestvanên kilasîk belkî soza dildarîya Kurdî sozeke evîndarîya rasteqîne bû û di qaliê evînê da 'helîya ye'*".<sup>175</sup>

Hemeborê ku lêkolîn li ser dîwana Kurdî kirîye dijî hemû ew raman û boçûnanaye, li gor wî Kurdî dildarê "Qadir" bû, Hemebor bi şêweyekî behsa evîna Kurdî dike: "*Kurdî wê dema ku li Kerkûkê bû evîndarê keçeke karker dibe ku navê wê Çinar û bernavê wê jî Çine bû, ji Kerkûkê dihere paşê jî malbata wî vedigerin Silêmanîyê dixwazin jinekê ji bo wî bînin, ew jî doza wê keça din dike lê biryareke hinekî giran bû çimkî binemala Kurdî ji binemala şalyaran (wezîr) wê deme bûn ji ber wê karekî wiha nagunce. Loma ku diçine doza Çinarê tiştêkî xirap rû dide ew jî revandina Çinar e ji aliyê çend kesan ve, ji ber wê bûyera revandinê rewşa derûnîya Çinarê têk diçe. Dema ku Kurdî dixwaze wê bibîne ku hev du didîn ji heşê xwe diçûn, Kurdî wê gavê wiha digot: 'Xwedêyo ku ev kara wa bû her çi jin be li min heram be', loma ji wê deme û heta wêfat kir jin neanî'*".<sup>176</sup> Sebaret bi evîndarîya Kurdî ramana me jî wiha ye ku evîna wî pak û bêgerd (bêguneh) bû, ew evîndarîya xazeyî (mecazî) dibe evîndarîyeke Xwedayî bi wê hoya ku di pirranîya helbestên xwe da navê "Qadir" tîne. Çimkî tu guman têda nîye "Qadir" navekî Xweda ye, lê li gorî hinek kesan evîndarê kurekî balix bû, ev jî bi ronî û eşkere dûr e ji rastîyê.

<sup>175</sup> - 'Usman 'Ebdûl Berzincî, *Rolî Şarî Silêmanî Le Edebîyatî Kurdî da Ta Kotayî Serdemî Babanekan*, Namey Master, Zankoy Selaheddîn, 1995, r105

<sup>176</sup> - Mihemmed Mistefa Hemebor, b.n, r20



## **2. Cureyên Wêneyê Helbestî Di Helbestên Mistefa Begê Kurd da:**

Li ba her helbestvanekî/ê celebên wêneyê helbestî bi şeweyekî cor bi cor e, ev cor bi corîya jî girêdayî bihêzî û şîyana helbestvan e, çimkî dahênanîyê li war û pîşeyê helbestvan dike bi wêneyên cor bi cor. Helbest behreyeke (behremendî) Xwedayî ye loma hemû kes nikare di vî warî da xwe bibine çimkî digel wê da îlhameke Xwedayî ye herwiha pîşeyeke resen û awirte ye ji ber wê yekê westabûn û pisporîya xwe divê ta ku bînaya wêneyê xwe helbestî temam bike. Diyare helbestvan giringîyê dide gelek alî hokarên binyatî yên zanistî ta ku bi şeweyekî serkeftî bigêje armancên xwe, çimkî weke eşkere ye eger helbestvan giringîyê nede ew yasa û binemayên serdest yên helbestê bêguman helbest ji wî qalibî derdikeve ku em jê ra dibêjin helbest . Loma helbestvan digel hemû ev keriste û binemayên serekî dibe helbijêr û bijartina tiştên baş û xirap dike, her di bikaranîna peyvên awirte û bêhêz û pileyên bilinda jî, her loma erka giran ya helbestvan ewe ku peyama dilê xwe û derdora xwe di helbestê da bi wêneyekî ron û eşkere bigîjîne xwendevan û bîserên (guhdar) xwe.

Ev jî tiştêkî giring û gelekî pûtedar e divê helbestvan bi wê zanîne mameleyê bike ta ku binyata wêneyên helbestîyên helbestvan ji şewaz û şeweyên cuda cuda bêpar nebe. Ev jî bi bikaranîna temamê teknîk û planan ve girêdayî ye, bi taybetî di helbestên kevn (kilasîk) da awayekî giringîdan û hişyarî herwiha zanistên din yên di warê wêjeyî da pêwîste. Eger ji serdemekê bo serdemeke din guherîn bi ser wêneyan da tê ew jî bi wê hoyêye ku roj bi roj wêneyên teze û nû di kargeh û xezneya helbestvan da tê holê.

Herwiha helbestên nû jî ji van cor bi corîyên wêneyê helbestî bêpar nebûne û şewazen nû jî xistine dahênanê ku di helbestên kevn da ev wênana nebûn û bikarnehatine. Îjar emê ji vir û wê da destnîşankirina corên wêneyê helbestî yên Mistefa Begê Kurdî bi pê ew pol û binemana, bi şeweyekî rohnî û eşkere li xwarê têxine rû, diyare helbestvan li rûyê cor û celebên wêneyê helbestî ewqas dewlemend û bihêze ku xwe di pirranîya celebên wêneyê helbestî da dibîne. Her ev jî ji ber wê ye ku helbestvanên serdema xwe û paş serdema xwe şanzîyê pê bikin, ku heta îro jî dîwanên wî/wê yên helbestan bi şeweyê jiberkirin yan di hinav û derûnîya wan da be û roj bi roj dewran dike.

Ev jî bi hoya wê hunera bilinde ku helbestvan di celebên wêneyên xwe yên helbestî da bikaranîye, diyare ku helbest çiqas corên wê têda hebe zindîtî û mayîna wê bihêztir dibe di nava komên civakê da ev jî bi eşkere di helbestên Kurdî da berçav dikevin. Ev berçav ketina jî wa nabe ku ewqas asan be, helbestvan bi serzarî û bi şêweyekî asan danî be, na pirrtirîn liq û şaxên coreyên polvekirina (tasnif) wêneyê helbestî pîvaye û bikaranîye. Dibe ku li rûyê deme ve rojek, hefteyek yan ji mehekê zêdetir li ser wê cor bi coreyîyê sekinîye û mijûl (xerîk) bûye heta ku gihîştîye berhema xwe, emê jî bi pê polvekirin û cor bi corîyên wan wêneyê helbestî û helbestên Mistefa Begê Kurdî diyar bikin.

## **2.1.Wêne Li Rûyê Hestî û Jîrî:**

### **2.1.1.Wêneyê Hestî**

Yek ji ew dîyarîyên binirxe ku Xwedayê Mezin bexşandîye ji bo mirovan, ji hestan pêk tê ku bi hoya wê mirov pirranîya karen xwe yên rojane bi rêve dibe, ew hest jî ev in; ‘‘bînîn (dîtin) bihîstin, bêhnkirin, berketin( berkewtin) , çêjtin’’. Îjar li rûyê sûd wergirtinê ev hestana ji kesekî/kesekê bo kesekî/keseka din cuda ne bi taybetî li ba helbestvanan weke hokara serekî tê hesabkirin ji bo çêkirina wêneyê helbestî ku ev hestana dibin alîkarê corên din yên wêneyê helbestî. Ev jî di wê da diyar dibe dema ku ji bilî hestan hemû keriste (materyal) li ber destê helbestvan bin gelo (aya) dikare wêneyekî helbestî dirust bike? Bêguman nikare, çimkî dema ku helbestvan helbestekê dinivîsîne bêguman keristeya serekî ewe ye wergirtina wêneyan ji siruştê bo ser pelên spî ew jî ji hestên helbestvan pêk tê.

Loma em dikarin bibêjin hest sereta (destpêk) dawîya hemû deqên helbestî ne, helbest bê hest dibe nivîseke bêkêr û di dema xwendina wê da tu kes jî bervê naçe ta ku ta'm û çêja helbestî jê werbigre. Di wêneyên hestî da awayekî ciwankirin û veguhestina hestan heye , helbestvan ew ciwanî û xweşî yên di siruştê da heye bi şêweyekî ciwantir û baştir dixe berdestê xwendevanên xwe ev jî bi wî awayî ku dîmenekî siruştî dikeve ber hestên helbestvan. Dema ku em jinekê di siruştê da dibînin û herwiha heman jinê di wêneyekî helbestî da bibînin, diyar dibe dema helbestvan wêneyê siruştî yê jinê vediguhezîne nava wêneyê helbestî em dibinin çî bandorek hey eli rûyê hestan ve. Çimkî helbestvan dema ku di pirranîya deqan da behsa ciwanîya siruştê yan jinê dike, wê deme em bi şêweyekî yekser dikevin nav wê

cihana ku helbestvan bi hoya wêneyê hestî ew wêneya dariştîye. Ev jî ciwanîya wêneyê helbestî yê helbestvan derdixê holê ji nav ew hestên ku me behsa wan kirin, di rastî da rol û pûteyêke taybet ya hemû hestan heye lê ewên zêdetir helbestvan giringîyê didê, sûd jê werdigre yan jî çavkanîya helbestên xwe jê digre hesta “bînîn” û “bihîstin”ê ye.

Herwiha pêwîste em wê jî bibêjin hestên mirovan di rewşeke misoger da diyarkirî nîne, çimkî gelek car helbestvan dema ku hest bi dîtina tiştêkî dike yan ji ‘hedê xwe zêdetir giringîyê dide hesta xwe gava vê hestê dixê ser pelên spî em dibinin guherîn bi ser vê hesta helbestvan da hatîye. Ewqas bi ciwantir hesta xwe veguhezandîye yan hesta xwe bi şêwazeke ku ew hesta pêkirîye vediguhezîne nav deqa helbestê, loma hest di nava deqa helbestî da digêje asta pileya cîgîrbûnê wate dema helbestvan di wêneyekî hestî da wekemînak “hinar” ku helbestvan di deqeke helbestî da gote; “şîrîn” e yan “tirş” e ev hesta di deqê da şêweyekî cîgîrbûn werdigre. Herwiha pîvanên diyarkirî ya şêweyê hestên mirov û helbestvanan heye, wata bi rêjeya xwe ya pirranî yan kêmkî. Em her pênc hestan destnîşan dikin di helbestên Mistefa Begê Kurdî da.

### **2.1.1.1.Hesta Bînînê**

Hestî bînînê li ba helbestvan giringtirîn û baştirîn hokare ji bo çavknîya wêneyê helbestî , çimkî dem û şêweyekî yekser yê wêneyan heye ku bi wê hoyê dikevîne ber hesta bînîn ya helbestvan, bi vê corê jî helbestvan sûdeke yekcar gelekî fire ji vê hesta werdigre û beşeke pirr ya helbestên xwe pê dewlemend dike. Çimkî helbestvan ji bo her mijar û rengêkî biçê bi Rêya hesta bînînê ve rûbirûyê wan dibe binyata helbestên xwe deyne, loma bînîn mezintirîn hesta helbestvan e ku ji wê rûbirûyê hemû bûyer û vetîreyan dibe, bi hoya bînînê ve jî ew wênehelbestana vediguhezîne, divê em wê ya jî bibêjin ku reng jî li ba helbestvan dikevîne ber hesta bînînê. Gerçî ev rengana ji alîyê nabînan (kor, kiwêr) ve nayên dîtîn û hest pê nayên kirin lê tiştê ku dibe hoya wê ew rengana ji alîyê nabînan ve bête cudakirin hesta “bihîstinê” ye. Her ji ber wê hesta Mistefa Begê Kurdî ji vê coreya wêneyê bêpar

nebûye, bi westayî çavê xwe vekirîye û gelekî geş bû li hember ew dîmenên ku bi berçavî vî ketine, wekemînak dema ku dibêje:

*Hat be 'iyarî dilî lêm sand û êsteş pê m dellê*

*min le kiwê tom dîwe hey petiyare laço lêre, sa*

*dêm, biçim bîbînim ew derrwa be yaranî dellê:*

*kes silawî lê neka, dûrbê le cem'î ême ba.*

[D. K, b.yekem,51]

Wek diyare em wêne jî bi ber hesta bîninê dikeve, dema ku helbestvan gilî û gazinan ji bêwefayîya yara xwe dike ku dawîyê hev du dibînin yara wî ret dike ku ewê dîtibe gerçî hev du dibûn bi vê dîtîne yara wî dile wî bervî xwe biriye û evîndar û şeydayê xwe kirîye. Herwiha helbestvan dibêje: “Dema ku dixwazim biçim bibînim, li cihê ku pêşwazîyê lê bike bi berevajî yara xwe bi cî dihêle û ji yar û dostên xwe ra dibêje -silavê lê mekin-”. Herwek eşkereye helbestvan çavkanîya vê wêneyê helbestî ji hesta bîninê wergirtîye, wênehelbesta xwe bi wê hoyê nexşandîye herwiha helbestvan di wêneyekî din yê hesta bîninê da dibêje:

*Pencet le hena megire, surêkî tellix renga*

*xwênî dillî min alle bîke xenebandanî*

[h. b,82]

Herwek eşkere ye reng bûye hoya binyata wênehelbesta wî ku bi hoya hesta bîninê û berketîne ve hatîye nexşandin, dema ku helbestvan divê hesta evîndarîyê eşkere bike ji bo yara xwe loma jê ra dibêje: “Tu (hîç) pêwîst nake tu destê xwe hine bike, çimkî renga hineyê sorekî baş nîye û were xwîna dile min bike hine û li destê xwe ke û bike hinebend ku renga wê sorekî tox û başe”. Diyare hine weke nerîteke (kevneşopî) kurdî ku jinan ji bo ciwanî, çareserî, pîrozî û herwiha ji bo ahenga şêweyê şukirkirinê bikartînin, herwiha peya (zilam) jî bikartînin. Wek nerîtekê ku Pêxemberê axirzeman Mihemed (D.X.L) bikaranîye di simêla xwe daye loma hine

hem ji bo ciwanîyê û hem jî tiştêkî pîroz e li rûyê dînê îslamê da herwiha helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Çawim egerçî menzireh bo kullî te'letê*

*Wellahî manezertû bîqelbî ille sîwak*

[D.K, B. yekem, 264]

Eger em li ser vê wêneyê helbestî hûr bibin wê dibînin ku bi ber hesteke bilind ya hesta bîninê dikeve, ev jî ew huner û bilindîya helbestvan e ku di vî wêneyî da bikaranîye, ew jî bikaranîna her du zimanan e ku nîvdêra yekem kurdî ye û nîvdêra duyem jî ‘erebî ye. Helbestvan dibêje: ‘Eger çavê min bînerê hemû tiştan e û hemû tiştan dibine wek hilhatina heyv û rojê, lê sond bi Xwedê min ji bilî te jidil ve sêyri kesî nekirî ye. Helbestvan di wêneyekî din yê hesta bîninê da dibêje:

*Le cewher ger temaşa ken, dezanin çone ehwallm*

*Le jêr xaşakewe çun gewherêk nuqmî bin awanim*

[h.b, 326]

Em wêneya ku dikeve ber hesta bîninê, ev jî bi piştgirêdan (piştîdan) bi peyva ‘temaşê bikin=binêrin’ helbestvan di vî wêneyî da awayekî şanazîkirina xwe nişan dide ku ‘cewherekî binavbûyî ye û veşartî ye, heta ku lê nenêrin nirx û pûte û giringîya wî nayê zanîn’. Di wêneyekî din yê hesta bîninê da helbestvan dibêje:

*Werin binwarrine çawî pîrr le xwênim*

*Be tefsîlat bibînin maceratan*

[h.b, 360]

Heryek ji peyvên ‘binwarrin=binêrin’ û ‘bibînin’ dikevîne ber hesta bîninê, helbestvan zimar (ağıt) li hemberî ew dûrketina û ser hilgirtina xwe li hemberî Bajarê Silêmanîyê nişan dide, ji wan ra dibêje: ‘Çavê min yê tijî xwîn hokara wê karesatê ye’.

*Şêx û sofî dîn û îmanîyan deken pêşkeş eger*

*Def'eyê wek min temaşay em kewa gullnareken*

[h. b,410]

Di vî wêneyî da peyvên “temaşay” û “gullnar” dikevîne ber hesta bînînê çimkî helbestvan eşkere dike ku şêx û sofî digel ev hemû bihêzîya dîn û îmana xwe carekê li yara xwe binerî (temaşê bikin) ji dîn werdigerî û dîn û îmana wan lawaz dibe û bervî nemandîne diçe, loma evîndarê yara xwe dibin û bi dû ciwanîya yara xwe dikevin. Mebesta wî ji “gullnar” gula henarê ye ku ji bo ciwanîya rengê yara xwe xwestîye, ku rengê gula henarê bi şêweyê sor û narincî (tûrûncû) ye ku diyare ev rengê ciwan jî bi ber hesta bînînê dikeve.

### **2.1.1.2.hesta Bihîstinê**

Hesta bihîstinê hesteke gelekî çalak e, bi şêweyekî fire beşdarîyê li wêneyê helbestî dike, çimkî zêdetir bi ber hest û soza helbestvan dikeve, hesta bihîstinê bi pîvan û rûhevkirinê ve digel hesta bînînê taybetîyeke wê heye ew jî ewe ku mirovên nabîna jî hesta wan ya bihîstinê heye û çalaktir û zêdetir sûdê jê werdigrin. Hesta bihîstinê hemû bangkirineke (gazîkirin) dengî digre û her coreya deng têkeve ber guh û were bihîstin di heman deme da bi ber hesta bihîstinê jî dikeve, wekemînak “dengê firrindeyan, xuşxuşa ava rûbaran, dengê birûskê, dengê girî, nalîn û şadî û pêkenînan û herwiha dengê amûr (alav) ên muzîkê”.

Hesta bihîstin ya helbestvan jî yekcar dewlemend e, her loma wê demê amûrên di awaz û muzîka helbestî da bi hêsanî dikevin ber guhê xwendevanên helbestvan. Hesta bihîstinê hesteke cuda ye ku Xwedayê Mezin bexşandîye ji bo mirovan, çimkî dema ku em deqeke helbestî guhdar dikin ji bilî hesta wêneyê derî ji bo gelek wêne, bîr û xeyalên din jî vedike û ji bilî wêneyê serekî wêneyên din jî jê ji dayik dibin. Ji bo corekê ku wêneyê serekî dikeve ber dîde û derûna me ew bi şêweyekî siruştî û ji xwe ve xeyal difire û ji bo dûrtirîn qeraxa (kenar) bîr û aşopa (endêşe) mirov hildifire û wêneyên din nîşanî me dide, ev jî bi hişyarî û jîrîya helbestvan ve girêdayî ye. Kesên “kerr” û “lal” hest bi hesta bihîstinê nakin çimkî nikarin bibihîzin û nikarin bipeyivin, ev jî rewşeke siruştî ya Xwedayî ye ku mirov têda bêpar dimîne.

Mistefa Beg bi şeweyê cuda cuda wêney hesta bihîstinê di berhemên xwe da bikaranîye, ev hêza jî bi hoya hîcir û awarebûna wê evîndarîya taybetî û mezin ku hebû bûye mayeya hewar û nalenala azara (êşa) wê evîndarîya wî ya ku hebû, her loma helbestvan di wêneyekî hesta bihîstinê da dibêje:

*Le taw êşî ciger hawar dekêşm  
Le ber derdî dillim giriyane karim.*

[D.K, b.yekem,316]

Di vê wênehelbestê da peyvên "hawar" û "giryan" dikevîne ber hesta bihîstinê, herwek helbestvan xwe eşkere dike ku ji ber azar û êşa evîndara xwe kare wî hewar û girî ye. Herwiha di wêneyekî din da dibêje:

*Le ber cewir û cefa û hîcran nîye nalle û fixanî min  
Hîlakî lewm û te'ney nakes û xendey reqîbanim*

[h.b, 316]

Her yek peyvên "nalle, fixan, te'ne, xende" di vê wênehelbestî da dikevîne ber hesta bihîstinê, helbestvan ji dostên xwe ra dibêje: "Hewar û girîyê min ne ji ber dûrketin, nexweşî û azar e, belkî ji ber lome û tiwanca (qest) xelk û pêkenîna nehezên min e ku qest û gotinên nexweş ji min ra dibêjin". Di hemû dem û gavan da kesên dana û zana dikevin ber tîra nahezên xwe, loma Mistefa Begê Kurdî jî ketîye ber vê herikandina qesta xelkê, helbestvan di çarîneyek din da dibêje:

*Tenim yek parçeyî dengîn e bê to  
Ke şeypûr î gerûm, derîne bê to  
Serim semitûre sînem çenge dill defe  
Xefet tar û meqam nalîn e bê to.*

[D. K, b. yekem, 462]

Her yek ji peyvên "dengîn" corek amûra muzîkê ye di demên kevn da bikarhatine, herwiha peyva "şeypûr" ku amûreke cengê ye û denge wê yekcar mezin û bilind e, ku dikevîne ber hesta bihîstinê. Herwiha wêneyekî lihevçiwandin e çimkî helbestvan gewrîya xwe şibandîye wê amûra muzîkê, "semîr" jî amûreke muzîkê

ye awaza wê ya taybet heye loma dikeve ber Hesta bihîstinê. Herwiha dûbare di vî wêneyî da ji bilî hesta bihîstinê wêneyekî lihevçiwandin jî heye, dema ku helbestvan sere xwe şibandîye bi wê amûrê ku "semtur" e, herwiha peyva "def" amûreke muzîkê ye û ji bo gelek coran bikar tê, awazeke wê ya hestbez (hestxurt) heye û dikeve ber hesta bihîstina mirov. Dîsa wêneyekî din yê lihevçiwandin dûbare dibe, dema ku helbestvan dilê xwe dişibîne wê amûrê ev hesta bihîstinê bi şeweyekî hunera ciwan û wêneyê helbestî ve nexşandîye, çimkî seda û dengê "def" ê ewqas hestan dilivîne ji dûr û nîzik da tê guhê mirovan, helbestvan jî rewşa dilê xwe kirîye "def" ku dilê wî weke "def" ê ye ketiye dilkutê ji ber azar û êşa yara xwe. "Tar" bi wateya kezî (zulf) ên dirêj tê herwiha bi wateya corek amûra muzîkê jî tê, helbestvan di vir da du cor wêneyên gelekî ciwan tevlîhev kirîye û bikaranîye ew jî wêneyê hesta bihîstinê ye ku amûreke ku deng jê derdikeve û xefeta xwe şibandîye vê amûra ku "tar" e. Herwiha peyva "nalîn" bi wateya hewarê tê û dikeve ber hesta bihîstinê, herwiha helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Seday karwanî firqet dê, dellên ser qafleçî yâre*

*Zirrey pêşengî hîcret dê, meger kalay xem bare*

*Tiringey teplî baz atlanî çaweş, dengî carçî, dê*

*Be tîpî xem dellên: Namerd, eser dill emrro êlxare*

*dellêy espî fîraq simkoll deka, wa lêlle bînayim*

*dellî (teplî tîfaq) yan jend, kewa, giwê mîrîr le haware.*

[D. K, b. yekem, 550]

Her yek peyvên di nav vî wêneyê helbestî da bi ber hesta bihîstinê dikevin bûne hoya nexşandina wêneyê ku ji "seda, zirre, tiringe, teplî tîfaq" pêk tên, ev hemû bi ber hesta bihîstinê dikevin. Qaşo (guya, giwaye) Mistefa Begê Kurdî ev helbesta xwe ji bo "Qadir" nivîsandîye lê bi tu (hîç) şeweyekî ev nerast e, çimkî navê wê neanîye û amaje pê nekirîye.



### 2.1.1.3.HestaBêhnkirinê

Hesta bêhnkirinê coreke din e ku binyata wêneyê helbestî li ser tê nexşandin, diyare taybetmendî û sîfetek ya awirteya vê hesta mirov heye ku tenê bi hoya bêhnkirinê ve wêneyê helbestê tê nexşandin. Wata yek ji ew hestanane ku helbestvan wêneyên xwe jê werdigre, ev jî bi hoya endama ‘‘poz’’ (bêvil, kepû, lût) ve tê kirin. Mistefa Begê Kurdî jî ji vê coreya hestê bêpar nemaye, bi şeweyekî ciwan wêneyê hesta bêhnkirinê wergirtîye weke di vî wêneyî da dibêje:

*Kiwêr bûm dîdem weku Ye'qûb be Xuday (dîdeke) bot*

*Sabinêre weku Yusif be şîfay dîdeke (bo) t*

[D. K, b.yekem,108]

Eger em li ser vî wêneyê helbestî hûr bibin peyva ‘‘dîde’’ bi ber hesta bînînê dikeve, herwiha peyva ‘‘bo’’ ya duyem bi wateya ‘‘bêhn’’ ê tê loma bi ber hesta bêhnkirinê dikeve. Helbestvan sûtê ji çîrok û serpêhatîya ‘Hezretî Ye'qûb û Yusifê kurê wî wergirtîye, bi Hebûna sîfeta lihevçiwandin ya di navbera wan da wêneyekî lihevçiwandin nexşandîye ew jî ‘‘bêhna kirasê’’ wî kesî ye ku helbestvan doza wî kirasî dike ku belkî ji bo çavên wî bibe şifa ji ber ku li dûrî wê kesê çavên wî nabînin, di wêneyekî din da dibêje:

*Meger sirwey nesîmî wesillî to bê*

*Mu'etter ka dilley pîrr derdim emrro*

[h.b,472]

Di vî wêneyê helbestî da peyva ‘‘mu'etter’’ bi ber hesta bêhnkirinê dikeve, helbestvan dibêje: ‘‘Ew bayê ku beyanîyan tê şineba û bayê nesîm e xwezî bayek biba ji bêhna te be’’, mebesta wî ewe ku kesên evîndar bi vê bêhnê dilê xwe tijî bike û şad bike’’ ji ber ku dilê helbestvan ji êş û nexweşîyan tijî xem û derd e, di wêneyekî din da dibêje:

*Eceb mawim, be (gull), bo baxî lîmokat derrazênê?*

*Be (mêxek bend) û (go) û (simll) û (xewnake) î bo denexşênî?*

[D.K, b.duwem, 243]

Di vî wêneyî da peyva “mêxek bend” bi ber hesta bêhnkirinê dikeve ku "mêxek bend " corek gerdana folklorî ya kurdî ye ku jinan di demên kevn da ji bo ciwanîyê li xwe dikirin, herwiha bêhneke wê ya xweş heye ku bala dile xortan dikşîne.

#### 2.1.1.4.Hesta Çejtine

Hesta çejtinê coreke din ya hestên mirov e ku helbestvan bi hoya vê hestê ve binyata wêneyên xwe yên helbestî datîne, ev hesta jî xwe zêdetir li rûyê “şîrînî”, “talî” û “tirşî” da dibîne. Herwiha helbestvan di cîhana helbestê da zêdetir hestê bi çejtinê dike, ev bi hoya xwarin û çejtina azar û êşa dûrîya yar û dostên xwe ve wêneyên xwe yên helbestî pê dinexşîne. Loma Mistefa Begê Kurdî û helbestên wî ji vê hesta bihêz bêpar nemane, herwiha helbestvan di vî wêneyî da dibêje:

*Ew memike çi şîrîn e, gîflî dillî bo egirî  
Dawî dille, daney daw, egirîcew (xirr) xallit.*

[D.K, b. yekem, 71]

Ev wêneya bi ber hesta çejtinê dikeve çimkî peyva “şîrîn” bi wateya ta’ma şîrîn tê, diyare ev jî coreke ji wêneyê hesta çejtinê ye, dema ku helbestvan dilê xwe wek zarokan ji bo memikê yara xwe digirî (girî) ku li ba helbestvan şîrîn e, ev wêneya bi ber hesta bihîstinê jî dikeve çimkî peyva “egirî=digrî” bi ber hesta bihîstinê dikeve, helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Reqîb rûtirş û eşkî dîde siwêre  
Heyat tellix û ecel şîrîne bê to*

[h.b, 456]

Her yek peyvên “tirş”, “siwêr=şor (bi xwê)” û “şîrîn” di vî wêneyî da bi ber hesta çejtinê dikevin , mebesta helbestvan di vî wêneyî da ewe ku “rûyê nehezên wî tirş e”bi wateya naşîrînî û heznekirina dîtina wan tê, herwiha “hêsirê çavê şor” bi hoya girîyê pîrr e, loma ecel wata mirin ger were, ew li ba şîrîn e ku bê yara xwe be, di wêneyekî din da dibêje:

*Herkesê şehdî wîsal û, zehirî dûrîy çêşti bê  
Ewa dezanê derdî dûrî çend giran û zehmete*

[D. K, b.yekem,544]

Di vî wêneyî da her yek peyvên ‘‘şehd’’û ‘‘zehr’’ bi ber hesta çêjtinê dikevin çimkî diyare ku ‘‘şehd’’ wata hingiv ku pêş wê di şane da destkarî lê were kirin wate hingivekî şîrîn, pak û bêfêl e, diyare ev jî bi ber hesta çêjtinê dikeve. Herwiha peyva ‘‘zehr’’ ku çêjteke gelek car nexweş û tal e loma bi ber hesta çêjtinê dikeve, helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Ewende şîrînziman û xoşkelam î*

*Be îni her wekû qend û nebat î*

[D.K,b.duyem,134]

Di vî wêneyî da her yek peyvên ‘‘şîrîn’’, ‘‘qend’’û ‘‘nebat’’ bi ber hesta çêjtinê dikevin ku tam û çêja wan şîrînin, mebesta helbestvan evîndara wî ye ku axaftina wê şîrîn e û şibandîye qend û riwekan.

#### **2.1.1.5. Hesta Berketinê (berkewtin)**

Hesta berketinê jî yeke di wan wêneyê helbestî da bi ber hestên mirov dikevin, wata ‘‘destlêdan’’. Ev hesta jî zêdetir bi hoya peyvên ‘‘nermî’’, ‘‘reqî=dijwarî, tûndî’’, ‘‘lusî=dûzî’’, ‘‘dirrî=girûz (pürüzlü)’’, ‘‘germî’’ û ‘‘sar’’,fîrehî’’ û ‘‘tengî’’ derdikeve. Helbestvan dema ku li ciwanîya gulekê yan jinekê dinêre û îlhamê jê digire hesta wî/wê ya berketinê bihêztirîn hokara nexşandina wêneyê helbestî yê helbestvan e. Çimkî dema ku helbestvan ji ciwanîya jinekê ji ‘‘bînîn’’, ‘‘bihîstin’’, ‘‘çêjtin’’ û ‘‘bêhnikirinê’’ wêneyekî werdigre gelek car bi hoya hesta berketinê ve wêneyê xwe tamam dike. Bi corekê ku dema helbestvan destê xwe di porê yara/yarê xwe dide ew hestê bi nermîya porê yar dike, bi vê şewaza hestî ve helbestvan wêneyê helbestî yê ciwanîyê nexşandîye, herwek di vî wêneyî da helbestvan dibêje:

*Ey tebîb er to temate zamî derdim çarekey?*

*Take germawgerm e boy peyda bike, şehdî wîsal*

[D. K, b. yekem,271]

Di vî wêneyî da peyva ‘‘germ’’ bi ber hesta berketinê dikeve çimkî mebesta helbestvan eşkere ye ku bi hoya dûrîya yara xwe rastî nexweşîya ‘‘ta’’ yê tê, bi hoya destlêdanê ve hest bi germîya "ta " ya wê dike û loma dixwaze çareserîya vê

nexweşîya ku pê ketîye bi şêweyekî xêr çareser bikin, ew jî gihîştina bi yara xwe ye, di wêneyekî dn da helbestvan dibêje:

*Seday semitûrî kellem germe em şew  
Çirîke wû bangî dill bê şerme emşew  
Benaxûn, (karî Ferhad) dê le destim  
Weha şahûle sînem nerime emşew*

[D. K, b. Yekem,511]

Ev wêneya bi şêweyekî hunerî gelekî ciwan hatîye nexşandin, çimkî bi hoya peyvên ‘seda’, ‘semîtur’ û ‘çirîke’ yê ve bi ber hesta bihîstîne dikeve ku awayekî wan yê awaz û dengî heye. Herwiha bi hoya peyvên ‘germe’ û ‘nerme’ bi ber hesta berketîne jî dikeve ku mebesta helbestvan di vî wêneyî da ewe: ‘Serê wî ewqas germ’ e şibandîye amûra semîtûrê ji ber yara xwe. Herwiha peyva ‘nerme’ jî bi ber hesta berketîne dikeve, helbestvan dixwaze wek ew karê ku Ferhad kirîye; Li oxira evîndara xwe Şîrîn Çiyayê Bêstûn qul (kun) kirîye ew jî dixwaze ev karê ku ji deste wî tê di sînga xwe da bi nenûkên xwe kun bike, di wêneyekî din da dibêje:

*Perçemî çeşnî perî Tawis ke dedirewşêtewe  
Hênde nerm û xawe wek awrîşme ya (tûkî tû) we*

[D. K, b. duyem, 173]

Di vî wêneyî da peyva ‘nerm’ bi ber hesta berketîne dikeve, helbestvan biska yara xwe şibandîye pûrta Tawisê ku ji ber ciwanîyê dibiriqe, diyar e ev jî bi ber hesta berketîne ketiye, herwiha rûyê lihevçiwandina wan jî ‘nermî’ û ‘xavî’ ye ku şibandîye ‘hevrişim’ yan ‘tûkî tû’ herwiha helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Gilem kird min le xem, boçî becêm dëllê ciger sozim*

*Witî, axir le dilt e cêge hênde tenge guzer nabê (nayê gerîn).*

[h.b, 1103]

Di vî wêneyî da peyva ‘teng’ bi ber hesta berketîne dikeve, mebesta helbestvan di vî wêneyî da ewe ku; ‘gilîyê xwe li xemê dike ku ji bo çî terka wî

dike ( bi cî dihêle , bi tenê dihêle), xem jî bersiva wî dide û dibêje “di dilê te da hewqas nexweşî, azar û êş heye ku mayîn û ger têda gelek zehmet e herwiha gelekî teng bûye loma naçare bi cî dihêle”.

### 2.1.2.Wêneyê Watayî (El sure al ma’newîye)

Wêneyê watayî ew wênênin ku tu (hîç, qet) bi ber pênc hestên mirovan nakevin, wata ew wênênin ku nahestî ne. Ji wêneyên nahestî corek (celebek) wêneyên helbestî jidayik dibin ku cudane ji wêneyên hestî, çimkî di van wêneyan da mamele û nivîsandina helbestên helbestvan digel hundurê cesteyê ademîzad e, wata bi berevajîya wêneyên hestî ne ku ew wêne bi ber tiştên maddî dikevin û mameleya wan digel hestên derveyî yê mirovan da ye. Wata wêneyê watayî zêdetir di zîhn û bîra helbestvan da xwe dinexşîne ku ‘*şîyana bîrkirina helbestvan çiqasî bihêz û çalaktir be rêjeya wêneyê watayî li ba helbestvan bilind û xurt dibe, her şîyana bîrkirina helbestvan çiqasî nizm be wê gavê jî rêjeya wêneyên hestî li ba helbestvan bilind dibe*’.<sup>177</sup> li vî rûyî ve helbestvan wêneyên ciwan dinexşîne û herwek dibêje:

*Kurdî mestî durdî badey eşqe wîrdî nezmî wird  
Derdî hîcre ger be herfî kurdî her yarî deka*

[D.K, b.yekem,61]

Di vî wêneyî da her yek ji peyvên “badey eşq” û “derdî hîcre” dikevîne ber wêneyekî watayî çimkî eşkere ye ku ev wêneya bi ber pênc hestên mirov nakeve, belkî wêneyekî watayî ye, mebesta helbestvan ewe ku bi hoya mestî (mestbûn) û badeya evînê wiha li Kurdî kirîye ku du’ a û bergera (parranewe) xwe zêde bike. Di dêra duyem da jî mebesta wî ewe ku ji ber derde dûrîyê bûye hoya ku bi tîp û peyvên “kurdî” mebest zimanê kurdî ye û qerfan bi helbestê bike, helbestan binivîsîne û bihûne. Awarebûn û derde dûrîyê wa li helbestvan kirîye ku xezneya wî ya peyv û zimanî herdem di darijtina helbestê da be, herwiha helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

Supay mujgan be tîxî ebirwanit  
Şikistey firqe û tabur e em şew

<sup>177</sup> -Serdar Ehmed Hesên Gerdî, Binyatî Wêney Hunerî Le Şî’rî Kurdî da (1970-1991),b.n,r211

[D. K, b.yekem 483]

Eger em bala xwe bidin vê dêra helbestê wê dibinin ku tu (hîç) amajeyek ji bo pênc hestên mirov têda nîye, her ew jî derdikeve ku ev wêneya diçe xaneya wêneyê nahestî û watayî. Helbestvan wêneyekî gelek ciwan nexşandîye; “bijang” ê yara xwe çiwandîye (şibandîye) “artêş” ê û “burî” yê wê jî çiwandîye “tix” ên di destê şervanên artêşê, ji alîyekî din ve ev wêne amajeye ji bo rêkî û ciwanîya bijangê yara wî weke artêşeke rêkûpêk û rast e, herweha helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*To ke xizmanit birrencênî û sera jêriyan bikey*

*Qet berîkarîy bêgane hîwa barî meke*

*Hakimî ça be, terîqî ‘edildarî pêş gire*

*Çunke hukmet radebûrê heyfe zordarî meke*

[D. K, b. duyem,33]

Di vî wêneyê helbestî derdikeve ku helbestvan bi rêya peyvên le “rencandin”, “hîwa”, “edildarî (yeksanî)” û “zordarî” ku yek jî nakevine ber hestên mirov, vê jî wa kirîye helbestvan wêneyekî nahestî (watayî) binexşîne, herwiha helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Ewa ferşî muhîbet radexem yaran (qeza) ba bê*

*Serînî mîhnetim danawe boxom, kiwa (bela) ba bê*

[h.b ,103]

Eger em li ser vî wêneyî hûr bibin ji bo me derdikeve ku her yek ji peyvên “ferş” û “serîn” her çiqas bi ber hestên mirovan dikevin jî, di vir da helbestvan bi rêya ladanê (terkkirin) ve watayeke din daye van peyva ku dibêje: “ferşî muhîbet”, serînî mîhnet” bi vê jî helbestvan wêneyekî zîhnî bi hunera ciwanîyê nexşandîye. Çimkî hebûna “ferşî muhîbet” û “serînî mîhnet” tune, herwiha peyvên “qeza” û “bela” jî dikevine ber wêneyê nahestî.

## 2.2. Wêne Li Rûyê Rawestan û Livê (Lebatê)

Di vî rûyî da helbestvan bi şeweyekî hunerî wênêhelbestên xwe dinexşîne, îjar ev wêne di warê rawestanê yan di warê livê yaxud di her du waran da di wêne û tabloyekê da derdikevin. Loma eger wêne di rewşeke rawestyayî da be mesafê û sînôrê wî wêneyî tête diyar kirin, eger bi şeweyê livê be ew ji bo wêneyê xwe yê siruştî fireh dibe û wêneyên din jê çê dibin. Wata ‘*eger vetîreya wê di demeke rawestyayî (westaw) da be helbestvan weke -fotografereki/ê- (wênegir) derdikeve, ku di çirke gavekê da hest bi liv, pêkhate û kirdarên wî wêneyî nayê kirin. Lê (belam) eger vetîreya (diyarde) wê di demeke lebatê da be helbestvan weke -kameravanekî/ê- derdikeve û gelek dîmen di gelek cîh û demên ciyawaz da wêna dike (dinuwendîne, film dike). Ev jî ji ber wê yeke ye ku hest bi liv, pêkhate û kirdarên wî wêneyî tête kirin û di heman deme da jî bizwêner in (tevgerî ne, bi hereket in)*’<sup>178</sup> her ji ber wê em ev her du coreyê wêneyê helbestî li jêrê ronî û eşkere dikin:

### 2.2.1. Wêneyê Rawestyayî (westaw)

Wêneyê rawestyayî her ji navê xwe diyar e ku wesfê wêneyekî dike ku di rewş û cihêkî rawestyayî da be, wata mewdayeke (mesafeyek) wî yê diyarkirî heye ku tew (hîç) olandan, geşekirin (pêşketin), tevger û livek têda nayê dîtin. Herwiha ‘*wêneyê helbestî jî eger rawestayayî jî be tenê di astekê da rawestya ye, li ser asta helbesta xwe da ranewestya ye çimkî di binyata helbestê da hevbeş in*’<sup>179</sup> Lê pêwîste em amaje bi wê jî bikin ku li rûyê çendîtiyê ve ‘*kirde*’ û ‘*rêje*’ ya kêr û pirr ya wêneyê heye, ev jî tu guherînekê li asta rawestayayî ya wêneyê nake. Herwiha di pirranîya wêneyên rawestyayî da haweyekî (cor, cure) bergerîn (du’a), nefî, negihîştin û bêhêvîti heye, bi şeweyekê ev wêneyên rawestyayî bi hoya wesfê ve derdikevin. Mistefa Begê Kurdî di van corên wêneyê da gelekî jîr bû û deste wî div î warî da bilind û rêngîn bû, herwek div î wêneyî da dibêje:

*Le naw fikir û xemanî kakollit qurban weha matim*

*Şew roj nabizûm esla, ne bem la da û ne bew lada*

[D. K, b.yekem, 47]

<sup>178</sup> -Yûsif Elî Mihemmed, *Binyatî Wêne Le Şî’rekani Mihri da*, Namey Master, Kollêjî Perwerde, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 2014, 90

<sup>179</sup> - Serdar Ehmed Hesên Gerdî, *Binyatî Wêney Hunerî Le Şî’rî Kurdî da (1970-1991)*, b.n, r215-216

Eger em li ser vî wêneyî hûr bibin ji bilî wê şêwazêke rawestyayî ya wêneyê heye ku tu haweyê olandan, geşe û livê têda nîye, helbestvan bi xweşî wê rewşê destnîşan dike ku di gav û demek rawestyayî da ye ku bêdeng û bêlebat e. Loma bi şew û roj nikare bi tu alîyê xwe da bilive, herwiha helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Ta key bikêşim ey senema, ahî derdnak  
Wexte tenim le hîcr û fîraqit bibê be xak*

[D. K, b.yekem ,264]

Di vî wêneyî da tu guman têda nîye ku peyvên “senem” û “xak” bûne hoya wêneyekî rawestyayî, diyare ku tu liv têda nîye. Helbestvan ev wêne bi rêya wesfekê ku daye yara xwe û sîfeta bêdeng û bêliv ya “senem” ê şibandîye yara xwe bi bêdengî û bêlivê ve, herwiha helbestvan wêneyekî yekcar berz û bilind nexşandîye. Dema ku bi hoya dûrî û awareyîyê xwe dike xakeke bêliv û bêberhem ku şîyana wî ya geşe û lebatê tuneye, loma wêneyê xwe yê helbestî di tabloyeke rawestyayî da nexşandîye. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Eger kirdûme teqsîr û gunahê?  
Hezaran tobe bê ta roy mematim*

[h.b,313]

Di vî wêneyî da helbestvan rewşa wêneyê xw bi şêweyekî ciwan diyarkirîye, wata eger em li ser dêra yekem hûrbibin wê dibinin; di rewşa wê da haweyekî liv û tevgerêke bêgahî heye ku helbestvan bi hoya bergerîn (parranewe) û du'ayê ve dixwaze xwe derbas bike çimkî peyva “eger” xistîye nav wêneyê xwe. Peyvên “teqsîr” û “guneh” jî gumana liva bêgahî têda heye, diyare ev her du peyv gelek car dikevîne ber rewşeke bêgahîya livê (lebatê). Lê helbestvan di dêra duyem da rewşa temam ya wêneyê xwe diçespîne (misoger dike) û dike wêneyekî rawestyayî, ew jî bi hoya her du peyvên “tobe bê” û “mematim”. Diyare sîma û şêwazeke rawestyayî ya van her du peyvên heye, çimkî peyva “tobe” bi wateya “dev jê berdan=wazhênan” tê bikaranîn, wate nehiştina lebat û bi wateya rawestanê di rewşeke diyarkirî da. Herwiha peyva “mematim” ku bi wateya “mirin” tê, diyare



ev jî bi ber wêneyekî rawestyayî dikeve çimkî eşkere ye tu lebat û tevgerek di ‘‘mirin’’ ê da tune. Herwiha helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Hemû ‘umrim be zaye’ çû le rêgey eşq da aman*

*Ke dû çarî sîham û damî eşqî tîfl û xamêkim*

[D. K, b.yekem,353]

Di vî wêneyî da eger em li ser dêra yekem hûrbibin ku sînor û mewdaya wêneyê diyar dike, dema ku helbestvan dibêje; ‘‘hemû ‘umrim be zaye’ çû’’ em dibinin wêne coreke rabirdû nîşan dide, wata rawestana wêneyê dikeve çarçeweya hemû temenê wî ku baqî û tiştêk nemaye heta haweyekî ji zindîbûna lebata evîne bidestxîne. Herwiha karê ‘‘çû’’ ku dikeve dema rabirdû sînore wêneyê zêdetir bihêztir kirîye li rûyê rawestanê ve, çimkî eşkere ye dema hemû tiştî bi ser da çû yan here tu liv û tevgerek têda namîne û ji dayik nabe. Loma tene wêneyekî rawestî dide dest bi taybetî dem û temenê pîrî ku hîç liv û lebatek nikare bikeve kar heta temen vegere dema xortanîyê.

### **2.2.2.Wêneyê Lebatî (livî,culaw)**

Wêneyê lebatî ew wêne ye ku geşe, tevger û berdewamîyê dide wêneyê, wata wêneyê lebatî di rewşeke cîgir da namîne û sînor û mewdaya (mesafe) cografi ya van wênana ji yê wêneyên rawestyayî firehtir e. Ev jî bi hoya wê ye ku ta wêne di lebatê da be wêneyên nû ji dayik dibin, wata sînore wêneyê jî fireh dibe herwiha pirranîya wêneyan di dema raneborî (ranebirdû) da ne. Ev jî sîmayeke taybetî dide wêneyên bi vî corî, siruştê wêneyên lebatî wiha ye ku di yek qonaxê da namînin û berdewam dibe û guherîn di şeweyê wêneyê tê kirin Herwiha hest soza helbestvan jî hokareke bingehîne ku can û ruhekî livîn (tevgerî) dide wêneyan. Livîna van wêneyan jî bi pê coreya gavê, cihê wan û ast û şeweyên wan tête guherîn, ku helbestvan bi hoya bîrmendî û jîrîya binyata wêneyên xwe dinexşîne. Mistefa Begê Kurdî bi jîrî hespê xwe di vê coreya helbestê da bezandîye, dema ku di vê helbestê da dibêje:

*Seba ger la bida zulfî le kullmî*

*Dellêm: Ya mehe ya xurşîde engut*

[D. K, b.yekem,111]

Dema ku em bala didin vî wêneyî ji bo eşkere dibe ku wêneyekî lebatî ye, ev jî ji ber wê ye ku dikeve ber hesta bînînê çimkî wêne ji rewşekê bo rewşeke din diguhere (guherîn têda çê dibe) herwiha peyvên ‘seba’ ku bi wateya ‘ba’ tê, herwiha ‘la bida’ em dibinin ku karekî raneborî ye loma liv û geşeyeke berdewamî daye wêneyê, herwiha helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Wa, le kanî sawe, wek gull toqenê kîj dêne xwar*

*Taq û waz, polî qoling û qaz, be rêz bestiyân qetar*

*Cûte biskaniyan le cewilanda be ser memkollewe*

*Her dellêy gencî telawisîm pas eken dû tûleamar.*

[h,b,131]

Ev wêneya bi şêweyekî giştî yê wêneyê dikeve xaneya wêneyekî lebatî, çimkî çend dîmenên lebatî di wêneyê da heye yek ji wan ‘kanî sawe’ ev jî diyare wêneyekî lebatî ye ; çimkî ‘ av ji vê kanîyê dize û bi haweyekî lê belav dibe’. Ev jî li rûyê lebatê ve berdewamîyê dide wêneyê, herwiha ‘kîj dêne xwar’ di vir da derdikeve ku wêne di asteke bilind ya lebatê da ye bervî nizmîyê dihere ev jî berdewamîya wêneyê derdixe, herwiha hatina navê her du firrînde ‘quling û qaz’ bi ezmanan ve wêneyê dixê rewşeke lebatîya berdewam, ev jî li dû wê ku li ezmanan diffîrin û bi evînê baskan davêjin. Helbestvan di dêra duyem wata di wêneyê duyem da asteke hunerî ya bilind û ciwan bikartîne, ev jî li dû wê ‘cûte biskî’ dike ‘colane’ ku sîfeta wê ya lebatî heye ku lîstikeke ya zarokan e hinek caran mirovên mezin jî dilîzin. Herwiha ciwanîyê dide ‘biskê’ ku bi ser memikê keçan da hatine xwar û dilerzin bi şêweyê mar jî dilivin, diyare ev wêneya jî wêneyekî lebatî ye û dikeve ber hesta bînînê jî. Herwiha helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Kê dellê dulber bexîle emrro wella dulberim,*

*Berdî jêr pêy xoşî hetta her dehawê bo serim*

[h,b,323]

Dema ku helbestvan tê bi şêweyekî hunerî wesfa dildara xwe dike, qaşo (goya, giwaye) xelk jê re dibêjin; ‘yara wî çikûs (rezil) e’ di dayina her tiştêkî da ku pêwendîya wê bi evîndarîyê hebe. Helbestvan di wêneyekî lebatî da dibêje: ‘yarekem berdî jêr pêşî bom dehawê=yara min kevirê jêr ...’ diyare peyva ‘dehawê=davêje’ dikeve ber wêneyekî lebatî û berdewam. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Çaw eger yaray riwanîni nebê, emrro belan  
Çarî naçarî, debê nûkî qellem bête fixan*

[D. K, b.yekem, 396]

Ev wêneya dikeve ber hesta bînîn û bihîstinê ji bilî wan jî dikeve ber wêneyê livî (lebatî), çimkî helbestvan dibêje; ‘ger çaw hêzî seyrkirdinî nebê bê sûde=ger hêza sêrkirina çav nebe bêkêr e’. Loma di nivdêra duyem da helbestvan dibêje; ‘qellim bête fixan= ...’ diyare ev wêneya du wesif li xwe digre hem hawarkirina wê bi ber hesta bihîstinê dikeve û hem jî sîfeta pênuşê bi rêya lebatê ve wata nivîsandinê ve dikeve livê, diyare ku pênuş nikare hewar bike lê bi hoya nivîsandinê ve liv û geşeyê dide wêneyê loma wêne dikeve xaneyaya wêneyê livî. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Dest ewa dênim û debem yarim ke nîzm lê bida  
Morr debêt û pê m dellê: Lêm lade, rolle ême nîn.*

[h.b,423]

Ev wêneya jî di serî da bi ber hestên ‘berketin, bînîn, bihîstinê’ dikeve û herwiha dikeve xaneyaya wêneyê livî çimkî dema ku helbestvan dibêje: ‘dest dênim û debem= dest tînim û dibim’ di vî wêneyî da yekser û berdewamî liv heye, herwiha ‘ladan=serdaçûn, wêda çûn’ haweyekî (cor) lebatê ye ku wêne dixê xaneyaya wêneyê lebatî.

*Dayim le dewrî xallî ruxt bêqerare dil  
Her wek ledewrî qitubî felek diîrey cudey*

[D.K, b.duyem,256]

Dema ku em li ser vî wêneyî hûr dibin, em dibinin wêne dikeve xaneyê wêneyekî lebatî ew jî bi wê hoya ku helbestvan sûd ji wêneyekî lihevçiwandin wergirtîye, dema dile xwe bi livê dişibîne ‘stêrka qitub’ bi zîvirandine xwe ya li dor zevî (cîhan) da, diyare di vê zîvirandinê da haweyekî lebatê heye ku bi wê hoyê ve wêne geşe û liv li xwe girtîye û bi şeweyekî berdewam dilive (tevdigere).

### **2.3. Cureyên Wêneyê Helbestî Li Rûyê Pêkhateya Şewazê ve**

Her corê wêjeyî sîma û şewazê wan ye taybetî heye, loma di nava coreyên helbestê da şewaz hokarekî giring û gelekî pûtedar e ji bo binyatdanîna wêneyên helbestî. Di coreyên helbestê da corên şewazan diyarkirî û taybetin li ba helbestvanan, ev jî xaleke siruştî ye û hinek caran jî destkirî ye û di nav dîwanên helbestvanan da olanê dide. Ev jî ji bo digel hev cudakirina bîr û aşopa helbestvanan e loma wêne li rûyê şewazê ve ragihandina peyama helbestvan e. Di vê tewerê da em hewlê didin ku şewazên wêneyê helbestî yên Mistefa Begê Kurdî destnîşan bikin û rohnîtir derxin holê ku pirranîya helbestên wî heyvanê (hevîrtirş, maya, hewên) van şewazan e ku em wan li jêrê dixine rû:

#### **2.3.1. Wêneyê Tinazî (Daşorîn, hîcîw, hîciw)**

Wêneyê tinazî (teniz) di helbestên wêjeya kurdî da bikaranîna wê gelekî kevn e, di wêjeya ‘erebî da jê re ‘el şî’r el hica’ tete gotin. Her di wêjeya sereta heta îroj bi şeweyekî çalak xwe xistiye nav şewazên wêneyên helbestî hokara vê jî girêdayî rewş û serdema helbestvane ku bi hoya her hokarekê ev coreya helbestê bikar anîye. Loma bi şeweyekî serekî li ba pirranîya helbestvanan giringîya wê tune bû, wê li her derê helbesta helbestvanan da cihê xwe vekirîye. Eger em li ser vê şewaza wêneyê helbestî hûr bibin; bêguman helbestên Şêx Rezayê Tallebanî pêşengê vê coreya helbestê ye li rûyê pirranîya şewazên bi vî coreyê, her çiqas pêş wî ev coreya helbestê di helbestên Nalî û Salim da jî hebû, em dikarin wiha pênaseya wêneyê helbestî ye tinazî bikin: ‘Ji corek wêneyên helbestî pêk tê wêneyekî wê ye taybetî heye ew jî ji dijûn (çêr, xeber, ciwên) û peyvên neşêrîn û bêşerm ku hem rapêşî takekes û hem jî rapêşî civakê tete kirin, bi haweyekî ku tu (hîç) perdeyek tune ye di derbirînê da wata di bikaranaînê da şerm tune ye’.

Herwek me destnîşan kir ku ev coreya helbestê di encama çend hokaran da tete holê (dête kayewe) ku bandora wê li ser helbestvanan heye û bi vî coreyê helbestvan

rû li vê şewazê dike. Mistefa Begê Kurdî digel hemû xezelên xwe yê ciwan ji vê coreya helbestê jî bêpar nemaye, loma bi bernavê ‘‘Kurdî’’ tê naskirin ku zimanê wî yê helbestan gelekî ronî û eşkere ye wata kî bixwîne mebestên wî têdigên (fam dikin). Bi heman şêwe zimanê helbestên wî yê tinazî jî ronî û eşkere ne, bêguman ev coreya helbestê di encama riq û sitemek pir da ji dayik bûye ku her deq (metn, tekst) bi helbestvan encamê dide. Tinazî herwek ji navê xwe diyare bi wateya ‘‘dijûn, nav derketin ‘’ û naşîrînkirina kesên hember’’ e, ev jî weke tolhildana wî karê xerap e ku kesê hember lê kiriye . Kurdî di vê mînakê da bi helbestê amajeya êrîşkirina ser kesên hember dike ku bi peyvên dijûn destpê dike, paşê jî tu perdeyê nahêle ji bo neşîrînkirina kesê hember, herwek di vê mînaka yekem ku bi navnîşana ‘‘**Min ewa bo hecûy pîrêjin**’’ da dibêje:

*1 -Min ewa bo hecûy pîrêjin dillim kewte firîn*

*Ba bikem hecûy, kewate qeg nekem teqsîr le qîn*

*2 -Zahîra pîrêjinêke qirubî xaney ême ye*

*fitne coye, bê heya, hergîz nîye mîslî çunîn*

[D. K, b.yekem,418]

Dema ku em li ser dêra yekem hûr dibin; helbestvan bi xeydeke pîr xwe amade kirîye ji bo tinaza pîrê ku ‘‘dillî firîwe le xêrayan’’, loma ewqas jê xeyîdî ye rihmê lê nake, di nîvdêra duyem da helbestvan xeyidandina xwe li hemberê pîrê beyan dike loma jê ra dibêje: ‘‘fitne çî ye û bêheya ye, kes wek wê nîye’’, di dêra din da dibêje:

*3 -Dem demî gurg û yekane, dan û dill wek zaxî reş*

*sahêbî buxtan û dû nan wek ezazîlî le’în*

*4 – ‘Efefey dê ‘eynî seg wexta ke dête giftûgo*

*kef çîrrînî zarî qewçey makere bê lê perîn*

*5 -Terhî çun rûbayî pîr û çawî wek hî kiwêre mar*

*pîrçî kilkî kemitiyar û, loçî laçaw çîrç û şîn.*

[h.b, 418]

Asta xeyidandin û tinaza helbestvan zêde dibe ku “devê pîrê” diçiwîne (dişibîne) “devê gur û beraz”, “dan û dil” diçiwîne “qirik” (qelereş) ku hêmayeke bêyom û nexweş e. Herwiha bi xwedî buxtan û “Ezazîl” ê ku navekî “Şeytan” e, helbestvan peyivandina pîrê diçiwîne “reyîna kûçikan”, şêweyê livîna devê wê diçiwîne “devê ker” ku kef dike, helbestvan di berdewamîya tinazan da; birêveçûna (meş) wê diçiwîne “rêvî” û awaza wê jî diçiwîne bi “mar” herwiha helbestvan di dêrên din da dibêje:

*6 -Hênde be xiroş û be tawe pîrejin (mirdûy mirê)  
nallê (besiye), bêtû ger bigê hemû ehli zemîn*

*7 -Coşî (kure) î pîrejin wek: (dozexe zêde teleb)  
destî ristî (benega) î deglofê hî çep bo xurîn*

[D. K, b.yekem, 418]

Dema ku em li ser ev her du dêran hûr dibin em dibînin tinaza helbestvan digêje qotê (sertar, kop,lûtke)û tu perde û şermê nahêle li hemberî pîrê, ji bo gotina tinazên xwe rûyê şermê nahêle ku dema jê ra dibêje ; “eger hemû dunya karê xirap digel te da bikin, tu nabêjî bese û têr nabî”, paşê jî diçiwîne “agirê dogehê” ku çawa agirê dogehê doza şewitandina kesên xirap dike. Bi heman şêweyê pîrê doza karê xirap dike wata "zîna " digel wê da bikin, helbestvan di du dêrên dawî da dibêje:

*8 -Sipleyeke napesind, hengwîn be qurgiya key bedes  
qet xelasî nabê ew deste le zarî bê gezîn*

*9 -Kurdî ye hecût dekatî ey ‘ecûzî cînsî ker  
çunke hênde lêt bedaxe, mîslî duşmîn (derkemîn)*

[h.b, 418]

Helbestvan navberê nade tinazên xwe yê li hemberî pîrê, vê carê jî bi bêwefa û xirap nav lê dike ku tu carî çêyîyê nizane. Loma di dêra duyem da tinazên xwe zede dike û wê dike “ker”, ji ber wê yeke her tinazên xwe zede dike û ranaweste.

Çimkî gelekî jê xeyidî ye herwek dujmin dibine, helbestvan di mînaka xwe ya tinazî ya bi navê ‘‘Leqebî Salihe’’ da dibêje:

*1 -Leqebî salhe, paşa nîye, nawî yesûd e  
Be musulmanî mezanin, teres e, ehlî cuw e*

*2 -Bexsîsî nîye manendî le rom û ‘ecema  
weku em kûnî ye, espabî muheyîya nebuwe.*

[D. K, b. duyem,76]

Helbestvan di vê wêneyê tinazî da kesekî neşêrîn dike ku bernavê wî ‘‘Salih’’ e, dema ku dibêje; navî wî ‘‘Yesud’’ e ev nava jî navekî cihûyan e û di nava musulmanan da tu rêz û hurmeta wan tune. Herwiha jê ra dibêje ‘‘teres’’ ku ev nava jî ji bo kesên ‘‘neşêrîn’’ û ‘‘nepesend’’ bikar tên, paşê jî di duyem da dibêje;’’ pîsên wek wê di nav rom û ‘eceman da jî tune’’ wata di nav tirk û farisan da ku li ba helbestvan ew pîs û xirapkar û neşêrînin, dîsa jî pîrê ji wan xiraptir e, helbestvan di dêrên din da dibêje:

*3 -Em sege, hêştu naxellefe. Şermî be qewmî xoy da  
dujminî ew keseye pêy billa: Emrro şemû we*

*4 -Damenî reş, weku (taws) be firrîn û esera  
xwêrriye mamirî hîze, hemû xorakî guwe.*

[h.b, 76]

Helbestvan di tinazên xwe da berdewam dibe, dema ku jê ra dibêje; "naxelef e’’ wata kesêk kêr’eqil e, "xwêrriye mamirî hîze " helbestvan ji vir da wêda perdeya şermê nahêle û dijûnên neşêrîn û gotinên beredayî jê ra dibêje heta ku gelekî pêş da dihere û dibêje; ‘‘xwerûk (xwarin) a wê hemû gû ye’’ lê helbestvan bi vê jî ranaweste û di dêrên din da dibêje:

*5 -Duşminatîy min û em gandere, resmêk qedîm  
xerzî (kune), ke ta êsta lebîrî neçuwe.*

[h.b,76 -77]

6 -Herweku bêwe jinan perçemî berdawetewe  
kone fahîşe, dellêy kêrêkî pêda neçuwe

13 -Nêr eger awis ebû, em debû dakî çil bê  
Kurdî heyfe bese lem newe kesane meduwe

[D. K, b. duyem,76 -77]

Helbestvan peyvên wiha bikaranîye ku xwendevan naxwaze careke dîn ne bixwîne û ne jî bibihîse, ev jî ji ber wê ye ku rika wî ya pîrr heye li hemberî wî/wê kesî/kesê, nexwe (dena) tinaza wî nedigihîşt vî astî ku ev peyvana bikaranîye; ‘gander=’, ‘kone fahîşe=fahîşeya kevn’, ‘kîrêkî pêda neçuwe=kîrek (xirek) neçûyê’. Helbestvan sînorên şerm û fedîyê rakirîye û axîna dile xwe vala kirîye, herwiha di dêra dawî da dozê li xwe dike ku dev ji van kesan berde û digel wan nepeyîve û ji wan dûr bikeve.

### 2.3.2.Wêneyê Felsefî

Wêneyê felsefî herwek ji navê xwe jî diyare ku mijareke zanistîye û bi şêweyekî siruştî li dû ew bersîvên nedîyar da digere ku cihana bûyin û hebûnê da rastî mirovan tê. Loma pênaseya wêneyê felsefî di yekcor û şêwe da cîgir û diyar nabe, ev ji ber wê şîroveya kûr û dûr e ku taybete bi xwe herwiha divê em wê jî diyar bikin ku ‘bingeha peyva ‘felsefe’ Grîkî (Yonani) ye. Ji du peyvên grîkî pêk hatîye; ‘filo’ bi wateya delalî, dilberî, evîndarî, xoşewîstî yan xwastinê tê, peyva ‘sofia’ jî bi wateya hikmet, hişmendî tê. Bi lihevdana her du peyvên ku têgiha (zarawe, term) ‘filosofia’ dariştîye bi wateya ‘dilberîya hişmendîyê’ yan ‘delalîya hikmetê’ hatîye holê’.<sup>180</sup> Wêneyê felsefî yek ji wan şêwazên din e ku pirranîya helbestvanan xwedî bîr û ramanên taybet bi xwe nin û li ser vê binemaya felsefî binyata helbestên xwe danî ne. Gerçî wêje bi giştî û coreya helbestê bi taybetî digel felsefeyê du tiştên cuda ne di jîyana mirovan da, lê dîsa jî wêje û felsefe du qalibê ku hinek car bi hevdû ra diçine xaleke hevbeş. Wata hinek caran dikevîne yek qalibî, ew xala hevbeş jî ji

<sup>180</sup> -Dr. Senger Qadir Şêx Mihemmed, *Felsefey Şî'r û Şî'ri Felsefî Be Nimûney Şî'rekani Refîq Sabîr û Kerîm Deştî*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, r12



nasandîn û zanîna zanyarîyan pêk tê, ev pêwendîya bihêz jî ji xwe ve nayê holê belkî bi wê hoyê ye ku bilindbûna asta bîr û ramanan ve ew di yek cî da bi hev şad bin, ev jî wiha dike ku em bibêjin; ‘*’feylesof "bîr " a me bi şêweyekî rût pêşkeş dike ku helbestvan di xeyal û xew da ji mezindeyên xwe yê hêsinî kirasan li xwe dike. Loma ew rexnegirên ku bi dû felsefeya helbestvan da digere di serî da divê ew kincana ji “bîr” ê deynin (bikin) heta ku bîra helbestvan weke xwe bimîne, çimkî helbest ji bîrik (bîroke) û wêneyê pêk tê*’<sup>181</sup> Hinek car jî bi wê şêwe û zanista cuda ku hene ji hev diqetin (cuda dibin), helbest û felsefe du maddeyên tevhevdû ne her ji ber wê yekê pêkhatiya helbestê ji peyvên bihêz, wateyên ciwan û herwiha ji dirêjî û berayîya “bîr” a kûr û dûr pêk tê. Tu guman têda nîye ku di vê coreya helbestê da gelek watayên felsefî hene û bi şêweyekî bandordar arasteyî xwendevanan tê kirin (digêje berdestê xwendevanan). Helbesta felsefî di serdema kevn û nû da şêwe û naverokê fireh ya deqên helbestî dagir kirîye ku ‘*’serencam (bi giştî) helbestên felsefî nepenîyên jîyanê derdixin û bersivê amade dikin ji bo ew pirsên ku ta îro bersivên wan nehatine dayîn, bi dû hemû ew tiştana dikevin ku li mirovan girêk û aloz e. Xewn û tiştên nedîyar û pîvan dikin waqî’î û eşkere dikin, zimanê helbestên felsefî zimanekî serbixwe, bandordar û taybete û bi peyvên watedar, dilgîr û nazik ve xwe dihewîne nêzikî civakê dibe*’<sup>182</sup> Her vê jî wiha kirîye ku ev helbestên felsefî bi şêweyekî zindî û teze bimînin, diyare ev pêwendîya di navbera felsefe û helbestê da wiha dike kû em bibêjin; ‘*’helbestên felsefî li gorî coreyên din yê helbestê di qot (lûtke) û ast bilindahîyeke berdewam da ye. Loma bi şêweyekî serekî corek ji nemirîyan di dîwanên helbestvanan da çêj û ta’ m û xweşîya deqan li ba xwendevanan berçav kirîye, herwek di vê mînakê da dibêje:*

*Eger yek lemhe xafill bim, le şewqî mahî ruxsarit  
Le heşra, bê (nesîb) î ceninit û, rûbarî kewser bim*

[D.K, b.yekem,294]

Helbestvan bi rêya hunera lihevçiwandinê (lêkçiwandin) û paşê jî bi girêdana bi ew bîr û bawerîyên dînî ku di roja “Heşir” da hinek diçine “dojehê” û hinek jî

<sup>181</sup> - Serdar Ehmed Hesên Gerdî, *Binyatî Wêney Hunerî Le Şî’rî Kurdî da (1970-1991)*, b.n,r247

<sup>182</sup> - Berzan Mela Taha, *Edebî Felsefî û Ezmûne Zînduwekanî Serdem*, Çapxaney Şivan, 2008,r8

diçine “biheştê” û nava biheştê da jî helbestvan bi taybetî amajeya hewzê “Kewser” ê kirîye, bîr û bawerîya xwe ya felsefî xistîye rû.

Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Şehîdî eşqim û memşon û kifnim bo meken yaran  
gewahî heşire bo deway şehadet bergî xwênînim*

[D.K, b.yekem,338]

Di vê malike da helbestvan wêneyekî bilind û ciwan nexşandîye, dema ku amajeya roja “Heşir” ê dike û li gor wî wihaye ; “madem şehîdê evînê ye” d’ roja “heşir” da kincên bixwîn dibe şahîdê wî û şahîdîyê ji bo wî dike, loma dema ku em li ser vê malikê hûr dibin em dibinin ku felsefeyek kûr ya dildarî têda xuya dike, di wêneyekî din da helbestvan dibêje:

*Rengî gull cana weku ruxsareket rengîn nîye  
şekerî mîsirî weku guftareket şîrin nîye*

[D.K,b.duyem, 93]

Her çiqas di vir da helbestvan amaje ji bo renga gulê kirîye jî berhevî (berawirdî) ya wê bi renga ciwan yê yara xwe kirîye, lê di vir da mebest bi tenê "reng" nîye belkî mebest ciwanî, nazikî, bêhn xweşî û hemû ew sîfetên daye pal yara xwe ye û di serda jî axaftina xweş û zimanê şêrîn yê yara xwe ye ku ji “Şekirê Misirî” şêrîntir e. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Çiwar şit qet meke xwahîş le duniya (kurdî) ta mawiy  
Le xot eqill û le dill sibiru le bext îmdad le yar yari*

[h.b,124]

Di vê malike da helbestvan rû li xwe dike (rûbirûyê xwe dibe) û digel xwe dipeyive, haweyekî “monolog” ê dirust dike û nefsa xwe agahdar dike. Amaje ji bo çar tiştên ku navê wan anîye kirîye loma em dibinin wêneyekî kûr yê felsefî nexşandîye, di ser wê da jî ev malika diçe (dikeve) xaneyaya serzenîşkirina hêsina xwe. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Belay Mensur le dilimî da û mededkariy nebû talî'*  
*Le dergay yar weku şêt baziy birdû kewte serdarê*

[h.b,137]

Di vir da helbestvan amajeyê ji bo (amajeya) felsefeya Mensûrê Helac dike û dema ku dibêje; ‘‘belay Mensûr=belaya Mensûr’’, di vir da mebesta helbestvan ewe ku weke rastî heman belaya Mensûr hatiye, ji bext jî tu alîkarî û hevkarîyê nabîne heta ku wî rizgar bike herwiha helbestvan amadeye li ber derîyê yara xwe sêdare bibe (darve bibe) ku ev amajeye ji bo felsefeya Mensûrê Helac. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Kafirîş rehmê be yexsîr û zelîlî xoy deka*  
*sawere rehmê be cestey min ke gerçî kafirî*  
*Min ke perwane û kemendkêşî kemal û husnitim*  
*Ke 'be keç nabê, eger bo şem 'î rûtîm ragirî*

[D. K, b. duyem,162]

Di vir da helbestvan bi rêya lihevçiwandinê ve wêneyekî nayab (kêmpeyda) dirust kirîye, ji bo yara xwe dibêje : ‘‘her çiqas yara wî ‘‘kafir’’ jî nîye lê weke kafirekê tevdigere û tu bezeyî ya (re'hma) wê tune ye li hemberî helbestvan. Loma helbestvan rû li yara xwe dike û jê ra dibêje ku ‘‘amade ye weke perwaneyê xwe bişewitîne li dor ronkaya ruxsara yara xwe da’’ bi vê jî helbestvan yekcar wêneyekî bilind û ciwan nexşandîye. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Weku bulbul, fixan ke daîma, Kurdî le dewrî gull*  
*Weku qumrî binallêne le taw serûy xeramananî*

[h.b, 215]

Helbestvan di vî wêneyî da bi rêya lihevçiwandinê ve wêneyekî ciwan yê felsefî nexşandîye, dema ku monologê digel xwe dike her ji xwe ra dibêje; ‘‘bulbul bi berdewamî hawar û girîyê bike li dora gulê’’, ku helbestvan xwe çiwandîye bulbul û yara xwe jî çiwandîye gulê. Diyare derbirîna vê bîra felsefî asta bilindbûna felsefeya helbestvan diyar dike, helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Le cêgey şêrkerojan û dilêranî bibey diwênê  
Şuxal serdare, emma gurg be dû giwêy da elûrênê*

[h.b, 251]

Di vê malike da helbestvan amajeyê ji bo hilweşandina Mîrnişîna (Mîrîfî) Baban dike û dax û kesereke pirr ji bo wê karesatê hildikşîne û amajeyê ji bo zilamên gernas û navdarên Baban dike herwiha dibêje ; ‘‘li cihê (şûna) zilamên şêr yên Mîrnişîna Baban ‘‘şuxal’’ wate ‘‘çeçel û rovî’’ bûne serdar ku bi rastî wêneyekî felsefî yê berz (bilind)û nayab têda tê dîtin.

### **2.3.3.Wêneyê Derûnî**

Yekê din yê ji coreyên wêneyê helbestî ‘‘wêneyê derûnî’’ ye. Ev jî ji ber wê pêwendîya bihêz û bitîn ya di navbera wêje û derûnnasî ye, bi taybetî helbest ku pêwendîyeke wê ya bihêz heye bi pirsên derûnî. Herwiha di pirranîya deman da em dikarin di lêkolînên li ser helbest û derûnnasî yê da sûdê ji herduyan bigrin, weke ku pêştir me amajeya wê kir ev jî ji ber wê hoyêye ku pêwendîyeke bihêz û bêqet (bi hev re, têkçirjaw) di navbera wan da heye. Wekemînak em dibînin her deqeke helbestî olandana (dengvedana) wê rewşa derûnî ye ku helbestvan têda dijî, her ev jî wiha dike ku ew wêneyên waqî’î ku di hundur û derûnîya helbestvan da mabe ku her ji hilçûn û hest sozên derûnî yên helbestvan bi rêya wêneyê helbestî biguhezîne nava deqên helbestî. Îjar ew rewşa veşartî û taybetîya helbestvan beyan bike, her loma em dibînin ; ‘‘wêneyê derûnî jî weke corek ji coreyên wêne, yekser ji hest û soza helbestvan çavkanîyê digire û tomareke ji bo rewşên derûnî, wate ji dayik buna wê rewşa ku helbestvan têda dijî yaxud derbirîna derveyê mijarî ye ji wê rewşa navekî ya hêsinî ye ku helbestvan bi wê ve vedimire. Tenêyî û hestkirin bi namoyî (xerîbî) hêzeke palnerin ji bo teqîna kanîya helbestê û guzarîştîkirine (tabîr) li wê rewşa derûnî ye’’.<sup>183</sup>

Wêje helgirê hest, nest û soz û xeyal e, her vê jî wiha kirîye ew pêwendîya bihêz ya di navbera ‘‘wêje û derûnnasî’’ da peyda be û serîhilbide , dema ku helbestvan di vê cihana fireh Ya ku têda dijî bi hoya hestên bêdengkirî ‘hezên veşartî yên wî/wê di hundurê wî/wê da dewranê dike (digere). Tek hokarek ji bo xwe

<sup>183</sup>-Ferhad Qadir Kerîm,*Binyatî Wêne Le Şî’rekanî Hemdî da*,b.n,r227-228

valakirina vê rewşa taybetî ew derbirîna hundur û hilçûnên xwe bi şêweyekî derûnî, gelek car ev rewşa derûnî digel beyankirina xwe dibe hoya aramî bexşîna bi hêsina helbestvan û ji dayik bûna tabloyeke helbestî. Bêguman ev tabloyên helbestî bi rewşeke derûnî da ret dibin loma wêneyên helbestvan berdewam di guherîne da ne. Wekemînak dîmenekî nîştîmanî bandorê li helbestvan dike, wêneyekî derûnî û ji wêneyekî ku helbestvan berhem tîne (dirust dike) cuda (cihê) ku li wî aliyê bêhêvîyê da ye bandoreke cuda li helbestvan dike. Herwiha dema ku helbestvan rastî xemeke taybet û rewşeke derûnî tê û bi wê hoyê ve wêneyekî dinexşîne bandora wê jî cuda ye, loma pêwîste em wê jî eşkere bikin ku bi pê şêwaza derûnî rewş û şêweyêke misoger ya helbestê nîye, belkî berdewam di nuhbûnê da ye ev jî ji ber rewşa taybetîya helbestvane.

Loma em dibinin; *'nivîskar dema ku xwe dide axaftin û di hundurê xwe da dizivire heta radeyekê agahîyê ji dewrûber nagire (ji derdorê bêagahî dimîne) û bervî cihana xwe ya xeyalî gavan davêje û derûn û hundurê xwe dide axaftin. Kewate (yanî) pêwendîya di navbera wêje û derûnnasîyê da tiştêkî eşkere û belge naxwaze ku gelo bandora zanista derûnî heye li ser wêjeyê yan berevajî ye yaxud bandoreke bi dualî ye. Diyare derûn wêjeyê dirust dike û wêje jî derûnê, wêje bi dû rastîyên jîyanê da digere heta ku dil û derûnê rohnî dike, derûn jî war û babetên jîyanê kom dike heta ku wêje were holê'*.<sup>184</sup>Loma em dikarin bibêjin ; ''wêje û derûnnasî du warên cuda ne di jîyana mirovan da, di vir da ewê giringe ku divê em amajeyê pê bikin ; ew pêwendîya temamker ya di navbera herdukan da heye, ku heryek heyvanekin (hewên, maya, hevîrtirş) ji bo serhildana hevûdû bi taybetî giringîya rewşa derûnî di roman, çîrok û wêneyê helbestî da gelekî heye ji bo dirustbûna coreyên wêjeyî da. Ji vir da wêda em dikarin bibêjin ; di helbestên her helbestvanî da kêma yan jî pîr wêney derûnî têda xuya dike, ev jî ji ber wêye kul i gorî rewş, qonax û mercan guherîn bi ser wêneyan da tê."

Mistefa Begê Kurdî jî wek helbestvanekî qonaxa kilasîkî ye bi hoya hebûna gelek hokar û rewşên di serdem û jîyana wî da, wêneyê helbestî yê derûnî bi şêweyekî berçav xuya dibin. Loma Mistefa Begê Kurdî bi şêwazeke derûnî ya tije

<sup>184</sup> -Hawjîn Silêwe, *Rehendî Derûnî Le Şî'rekanî Letîf Helmet* da,b,n,r22

hest û soz wêneyê helbestî yên ciwan nexşandîye ku ev wênê olandana rewşa derûniya taybetîya wî ye, di vî wêneyî da dibêje:

*Muştaqe dillim, lew demewe çolle meqamit  
bo bîstinî eşarî pîrr û xoşî kelamit  
dill tabî xemî hîcrî nemawe bese îtir  
tazey bikewe uştirekey sall û eyamit  
ta (şîwekell) ti meskene şêwawe kellî jîn  
arê ke gume lêm xeber û peyik û peyamit*

[D.K, b.yekem, 77]

Bêguman ev wêneyê derunî ji Kurdî bo Salimê Helbestvan e (ji bo Salimê Helbestvan nexşandîye) , helbestvan di rewşeke yekcar xem û xefet da ye ev jî bi hoya dûrîya Salim e, herwek em dibînin helbestvan bi şêweyekî zimarî (ağıt) û hestî û sozî xwe derdibire. Dema ku dîwana (dîwexan, ode) Salim vala ye bi hoya dûrîya ji Kurdî û tu agahî û peyamek jê tune, Hesta derûnî ya helbestvan dilerze ji ber wê ev wêneya ji dayik dibe, di wêneyekî din da helbestvan dibêje:

*Çêştîm emrro jehrî mar û ruhî şîrînim nehat  
zexmî konim hate jan û merhemî birînim nehat  
Min xemim xward û xemîş xwênî cigermî xwardewe  
boye giriyam çend be çend firmêskî xwênînim nehat*

[h.b,115]

Dema ku em li ser vî wêneyî hûr dibin, helbestvan bi eşkere û bi şêweyekî hunerî ya yekcar bilind rewşa xwe ya derûnî beyan dike, çimkî herwek diyare helbestvan talî û xem, xefet û dûrîya ji yara xwe çiwandîye "jara mar " ku bi wê şêweyê rewş û halê wî yê derûnî nebaş e ku "jara mar" ta'm kirîye. Diyare ev jî bi hoya nehatîna yara wî ye, herwiha bîrîna wî ya kevn jî janê dide û çareserîya birîna wî jî nehatîye, loma dema ku dibêje: "Min xemim xward xemîş xwênî cigermî xwardewe= Min xem xwar û xwemê jî xwîna cerga min vexwar ", ev ew alîyê rewşa xirap ya derûniya helbestvan derdixe ku hewqas xema helbestvan zede bûye "xemê

xwîna dile wî vexwarî ye''. Helbestvan di heman wêneyî da rewşa xwe ya derûnî digîne (digihîne) radeyekê û dibêje:

*Kewtime wez 'î nez û xem xistmiye hallî xerxere*

*Kurdî bêkes xom le hîç layê seday şînim nehat*

[h.b, 115]

Her yek ji peyvên (biwêjên) "nez " ku bi wateya "ser merg= ser mirinê" tê û "xem " û "xerxere " wata nalîn û hewara li "sere merg=ser mirinê" û herwiha peyva "bêkes " wêneyê wî dixwe rewşeke yekcar taybet û diyar, ev jî rewşa derûnî ye ku helbestvan li ser mirinê jî tu hewqas xem nexwarî ye ji bo kesekî û lez nekiriye. Loma wêneyê wî dikeve nav tabloyeke hunerî ya yekcar bilind û şêwazek ji şêwazên wêneyê derûnî, helbestvan di wêneyekî di da dibêje:

*Aman mirdim îlacê, sa lerrêy pêxembera çare*

*wîsal, ya qetil, ya teskîn, le hersê bom biken kare*

*Weha sûtawim esla tabî fîriyadim nema sadey*

*refîqan nîwe sûtîn êwe, namerd erze hawara*

[D.K b.duyem, 137]

Dema ku em li ser vî wêneyî diramin (difikirin), em wê dibînin helbestvan wêneyekî hewqas bilind nexşandîye ku bi temamî dil û derûnîya xwe hawar dike ku çareserîyekê ji bo wî bibinin. Dema ku xwe davêje emana Pêxember (D.S.X) diyare ev wêneyekî derûnîyê gelekî ciwan e, çimkî dibêje; "dema ku bigêje yara xwe yan jî kuştina wî rizgarî ye ji bo wî çimkî ji derd û xem û xefetên yara xwe xelas dibe, yan jî dixwaze herkes ji bo wî du'a bikin ku belkî bigêje wê mebesta xwe''. Helbestvan di dêra duyem da bi şêweyekê behsa nalîna derûnîya xwe û hesta xwe ya derûnî dike ku wiha şewitîye bûye xwelî (arî, xulemêş) loma kêra (sûd) hewar û lezgîniyê nemaye. Ji ber wê dibêje; "boye hawrêyan êwe ger nîwe sûtawin, min be tewawî sûtawim=hevalno hûn eger nîvî şewîfîne, ez bi temamî şewîfî me'', ev jî hest û soza helbestvane ku ji derûnîya wî afirî ye. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Nawî eşiq hergîz le dunyada nebûba kaşkî*

*toy le bo dermanî çaw, nebuwaye peyda kaşkî*

[h.b, 197]

Di vî wêneyî da helbestvan peyvek bikaranîye ku tijî hest û soza derûnî ye, ev jî peyva "kaşkî=xwezî" ye ku tê wateya "xozge" yan jî "hergîz". Mistefa Begê Kurdî di bazara evîn û cihana dildarîyê da serkeftî nebûye yan jî negihîştîye dildara xwe, loma em dibînîn di pirranîya helbestên xwe da bi zimareke (lawandnewe) derûnî tiştên hundurê xwe der tîne, helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Dek (reqîb)! Tûşî belayek bî, necatit qet nebê  
Manî'î wesl û heyatim bûy, heyatit qet nebê*

*Wek lemin têkçû hizurî ru'hekem rebî, xuda  
xeyrî (destî darî kiwêrî), rûy cematit qet nebê*

[D. K, b. duyem,267]

Dema ku em li ser vî wêneyî hûr dibin bi eşkere rewşeke hilçûnî ya helbestvan têda dibînîn. Ev jî bi rêya ew hest û soza helbestvane ku ji derûnîya xwe dertîne û arasteyî "reqîb=dujmin" ê xwe dike. Jê ra dibêje; "ku tu rastî belayekê hat, bila azadbûna te tunebe" çimkî bûye sedema têkdana (xerakirina) pêwendîya navbera wî û yara wî, bi vê jî wêneyekî derûnî nexşandîye.

### **2.3.4.Wêneyê Remzî**

Wêneyê remzî alav (amraz) û keristeyekî pêwîst û bihêze ku pirranîya helbestvanan di serdemên kevn û nû da di berhemên xwe da bikaranîne û şêwazên helbestên xwe pê nexşandine ku bi wê hoyê ve wêneyên ciwan û wateyên bihêz digînin. Diyare bikaranîna remz di helbestê da gelek car tiştêkî asayî û sade ye û gelek car jî ji bo mebestek giring û taybetîya xwe bikartînin. Bi taybetî "remz" di nav wêjeya kurdî da cihêkî gelekî fireh û mezin dagir kirîye ku bûye hoya diyarkirina şêwaza helbestên helbestvanan. Ev bikaranîna remz hinek car siruştî ye û hinek car nesiruştî ye, ev şêwaza ku nesiruştîye gelek hokarên wê hene yek ji wan hokarana ewe ku em dibînîn gelê bi dirêjahîya dîrokê ta ku îro jî di bin bend û zilma dujmin da bû. Pêwendîya vê jî yekser hebû ku bi wê helbestvan remzan di helbestên xwe da bikarbînin, hokareke din jî ewe ku remz dibe hoya diyarkirina şêwaza taybet ya helbestvan.



Herwiha sîfetek gelekî giring ya remze heye ew jî ew ku ciwanîyek bihêz dide deqên helbestan, herwek Mehmûd Zamdar dibêje: ‘*Bê remz ne helbest heye ne xew û bînîn (dîtin) û ne do (duhu, diwênê) û ne îro û ne beyanî, di nava remz da zat û mewzû, xewn û waqî’î, zanist û sîhir, bûn û nebûn yek tên girtin*’.<sup>185</sup> Dema ku em bala xwe didin vê boçûnê gelek tişt ji bo Rohnî û eşkere dibin, ew jî giringî û pûteya (bayexî) remz bi giştî di hemû warên jîyanê da û bi taybetî jî wêje bi hemû coreyên xwe ve. Loma Mistefa Begê Kurdî ji vê şewazê bêpar nemaye û bi şeweyekî berçav remz di helbestên wî da olanê dide (deng vedide), div an mînakên jêr da em wêneyên remzî yên helbestvan dixine rû û şroveya wan dikin. Helbestvan di wêneyekî da dibêje:

*Kewill bedoş û xerqepoş bîn tac û keşkoll hellgirin  
rûkene eflakî pest û biçine şarî xamoşan*

[D.k, b.yekem, 396]

Helbestvan li ser remzî wate hêmayî wêneyekî ciwan nexşandîye, çimkî bi rêya derbirîneke xwe ya hestî ve peyamekê araste dike, "kewillbedoş û xerqepoş" ku mebesta wî derwêş û sofî ye ku kum (kilaw) bi sere xwe din û herin bajarê xamoşan (bêdeng, bêpejn), di vir da helbestvan "bajarê xamoşan" kirîye remzek ku mebest jê goristan e. Helbestvan di mînakeke din da dibêje:

*Şewî yelda ye, ya deycûre emşew  
ke didem dîr leto bê nûre emşew*

[h.b, 483]

Helbestvan "şeva yelda"yê bikaranîye ji bo wêneyê xwe ku wêneyekî remzî pê nexşandîye, çimkî "şeva yelda" peyveke bi zimanê suryanî ye û nîşaneyê ji bo ji dayikbûna Hezretî Îsa, herwiha şeva dawî ya pâyizê ye û dirêjtirîn şev e. Herwiha "deycur" jî hêmaye ji bo şeva gelekî tarî ku helbestvan bikaranîye, helbestvan bi

<sup>185</sup> - Mehmûd Zamdar, *Le Banêjî Şî'rewê, Komeley Roşinbîranî Kurd, Çapxaney Rojnamey*  
‘Iraq, Bexdad, 1981, r35

hoya dûrîya yara xwe ev wêneya nexşandîye û xistîye nav tabloyeke helbestî bi şêweyê remzî, helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Nîşaney (tof) û (tofan) î surîşkim  
le rû û damanim her sû seyle emşew  
Serapam xerqî eşkî sûr û dil wa  
xerîkî mewcî dûrîy leyle emşew*

[D.k, b.yekem,498]

Dema ku em li vî wêneyî hûr dibin, em dibînin helbestvan di nav deqa xwe ya helbestî da xwe bi amajeya hêma û remzê dike, çimkî helbestvan hêsirên çavê xwe kêrîye bi "tof " ku tê wateya "bahoz=ziryan" herwiha "tofan " tê wateya "lehî=lafaw". Diyarê helbestvan wêneyekî derûnî û remzî tevhev kirîye (têkell kirduwe), çimkî diyare hinek hêsirên wî bexur û gelek bûne kul i ba helbestvan bûye hoy ku helbestvan bi vî şêweyî basî hêsirên xwe bike. Helbestvan di dêra duyem bi heman şêwe basa "eşkî sûr=hêsirên sor" dike diyare ev jî hêmaye ji bo hêsirên xwînî, herwiha peyva "leyl" amajeye ji bo çîroka "Leyl û Mecnûn" ku helbestvan ev jî wek amajeyekê kirîye bi remz ji bo evîndara xwe.

Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Ta reqîb hazir e, bo min: Hedere nek hezer e  
ew sege ta le kemîn bê, hezer im her sefer e*

[h.b,592]

Di vî wêneyî da helbestvan peyva "reqîb " bikartîne û dike remzek ku tê wateya "kesên xirap û nehez" û dujminê dildar (evîndar) ku dibe hoya sedema nexweşîyê di navbera du evîndar da. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Le cêgey (şîrkîrojan) û dilêranî (bebe) î diwênê  
(şuxal) serdare emma (gurg) bedû giwêyda elûrêna*

[h.b, 251]

Di vî wêneyî da helbestvan peyvên “şîrkîrojan” , ”bebe”, “şuxal=çequel, wawîk” û “gurg=gur” bi şêweyê remz bikaranîye, bêguman helbestvan li paş rûxana (hilweşîna) Mîrnişîna Baban û hatina bêgane û dagirkirina xak û nîştîmanê dibêje; “li cihê mêr û zîlamên derwêş û mêrxasan rovîyan desthelat xistine deste xwe”, helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Çawekem zanîwte bo şew xew le çawim nakewê  
çunke min pêş xizmetim pêş xizmetan nanûn şewê*

[D.k, b.yekem, 302]

Helbestvan di vî wêneyî da xwe kirîye qurban û remza evîndara xwe, dema xwe dike bi “pêş xizmetan” ku ev jî hêmaye ji bo xizmetkirina kesên mezin wek “şa, serok, mîr û axa” . Ji bo derbirîna evîna xwe evîndara çiwandîye kêsên mezin û xwe jî çiwandîye xizmetkaran, her ji ber vê jî bi şev û roj xew lê nakeve.

#### **2.4. Wêneyê Ronbêjî (Rûnbêjî, Beyan)**

Dîrokeke kevn ya ronbêjî heye, vedigere ji bo serdema Romanî û Yonanîyan. Di nava wêjeya kurdî da jî bêguman dîrokeke wê ya kevn heye, zêdetir di nav wêje û dîn (ayîn, ol) da bikarhatîye, herwek Dr. ‘Umer El Mele dibêje: ‘*Ronbêjî ji hemû zanistên din giringtir e ji bo şîroveya Qur’ana Pîroz û destnîşankirin û ronîkirina ciwanîyên wê*’.<sup>186</sup> Lewre (loma, boye) ew kesên şarezayîya wan di warê ronbêjî da gelekî baş nebe nikarîn şîroveya Qur’ana Pîroz bikin, çimkî tu guman têda nîye nikare wek xwe şîroveya wê bikin. Pêxemberê me Hezretî Mihemmed (D.X.L) difermo ; <sup>187</sup>”*ان من البيان لسحرا , و ان من الشعر لحكمة*” wata di helbestê da ronbêjî û dilgîrî heye ev jî wiha dike balê bervî xwe dikşîne. Loma ronbêjî giringtirîn û serekîtirîn beşa zanista rewanbêjîyê ye ku wiha dike helbestvan bi şêweyekî berçav rû li vê zanistê bikin, çimkî rûnbêjî alîkarek başe ji bo perwerdekirina wêjeyeke ciwan û sûdbexş (bikêr, kêrdar).

Herwiha şêwaz û binyata wêneyên xwe yên helbestî berhem bînin (bînin holê, çê bikin). Dr. Muhsîn dibêje: ‘*ronbêjî di pirranîya waran da tê dîtin; siyasî, ayînî (dînî), zagonî (qanunî), wêje. Di serdemên kevn da li ba Romanî û Yonanîyan weke*

<sup>186</sup> -‘Umer Mela Hiwîş, *Eser El Belaxe fî Tefsîr El Keşîf*, Metbe’et Dar el-Basrî, Bexdad, 1970, s153

<sup>187</sup> -Yûsîf Elî Mihemmed, *Binyatî Wêne Le Şî’rekanî Mîhrî da*, b.n,r79

*fezûletekê bikardihat ji bo perwerdekirin, hunera axaftin û qena'et pêanîna ewên din''*.<sup>188</sup>

Herwek ronbêjî ji navê xwe diyare mebesta wê gihandina (famdana) peyamane bi şêweyekî eşkere, dema ku em li rûyê pêyvê li ser vê zanistê diramin (difikirin) ‘ron=rûn’ tê wateya ‘saf, pak, zelal’ yaxud ‘rast’, ev hemû ji mebesta ‘ron’ pêk tên. Peyva ‘bêj’ jî peyveke hevedudanîya watadar e, çimkî ‘bêj’ wata ‘gotin’; ji radera (çawig) ‘bêjtin’ hatîye dema ku her du peyvan yek digirin ‘ronbêjî’ dirust dibe û navekî watadar e. Ronbêjî ji van qise û gotinan ra tê gotin ku bi şêweyekî rast û dirust pêşkeş tête kirin ji bo ronkirin (zelakirin, eşkerekirin) û şîrovevê, herwiha li rûyê têgihê (zarawe) ve jî ronbêjî navê zanistêke rewanbêjî ye, ‘ereb peyva "el beyan" ji bo wê bikartînin.

‘Ezîz Gerdî wiha pênaseya ronbêjîyê dike û dibêje: ‘*Ronbêjî li wê dikole çawa dikare yek wata bi rêya cûr bi cûrî derbibire (derbîne), bi merca derbirîneke bi aşopeke (endêşeyekî) dahênrane û bê wataya wê bi ronî (zelalî) bigihêne (bide fehmandin), herwek çawa li ser çendîniya watayê dikole*’.<sup>189</sup> Ronbêjî zanistêke ku di şîyana (tiwana) wê da heye hemû corên derbirînên veşartî bi şêweyên cor bi cor watayên wan eşkere bike, emê jî hunerên ronbêjî ku ji ‘lihevçiwandin’ (lêkçiwandin), xwastin, xaze (mecaz), dirike (kînaye)’ û şêwaz û coreyên wêneyê helbestî yên Mistefa Begê Kurdî pêk tên têxine rû.

#### **2.4.1. Wêneyê Lihevçiwandin (El-sure teşbiye)**

Yek ji huner û zanista rewanbêjî ku helbestvan wek keristeyekî serekî û giring di helbestên xwe da bikartînin, ji ber wê yeke lihevçiwandin dewreke bilind dibîne di şêwaza wêneyê helbestî da loma giringtirîn hunere di çavê hunerên din yên ronbêjî da. ‘Elaeddîn Secadî di derbarê vê hunerê peyva ‘wek hev’ danîye û derbarê wê da dibêje: ‘*Wek hev ji bo hildana perdeyê ji ser tişteki nediyar, ev jî ji bo wê ku tiştê nediyar di navberê da nemine û eşkere were holê*’.<sup>190</sup> Wata çiwandina tişteki/tişteke

<sup>188</sup> -Muhsîn Ehmed Umer, *Rûnbêjî Yan Rewanbêjî*, kovarî Raman, 2008, 159

<sup>189</sup> -Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî*, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2002, r18

<sup>190</sup> -‘Elaeddîn Secadî, *Xoşxwanî*, Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 1986, 44

bi tişteki/tişteke din ku sîfet yaxud wataya wan bêhêz e yan ron nîye bi wê hoyê ve wataya wan bihêz û eşkere dibe.

Li hevçiwandin weke keresteyek ciwankariye û materyalek pêwîstîyeke serekî û berdewamî ya wêneyê deqên helbestî ne ku ji bi wê hoyê ve bandorê bi şeweyeke xurt li ser bîr û ramanên xwendevanên wêneyên helbestî da dihêle. Herwiha pêwîste em wê jî bibêjin vê hunerê bi şeweyekî siruştî cihê xwe di nav zimanê pirranîya takekesan da girtîye ku rojane ji bo ronkirina tiştên derdora xwe bikartînin.

Dr. Îdrîs di pênasekirina ronbêjî da dibêje: ‘*Lihevçiwandin ji çiwandina tişteki yan tişteke bi tişteki yan tişteke din pêk tê, ji ber hebûna sîfetekê yan ji zêdetir ji sîfetek hevbeş di navbera her du tiştan da ev jî bi şewazekê zêdetir tê pêşkeşkirin. Hinekê wan yekser û bê bikaranîna Ewzar û rûyê lihevçûnê, hinekê wan jî bi sûdwegirtin ji ewzar û rûyê lihevçûnê ve, îjar ji herduyan yaxud ji yek ji wan*’<sup>191</sup> Herwek eşkere ye lihevçiwandin ji çar binemayan pêk tê; du ji wan serekî ne wata bi bê hebûna ev duyana ku ji ‘lêçû û li wan (wî/wê)’ lihevçiwandina wan dirust nabe wata hebûna ev du binema mercekî serekî ye divê her hebîn. Herwiha du binema yê din jî hene ku ji ‘ewzar û rûyê lihevçûnê’ pêk tên ku ev du binema neserekî ne wata bi nebûna wan jî lihevçiwandin her dibe, nasandina ev binemana jî bi vê şeweyê ye:

**Lêçû:** Binemayeke serekî ye û sîfet û wataya wê ron û eşkere nîye ku bi hoya lêçûyê ve eşkere dibe.

**Li ew çû (li wê/wî):** Ev jî binemayeke serekî ye, giringtirîn erka wê zeqkirdinewe û derxistina sîfeta lêçû ye.

**Rûyê Lihevçûnê:** Ev jî pêwendîya navbera her du binemayên serekî derdixe, li rûyê ew sîfetên ku lihevçiwandinek pê encamê dide ; li rûyê bilindi û nizmî, mezinî û biçûkî,... Htd.

**Ewzar:** Ji ew amrazên ku du binemayên serekî yên ji bo lihevçiwandinê bi hevdû ve girê dide pêk tê.

Em li jêrê ev hunera ku Mîstefa Begê Kurdî di helbestên xwe da bikaranîye dixine rû. Helbestvan di vê mînakê da dibêje:

---

<sup>191</sup> -Îdrîs Ebdulla, *Kowanekani Rewanbêjî*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2013, 146

*Merdumî çawit ke dîçite ser supahî can û dil*

*wek Qecer daîm be qîrqaçî nîga da 'wa deka*

[D. K,b.yekem, 64]

Lêçû=çawî yar, li ew (wê)=qecer, ewzar=wek, amraz- rûyê lihevçûnê=qîrqaç

Dema ku em li ser vî wêneyî hûr dibin em dibînin helbestvan wêneyekî ciwanî nexşandîye li ser hunera lihevçiwandin, dema çavê yara xwe diçiwîne bi "qecer" ku hozeke kevn ya turke ku destdirêjî kirine ser kurdan, "qîrqaç" rûyê lihevçûnê ye. Hemû binemayên lihevçiwandinê div î wêneyî da heye, dibe lihevçiwandina rehaya dirêj tişbîhî tam", di wêneyekî din da helbestvan dibêje:

*Wek dur û eqîq nexşe, dindan û lebî alit*

*her wek (berreza) pexşe, egirîce le ser şanit*

[D.K, b.yekem, 82]

**Lêçû**=diran û lêv û egirîce, li ew (wê) çû=durr û eqîq û berze, ewzar-amraz=wek û wek, rûyê lihevçûnê= nexşe û pexşe

Helbestvan di vê dêra helbestî da du lihevçiwandin bikaranîye, di nîvdêra yekem da "diran" û "lêv" a yara xwe çiwandîye durr û mirwarî, herwiha di nîvdêra duyem da hlbestvan egirîcey yara xwe wata por û biskên yara xwe çiwandîye coreyekî gîhayê. Her du lihevçiwandin bi şêweya lihevçiwandina rehaya dirêj e wata "tişbîhî tam" çimkî hemû bingeh û binemayên lihevçiwandinê têda heye.Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Dil desûta çîn be çîn deşkête ser yek wek fener*

*sahêbî rûy atesîn û zullfî çîn çînim nehat*

[h.b,115]

lêçû=dilê helbestvan,li wê çû=fener,ewzar-amraz=wek,rûyê lihevçûnê=şewata çîn bi çîn (qat bi qat).

Di vî wêneyî da helbestvan dilê xwe çiwandîye “fener” ê ku coreyek çira ye di serdemên kevn da bikar hatîye, hemû binemayên lihevçiwandinê têda ye û dibe lihevçiwandina rehaya dirêj (tişbîhî tam). Di wêneyekî din da dibêje:

*Le hesret rûy mûyî kirij û bilawit*

*dillim daîm mîsalî xunçe teng*

[D. K, b. duyem, 47]

Lêçû=Dilê helbestvan, li wê çû=xunçe (bişkoj), ewzar-amraz= mîsalî, rûyê lihevçûnê=teng e

Helbestvan di vî wêneyî da dile xwe çiwandîye “xunçe” yê, ev jî ji ber neşêrîniya wê keseye ku vê helbestê ji bo wê dibêje, letawen dillî teng buwe ev tengbûna jî rûyê lihevçûnê ye û ev wêneya jî dibe lihevçiwandina rehaya dirêj (tişbîhî tam). Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Aşiqî xoşe, ne wek bo minî xerîb û qurr be ser*

*dûlberim wek dujmin û xom bêkes aşufte hall*

[h.b,271]

Lêçû=Dulbera helbestvan, li wî çû=dujmin, ewzar-amraz=wek Dema ku em li ser vê mînaka hûr dibin, helbestvan yara xwe diçiwîne dujmin ku dibêje; “xoşewîstî xoşe=evîndarî xweş e”, lê ji bo kesê wek min hejar ne xweş e. Di vî wêneyî da ji ber ku rûyê lihevçiwandinê têda tuneye ev coreya lihevçiwandinê dibe “lihevçiwandina rehaya kurte” (teşbîhî murselî mucmel). Di wêneyekî din da helbestvan dibêje:

*Weha firmêskî xwênîn dê le çawim*

*weku damanî Elwend e kenarim*

[h.b , 320]

Lêçû=Hesirê çavê helbestvan, li wî çû=Çîyayê Elwend, ewzar-amraz=wek

Di vî wêneyî da helbestvan bi hoya hunera lihevçiwandinê ve “hêsirên çavê xwe” çiwandîye Çîyayê Elwend, di vî wêneyî da rûyê lihevçiwandinê tuneye ji ber wê dibe “lihevçiwandina rehaya kurte” (teşbîhî murselî mucmel). Di wêneyekî din da helbestvan dibêje:

*Le cewher ger temaşa ken, dezanin çone ehwalim*

*le jêr xaşakewe çun gewherêk nuqmî bin awanim*

[D.K, b.yekem,326]

Lêçû=Helbestvan, li wê çû=gewher

Helbestvan di vî wêneyî da xwe kirîye “cewher”, di vî wêneyî da ewzar û rûyê lihevçiwandinê tuneye ji ber wê dibe “lihevçiwandina mîsoger ya kurte” ye (teşbîhî belîx).

#### **2.4.2.Wêneyê Xwastin (El-sure el-îstîariye)**

Xwastin (alegorî)coreyeka din ya hunera ronbêjî ye ku helbestvanên klasik ji bo bihêzî û bandora wê ya gîhandina peyamên xwe yaxud deqên xwe yên helbestî li ser xwendevanan bikaranîne, sîfetek taybet ya xwastinê heye ew jî ji bo mebest û wataya neserekî bikartê. ‘*Xwastin ji bikaranîna peyveke ku ji peyvek din zêdetir pêk tê, ji ber wê pêwendîyeke lihevçûnê heye di navbera ev du peyvana da, nîşaneyê wê jî heye rêgirî dike li wê peyva ku anîye ji bo wateya dirust bikaranî be*’.<sup>192</sup> Ev jî herwek me amaje pê da ku ji bo wê bandora jê têgihîştinê bi cî bihêle, wekemînak dema ku em dibêjin: “bulbul girîya” di vir da bi wateya neserekî hatîye ew jî ewe ku “bulbul” sîfeta mirovî wergirtîye ku mebesta serekî û wataya wê ya dirust “mirov digirî” ne bulbul. Herwek Arîsto dibêje: ‘*Xwastin ji veguheztina navê tişteki yan navê tişteke ji bo navek din pêk tê*’.<sup>193</sup> Gerçî “lihevçiwandin” û “xwastin” du hunerên ronbêjîne di zanista rewanbêjî da, her du ji bo mebest û wataya ciwan bikar tên ku di gelek waran da bi hev diçin (dişibin hev), lê yê wan ji hev cuda dike ewe ku di xwastin da her du binemayên serekî nabe bi hevdu ra werin. Wata lêxwastraw

<sup>192</sup> - Îdrîs Ebdulla, *Kowanekanî Rewanbêjî*, b.n, r166

<sup>193</sup> - Yûsif Ebû ‘*Edûs, el-Îstî’are fî Neqd Edebiel- ‘Hedîs Tabî’* et el Ule el-Ehliye lîl Neşir we Tewzî’, Emman, 1997, s47



(mûstîfare mînhu) nabe ji boxwastiraw (mûstîfare lehû) be, ev jî bi berevajîya lihevçiwandinê ye ku merce her du binemayên serekî hebe, wekemînak:

### **Kurd çavnetirs e.**

Lêxwastiraw: Ev xwastin e, çimkî tenê yek bineret (binema) têda heye. (Kurd=mûstîfare mînhû)

### **Kurd wek şêr çavnetirs e.**

Lêçû=Kurd, ewzar=wek, li ew (wî) çû=şêr: Ev lihevçiwandin e, çimkî her du binemayên serekî têda hene.

Giringtîrîn bineretên xwastin ji: lêxwastiraw (mûstîfare mînhû), boxwastiraw (mûstîfare lehû), xwastraw (mûstîfare), qerîne (nîşane) pêk tên, bi şêweyekî giştî xwastin dû cor e ew jî ji ‘xwastina eşkere û xwastina dirkaw’.

### **A.Xwastina Eşkere (îstîfare tesrîhî)**

Ew xwastine ye ku ji du bineretên serekî tenê lêxwastiraw (mûstîfare mînhû) têda hebe. Mînakên vê coreya helbestê jî li ba Mistefa Begê Kurdî bi şêweyekî gelekî baş berçav dikeve, dema ku helbestvan di vê mînakê da dibêje:

*Rohî xom lê ziwîre daîm, boye wa zarî deka*

*ay çî bêzare bezar, firyadî bîmarî deka*

[D.K, b.yekem,61]

Lêxwastiraw =rûhî xom (canê min), qerîne=zîwir (xeyidîn) û ‘aciz bûn sîfeta mirov e ne beşeke ji laş e.

Di vî wêneyî da peyva ‘rohî xom=ruhê (canê) min’ lêxwastraw e, herwiha boxwastraw (mûstîfare lehû) tune ye bi vê jî bi hoya ladanê ve helbestvan wêneyekî xwastina eşkere nexşandîye, helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Îltimasî kuştinim lê kird, witî nazanî to*

*min çepell nakem le xwênî her segêk da xencerim*

[h.b, 323]

Lêxwastiraw=seg (kûçik) , qerîne (nîşane)=Kûçik qet aşiqî yarên mirovan nabe, belkî tenê mirov aşiqî mirovan dibe, ew aşiqbûna mirovan jî tenê bi du zayendên cuda (nêr û mê) da dibe loma ‘‘seg=kûçik’’ ji bo wateya dirust bikar nehatîye.

Ev wêneyê helbestî wêneyekî xwastina eşkere ye çimkî lêxwastraw (mûstîare mînhû) hatîye û boxwastraw (mûstîare lehû) nehatîye. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Çawekem xo min birîndarî xendegî çawî tom*

*Zar û bîmar û girîftarî kemend û dawî tom*

[D.K, b.yekem, 343]

Lêxwastiraw =çawekem (çavê min),qerîne= çav wek beşek ji laşê mirove loma em nikarin gengeşiyê pê ra bikin û ligel da biaxivin, çimkî eşkere ye ku axaftin ji bo mirov e.

Dîsa ev wêneya dibe wêneyekî xwastina eşkere bi hoya ladaneke watayî.

## **B. Xwastina Dirkaw (Îstîareya Girtî=Îstîare Mekniye)**

Ev berevajîya xwastina eşkere ye, ku boxwastiraw hati be û lêxwastiraw nehati be, nîşane û qerîneya wê jî heye ji bo navbjîwanîya di navbera sîfet û rastîya watayên dirust. Helbestvan di vî wêneyî da dibêje:

*Çaweket bo qetlî min hîç rehm û endêşey nîye*

*hakima mest bê, hemîşe meylî xeddarî deka*

[h.b,61]

Boxwastiraw= çaweket bo qetlî min=çavê te ji bo kuştina min, qerîne (nîşane)=Qerîne wê qebûl nake ku boxwastraw (mûstîare lehû) sîfeta xwe be, belkî ev sîfeta ya lêxwastraw (mûstîare mînhû) ye lê daye boxwastraw, çimkî “çav” kesekî nakuje lê mirov hevdu dikuji.

Ev wêneyekî xwastina girtî ye, çimkî boxwastraw hatîye û lêxwastraw nehatîye. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

Heta diwênê le meclîs taqe gul bûm

ewa (bûm) e, le cêy şêx û melatan

[D.K, b.yekem, 361]

Boxwastiraw=gul bûm , qerîne=gul rihek (nebat) e, nabe mirov.

Dema ku em li vî wêneyî hûr dibin, em dibînin helbestvan li ser hunera xwastin wêneyekî dirkaw (îstîareya girtî) nexşandîye, xwe kirîye “gul” ,herwiha boxwastraw hatîye û lêxwastraw nehatîye. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Dil ewa lomem dekat û pêm dellê Kurdî billê*

*ger şekayetim heqe to bo qisey bêca dekey*

[D.k, b. duyem,270]

Boxwastraw=dil, qerîne= Ji ku (çawa) dil dikare bipeyîve?, loma ev nav hatina “dil” xwastine û ji bo wataya neserekî û nedirust bikar hatîye, çimkî dil beşeke ji laşê mirov.

Ev wêneya jî li ser binemaya hunera xwastin binyata şêwaza xwe danîye , helbestvan sîfeta yara xwe daye dil ku lomekirin e, yara xwe çiwandîye “dil”. Çimkî weke ku eşkere ye sîfeta “lêxwastiraw” daye “boxwastiraw”, loma em dibinin ev wêneya dibe wêneyekî xwastina dirkaw, çimkî “boxwastiraw” hatîye “lêxwastiraw” nehatîye.

Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Hênde bedbexte legell derdekem sebir dellê*

*of Xuda, namirê lekollim bikewê, em çepelle*

[h.b,50]

Boxwastiraw=sebir, qerîne= Çawa şîyana axaftina ‘sebir’ heye? ku ‘sebir’ sîfetek taybete bi hemû mirovan, belkî ew dildar û evîndara helbestvane diaxive.

Ev wêneya bi hoya hunera xwastina dirkaw ve hatîye nexşandin. Helbestvan sîfeta mirov û yara xwe daye ‘sebir’, wata helbestvan di helbesta xwe da amaje bi boxwastiraw kirîye lê lêxwastiraw têda tune.

### **2.4.3.Wêneyê Xaze (Al sure al-mecaziye)**

Xwaze yek ji hunerên ronbêjî ye ku helbestvanên klasik û hevçerx û serdem bi şêweyeke berçav ji bo gihandina wata û mebestên xwe di wêneye helbestî da bikar tînin. Xwaze bikaranîna peyveke xwazrawe (mecazî) ku ji bilî wataya wê ya xwazraw watayeke wê ya dirust jî heye, wata bikaranîna peyveke hele (çewt) ji bo bilî (xeynî) wataya xwe ya ku xwazî ye, loma ji bilî wataya wê ya xwaze watayeke dirust jî ldigel xwe tîne. Wekemînak ku em dibêjin; ‘Darûber girîyan’ darûber wataya wê ya xwazraw e, wataya wê ya dirust jî ‘mirov’ e. Loma xwaze ji ‘bikaranîna peyvekê ji bo cihê wê wataya wê ya ferhengîya dirust ku heye, digel hebûna nîşaneyek ku zimanî be yan jîrî, rêgirîyê bike li wê ku wiha ev peyva weke dirust hatibe bikaranîn û misoger bike ku divê ji bo wataya xazeyî bikar hatibe’.<sup>194</sup> Herwiha ji bo dirustbûna wêneyê xaze pêwîstî bi çend bineret (binema) heye ku pêwîste hebin ku ev in.

**Wataya Dirust:**Ji wataya serekî û dirust pêk tê ku peyvek yan watayeke ji bo tê xwestin.

**Wataya Xwazraw:**Wataya duyem e ku bi wataya neserekî tê.

**Pêwendî:** Merc û binereteke girînge ji bo ronkirina (zelalkirina) pêwendîya di navbera wataya wê ya xwazrawe û wataya dirust.

---

<sup>194</sup> -Îdrîs Ebdulla Mistefa, *Layene Rewanbêjîyekan Le Şî’rî Kilasîkî Kurdî da Be Nimûney Hemdî û Hacî Qadirî Koyî*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2011, 163-164

**Qerîne (nişane):** Pêwistiyeke serekî ye ku wataya xwazraw ji bo wataya dirust ron bike, herwiha rêgirîyekê dike ku peyva xaze ji bo wataya xwe ya dirust bikar hatibe.

Mistefa Begê Kurdî di vê coreya şêwaza wêneyê helbestî da gelekî jîr û jêhatî bû, ji ber wê emê bi pê hunera xaze ya ronbêjî ku çend coreyên wê hene hinek mînakên helbestên wî têxine rû û şîroveya wan bikin, wekemînak helbestvan dibêje:

*Rûy hezar dad û fixanî ta dekem lêm nabiyêt*

*sengdil axir behallî min terrhum key deka?*

[D. K, b.yekem, 51]

**wataya xwazraw**=hezar dad, wataya dirust=zor girîyan, pêwendî=jimare, qerîne= hezar dad û fixan nişaneyê ji bo ‘gelekî girîn’, ji ber wê wataya dirust ‘zor giriyane=gelekî girîn’ e, wataya xaze jî jimare ye.

Ev wêneya li ser şêwaza hunera xaze bi pêwendîya jimareyî hatîye nexşandin.Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Pertewî arîzî yar û dillî sed pareyî min*

*qeyseyî şewqî mehû çakî ketane be ‘Umer*

[h.b,146]

wataya xwaziraw= dillî sed pareyî min, wataya dirust= dill rencanî zor, peywendî=jimareyî, qerîne=Çawa dibe eger dil sed parçe be mirov bijî.

Ev wêneya jî li ser şêwaza hunerî ya xaze bi pêwendîya jimareyî hatîye nexşandin.Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Dil le mîhnet keyile meylî seyrî naw şarim nîye*

*herdû çawim xwênî tê zawe le daxî turkan*

[D. K, b.yekem,39]

Wataya xwazraw= naw şar (navenda bajêr), wataya dirust=gelê bajêr, peywendî=cihî (şiwênî), qerîne=Navenda bajêr nikare bibîne, çimkî çavê cî (şûn) tune, gelê bajêr dibînin çimkî çavê wan hene.

Ev wêneya jî li ser şewaza hunerî ya xwaze bi pêwendîya jimareyî hatîye nexşandin. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*'Eceb mawim, be gul bo baxî lîmokat derrazênî?*

*be mêxek bend û go û simll û xenawke bo denexşênî?*

[D. K, b. duyem, 243]

wataya xwazraw= baxî lîmokat, wataya dirust=sîngî afret (sînga jînê), pêwendî=cihî, qerîne=Gerdan ji bo sînga jînê ye, ne ji bo bax e.

Ev wêneya jî li ser şewaza hunerî ya xaze bi pêwendîya jimareyî hatîye nexşandin. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Bo minî bêkes, xuda, emrro, çi rojêkî reşe*

*axo kê neyhêstuwe ya zîze yar le lemnî hejar*

[D. K, b. yekem, 131]

wataya xwazraw= rojêkî reşe, wataya dirust= katêkî naxoş (demeke nexweş), peywendî=demî, qerîne=Reş hêmaye ji bo demeke nexweş, ne ji bo roja reş.

Ev wêneya jî li ser şewaza hunerî ya xaze bi pêwendîya demî hatîye nexşandin. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Hîcrî ke heta heşir denallênê le hesret*

*aşubî zemen fitneyî afaq Xuda wey*

[D. K, b. duyem, 280]

wataya xwazraw= heta heşir, wataya dirust= katêkî zor (demeke pir yan zêde), peywendî=demî, qerîne= Mîrov nikare heta Roja Qiyametê binale, çimkî temenê mirovan kin e û besî heta wê rojê nake.

Ev wêneya jî li ser binemaya hunera xwaze bi pêwendîya demî ve hatîye nexşandin

#### 2.4.4.Wêneyê Dirkeyî (El-sure el-kînaye)

Dirke (metonîm) ku ser bi hunera ronbêjî ye her digel dirustbûna şaristaniyet û firehbûna bîr û hizra mirov û geşeya ziman dirke cihê xwe di nav zar û zimanê pirranîya gelên cîhanê vekirîye, bi şêweyeke ku bûye pêdivîyeke serekî ya axaftina rojane. Ev jî ji bo zêdetir ronkirin (zelalkirin) û têgihîştina wataya tiştên derdorê da di pêwendîya navbera takekesan ku di dema axaftinê ji bo hemû astên pêwendîyê ye. Tişteki ron û eşkere ye ku ‘ereban gelekî giringî dane vê hunerê bi taybetî digel hatina Qur’ana Pîroz, di nava kurdan da jî bi şêweyekî berçav dirke ji alîyêji alîyê helbestvan û kêsên jîr û zana bikar hatîye.

Loma wiha pênaseya ‘dirke’ hatîye kirin; ‘*Peyvek yan komek peyvin ku wataya wan ya dirust hebe, her di wê demê da di hevokê da watayeke din ji bide dest. Mebest ev wataya bi vê dawîyê (paşê) be dîsa dikare wata û nejada wê ya dirust mebest be çimkî tu (hîç) nîşaneyek nîye dijayetîya wê bike ku wataya wê ya nejadî mebest be*’.<sup>195</sup> Wata mebesta serekî ji dirke derbirîna hevokê ye ku wataya wê ya veşartî hebe, wata gelek car derbirîneke eşkere û watayeke eşkere rêgirîyê lê tê kirin, îjar bi her şêwazekê be û ji ber hokarekê be loma helbestvan yan nivîskar dirke di nav berhemên xwe da bikar anîne. Wekemînak gelek peyv û hevokên nerêk (bê rêkûpêk) û neşêrîn hene ku giran e nabe bi şêwazeke eşkere werin derbirîn, ji ber wê ye helbestvan û kesên jîr û zana ji bo ciwan kirina wêneyê helbestî û herwiha ji bo bihêzîya axaftina di navbera wan da dirke bikar tînin.

Di pênaseyek din da ; ‘*dirke;hunereke ronbêjî ye û ji alîyê qiseker (axiver, peyiver) ve bi dirkandina (kînayekirina) watayekê ji bo tiştê yan kesekî yan kesekê pêk tê, ku ev wataya dirkeyî watayeke dûrî vê babetêye lê di heman demê da dikare*

<sup>195</sup> -Ezîz Gerdî, *Rewanbêji Le Edebî Kurdî da*, Çapxaney Dar el Ca’ hiz, Çapî Yekem, Bergî Yekem, Bexda, 1972, r88

*bi wataya nêzikî xwe ve digel wê wataya dûr yek were girtin (yek bigrin), çimkî tu (hîç) nîşaneyek diyar nîye ku ji bo wê kîjan wata mebeste*”.<sup>196</sup> Wata divê di dema ronkirin û gihandina peyama di navbera takekesan û deqên wêneyê helbestî şewaza peyv û hevokan bi pê pêwîstîya dem û cî (şûn) bête (were) kirin, wata divê navê ajal yan darûber...hwd. were bikaranîn. Ev jî herwek me got ji bo mebesta wataya dirust û dirke ye, herwiha tiştê ku dirke ji xwaze cuda dike ew jî nebûn û nîşane ye ku di dirke da nîye lê di xaze da heye.

Weke mînak dema ku em dibêjin: “Em piyawe natwanêt biçête jûrewe ta dergay bo gewre neken= Ev peyaya (mêrik , zîlam) nikare biçê hundur ta derî ji bo wî mezin nekin”. Ev dirke ye, wataya dirkkirî ewe ku “mîrovekî qelaw e” tu nîşaneyek nîye ku rêgirîyê li wataya wê ya dirkkirî bike, bi berevajîyê ve di xazeyê da weke ku pêştir me bas kir û zelal kir nîşane û qerîneyek heye rêgirîyê li wataya xwazraw dike. Giringtirîn bineretên (bintar, binema) dirike ji “derbirîna dirkkirî” û “wataya dirkkirî” pêk tên, Mistefa Begê Kurdî jî bi jîrî û helbestvane ve ev hunera di helbestên xwe da bikar anîye, ji ber wê emê mînakên helbestên helbestvan têxine rû û şîroveya wan bikin.

Helbestvan di wêneyekî da dibêje:

*Leb teşneyî bo sêke lew damenî pakî to*

*manî mebe lem xêre, destî min û damanit*

[D. k, byekem,82]

derbirîna dirkî=destî min û damanit=deste min û dawa te, wataya dirkî=tika dikim

Dema ku em li ser vî wêneyî hûr dibin, helbestvan bi şeweyeke wêjeyîyane û hejarane bi şewazeke dirkî li ber yara xwe digere û doza xêra evîndarîyê dike bi peyva “tika=rîca” .

<sup>196</sup>-Derya Cemal Hewêzî, *Wêney Rûnbêjî Le Komele Şî'ri (Şehîd Be Tenya Piyase Dekat) î Qubadî Celîzade da*, Çap û Bilawkirdnewey Silêmanî, Silêmanî, 2009, r240



Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Bakim nîye murxî dill bikey be kebab emma*

*bîde be seg meyde derxurdî reqîbanit*

[h.b,91]

derbirîna dirkî=bîde be seg=bide kûçikan, wataya dirkî=mede derxurê dujminên xwe.

Wata; Kûçik (seg) ji mirovên dujmin wefadartir e.

Helbestvan hunera dirke gelekî bi ciwanî bikar anîye, wefaya kûçik ji ya mirovên dujmin baştir zane, diyare di vî wêneyî da “kûçik” jî weke hêmayeke dost û bi wefa ji bo hunera dirke bikar hatîye.

Helbestvan di mîna keke din da dibêje:

*Dulberî wa be kemal û eqil û daniş kem heyê*

*wam dezanî bê kemal e, çunke tîfl e û xurde sal*

[h.b,271]

derbirîna dirkî=tîfle û xurde sal, wataya dirkî=mêrd mindal û taze helçû (xort û nû gihiştî)

Helbestvan bi rêya hunera dirikî ve wêneyekî ciwan nexşandîye, çimkî bi navanîna “xurde sal” wata temen biçûk e, helbestvan wiha zane ku heşê wî/wê gihiştî nîye wata “kamil” nîye. Lê bi berevajîya bîrkirina (ramana) helbestvan yara wî bi wî temenê biçûk jî gelekî jîr û baqil e ku bûye hoy helbestvan mendehoş (sersam, gêj) bibe

### **3. Çavkanîyên Wêneyê Helbestî Li Ba Mistefa Begê Kurdî**

Çavkanîya helbestan mijareke giring û bihêzîya wêneyê helbestî ye, ji ber wê em dikarin bibêjin heyvanê (hewên, maya) her helbestekê wata ji dayik buna her helbestekê vedigere ji bo çavkanîyekê. Ev çavkanîya jî bêguman weke tiştekî nebirî

ye wata hîna berdewam e û dawî lê nehatîye, herwiha bi berdewamî di nuhbûn (nûbûn) û tazebûnê da ye. Diyare çavkanîya helbestê yan ji nava dile helbestvan diafire yaxud li derdorê, ev jî bi rêya hestên helbestvan ve. Çavkanîyên helbestan keristeyeke ewqas asan nîye ku hemû kes nikare bidest bixe, lê di heman demê da jî ewqas sitûr û giran jî nîye ku bibe tiştêkî nebûyî kes nikari be nîzik bibe.

Pêwîste helbestvan heqîba xwe ya zanyarî tijî bike ji zanîn û zanyarîyan û berdewam be li xwendina hemû warê mijarên zanistî, wêjeyî, dîrokî û...hwd. Çimkî weke eşkere ye ku tiştêkî bi xwe ve nakeve nav û hundur û derûnîya helbestvan, ji ber wê pêwîstîya helbestvan weke xurekê (xwarin û vexwarin) gav bi gav bi têkirin û zêdekirina zanyarîyên xwe heye. Gerçî beşek ciwanî û başî û bihêzîya çavkanîyên helbestvan vedigere ji bo behreyeke (bîrberî, gêrûf, qabîliyet) Xwedayî ku Xwedayê Mezin bexşandîye bi van kesan.

Helbestvan eger bivê (bixwaze) li ser her mijarekê wêneyekî helbestî binexşîne, divê di serî da zanyarîya wan temam hebe li ser wê mijarê û îjar dest bi nivîsandina deqên helbestî bike, eger berevajî be helbestvan çiqas bi şîyan û behremend be jî nikare helbestê binivîsîne. Baştirîn mînak jî ji bo zêdetir ronkirin û rastîya mebest û dirustîya mijara me ewe ku helbestvanên kilasîk hewqasî bi jîrî li zanistên serdema xwe şareza bûn û xwendî bûn ku di çavkanîya wêne helbestên wan da xuya dike (olanê dide) ku heta nika jî digel wan da be ne kevn dibe û ne jî ji nav diçe. Herwiha di pirranîya wan da wêneyên wiha têda ye ku bê wê kes agahdar be cihê xwe di nav civakê û dil û derûna takekesan da vekirine, ji ber wê pêwîstîya çavkanîya helbestan bi zanyarî û zanîneke pirr heye. Eger na helbestvan çiqas bihêz be li berhema wêneyê helbestî qisir dibe, wata nikare yek peyvê binivîsîne ku zanyarîyên pêwîst li ba wî nebin, ji ber wê gelek car ewên wiha dibe ku li helbestvan di encama xwendineke pirr û şîyaneke mezin ya siruştî ku Xwedayê Mezin pê bexşandîye. Her ev jî wiha dike em bibêjin ku ew tiştê helbestvan ji kesên din cuda dike çavkanîya helbestên wane, ku dewê (tenanet) ji helbestvanekî/helbestvanekê bo

helbestvanekî/helbestvanekê û ji serdemekê bo serdemeke din cuda ye. Çimkî li ser helbestvan pêwîste di çavkanîya helbestên wî/wê dahênan û nûjenî têda hebe ku pêştir (berî wan) tu helbestvanekî/helbestvanekê bi wî haweyî (coreyî) wêneyê helbestî nekişandî be. Dema ku zanyarî û zanist bi temamî di mêjîyê helbestvan da be

çavkanîya helbestek pêşbînîya wê rast û dirust ya bûyerên wê hîna rû neda bin diyar dike (dixe rû), **gelek car wiha rêk dikeve ku helbesta helbestvan ji sedsalekê zêdetir hatîye gotin weke dibêjin; ‘kirasekî îro li xwe kiribe’, ji bo îro hatibe gotin hewqas watadar e** ji ber wê em helbestên Mistefa Begê Kurdî li jêrê dabeşî ser du çavkanîyên serekî dikin ku ‘hêsinî=xudî’ û ‘mijarî=babetî’ ne.

### 3.1.Çavkanîya Hêsinî (xudî)

Çavkanîya wêneyê hêsinî taybete bi kesayetîya helbestvan, wata ji yekem roja ji dayik bûnê heta ew dema ku deqa helbestî dinivîsîne pêwendîya wê bi hêsina helbestvan ve heye. Ev hokara dibin hoya ji dayik bûna wêneyekî helbestî hêsina helbestvan ji rûdana bûyerekê pêk tê ku bi ser kesayetîya helbestvan da hatîye. Di encamê da helbestvan bi hest û sozeke wiha di derbarê xwe da dinivîsîne diyarkirina sînore helbestên wî/wê yekalî (yekla) dibe, şewaza derbirîna wî/wê jî bi şeweyê cuda cuda ku hinek car bi şeweyê zimar (lawandinewe) e, hinek car bi şeweya pesn (meth) hinek car jî ji şanazîkirina hêsina xwe pêk tê. Wata yan di rewşeke gelek nexweş û xemgîn da ye yaxud di rewşeke gelek xweş û şad û kamûranî da ye.

Ev şewazana jî di dem û gavek diyarkirî da pêştir rû da ne. Helbestvan bi pê ‘heza (dilxwazî) xwe wêneyekî gelekî bi baskirina hêsina xwe dinivîsîne, wata helbestvan vedigere ji bo dema raborî, wekemînak ; serdema zaroktî, pakî û ciwanîyê ku ev temenê helbestvan tê bîrê bi xweşî be yan nexweşî be di deqeke helbestî ya wêneyê hêsinî ya xwe da dikşîne ku jê ra tête gotin ‘nostaljî’. Nostaljî ; *kirareke tenyayî, yadewerî (yadîgarî) û vejerî (gerraneweyî) ye, ji bo raborî û karekî pasîvîyî (neçalakî) ye çimkî girî, hêsir û herdem retkirina nika ye*.<sup>197</sup> Ev di dema vejerîna raborî (gerranewe rabirdû) .

Herwiha gelek car vetîreyek (dîyarde) bi ber çavê helbestvan dikeve di dema nika da helbesta xwe li jêr hest û soza xwe da wata hêsina xwe dinivîsîne. Ev jî gelek car rizgar bûn e ji wê rewşa ku têda ye, bi taybetî eger di rewşeke nexweş da be, herwiha helbestvan gelek car hesteka taybet divê ku cudaye ji mirovên asayî ev jî pêşbînîkirina bûyerekê yan vetîreyekê ye ku hîna dema wan nehatîye yan rû neda ne.

<sup>197</sup> - Soran Mamend Ebdulla, *Nostalojîya Le Şî'ri Hawçerxi Kurdî da ,Be Nimûney Şî'rekanî: Ebdulla Peşêw*, Enwer Qadir Mihemmed, Sebah Rencder, Çapxaney Taran, Hewlêr, 2016, r31

Wekemînak ‘‘pîrî’’ pirranîya helbestvanan bi hesteke yekcar mezin behsa rewşa taybetî û hêsînîya xwe dikin.

Helbestvanên kurd her ji qonaxa kilasîk heta serdema îro bi hoya siruştîya av û hewayaya xak û nîştîmana xwe li jêr benda dûjmin da bûn, lê dîsa jî helbestvanan bi çeka destên xwe ku ‘‘pênûs’’ e xurtî û qahremanî ji nîştîmana xwe ‘hez kirine. Derdê dile xwe xistine ser rûpelên spî bi şêweyekî hunerî ya gelekî ciwan ku hemû cîhanê sersamê (gêj) vê hunera xwe bikin. Ev li alîyekî li alîyê din pirranîya helbestvanên kurd berdewam di koç û gerê da bûn heta pirrtirîn û zêdetirîn mijaran beyan bikin bi taybetî di warê çavkanîya hêsînî ku bi hoya awarebûn û dûrîya ji xak û nîştîmana xwe gelekî bandor li wan kirîye. Herwek me amaje pê da hemû wêneyên hêsînî yên helbestvan olandana jîyana wan ya taybete bi hemû xweşî û nexweşîyên xwe ve, ji ber wê Mistefa Begê Kurdî ji çavkanîya hêsînî bêpar nemaye. Helbestvan di mînakekê da dibêje:

*Kewtime wez’î nez û xem xistmiye hallî xerxere*

*Kurdî bêkes xom le hîç layê seday şînim nehat*

[D.k,b. yekem, 115]

Helbestvan wêneyî da çavkanîya helbesta xwe ji hêsîna xwe wergirtîye, ev jî bi hoya wê dikeve ber sere merg (ketiye ber sîkratê) ku xem û xefetê jî ew xistiye dema ruh danê. Kurdî bi şêweyekî zimarî (lawandnewe) behsa xwe dike ku di vê mînakê da ‘‘Kurdî’’ çî weke hemû kurdek çî weke bernavekê ji bo xwe bikar anîye dibêje; ‘‘hênde bêkes bûm lew kate da kes be hanay derd û şîwenekem nehat=hewqas bêkes bûm di wê deme da kesek bi hawara derd û şûna min nehat’’.

Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Felek rehmê be halim ke, be xayet dill perêşanim*

*rehendey zêd û mesken dûr le yar û qewm xwêşanim*

[h.b, 326]

Helbestvan dîsa wêneyekî hêsînî (xudî) nexşandîye, bi hesteke tijî soz ve li ber Xwedê digere (du'a dike) ku li hawara rewşa wî were ku di nexweşîyê da ye, ev jî bi hoya awarebûn (koçber bûn) û derbederî û dûrîya ji xizm û mirov û kes û xak û nîştîmana xwe ye. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Kurdî dilêrî 'erseyî nezm û fesahet e*

*cewlan deka hemîşe weku berqî têjirrew*

[h.b, 536]

Dema ku em li vî wêneyî hû dibin em dibînin helbestvan li ser binemaya şanazîkirin bi hêsina xwe çavkanîya wênehelbesta xwe ji hêsina xwe wergirtîye. Şanazîyê bi wê dike ku Kurdî di qada hûnandina helbestê da gelekî xurt û bîhêzî hatûçoya hunerîyane dike û bi zimanekî paraw (vekirî) û ron (zelal) dinivîsîne, helbestvan bi hoya hunera lihevçiwandinê ve xwe çiwandîye "brûska ewran" bi bihêzî, lezî û bi bandorî ku bi vî şêweyî:

Lêçû=helbestvan, lewçû=birûsk, ewzar-amraz=wek, rûyê lêkçûnê=lezî (xêrayî)

Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Nefsî Hîcrî berze, boye razî xoy nallê bexîr*

*sikkeî sahbqiranî çun behay payîn nîye*

[D.K,b.duyem,536]

Helbestvan b rêya bernavê xwe ve şanazîyeke mezin bi hêsina xwe û binemala (malbat) xwe dike, her ev jî bûye hoya wê ku em bibêjin; "çavkanîya helbestên helbestvan hêsînî ye", çimkî helbestvan xwe weke kesekî nefis bilind danîye û malbata xwe jî weke "diravê zêr" danîye ku ev jî nîşaneyê ji bo nirxa bilind, ji ber wê xwe û binemala xwe weke kesên bilind û payedar danîye. Eger em bala xwe di derbarê çavkanîya hêsînî bidin ser helbestên Kurdî, em dibînin ku pirranîya helbestên wî li ser şêweyên şanazîkirin, zimar û bergerîn û gazind da ne, ev jî çend hokarên wê hene. . **1-** Ji malbateke binavûdeng bû, **2-** Ji ber hoya koçber bûn û dûrîya ji welêt.

### 3.2.Çavkanîya Mijarî (Babetî)

Çavkanîya mijarî hemû ew mijarin ku dikevin derveyî sînorê hêsina helbestvan, dîsa hest û soza helbestvan roleke serekî dibîne di wênehelbestên xwe da. Lê vê carê li şûna behsa hêsina helbestvan bike weke çavkanîyeke mijarî sûdê ji vetîreyên serdest yên serdema xwe werdigrin û dikin deqeke helbestî û mebest û armanca helbestvan hinek car bi eşkere û hinek car jî bi şêweyekî veşartî tê beyan kirin. Wata helbestvan sûdê ji vetîre û bûyerên mijarî werdigre ji bo nexşandina wênehelbestên xwe ku ji derdorê û ew jîngeya têda dijî yaxud ji derveyî sînorê jîngeya xwe. Ev çavkanîya mijarîya ku helbestvan sûdê jê werdigre helbestvan dixê ser giranîyê ji bo ew asta bilind û dewlemendî û bihêzîya wênehelbestên helbestvan derbixe, çimkî tu guman têda nîye helbestvan baş û xurt dibe li hemû waran da ku wênehelbestên xwe hebin. Diyare bi hêsanî destê helbestvan nagihêje çavkanîya van mijarana jî ku şarezayîya wan ya baş nebe di derbarê ew mijarên dinivîsîne, wata dema ku helbestvan li ser mijara dîroka gelekî (millet) dinivîsîne, divê şarezayîya helbestvan hebe li ser ziman, kevneşopî, dabûnerî û hemû tiştên wî gelî. Ji bo wê ku xeyalên helbestvan dûr biçê û mewdaya wê kurt nebe, bêguman helbestvan wê demê di nexşandina wênehelbestên xwe da serkeftî dibe ku çavkanîya wê ji mijareke diyarkirî wergirtîye.

Gerçê dahênana helbestvan di serî da ji çavkanîya hêsinî destpê dike, paşê jî gavê davêje ji bo çavkanîya mijarî û di vir da dahênana helbestvan mezintir û balkêştir dibe. Çimkî helbestvan ji bîra xwe ya takekesî gavê davêje ji bo bîra giştî ya kesan, çavkanîya mijarî vedigere ji bo rewşa helbestvan bi pê temenê helbestvanên ku di wê serdema têda dijî. Çimkî her serdem cudaye digel serdemên pêş xwe yaxûd yên paş xwe, wekemînak helbestvanên kilasîk di jêrdestê rejîma derebegayetîyê da bûn, paşê di qonaxa hevçerx çavkanîya helbestan mijarên xwe di ‘‘bîra azad’’ da dibînin. Di serdema nika da jî çavkanîya mijarên wênehelbestan digel hemû bîrên netewî û civakî, teknolojiya pêşketî çavkanîyeke mijarîya serekî ya pirranîya helbestvanan e. Bêguman çavkanîya helbestên mijarî di qonaxa kilasîk da ji helbestvanekî yan helbestvanekê bi helbestvanên din cuda ye, herwiha çavkanîya mijarî ji qonaxekê bo qonaxeke din cudatir e. Ev jî ji ber gelek hokarin ku çend ji wan ; Neteweyî, siruştî, siyasî, civakî, pêşketina teknoloji ...Hwd.

Ji ber wê emê coreyên çavkanîya mijarî di helbestên Mistefa Begê Kurdî da destnîşan bikin ku di çend mijarên diyar yê serdema wî û li jêr bandora taybetîya xwe ku ev coreya çavkanîyê di berhemên xwe da bikar anîye wekemînak: Bandordar bûn bi wêjeya hevserdema xwe û folklor, ayîn (dîn), kesayetîyên navdarên serdema xwe û hemû ew behsên ku çavkanîya mijarên wênehelbestên wî jê berhem anîye, bi şêwaz û zimanekî zelal û eşkere ji bo dost û hevalên xwe nivîsîye.

### **3.2.1. Çavkanîya Neteweyî (Xwemalî)**

Çavkanîya neteweyî ji hemû tiştên ku taybete bi xak û nîştîmana helbestvan pêk tê, wata helbestvan dema ku çavkanîya helbestên ji mijareke xwemalî yan neteweyî berhem tîne, ev jî me têdigîne ku em bibêjin mor (xitim) û rengê nîştîmanîya helbestvan e ku bi hemû rûyên Xwe ji hemû corê sîfetên bêgane dûr e wata hemû ew sîfetên bêgane têda xuya nakin. Helbestvan çavkanîyên xwemalî yan neteweyî ji nav jîyana rojaneya gel werdigre, ev çavkanîyanan jî; cihekî (şûneke) pîroz be yan tîtik mîtikên (kelûpel) alava be yan kevneşopî û folklor a gele xwe be yan dîroka neteweya xwe be yaxud gotinên pêşîyan be... Hwd, helbestvan weke keresteyek baş û ciwan çavkanîya helbestên xwe ji wan dinexşîne. Ev çavkanîyên xwemalî çiqasî gelek bin helbestvan ewqas sûdê ji wan werdigre, wekemînak ; di warê cotkarîya neteweya kurd da gelectirîn û baştirîn core, keriste û alav û amûr hene, ev jî dibin alîkarekî baş ji bo helbestvan di derbarê çavkanîyên wêneyê helbestî. Bêguman ji bîlî wan wêjeyeke bilind û bihêz ya kurdan heye, di heman deme da jî çavkanîyên neteweyî gelekî pirr hene vê jî wiha kirîye helbestvan bi şêweyekî berçav wan bike çavkanîyên helbestên xwe. Li jêrê emê wan bi pê coreyên çavkanîyên neteweyî destnîşan bikin.

### **Çavkanîya Wêjeya Kilasîk (Helbestvanên Hevserdem)**

Dema ku em behsa serdema Mistefa Begê Kurdî dikin, bêguman bîr û rastî vedigerin ji bo seretayê nivîsandin û dahênana helbestê li Kurmancîya Jêrê (Navîn) bi Şêwezarê Soranî ku Nalî, Salim û Kurdî weke ‘‘Sê kuçkeyên Baban’’ di dahênana helbestê da binavbang in. Çimkî di serdema wan da kes bi wê şêweyê bihêz û bandordar nebûn, ji ber Nalî weke ‘‘rêvebir û pêşengê’’ vê ekole tê qebûlkirin, paşê Salim û dawîyê jî Kurdî bi heman şêweyê her du helbestvanan bi vê rêçikê girtîye. Ev rêzbandîya jî her wiha ji xwe ve nebûye, belkî dîroka ji dayîk bûna wan belgeyeke bihêz e ku Kurdî ji her du helbestvanên din biçûktir e. Her ev jî wiha dike em bîbêjin Kurdî di bin her bandorekê da be çavkanîyên baş ji helbestên van her du helbestvanan wergirtîye,

Herwiha divê em behsa xalek din ya giring bikin ew jî ; wêjeyek hebû li Bajare Silêmanîyê pêş vê ekolê (rêbaz) ku bi Şêwezarê Goran wata Hewramî ku digel dahênana helbestê bi Şêwezarê Soranî ji aliyê Nalî. Ev ekola herwek çawa pêşeng bûn di dahênana helbestê da bi heman şêweyê digel vê ekola nû jî her berdewam bû, lê li sere sedsala nû wata sedsala nozdehem ya zayînî Şêwezarê Soranî baladestîya (serdestî) xwe diyar kirîye, pîrranîya helbestvanan ketine vê rêçikê wata ev ekola di berhemên xwe da bikaranîne.

Xaleke din jî ewe ku wiha Kurdî neketîye bin bandora wan helbestvanan gerçi helbestek wî bi şêwezarê goran heye, ji bo rastî û dirustîya behsa me divê derbarê Dr. Marûf Xeznedar dibêje: ‘*Eger bi zanistî lêkolîn li ser wê berhema wêjeyî bête kirin ku ev du diyalekt ketine nav hev bi zelalî ji bo me eşkere dibe tu corê pêwendîyê tune di navbera helbestvanên her du alî. Bi berevajî ew helbestvanên bi diyalekta kirmancîya başûr helbestên xwe gotine pêwendîyêke bihêz di navberan wan da hebû û behsa hev kirine, herwiha ew helbestvanên ku bi diyalekta goran jî helbest gotine pêwendî di navbera wan da jî hebû. Ji bo belgeyê pêwendî di navbera Mewlewî û helbestvanên derdorê xwe da hebû ku helbestên xwe bi diyalekta goranî gotine, di vir da ew tê zanîn ku dostayetî di navbera Mewlewî û Mehwî da hebû. Dibe ku hokara ev her du helbestvan nêzikî hev kirîye ewe ku Tariqata Dewrêşî Ya Neqşbandî ye, lê li rûyê hunera helbestê û dahênana wêjeyî da tu pêwendî di navbera wan da*



*tuneye*”.<sup>198</sup> Seretaya bandora Nalî (1800 -1856 z.) bi ser Kurdî da ji bo wê wêjeya bilind vedigere ku Hebû, wata bi bandorê gelek car helbestvan peyvek di nîvdêr yan jî helbestê da ku bi teqlîda wan xistiye nav helbestên xwe. Ev bandora bi eşkere di helbestên Kurdî da xuya dikin, gerçî Kurdî bi eşkere navê Nalî neanîye lê bandoreke wî ya yekcar mezin hebû li ser Kurdî, wekemînak Nalî dibêje:

*‘‘Legell murxî çemen Nalî denallê*

*Key’nî aşiq û hem ferd û ferdîn’’<sup>199</sup>*

Dema ku em bala xwe didin vî wêneyî , Nalî behsa xwe dike ku bi hoya tenêbûna xwe rastî nalîn û girî hatîye ku bêyar e, weke çivîka nav daran. Di mînaka Kurdî da ku şeweya bandorê şeweyeke sade ye dema ku dibêje:

*Le kuncî bêkesî da ferdim emrro*

*zelîl û zar û bê hemderdim emro*

[D. K.byekem, 472]

Kurdî hatîye wêneyekî nêzikî ya Nalî kişandîye, em dibînin peyva ‘‘ferd’’ wata ‘‘bi tenê me’’ di her du wêneyan da heye, herwiha nale û zar û giryan di her du wêneyan da xuya dibin. Hawar û nalîna wan jî ji bo kesên evîndar e ya Nalî ji bo yara wî ye, ya Kurdî jî ji bo Salimê helbestvan û pismamê wî ye û ji ber dûrîya wî ev helbesta gotîye.Nalî di wêneyekî din da dibêje:

*‘‘Aşiq dellê; ‘‘Nabê ke bida xoy le dawim*

*zulfîm ke hemû dawê, hemû daneye xalim’’<sup>200</sup>*

Nalî di vî wêneyî da behsa yara xwe kirîye bi peyvên ‘‘daw’’ û ‘‘daneye xalim’’ û ‘‘rûy yar=rûyê yarê’’, bi heman şewê dîsa Kurdî wêneyekî helbestî li jêr bandora çend peyvên Nalî da nexşandîye bi şeweyekî sade, dema ku dibêje:

---

<sup>198</sup> -Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Sêyem, b.n,r253

<sup>199</sup> -Mela Ebdulkerîm Muderîs, û Fatîh Ebdulkerîm: *Dîwanî Nalî*,b.n,r363

<sup>200</sup> -h.b,r296

*Be (daw)î zulif û (dane)y xalî ser rût*

*giriştare dilî sed aşiqî rût*

[D.K, b.yekem,111]

Herwek di helbesta wî da jî diyar dibe li jêr bandora Nalî çavkanîya wênehelbesta xwe nexşandîye, bi heman şeweyê Nalî wesfa yara xwe dike û bi peyvên “daw” û “dane xallî” û “rûy yar” behsa wê dike. Mistefa Begê Kurdî herwek me amaje pê kir li jêr bandoreke bihêz ya Nalî da bû, her ji ber wê beşek baş ya çavkanîya helbestên xwe jê nexşandîye, ev jî li dû wê ku hinek helbestên Kurdî li jêr rewşa bandorê derdikeve diçine nêzikî qonaxa zarjêkirina (lasayîkirdnewe, teqlîd) Nalî. Herwek Dr. ‘Ebdulla Xidir amaje pê kirîye ku di mînakekê da wê rastîyê ji bo me zelal dike, dema ku dibêje:

‘Nalî dibêje:

*‘Fîday dest û kemanit bim be tîra*

*depêkî sê û du hem taq û hem cût*

‘Kurdî dibêje:

*Fîday dest û kemanit bêt Kurdî*

*depêkî sê û du hem taq û hem cût’<sup>201</sup>*

Dema ku em bala xwe didin ser vî wêneyî em dibînin ewqas nêzikî hev in ku pîrranîya peyvên di nav her du wêneyan da heye, ji bilî peyvên “tîr” û “Kurdî” ku “tîr” Nalî bikaranîye “Kurdî” jî navê xwe bikaranîye. Ev coreya bandorê yekem wêne nîye ku helbestvan çavkanîya wêneyê xwe jê wergirtibe, belkî di çend wêneyên din da jî dúbare bibe bi taybetî di wasîyetname û xatir xwestina xwe da ku Kurdistanê terk dike.

---

<sup>201</sup> -Ebdulla Xidir Mewlûd, *Karîgeriy Şa’îranî Kilasîkî Kurd Le Ser Yektir da*, b.n,r9-10

‘Nalî dibêje:

*Refîqan! Min ewa royim le latan*

*le mezlûman bila çol bê wilatan*’,<sup>202</sup>

Bi heman şêwe Kurdî ku dest bi wasîyetnameya xwe dike, demekê divê biçe Îranê dibêje:

*Refîqan min ewa royim le latan*

*le mezlûman bila çol bê wilatan*

[D.K,b. yekem,360]

Ew bandora Nalî li ser Kurdî ku di van her du wêneyan da xuya dike ewe ku Kurdî bi heman şêweyê Nalî wasîyetnameya xwe nivîsandîye, ku her du jî hevalên xwe agahdar dikin li çûyin û bicîhîştina nîştîman. Ji ber wê her du jî diway xêr deken bo nîştîmana xwe, pêwîste em wê jî bibêjin Kurdî di vê wasîyetnameyê da deq bi deq zarî (lasayîkirdnewe) Nalî nekirîye çimkî helbesta Nalî ji heft dêran pêk tê ku ya Kurdî ji panzde dêran pêk tê lê li jêr bandoreke bihêz çavkanîya helbesta xwe ji Nalî wergirtîye.

‘Nalî dibêje:

*‘Mellên kellî nebuwe rûy cehennem!*

*serim qellxane bo tîrî qezatan*’,<sup>203</sup>

Nalî ji wan ra dibêje ; ku diçim ji min ra mebejin ‘biciheme! kêr û sûd û wefaya te nebû, bi rastî hûn digel min xerap jî bûn her eve bûye hoya wê ku ez vî bajarî terk bikim, lê dîsa di rastî da welêt bicî dihêlim lê dîsa jî sere min li rêya xak û nîştîman feda ye, loma ez sere xwe dikim mertal ji bo tîrên dujminên we’.

Kurdî dibêje:

<sup>202</sup> - Mela Ebdulkerîm Muderîs, û Fatîh Ebdulkerîm: *Dîwanî Nalî*,b.n,r328

<sup>203</sup> -h.b,r329

*Ke min royim cehennem pîrr meken lêm*

*le min xallî meken koşk û seratan*

[D. K,b. yekem,361]

Kurdî bi heman şeweyê Nalî dibêje ; ‘‘ku çûm cîhanê li min mekin dojah û herwiha min ji bajarê min jî bêpar mekin û gelên bêgane neynin bajarê min, diyare Nalî û Kurdî dozê li gele xwe dîkin piştê bidin hev, ne dujminên xwe. Belgeyeke din ya bihêz ku sedî sed Kurdî eşkere dike bandora Nalî li ser wî hebû ewe ku nivîsandina ‘‘Pênc Xiştekî’’ yek e li ser helbesta Nalî ya bi navê ‘‘Ey Harîp’’ e. Kurdî di vê wênehelbesta xwe da heft malik nexşandîye ku her malikek wê pênc nîvdêr e, sê nîvdêrên yekem yê wî ne her du yên din jî yên Nalî ne. Em weke balkêşîyekê bandorbûn û çavkanîya helbestên Kurdî bi tenê yek malikekê werdigrin, Kurdî bî vî şeweyî dibêje:

*Gahê be dû’ a rû dekeye qîbleyî hacat*

*gahê le re’îyet debiye mergî mucafat*

*nakey le dila qet be ebed fikrî mukâfat*

*‘‘ey camî’îy dunya û qiyamet be xeyalat*

*ew roje ke mirdî ne ewit bû ne emit bû’’*

[D.K,b.yekem,431]

Helbestvan di vê pênc xiştekî ya xwe da ku digel helbesta Nalî tevlihev kirîye coreke zimarî têda xuya dike, ewa ku behsa wê hate kirin bandora Nalî bû li ser Kurdî da. Îjar ew helbestvanê ku di serdema wî da bû û bi pê çavkanîyên dîrokî jê mezintir bû ku bi (weke) helbestvanê duyem dihate qebûlkirin û Kurdî çavkanîya helbestên xwe jê wergirtîye û helbest ji bo wî gotîye herwiha bi eşkere navê wî anîye ku kurê apê wî ye wata pismamê wî ye ku Salim (1805-1869) e. Pêwîste em wê bibêjin ku ev helbestvanên ‘‘Sê kuçkeyên Baban’’ bi şeweyê mîlên demjimêrê bi dû hev da hatin, tevlihbûna xizmayetî (merivtî) û hevaltîya Kurdî gelekî bihêz bû digel

Salim ku gelek helbest ji bo wî gotîye û gelek name bi helbestî jê ra şandîye. Yek ji wan nameyan bi navê “Muştage Dillim” da di dêra yekem da dibêje:

*Muştage dillim lew demewe çolle meqamit*

*bo bîstinî eş'arî pîrr û xoşî kelamit*

[h.b 77]

Pirranîya namehelbestên (nameyên helbestî) Kurdî ji bo Salim ji ber hoya dûrîyê bû, Kurdî gelekî dixwaze Salim bibîne ji ber wê jê ra dibêje; “dillim toy dewê= dile min doza te dike” ji bo wê ku dîsa guhdarîya helbestên wî yên ciwan û xweş bike, paşê di dêra dawîyê da Kurdî dibêje:

*Me'hirumî serî (lutf) î e (bîmar) î ye (Kurdî)*

*boyê ke serî (Salim) e le hîcranî be samit*

[h,b 338]

Helbestvan bi hoya zimarekê ve dibêje ; “bêbeşim le bînî balay Salim=bêparim ji dîtîna bejna Salim” ku bi navê “bîmar” navê wî anîye, di nîvdêra duyem da dibêje ew nexweşîya hemû ji ber dûrîya Salim e. Bernavê wî yê yekem “Salim” e ev bernavê wî ji ber wê bû ku di demeke dirêj da gelekî nexweş bû, paşê ku baş dibe bernavê “Salim” ji bo xwe datîne. Bandora di navbera wan da gihîştîye wê radeyê ku helbestan bi hevdu ra binivîsin, herwiha di zelalkirina mezheba xwe jî Salim dike gewahîder wata şahîd bi navnîşana “Refîqî kuncî mihnet=Dostê kuncikê mîhnetê”, weke di vê mînakê da dibêje:

*Refîqî kuncî mihnet, 'acizin her şew le nallînim*

*gurêzanin le ber lêşawî mewcî ba'hrî esirînim*

[h.b, 1338]

Kurdî her di serî da rewşa xwe eşkere dike ku di nexweşîyê da ye û bi tenê ye, ji ber wê hevalên wî jê direvin , ev jî ji ber wê ye ku ewqas girîyaye ku ji hêsirên çavê wî derya dirust bûye (çê bûye), di dêrên din da dibêje:

*Hezar xozgem be xot dûrî le şarî pirr bela û mihnet*

*le firset da minîş helldêm le tellxîy şarî şîrînim*

[D.K, b.yekem,338]

Kurdî bi hoya dûrîya ji Salimê helbestvan helbestekê ji bo wî dinivîsîne û behsa derdê dilê xwe dike ku bêzar e û dixwaze ew jî koç bike, çimkî weke ku di helbesteke wî da xuya ye Salim li Îranê ye. Her weke ku di serî da me got Kurdî behsa rewşa nexweşîya xwe dike, paşê jî bi vê dêrê ve jê ra dibêje ku ; ‘çakit kirduwe,dûrî le şarî pirrxem û derd=te baş kir dûrî ji bajarê tijî xem’, îcar jê ra dibêje ; ‘minîş le derfetêk dême lat, ledest şarî pirrxem helldêm=eze jî di derfetekê da werim ba te,ji deste bajarê tijî xem direvim’. Paşê di heman helbestê da dibêje:

*Eger mumkîn nebû weslit ke min mirdim wesiyet bê*

*lebatî qewm û xwêşanim, le ser qebriim bike şînim.*

[h.b, 338]

Dema ku em bala xwe didin vê dêrê, em dibînin û ji bo me gelekî zelal dibe ku pêwendîya di navbera Kurdî û Salim çiqas bihêz bû, dema ku jê ra dibêje; ‘eger nemtiwanî bitbînim û mirdim, wesiyet bêt le cîyatî hemû xizm û kesim wer ser qebriim şîn û roro bo bike=eger nikaribim te bibînim û mirim, bila wasîyet be ji dêla (li şûna) hemû kes û merivên min were ser gora min şînê bike’. Helbestvan di dêra dawî da eşkere navê Salim tîne û dibêje:

*‘Ebes Kurdî melayik dên depirsin îtîqadatim*

*ke Salim xoy dezanê min le ser kam mezheb û dînim.*

[h.b,338]

Kurdî dûbare dike, di dêra dawî da navê Salim tîne û eşkere dibe ku helbesta xwe ji bo Salim gotîye. Herwiha çavkanîya helbesta wî Salim e, loma dibêje; ‘eger melayket lêm bipirsin bîrubawerrim ewa Salim dezanê ke wa mezhebim çîye û dînim çîye=eger ku ferîşte hatin û bîrûbawerîya min ji min bipirsin, Salim dizane ku mezheb û dînê min çî ye’. Helbestvan bi hoya pêwendîya xizmayetî hevaltîyê ya di

navbera wan da weneyekî helbestî yê ciwan nexşandîye ku çavkanîya helbestê Salim e. Paşê Salim vê helbestê dixwîne û bersiva Kurdî dide bi helbesteke tîjî bergerîn, hest û soz, pêwîste em wê jî bibêjin ku Kurdî gelek helbest ji bo Salim nivîsandîye, gelek caran jî Salim bersiv ji bo Kurdî nivîsandîye. Di mînakeke din da Kurdî dibêje:

*Şeyxetnî bihicrîke û wella sûbe*

*rehmet birale bo key û, cewirt heta be key?*

[D.K, b.duyem,256]

Kurdî bi tevlihevkirina zimanê kurdî û ‘erebi ve dîsa helbestek ji bo Salim nivîsandîye ku têda dibêje ; ‘pîrit kirdim e ey kurre law be hoy dûrîte=te ez kal (pîr) kirim ey kûro lawo bi hoy dûrîya ji te’, di nîvdêra duyem da dibêje ; ‘soz û bezeyit bo kengîne û naxoşî dûrît heta key=nexweşî û dûrîya te heta kengê?’ , di dêra dawî da jî dibêjele:

*Kurdî le hîcrî (Salim) e wa xerqî mihnet e*

*Re’hmit birale bo key û cewrit heta be key*

[h.b , 256]

Dîsa Kurdî behsa dûrîya Salim dike ku ji ber wê dûrîyê rastî rewşeke xirap û nexweş hatîye, bi heman şeweyê di dêra yekem da doza rihm û dilxweşî (bezeyî) yê dike. Kurdî beşeke baş ya çavkanîyên helbestê xwe ji Salim wergirtîye, ev jî weke ku behsa wê hat kirin çî weke du helbestvanên yek serdemê, çî weke du pismam bandora wan li ser hev hebû. Herwiha Hemebor di şîroveya Dîwana Kurdî da amajeyê bi wê mijarê dike ku ; Kurdî û Salim helbestên xwe bi hevdu ra hûnandine û bi çend çavkanîyên bihêz vê mijarê misoger dike. Dibe ku Kurdî ji bilî van helbestvanên kurd ji helbestvanên faris jî bandordar bûbe, çimkî di jîyana çend caran mişextîyê (awareyê) Îranê bûye ji ber jinavçûna (hilweşîna, rûxana) Mirnîşîna Baban.

### **Çavkanîyên Kelepûra Gelî (Mîllî):**

Çavkanîyên kelepûra gelî çavkanîyeke giring û binirxe di pirranîya coreyên wêjeyî da û bi taybetî di helbestê da. Çavkanîyên kelepûra gelî bingeh û pêgeheke başe ji bo hemû helbestvanan e di her serdemê wêjeyî da, wata helbestvan bi sûd wergirtina vê samana zengîn hem berhemên xwe dewlemend dikin û hem jî resenayetîya (orjînal) wê diparêzin. Pirranîya gelen cîhanê xwedîyê vê çavkanîya neteweyî ne û bûye xala hevbeş ya navbera gelan da, wata gelen cîhanê şanazîyê bi vê kelepûrê dikin û di berhemên wan yên hunerî wêjeyî da olanê dide (deng vedide). Ji ber wê ‘*’kelepûrên neteweyî şêweyên jiyana bav û kalên me yên pêş hezaran sal derdixe, pileya şaristanîyê û xûy û rewîşt û bîr û bawerî wan pêşan dide. Ev jî hemû çavkanî ne ji bo jîyana me ya îroj, wata jiyana me girêdayî jîyana pêşîyên me ne, çimkî ew kelepûrana daxwazî û hestên me bihêz dikin ji bo têkoşan û berhem deranîna ji bo neviyên me yên paşerojê herwek bav û kalên me çawa ji me ra hîştin’’*.<sup>204</sup> Ev sermîyan (saman) jî bi şêweyekî siruştî digel dirustbûna her civakê da li pal ziman, ayin (dîn) , xak û nîştîman da cihê xwe vedike. Kurd di van sermîyan û kelepûrên neteweyî da hewqas dewlemende ku li rûyê dewlemendîya wan da di rêza pêş pirranîya gelen cîhanê da ye, her vê jî wiha kirîye bi şêweyekî berçav helbestvanên kurd sûd jê wergirtine û di berhemên wan da olanê dide. Ev çavkanî ji neviyan bo neviyên paş xwe vediguhezînin û dimînin, ev çavkanî pêdivîyeke serekî ye ji bo helbestvanên serkeftî çimkî bi hoya wê berhemên asta wan bilind pêşkeş dike di dil û derûna xwendevanan da zêdetir dilgîrtir dibin. Ev jî wiha dike ku em bibêjin ; *’Helbestvan ji bo pêşketin û berdewamîya ezmûnên xwe divê li pêş hêmu tiştî mêjîyê xwe bi kelepûrên gelî av bide’’*<sup>205</sup>, çimkî ev çavkanî ji nav cerga kevneşopîya civaka xwe da diafirin û derdikevin, olandana wî gelî zelal dike . Kelepûrên gelî tenê yê kesekî yan kesekê nîye belkî yê giştî ye, her ji ber vê jî xwedîyê vê çavkanîya binirx dîyar nabe û bi nedîyarî dimîne, helbestvan bi şêweyekî baş sûdê ji van çavkanîyan werdigrin.

Ji ber wê Mistefa Begê Kurdî ji vê çavkanîyê jî bêpar nemaye û beşeke baş ya helbestên xwe ji wêneyê kelepûra gelî û wênehelbestan ve tevlihev kirîye û di

<sup>204</sup>-Komelêk Nûser, Serincêk Le Derwazey Folklorî Kurdewe, Çapxaney Dezgay Aras, ÇapîDuwem, Hewlêr, 2009, r15

<sup>205</sup> -Hawjîn Silêwe Îsa, Binyatî Hunerî Le Şî’rî Şêrko Bêkes, r254



encamê da jî tabloyên rengareng bi kelepûrên gelî nexşandîye ku emê li jêrê wan destnîşan bikin û zelal bikin. Divê em wê jî bibêjin ku Kurdî di serdemeke wiha dabû ke nîşandana kelepûra gelê xwe di helbestên xwe da bi şanazî zanîbû û wek helbestvanekî nîştîmanî û kurd sûd ji vê çavkanîya bi nîrx wergirtîye û di nava wênehelbestên kelepûra gelî da têne dîtin.

### **Helbestên Folklorîya Kurdî (Şî'rî Folklorî Kurdî)**

Helbestên folklorî binaxeyek serekî û bihêze ji bo hemû helbestvanan, ev jî ji ber hoya firehbûn û dewlemendîya sermîyana folklorî ye bi hemû keristeyên wê ve. Wata helbestvan bi şeweyê yekser yan neyekser van sermîyanên neteweyî di nav berhemên xwe da bikaranîye û çavkanîya helbestên xwe pê dewlemend dike. Ji ber ku xwedîyê helbestên folklorî nediyare dibin helbestên folklorîyên taybet bi neteweyekê ku takekesên wê neteweyê bi pê pêwîstîyê (dema ku pêwîst bû) sûdê jê werdigrin, herwiha ji ber hêsanî û bihêzîya wataya helbestên folklorî ji aliyê xwendevan û helbestvanan ve gelekî sûd jê tê wergirtin û ji bo demeke dirêj di nav gel da dimînin. Her ev jî dibe hoy ku helbestvan beşeke baş ya çavkanîya helbestên xwe ji folklorê werbigrin, ev sûd wergirtina jî bi hemû coreyên folklorê ne wata ; stran (goranî), dastan, kevneşopî, gotinê pêşîyan...Hwd.

Her ji ber wê ye ku dema em li ser folklorê kurdî hûr dibin, em dibînin kêma yan pirr (gelek) folklor bi şeweyekî siruştî ji nav hemû kesî da derdikeve. Dr.Îdrîs di derbarê stranên folklorî da dibêje: ‘*Ev helbestin, di folklorê da ji wan ra tê gotin stran. Çimkî di demen kevn da nivîs nebû helbest weke stranên dihatin pêşkeşkirin lê di derdema nû da jî wan ra dihatin gotin helbest, çimkî helbestvan helbesta xwe dinivîsîne û paşê jî stranbêjek tê helbestên wî/wê dikin stran*’<sup>206</sup> Stran jî bi taybetî di nav gelê kurd û bi giştî jî di nav gelen cîhanê da bi şewazên cor bi cor hatine pêşkeşkirin, wata dibe ev stranana di serî da kesekî/kesekê goti be yan jî stranên folklorî bi komî hatibin gotin, ev du şewaz serdestirîn stran û helbestên folklorîya kurdî ne. Mistefa Begê Kurdî weke çavkanîyekê ji helbestên folklorîya kurdî sûd wergirtîye û olandana wê di berhemên wî da bi eşkere derdikeve, pêwîste em wê jî bibêjin renga (dibe ku) ew çavkanîyên helbestên folklorî yên Mistefa Begê Kurdî jê

<sup>206</sup> -Îdrîs Ebdulla, *Edebî Millî û Folklorî*, Bergî Sêyem, Çapxaney Hacı Haşim, Hewlêr, 2014, r114

sûd wergirtîye dibe ew helbestana ji nav çû bin (nema bin) û negîhîştî bin vê dema ku em têda ne. Ev jî ji ber wê serdema kevn ya helbestvan ji dayik bûye ye, ev li alîyekî li alîyê din bi hoya kêmbiya lêkolînên zanistî li ser helbestên folklorîya kurdî sedema vê yekê ye. Di helbestekê da di derbareyê “çay” ê da dibêje:

*Ça merhemî zexman e*

*dermanî birînan e*

*eczayî tabîban e*

*xemxwarî ‘hezînane*

[D.K, b.duyem, 69]

Ev helbesta ji heft çarînyan pêk tê, lê em tenê ji bo mînakê çarîneyekê werdigrin, Hemebor şîroveya Dîwana Kurdî digel vê helbestê zelal dike ku belgeyeke bihêze Kurdî çavkanîya helbesta xwe ji helbesta folklorî wergirti be.

### **Efsane:**

Wêney efsaneyi çî ji çîrok û ji wêneyê helbestên rûbereke beşek mezin ya wêjeya kurdî dagîr kirîye, ji ber wê efsane weke têgiheke kurdî hatîye naskirin û di zimanê îngilîzî da ‘myth’ bikar hatîye, herwiha di zimanê ‘erebî da ‘el estûre’ bikar tê, weke mijareke wêjeyî û çandî (kultûrî) giringî û pûteyeke wê ya taybetî heye. Helbestvan di cihana helbestê da ji hêza Wêneyê efsaneyi sûd werdigre, giringtirîn mebesta helbestvan ewe ku derxistina alîyê tiştên nedîyar û maddî yên derdora xwe ye, ev jî wê derdixe ku di serdemên seratayî da zanist û zanyarî bi şêweyekî wek niha zelal û eşkere nebûn. Ji ber wê ‘mirov efsane kirîye hoyek ji bo taybetmendîya bîr û bawerîyê bide ji taqîkirina jiyana xwe watayeke felsefî bibexşe bi rasteqînîyên asayî yên jiyana xwe ta piştrast (dilniya) be bermiber bi ew hemû veşartîyên di gerdûnê da heye û desten wî/wê nagêjê eşkerekirina û bi vê hoyê dixwaze xwe ji tirsê rizgar bike, wekemînak ademîzad ji tarîyê tirsyaye û ji ronkaya

*rojê hez kirîye ji ber wê peristî ('abid) rojê bûye tarikayî jî weke tişteki xerap zanîye û naskirîye''*.<sup>207</sup>

Helbestvanan jî bi şêweyekî berçav sûd ji vê coreya mijarê wergirtine, digel vê da jî efsane cihê xwe di deqên helbestî û tabloyên helbestî da bi şêweyekî berdewam û zîndî vedike, çimkî hem mesafeya helbestê fireh dike û hem jî wêneyê xeyalî (fantazî)di xwe da digre. Wêneyê efsaneyî ku bi pê dem û serdemê helbestvanan ew bikaranîne, wata di qonaxeke diyakirî da bikar nehatîye belkî di hemû qonaxên helbestê da roleke çalak ya efsaneye hebû. Ev jî ji ber wê ye ku bi taybet pêwendîya efsaneyê digel gelê kurd bi şêweyekî berdewamî hebû, çimkî zimanî kurdî ew zimanê bihêz û dewlemend e ku ji sereta heta nika bi corekê şêwazên deng û awaz û efsaneyî têda heye û pê diaxivin (qise dikin, dipeyivin) ev jî bi hoya siruştaxak û nîştîman û çanda gelê kurd ya ciwan e. Loma çavkanîya efsaneyê di her serdemê da binameyeke girîng jî bo berhemanîna wêneyê helbestî li ba helbestvanan, efsane du cîhanên cuda tevhev (tevlîhev) dike ji ber wê ye helbestvan jî bo rengarengî û bihêzîya wêneyên helbestî bikar tînin. ‘*Mirovên seretayî (ilkel) mebesta tomarkirina rûdawên girîng yê di nav civakê da efsane bikar anîne , çimkî tomarkirina bûyeran bi zimanê efsaneye hokareke ji bo berdewambûn û mayîna wan e di nav heqîba çand û dîroka gel da*’.<sup>208</sup> Vê efsaneyê jî ji aliyê her takekî (takekes) kurd bi haweyekî olan daye û bikar hatîye. Wekemînak helbestvanan efsane kirine heyvan (maya, hevîrtirş, hewên) û ji dayik bûna beşeke tabloyên xwe yê helbestî, di guldana Mistefa Begê Kurdî da ev coreya wêneyê bi şêweyekî eşkere berçav dibe. Herwek helbestvan di vê mînakê da dibêje:

*Le nêw çahî zenexedanit esîrin*

*hezarêkî weku Harrût û Marrût*

[D.K,b.yekem,111]

---

<sup>207</sup> -Kameran Mukrî, *Edebî Folklorî Kurdî*, Beşî Yekem, Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr 1984,r39

<sup>208</sup> - Ferhad Ezîz Xoşnaw, *Efrandin û Mirdin Le Efsaney Kurdî da Be Pêy Avêsta û Deqe Pehlewîyekan*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr,2013,r29

Helbestvan di gihandina peyama xwe da wêneyekî efsaneyî nexşandîye, ew jî ji efsaneyê navê du ferîşteyan anîye ku Harrût û Marrût in, ev her du ferîşte di dema Hezretî Silêman da bi şêweyê mirovan ji bo hişyarkirina gel dibûn alîkarê wî ku ji bo gel xwe ji cazû (cadû) û sêhran biparêzin, lê bi hoya jinekê ve têne xapandin û rastî karen xerap tên. Ji ber vê jî Xwedayê Mezin li wan hêrs dibe û siza dide wan, helbestvan xwe çiwandîye van her du ferîşte bi hemû zîrekî û ferîşteyîya xwe jî wê jina ciwan tenê bi ciwanîya çala li ser çeneya Xwe ew xapandine û ketîye nav sizayê heman ferîşteyan. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Rojê bêcam kird û satê çûme lay şêx bo sema'*

*wek (kuze kemitiyar) î pê bê saeten, lay dam le rê*

[D.K, b.duyem,145]

Helbestvan di vî wêneyî da ramanê ciwan ya efsaneyî bikaranîye, ew jî ‘kuze kemitiyar=q..zê gur’ê. Ev vetîreyeke (dîyarde) serdeste di nav civaka kurdewarî da heta radeyekê bawerîya wan pê heye, gelek car di axaftina rojane da jî bikar tê. Ev ‘kuze kemitiyare’ wiha tê naskirin ku bi deste kê bikeve çi bixwaze tê cî (cî bi cî dibe), helbestvan dibêje ;’’hellem kird çûme lay şêx bo giwêgirtin û amojgarî= min hele (çewtî, xeta) kir çûm ba şêx ji bo şîret û guhdarîkirinê, ‘kuze kemitiyar pê buwe weha minî razî kirduwe berrêy helley birdûme=te digot qey (sankî) kuze kemtîyar pêve bû, ez wiha razî kirim û bervî heleyan birim’’. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Be ayîney rox Eskender be camî dîde Cemşîd î*

*be be textî sîne, (perwêz) î, be marî zullif (Zuhhak) î*

[D.K, b.duyem, 179]

Helbestvan ev wêneyê xwe li ser binemaya lihevçiwandinê nexşandîye, paşê jî raman û çîroka efsaneyî tevî wêneyê xwe kirîye, çimkî em dibînin di wêneyê helbestvan da navê ‘‘Zuhhak=Dehaq’’ bi ber çavê me dikeve. Herwek tê zanîn û eşkere ye çîrokeke efsaneyî kurdî ye û diyarkirina sembola cejna neteweya kurd e ku bi şêweyê efsaneyê tête gêrrîn (tê vegotin).

## Destan:

Destan mijareke giring ya wêjeya neteweyî (gelî) ye ku bi şêweyê çîrokan derdikeve, destan serpêhatîyên nav civakê ne ku bi pê dem û serdeman rû didin wata binemaya wê ya rast û dirust heye. Her ji ber vê jî ji qonaxa serzarî (devkî) tête guheztin ji bo (bervî) qonaxa nivîsê, ev nivîsandina jî hinek car bi şêweyê helbestê têne nivîsandin herwek ‘‘Mem û Zîn’’ ya Ehmedê Xanî, herwiha hinek jî bi şêweyê çîrokan têne nivîsandin herwek Destana ‘‘Keleha Dimdim’’ ya ‘Erebê Şemo.

Kurd ji vê coreya wêjeyî ya bisûd bêpar nemane û wêjeya xwe pê dewlemend kirine, ji ber wê divê em bi wê şêweyî destanên kurdî destnîşan bikin ku Dr. Îzeddîn Mistefa destnîşan kirîye û du corin ; ‘‘ *Destanên Gernasî (Qahremanî) û Destanên Dildarî (Evînî)* ’’.<sup>209</sup> Ev du Coreyên destanê serekîtirîn coreyên destanên kurdî ne, ‘‘destanên gernasî’’ ji nîşandana xurtbûn û bihêzîya palewan û gel pêk tînin, mînakên vê coreyê di nava kurdan da gelek in û destanên bihêz hene wek Destana ‘‘Diwanzde Siwarîyên Merîwan’’. Herwiha destanên dildarî jî xalek çalak û bihêz e di nava wêjeya kurdî da, cihekî xwe yê fireh di nav panîya coreyên destanê da vekirîye, ev coreya destanê derxistin û pêşandana evîndarîya pak e di navbera du evîndaran ku di nav gel da rû dide û mînakên vê coreyê jî di wêjeya kurdî da gelek in wek Destana ‘‘Mem û Zîn’’.

Pêwîste em wê jî zelal bikin ku hinek destan di nav gelan da hevbeşin, wata zêdetir ji gelekî yê xwe zanin û xistine nav wêjeya xwe û taybete bi wan gelan, wekemînak Destana ‘‘Şîrîn û Ferhad’’. Bûn (hebûn) a vê destanê di nav gelê kurd da heye, ew jî bi hoya çend belgeyên dirust e herwek Kameran Mukrî yê helbestvan ron dike û dibêje: ‘‘*Sebarete bi destana binavûdeng ya Şîrîn û Ferhad yan Şîrîn û Xusrew jî di bingeha xwe da kurd bûn, çimkî serpêhatî li Çîyayê Bêstûn bû ku xaka Kurdistanê ye û hunera kevirtraşê ku dibêjin ‘‘Hunera Ferhad’’, hunermendên wê hîn jî di nava kurdan da maye’’*.<sup>210</sup> Dîsa em dibînin ev destana di ziman û wêjeya farişî da jî bi heman şêweyê heye, herwiha destana ‘‘Leyl û Mecnûn’’ di rastî da mulk û xwedî û şêweyê ‘ereban e wata sereta destaneke ‘erebî ye ku di nava kurdan

---

<sup>209</sup> Îzeddîn Mistefa Resûl, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Çapxaney Dezgay Aras, Çapî Sêyem, Hewlêr, r41

<sup>210</sup> -Kameran Mukrî, *Edebî Folklorî Kurdî*, b.n, r70

da jî heye, hewqasî ji aliyê helbestvanan ve bikar hatîye ku di hemû qonaxan da olana vê destanê heye. Divê em wê jî bibêjin naveroka van destanana li ba pirranîya ew gelên ku bikaranîne û olana wê têda heye gelekî nêzikî hev in yaxud heman tiştin. Ji ber wê ye destan weke mijareke serekî û çavkanîyeke bihêz bûye heyvanê (maya) bihêz ya ciwanîya dîwana Kurdî ku bi şeweyekî berçav sûd ji wan wergirtîye, herwiha ew destanên ku bûne heyvanê wêneyê helbestî yên helbestvan ji destanên dildarî pêk tên.

### **Destana Mem û Zîn**

Xwedîyê vê destanê helbestvanê mezin yê kurd Ehmedê Xanî ye ku nêzikî sê sed sal zêdetire nivîsandîye, wata di sala ‘‘1694-5’’, naveroka vê destanê ji çîrokeke evînî ya di navbera kur û keçekê da pêk tê ku di encama wê bi nexweşî û mirinê bi dawî dibe. Ev destana sermîyana neteweyî ya gelê kurd e, ji bilî wê çendîn sûd û şîret (amojgarî) têdaye di derbarê ayînî, ramiyarî, sîyasî û dildarî. Kurtiya çîrokê bi vê şeweyê ye; ku du xuşkên Zeyneddînê Mîrê Botan dibin, bi navên ‘‘Zîn’’ û ‘‘Sitê’’û di heman demê da jî du evîndarên wan hene ku yê Zînê nav ‘‘Mem’’ û yê Sitê jî nav ‘‘Tacdîn’’ e. Di yek dem û gav da her du jî diçin ji bo xwestina keçan ku weke kevneşopîyeke wê demê tenê keçek dibû bidana mêr ew jî Sitê û Tacdîn e, ya Mem û Zîn jî dimîne ta dawîyeke nexweş û dilşkestî ku Mîr bi evîndarîya Mem û Zîn zane bi hoya xizmetkarekî xwe (Beko), Mem dixe zindanê û her di wir da dimre, Zîn jî li paş Mem xwe dike. Helbestvan bi vê destanê wêneyekî helbestî yê ciwan dinexşîne ku her di vê mînakê da dibêje:

*Şorî em carem le corî bezmekey Şîrîn nîye*

*Neway sewday Kake Mem ya şewqî Xatû Zîn nîye*

[D.K,b.duyem,90]

Dema ku em bala xwe didin vî wêneyî çend tişt derdikevin, ew jî hatina navê du destanane di yek wêne da bêguman ew jî ber bihêzî û ast berzî (bilindi) ya helbestvan e. Helbestvan bi rêya hawara şûnê (şîwen, matem) rewşa êş û azara xwe beyan dike ku rewşa êş û azara wî hewqasî giran e ku destanên ‘‘Mem û Zîn’’ û ‘‘Şîrîn û Ferhad’’ weke êş û azara wî nîn in. Helbestvan raman (bîr) û çavkanîya xwe ji her du destanan wergirtîye ku ev her du destanên dildarî bi şeweyekî mirinê ve

dawî lê tîn. Helbestvan di serbarê vê karesatên mezin jî hîna destana evîna wî pê azartir û êştir e û herwiha û wefata xwe pêş mirina xwe beyan dike ku di çi rewşek xerap da ye. Loma di evîndarîyê da xwe weke serdarê hemû evîndaran datîne, ev jî bi vî wêneyê ku nexşandîye dixê rû û xwe bi tenê dibîne ku tu şêwe û coreyên azar û êşa evîna wî tuneye, çimkî navê her du destanan dike şahîd û belgeya evîna xwe.

### **Destana Şîrîn û Ferhad**

Ev destana hevbeşe di nava kurd û gelên derdorê wata faris û tirk ku di wêjeya wan da jî ev destana heye, destana Şîrîn û Ferhad destaneke dildarî ye ku bi mirinê dawî lê tê. Naveroka vê destanê wiha ye; ku Ferhad di xewnê da evîne Şîrînê dibe, bajar û cihê xwe diterikîne bi dû cihê Şîrînê dikeve. Di vê gerê da Şîrînê dibîne , raz û niyaza dilê xwe ji bo wê eşkere dike, gerçi Şîrîn hevsera Xusrew Paşa ye lê evin û dildarîya di navbera wan da hemû tiştan bêwata dike, tenê evîndarîya wan li ba wan biwata ye. Paşê Xusrewê Perwêz bi meselê dihesê û dixwaze Ferhad bikuje, lê ji ber ku Ferhad kurê paşa ye nikare yekser wî bikuje, ji ber wê mercekê (şert) digre bi Ferhad ra ku bi serkeve wê Şîrînê bide lê eger na wê Ferhad bikuje. Merc jî ew bû ku Ferhadê Çîyayê Bêstûn bikole û mal û baxekî mezin li ser çê bike û avê di nav çîyê da biherike. Ferhad bi mercê razî dibe û nêzikî serkeftinê dibe lê Xusrew dek û dolaban lê dike bi jinek pîr ku pîrê diçe Çîyayê Bêstûn û bi derewan ji Ferhad ra dibêje Şîrîn mirîye, Ferhad bi hoya vê xeberê pîrê dike û paşê xwe jî dike û evîndarîya di navbera wî û Şîrîn diqede. Ev destana berdewam dibe ku Şêroyê kurê Xusrew hez ji Şîrînê dike, ji ber wê Xusrew dike ku bigêje Şîrînê, di dawîyê da jî Şîrîn li ser gora Ferhad û Xusrew şîn û daxêke pîr dike heta dimire. Mistefa Begê Kurdî bi şêweyekî gelekî baş ev destana kirîye çavkanîya wênehelbestên xwe, weke ku di vê mînakê da dibêje:

*Heta key bêwefay Şîrîn deheste weqtî şîwente*

*Le seriya xerqê wa tîşey cefa Ferhadî miskînit*

[D.K, b.yekem,123]

Helbestvan di vî wêneyî da yara xwe çiwandîye Şîrîn û xwe jî çiwandîye Ferhad , diyare gilîyê helbestvan ewe ku yara wî bêwefa ye ji ber wê helbestvan

dimre, loma jê ra dibêje; ‘‘min wa demirim katî şîwen û giriyante= wa ye ez dimrim dema şîn û girîyên te’’’. Helbestvan bi şêwazeke hunerî sûd ji vê destanê wergirtîye û rewşa xwe bi wê hoyê ve gihandîye yara xwe, di mînakeke din da helbestvan dibêje:

*Emin Ferhad û şahîd Bêstûn e*

*E to Şîrîn şemal şapur e emşew*

[D. K, b. yekem, 491]

Helbestvan dîsa bi heman şêwe xwe kirîye Ferhad û yara xwe jî Şîrîn, Çîyayê Bêstûn ku navnîşana destana evîndarîya Şîrîn û Ferhad e helbestvan ew kirîye şahîdê evîndarîya xwe. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Mestî eşqe Manî ye ya Kohken Kurdî billê*

*dil binexşêne, nekû seng karî Ferhadî meke*

[D.K, b.duyem,16]

Helbestvan di vî wêneyî da navê du kesayetî anîye û yek ji wan Ferhad e û evîndarê Şîrîn e ku meste evînê ye, loma Kurdî dibêje ; ‘‘to weku Ferhad meke ke Kêwî Bêstûn helkollî, to be yareket billê wêney min Leser dilit binexşêne=tu wek Ferhad meke ku Çîyayê Bêstûn bikolî, tu ji yara xwe ra bibêje wêneyê min li ser dile xwe binexşîne’’’. Em dibînin ku helbestvan bi vê çavkanîya wêneyê xwe ji vê destanê wergirtîye ku ‘‘helkolîn e’’, helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Min weku Ferhadî bêçarem e toş*

*Xusrewî esirî be Şîrîn miniverî*

[h.b,158]



Helbestvan rewşa xwe ya xerap ya ji ber yara xwe ketîyê çiwandîye Ferhad ku tu çareya wî tune ye ku bibe wesîle ji bo bigihêja yara xwe, diyare ew kesê ku bûye sedema bêhêvîyê jî çiwandîye Xusrew ku yara wî ya wek Şîrîn heye.

### **Destana Leyla û Mecnûn**

Ev destana di nava xaka ‘ereban da ji dayik bûye, wata çavkanîya wê mulkê ‘ereban e, bi heman şêwe ev destana dildarîyê jî di navbera du dildaran da ye û di vê destanê da jî her du evîndar nagihêjin hev. Naveroka destanê bi vê şeweyê ye ; ‘‘*Navê Mecnûn yê rastî Qeys kurê Melewê e û ji êla (‘eşîr) Binî Amir e, Leyla keça Mehdî ji binemaleke dewlemend e. Qeys xortekî ciwan bû û gelek helbestên ‘erebî jiber zanî bû, her ji zarokîya xwe da digel Leyla pez diçêrandin û evîne wê bûye. Nikarî bû evîna xwe veşêre û helbest li ser Leyla gotîye û navê Leyla di civakê da anîye ziman û ji ber wê yekê navê Leyla di nava civakê da nêşîrîn derketîye (nawî leylay le komellga zirranduwe), loma mala bavê Leyla neqayilîyên xwe derbirîne, her ku Qeys ji bo xwazgîniyê kî dişand lê nedidanê’’*.<sup>211</sup> Ev destana di nav gelê kurd, ‘ereb û farisan da heye, di van gelan da çend kesayetî ev destana nivîsandine, loma bûye çavkanîyeke baş ji bo wêneyê helbestî yên helbestvanan. Vê destanê jî di nav wêjeya kurdî da cihê xwe yê taybet vekirîye ku ‘‘*bi sê diyalektên goranî, kirmancîya jor û kirmancîya jêrê (soranî) hatîye nivîsandin*’’.<sup>212</sup> Mistefa Begê Kurdî bi vê destanê bandordar bûye û çavkanîyeke baş ya wênehelbestên xwe jê wergirtîye, weke di vê mînakê da dibêje:

*Bextî Kurdî ne 'hs û dil ba sebr û Leyla bêwefa*

*Ey Xuda ro dil weha tali' wesa cana newa*

[Dîwana Kurdî, berga yekem,51]

Kurdî di vî wêneyî da ji bo bextê xwe hawarê dîke û gelekî xem û derdên wî hene, digel vê da jî Kurdî evîndara xwe çiwandîye Leyla wata çavkanîya helbesta xwe bi Destana Leyla û Mecnûn bihêztir û ciwantir kirîye. Kurdî bi jîrî bi rêya vê destanê ve hawar, nalîn, dînî (şetî) û şeydaya xwe çiwandîye Mecnûn, çimkî navê yara xwe bi navê Leyla anîye ziman, helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

<sup>211</sup> - Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Berawirdî Edebî*, b.n., r276

<sup>212</sup> -h.b., r283

*Mecnûn eger le ciwanîy Leyla bû nawî kird*

*min şêfî takê ciwanîm û lawî merdî pak*

[D.K, b.yekem, 264]

Helbestvan ji Destana Leyla û Mecnûn sûd wergirtîye, ew jî dema ku dibêje ;  
**‘Mecnûn ji bo Leyla dîn bû, ez jî ji bo xortekî pak û ciwan’**, li gor Hemebor ew kes **‘Ezîz Begê Baban** bû. Helbestvan di mînakeke din da dibêje:

*Weku Mecnûn le dûriy Leylî bê meyl*

*xerîk û wêllî berriye û herdim emro*

[h.b, 472]

Helbestvan bi hoya dûriya ji yarê bi eşkere xwe çiwandîye Mecnûn, loma bi hoya yara xwe rewşa wî hewqas nexweş e û li deşt û bîyabanan digere herwiha li ber hemû wenda bûye. Em dibînin helbestvan çavkanîya wênehelbesta xwe ji Destana Leyla û Mecnûn veguhezandîye nav deqên helbesta xwe û debînin bi şêweyekî gelekî ciwan sûd ji çavkanîya wê wergirtîye.

### **Gotinên Pêşîyan**

Gotinên pêşîyan beşeke giring ya wêjeya folklorî ye û çavkanîyeke bisûd e ji bo hemû gel û neteweyan, çimkî bi rêya van gotinan mirov di hemû warên jîyana xwe da zanyarî û qazancên mezin bi destê xwe dixin. Gelê Kurd li vî rûyî ve gelekî dewlemend e û di her serdemê da komek gotinên pêşîyan hene û yên nû jî ji dayik dibin, herwiha ji nevîyan (nifş) bo nevîyên paş xwe têne veguhezandin, wata ev pendana (gotin) taybet bi gelê Kurd bi şêweyekî ku di her dîyalektên kurdî da komek pend hene, li her dever (nawçe), bajar û gundî gelek coreyên pendên bisûd hene ku di hemû warên jîyanê da mînakên wan hene. Gotinên pêşîyan kesên zane û jîr bikar tînin ji bo rênîşandanê, wata di her ast û temenan da ji bo pêwendîya di navbera takekesan û dûbare nekirina çewtîyan. Kurd her ji berê da sûd ji vê sermîyana neteweyî wergirtîye, em dibînin gelek car di axaftina me ya rojane da pendê pêşîyan bi şêweyekî yekser bi nav zar û zimanê me da tê ku ji bo sûd wergirtin yan ji her karekî yan tişteki din be. Ji ber wê em wiha pênaseya gotinên pêşîyan dikin ;gotinên pêşîyan ji derbîrînek balkêş pêk tê û bi zimanê sade yê nav gel tête pêşkeşkirin, wata

û manayeke wan ya bilind heye ku sîma û ciwanîyekê bi zimanê axaftin ya di navbera takekesan dibexşîne û bandora wan ya hewqas bihêz heye ku berdewam di nav dil û derûna mirovan da dimînin. Mistefa Begê Kurdî jî sûd ji van pendana wergirtîye û çavkanîya wênehelbestên xwe pê nexşandîye, wek di vî wêneyî da dibêje:

*Daîma dil wa le se'îy etk û abrû birdinim*

*pêşînan Kurdî dellên her xizm e xo riswa deka*

[d.K, b.yekem, 57]

Helbestvan di vî wêneyî da bi hoya nav anîna dilê xwe ve ji me ra dibêje ; dile min şermezar û rûmeta min dibe, diyare ji vê nav anîna “dil” mebesta wî meriv (xizm) yan jî yara wî be. Çimkî di nîvdêra din da gotineke pêşîyan tîne ku helbestvan çavkanîya wî wêneyî ji vê pendê wergirti be ku ev e ‘ewey xo be xoy deka bêgane be xoy naka=ewê ku meriv bi merivên xwe dike bêgane li wan wa nake’.<sup>213</sup> Ev penda ji me ra dibêje ; **‘hinek car bêgane (kesên xerîb) ji merivên me baştirin’**, dema ku em li ser vî wêneyî hûr dibin helbestvan hem gilî li meriv û hevalên xwe dike ku jê ra baş nebûn, hem weke şîretê gotîye sûdê jê werbigrin. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Min ke kuşte û şêfte û sewdazedey yek dulberim*

*Pendî pêşîn nexşî berde, dil yeke, meyde hezar*

[h.b, 131]

Helbestvan ji bo evîndarîya xwe ya pak sûd ji gotinên pêşîyan wergirtîye, di vê dêrê da du pend (gotin) anîye ew jî ‘gotina pêşîyan weke keviran hişk e lê rast e (heq e), wek nexşa li ser kevir e’, wata sîfeta gotinên pêşîyan wek sîfeta kevirê, di penda duyem da ji bo xwe û ji bo hemû kesan dibêje ; ‘dil di cîhanê da ji kesekî/kesekê hez dike nabe ji hemû kesan hez bike, ji ber wê dile xwe bide ew kesê/kesa ku jê hez dikî, ne hezar kesî’. Em dibînin helbestvan çavkanîya wêneyê

<sup>213</sup> -Mihemmed Mistefa Hemebor, *Dîwanî Kurdî*, Bergî Yekem,b,n,r60

xwe ji gotinên pêşîyan wergirtîye, wek wêneyekî ciwan di nav deqên helbesta xwe da bikar anîye.

### **Kevneşopî(Dabûnerît)**

Rewişt û sîmayên ciwan yê bav û kalên me ji bo û pêşeroja me tomar dike, ji bo dem û cihên guncaw pîvana wan tê kirin. Wata em dikarin bibêjin kevneşopî xezne û xezîneyeke baş ya kelepûra gel (millet) e, ev kevneşopî li nav hemû gelan da yek şêwe (wek hev) nîne, wata kevneşopîyên her gelî taybete bi wan û cor bi cor in. Di heman demê da jî hinek kevneşopî ji ber hoya dîn û cîrantîyê di navbera hinek gelan da hevbeş in, herwiha gelek coreyên van kevneşopîyan hene weke; kevneşopîya dînî, civakî, ramiyarî (sîyasî)... Hwd. Kurd di vê Samana (sermîyan) kelepûrî da hewqas dewlemende ku beşeke serekî ya gelê Kurdistanê ye, di vî rûyî da rewîşt û kare ciwan yê kurdan heye ku hemû kurd bê dudilî şanazî pê dîkin ku çi kesên asayî yan jî helbestvan bin. Ji ber wê ye helbestvanên me kevneşopî wêda nekirine, parastine û bi her şêweyî kirine heyvanê (hewên) helbestên xwe. Mistefa Begê Kurdî ji bo ciwankirin û bihêzîkirina wênehelbestên xwe kevneşopî di berhemên xwe da bikar anîye, hem ciwanî da wênehelbestên xwe û hem jî ev kevneşopîyana zindî kir, ji bo nevîyên kurd nifş bi nifş sûdê jê bigrin. Loma helbestvan di wêneyekê da dibêje:

*Her şewê weidey wîsalit bê? Heta roj nasrewim*

*Leyletul Qedire, hemû kes hez bebêdarî deka*

[D.K, b.yekem,61]

Dema ku em li ser vî wêneyî hûr dibin, em dibînin ev wêneya hewqas bi ciwanî ji aliyê helbestvan ve hatîye nexşandin ku xwendevan dîxwîne ji wata û mebesta wê têr nabe. Çimkî helbestvan kevneşopîyeke dînî digel wêneyekî helbestî tevlihev kirîye ku ji bo vê coreya helbestê westayî (ûstayî), jîrî û hunerbezî pêwîste. Di vî wêneyî da peyva "Leylet-ul Qedir" ji bilî rasteqînîya wê ya dînî ye ji ber wê bûye kevneşopîya hemû musilmanan, ev nava di Qur'ana Pîroz da heye bi navê Suretî "El-Qedr", jimare 97. Ev şeva weke şeveke pîroz di dînê îslamê da tête qebûlkirin û pîroz e ku ev jî ew şeva ye Xwedayê Mezin bi hoya Cebraîl ji Pêxemberê me Hezretî Mihemmed (D.S.X.L) ra "Seretayî ya Qur'anê jê ra şand û mizgînîya

pêxemberîyê pê ragihand”. Ev şeva dikeve meha Remezana Pîroz ku bi taybetî deh şevên dawîyê û zêdetir dikeve 27 ê mehê, gel di van şevan da heta nêzikîya berbangê nimêj û xwedaperistî yên xwe zede dikin bi wê mebestê ku Xwedayê Mezin wan ‘efû bike. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Pencet le hena megire, surêkî telix renga  
Xwênî dillî min alle bîke xenebandanî*

[D.K, b.yekem,82]

Her çiqas li ser vê dêra helbestê li beşên sereta me şîroveya wan kir jî lê bi hoya hebûna peyva “xenebandan=’hinebandan” ku kevneşopîyeke kevn ya kurdan e, jin pêş veguheze ji bo mala zavê ev kevneşopîya ji bo jinê encamê dide. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Lêy depirsim, boçî (kil saw) e muje û ebrot? Dellê  
tîx û tîr jehraw dedem ta her benasor bin birîn*

[h.b, 423]

Helbestvan bi hoya maddeyeke ke navê wê ‘kil’ e ku jin û mêr bikar tînin, di serdemên kevn da ev kila weke kevneşopîyekê ji bo ciwankirin û balkêşîyê bikar hatîye, loma helbestvan ji yara xwe dipirse ; ‘ji bo çi tu çavê xwe kil dikî’, yara wî jî bersîvê didê û jê ra dibêje; ‘çiqasî jehra tîrê zêdetir be, cihê birînê hewqasî zêde azar û janê dide’. Di vî wêneyî da helbestvan wêneyekî yekcar ciwan nexşandîye, çimkî ‘bijangê yarê’ bûye ‘tîr’ û ‘kila wê’ jî bûye ‘jehr’ ku ew tîra li kê bikeve hergîz serrast (timar) nabe. Ji ber wê helbestvan weke kevneşopîyekê çavkanîya helbesta xwe ji vê ‘kil’ê wergirtîye û ciwantirîn wêne û watayên helbestî pênexşandîye.

## Siruşt (Xweza, Xwerist)

Siruşt pêkhate û çavkanîyeke serekî ya helbestên helbestvanan e, çimkî dema ku helbestvan temaşeyê derdora xwe dike siruşt hokareke bihêz û dewlemend e ji bo ji dayik bûna wêneyê helbestî. Helbestvanên kurd di hemû xonaxên wêjeyê da sûd ji siruştê wergirtine, ji ber wê ; ‘‘mebest li siruştê hemû tiştên derdor û piştta me ne ku em hest bi wan dikin û wan dibînin ji bilî mirov’’. Siruşt nîşandana hemû dîmenên veşartî û dîyar (berçav) in ku helbestvan bi hoya dîtineke dîmena derdorê binyata wênehelbestên xwe datîne, siruşt derîyekî hewqas girînge li ba helbestvan ve ku herdem li rûyê helbestvanan tête vekirin (herkat berrûy dekrêtewe). Helbestvan bi şêweyekî azadane bîra xwe ya ciwan bi hoya siruştê ve beyan dike, wata siruşt rê ji bo helbestvan xweş dike ta ew alîyê veşartî yên ku hene bi hoya helbestê ve veguhezîne û nîşanî xwendevan û mirovan bide. Di nav vê siruştê pan (pehn) û mezin ya cîhanê da helbestvan bi kêfa dil û bîra xwe digere, ta digêje qotê helbestên ciwan û bihêz ev jî bi hoya siruştê ve ye. Siruşt pehnî û firehîya helbestên Mistefa Begê Kurdî bû ku wek hemû helbestvanên din, loma li vî rûyî wênehelbestên gelekî ciwan yê M. B. Kurdî hene, weke di vê mînakê da dibêje:

*Dîde wek hewrî beharan xwên debarênê û seday  
pêkenîni xunçeyî newsebze perjînim nehat*

[D.K, b.yekem,115]

Di vî wêneyî da her yek ji peyvên ‘‘**hewrî beharan=’ewrê biharan**’’ û ‘‘**xunçeyî newsebze=xunçeya kesk ya nû bûye (nû aj da ye)**’’ ku dîmenên siruştî ne û bi berçavê helbestvan ketine û bûne hoya heyvanê wênehelbestên wî. Diyare helbestvan ev helbesta ji bo wî/wê kesî/kesê ku jê xeyîdîye gotîye (nivîsandîye), çiwandîye ‘‘ewrê biharan’’ ku şêwe û dengê wan yê taybet heye ku bilez û reş e, dengê birûskên wan bihêz in û baraneke demî têda ne. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Weha firmêskî xwênîn dê le çawim  
weku damanî Elwende kenarim*

[h.b,320]

Helbestvan di vî wêneyî da sûd ji Çiyayê Elwend wergirtîye ku çavkanîya hevgirtina çend rûbara ne ku ji Rojhelatê Kurdistan bervî Başurê Kurdistan tê di nav Bajarê Xaneqîn da dihere û tevî Ava Sîrwan dibin. Helbestvan bi hoya vê dîmena siruştî ve xwe çiwandîye Çiyayê Elwend û wêneyekî ciwan yê hunerî nexşandîye. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Zumistan meyleket, payiz birakem  
beharî weslî tom hawîne bê to*

[h.b, 448]

Di vî wêneyî da helbestvan siruştî her çar demsalan bikar anîye ku ew jî ; ‘zivistan, payîz, bihar û havîn e’. Helbestvan sûd ji demsalên salê wergirtîye bi şêweyekî huneriyane û zimarîji bo Salimê pismamê xwe gotîye ku bi hoya dûrîya ji pismamê xwe ‘**meyla wî (Salim)**’ çiwandîye serma ya (sarî) zivistanê wek gilîyekî li Salim dike ku dereng dereng derdikeve. Herwiha dibêje ; ‘geyiştinim be werzî beharî ke to lelam nebî hawîne=gihîştina min bi demsala biharê ku tu li ba min nebî havîn e’, helbestvan dibêje ‘gerçî demsala biharê demsaleke nû ye, mizgîna xweşî, şadî, şînbûn û vejîne ye, lê bêfeyde ye ku tu li ba min nîne bûye weke demsala havînê’. Diyarê demsala havînê demsaleke germ û hişke, mirov ji havînê bêtir ji demsalên din hez dike. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Be rû rojey be zulfî şew, memî lam cutê lîmo ye  
zeqen wek sêwî lasûr e, bexû herdem hewayeke  
Beqed serwe, bearîfî gull, lebî çun şekkerî Mîsir e  
dehanî xunçeyî baxe, beçaw ahûy xetayeke*

[D. K, b.duyem, 42]

Di vî wêneyî da siruştî bi şêweyekî serekî bûye çavkanîya helbestê, çimkî her yek ji peyvên ‘roj,şev, lîmon, sêv, gul, şekirê Mîsir, xunçe, bax, ahûxeta ‘ û ‘mamiz’ hemû di siruştê da ne û ketine ber çavê helbestvan. Wata helbestvan bi hoya dîtina ev tiştên di siruştê da wêneyekî ciwan nexşandîye, bi hoya hunera lihevçiwandinê ‘rûyê yarê’ çiwandîye bi ‘roj’ ê, ‘biskên wê yên reş’ bi ‘şev’, memikên yarê’ çiwandîye bi ‘lîmon’ û ‘çenga yarê’ bi ‘sêva sor’. Herwiha

“lêva yarê” çiwandîye bi “Şekirê Misirê”, “devê wê” jî bi “xunçegul” ê û temamê “bejna wê” jî çiwandîye bi “xezala xeta (coreyeke xezalane). Di vî wêneyî da ji bo me zelal dibe ku helbestvan bi şêweyekî yekcar fire tevî siruştê bûye, her ev jî bûye hoy ku wan peyvana di wêneyê xwe da bikar bîne ku ji siruştê pêk hati bûn. Loma em dikarin bibêjin ;” siruşt xezne û çavkanîyeke başe ji bo helbestvanan ku ta bi hoya wê ve wêneyên helbestî berhem bînin”.

### 3.2.2. Çavkanîya Cîhanî

Çavkanîya cîhanî çavkanîyeke din e ku helbestvan di berhem anîna wêneyê helbestî da bikar tîne, ev çavkanîya jî hewqas fireh e ku helbestvan bi pê pêwîstîyê ilhama helbestên xwe jê werdigrin. Wata dema ku helbestvan bixwaze li derîyê vê çavkanîyê ve wêneyê helbestî binexşîne, pêwîste nêrîn û bînîna (dîtina) helbestvan kûr û dûr be, bi şêweyekê sînoren cografî û mewdayên (mesafe) dûr nêzîkî xwe bike ta sûdê ji wan werbigre. Çimkî pêwîstîya van çavkanîyên cîhanî bi hêsina (xûdî) helbestvan heye ta gavan ji bo wan bavêje û li ser wan hûr bibe (bala xwe bidê), ji bo wê ku di dema dariştina wan di wênehelbestan da weke xwe bin. Ev çavkanîyên cîhanî bi pê dem û serdem û cî cuda ne ji wanê ku çawa em têdigên bi aşop û ramana helbestvan, bi haweyekî em dibînin helbestvanên klasîk bi hoya ger û westandinê destê wan gihîştîye vê çavkanîyê. Em dikarin bibêjin heta radeyekê bi guman ev çavkanîyana xistine nav tabloya wêneyên helbestî da, bi pîvan helbestvanên hevçerx gelekî asanî gihîştine van çavkanîyên cîhanî. Ev jî bi hoya çend hokaran ; yek ji wan “hokara pêwendîyê” ye ku di navbera gelan da bi şêweyekî gelekî pêşketî geşe kirîye, wata her bi rêya rojname, tv, telefon û înternet û çend hokarê din jî dibine hoy ku bi asanî destê helbestvan bigêje van çavkanîyana. Loma em dikarin bibêjin; helbestvanên nû li gor helbestvanên kevn yaxud klasîk dewlemendtirin û bi hêsanîtir û leztir destê wan digêje van çavkanîyana, lê dîsa helbestvanên klasîk dikarin sûdê ji van çavkanîyên cîhanî werbigrin. Ji ber wê em li vî rûyî du cor çavkanîyên helbestî destnîşan dikin ku di helbestên Mistefa Begê Kurdî da olan dane (deng vedane):



## A-Çavkanîya Dîrokî:

Çavkanîya dîrokî li ba helbestvan gelekî girînge, girîngîya vê alîyê wê ji ber hêsina dîrokî ye. Çimkî dîrok xezîneyeke bêdawî ya hemû gelan e, wata hemû gel û netewe xwedî dîrokeke taybet in ku bi xweşî û nexweşî û serkeftin û şikestan ve tomara hemû bûyeran e. Loma helbestvan bi çavekî gelekî hûrbînî ve li dîrokê dinêre, çimkî ev çavkanîyên dîrokî belge û olandana hemû kar û kirinên taybet yê hemû gelan e, di nav van mijarana da helbestvan weke rêwîyekî/rêwîyekê (rêbwar) di nav hemû van mijarana da diçe ku diçine xaneyê çavkanîya dîrokî. Di nav wê gerê da jî helbestvan hemû dîrokê wernagre, belkî bi pê bandor û hest û soza xwe ev çavkanîyên dîrokî dike wêneyê helbestî ku sûd û peyama wan ya baş hebe. Merc nîye anîna ev mînakên çavkanîya dîrokî hemû ji olandana xweşî û şadîyê pêk hatibin, belkî olandana nexweşîyê jî têda heye. Ji ber wê ev çavkanîyên dîrokî bi hoyî çî hokaran bin jî helbestvan ew dema ku têdaye bi bikar tîne, ev çavkanîyana jî ji “bûyerên dîrokî” û “kesayetîyên dîrokî” pêk tê. Weke helbestvan di vê wêneyê helbestî da dibêje:

*Meclîs er wabê, heza Cemşîdî Cem ferraşîye  
mey eger wabê, behay camêkî Êran e û Hîcaz*

[D.Kurdî, b.yekem, 159]

Dema ku em helbestên Kurdî dixwînin em hestê bi awaza muzîkekê dikin di wênehelbestên wî da. Loma di vê helbesta ku bi navnîşana “dil le mîhnet keyile” ku sêta pê helbestek tijî ye ji stran û awaza muzîkê, loma di dêrek helbestê da navê kesayetîyekî dîrokî tîne ku “Cemşîdê Cem” e, ev kesa paşa bû ku di derbarê jîyana wî da çîrokên cuda hene. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Weku Mensûr eger bîşim sûtênin,  
Ene El-qadir dellê gerd û xubarim*

[h.b, 320]

Di vî wêneyê da helbestvan bi şêweyekî hunerîya gelekî ciwan navê “Mensûr” anîye, ev kesayetîya zana û feylesûf û xwendevanekî mezin bû ku berdewam digot; “Enel Haq” wata “Ez rast im”, heta çend salan di girtîgehê da maye û bi şêweyekî

nexweş û dilşikestî li Bexdayê kuştine. Di vir da Kurdî bawerbûna xwe ya bi ‘‘Terîqeta Qadirî’’ dúbare dike, çimkî bi xwe dibêje; ‘‘Ene El-qadir’’ wata rê û Terîqeta Qadirî rast û diruste. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Le îqlîmî melahet da Ferîd e û Nadirî ‘esr e  
cille û darî weku Elp Erselan û Sencer e emşew*

*Le mestî da weku Reham û bo merdî weku Şîd e  
be tundî herweku Tûs e beşoxî Ce’fer e emşew*

[h.b, 501]

Di vî wêneyî da helbestvan çavkanîyeke baş ji dîrokê wergirtîye û tevî wênehelbesta xwe kirîye, ew jî her yek ji ‘‘Elp Erselan=Alparslan’’, ‘‘Sencer’’ û ‘‘Reham’’ in ku sê paşane di dîrokê da behsa wan hatîye kirin. Helbestvan bi hoya hunera rewanbêjî û bi taybetî bi hunera lihevçiwandin di çend rewş da xwe çiwandîye bi van paşana, helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Xelatî rom û wilatî çol û wêran e le Baban da  
Le kawil da neba aşiyânî kunde lale naxwênê*

[D.K, b.duyem, 42]

Dema ku em bala xwe didin vî wêneyî, du nav dikeve ber çavan ew jî ; ‘‘Rom’’ wata ‘‘Dewleta Osmanî’’ herwiha ‘‘Baban’’ mebest jê ‘‘Mîrnişîna Baban’’ e. Dema ku em vî wêneyî bi temamî dixwînin, helbestvan ji bûyer û çavkanîyeke dîrokî ev wêneya nexşandîye. Ew jî dagirkirina Mîrnişîna Baban e ji aliyê Osmanîyan ve, helbestvanbi wêneyekî dijûnî (xeber, çêr) li ser tirkan û bi zimarî ji bo Mîrnişîna Babanev helbesta nivîsandîye, çavkanîya helbestê ji bûyereke dîrokî pêk tê ku di serdema wî da bi ser xak û nîştimana wî da hatîye.

### **B-Çavkanîya Ayînî (Dînî):**

Dîn weke peyameke Yezdanî (Xwedayî) ji bo hemû mirovên ser zewî hatîye xwarê, herwek em zanin dîn bi pê serdeman cuda bûn ji pêxemberan heta pirtûkên dînî. Ji aliyê hemû gelan ve weke kevneşopîyekê bi çavekî pîroz li van dînanan di hate nêrin û di jîyana rojane di hate cîbicîkirin . Çimkî dînen ezmanî (îlahî) rêya rast û baş nîşanî mirovan didin, ji kar û kirinên xerap dûr dixê, loma helbestvanan jî weke her

mirovên asayî dînê xwe parastine û her ji ber vê jî bûye çavakanîya helbestên wan. Ji ber wê ye ku pirranîya helbestvanên me yê klasîk li hucre û mizgeftan da xwendine bi taybetî li ser rêya Dînê Îslamê bûn, Mistefa Begê Kurdî jî wek gelek helbestvanên din pirranîya qonaxên xwendina wî mellatî bû û bi şêweyekî berçav dînê îslam bûye çavkanîya wênehelbestên wî. Dîsa jî helbestvan awirek li dînen pêş xwe jî daye û navê kesayetiyên wan dînen pêş xwe xistîye nav helbestên xwe. Mistefa Begê Kurdî ji bo ciwankirin û bihêzkirina wataya wênehelbestên xwe sûd ji sê dînan wergirtîye ku ev in:

### 1-Dînê Zerdeştî

Dînê Zerdeştî yek ji dînen herî kevn yê kurd û farisan e ku pêxemberê wan bi navê ‘Zerdeşt’ û pirtûka wan ya dînî jî ‘Avêsta’ ye. Helbestvan sûd ji vî dînî wergirtîye, weke ku di vê mînakê da dibêje:

*Herkesê aşiq le dest hîcran xelaska merde ew  
Erê Ferhad ta ‘heşir memnûnî pûrî Hurmuz e*

[D. K, b.yekem, 595]

Di vi wêneyî da navê ‘Pûrî Hurmuz’ e (Hurmuz=Ahura Mazda=Hurmezad) kurê Noşîrwanê Paşayê Sasanî, herwiha navê serdarekî Noşîrwanê Paşayê Sasanî bû. Dîsa navê Mûbed **ku** zilamê dînê Zerdeştî bû di serdema Qubadê Sasanî, herwek diyare helbestvan bi hoya navekî dînê Zerdeştî wêneyekî helbestî nexşandîye. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Behmen sîfet: Be tîrî xem, esfend yarî dill  
Ordîbehiştî ‘eyşî bedel bû, be ‘eynî dey*

[D.K, b.duyem,256]

Helbestvan bi hoya navê ‘Ordîbehişt’ ku di Dînê Zerdeştî da navê ‘Emsaspandan=Ferîşteyan’ e ku di cihana biheştê da nunerê pak û pîroz e û di cihana xakî da jî parastvanê agir e, helbestvan bi wê hoyê wêneye xwe nexşandîye.

## 2-Dînê Mesîhî (Xirîstîyanî)

Dînê Mesîhî yek ji wan dînana ne ku ji aliyê Xwedayê Mezin ve hatîye şandin, dîroka wê gelekî kevn e û heta îro jî beşeke pirr ya mirovên ser rûyê zewî li ser rêya mesîhîyet in. Navê pêxemberê mesîhîyan Hezretî Îsa (D.X.L) û navê pirtûka wan ya pîroz jî “Încîl=Mizgînî” ye, helbestvan ji bo wênehelbestên xwe weke çavkanîyekê sûd ji vî ayînî wergirtîye û tabloyên ciwan pê nexşandîye weke di vê mînakê da dibêje:

*Şikandî qîmetî şeker, nebatî lêwî şîrînit*

*Geyandîye Meryemey Meryem xeyalî rûy nîgarînit*

[D.K, b.yekem, 123]

Di vî wêneyî da navekî pîroz û dînî dikeve pêş çavê me ku hevbeşe di navbera Dînê Îslam û Dînê Mesîhî da, ew jî “Meryem” a dayika Pêxember ‘Îsa (D.X.L) ye ku di Dînê Mesîhî da gelekî pîroz e. Herwiha di Dînê Îslamê da jî gelekî pîroz e û bi şêweyekî gelekî jî navê wê di Qur’ana Pîroz da hatîye û surretek bi navê “Meryem” jî heye. Helbestvan ji yara xwe ra dibêje ; **“maçî şîrînî lêwekanit hênde şîrîne, le şekir zor şîrîntire, boye lay min qîmetî şekir kemptire=maça lêvên te yên şêrîn hewqas şêrîne ji şekir şêrîntir e,ji ber wê qîmeta şekir li ba min kêmîtir e”**.Di nivdêra duyem da helbestvan êş û azarên xwe yên berdewam yên bi hoya xeyalkirina yara xwe çiwandîye bi azarên Meryema dayika ‘Îsa Pêxember (D.X.L), çimkî Meryem bê mêr ducan bû bi emrê Xwedayê Mezin. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Şewî yeldaye, ya deycure emşew*

*ke dîdem dûr leto bînûr e emşew*

[h.b, 483]

Di vî wêneyî da helbestvan navê “Yelda” anîye ku ev nava du wata li xwe digre: yek ji wan= ev peyva peyveke suryanî ye amaje ye ji bo ji dayik bûna Hz. ‘Îsa (D.X.L), wataya wê ya din jî=şeva dawîya demsala payizê ye û dirêjtirîn şeva demsala e, helbestvan behsa yara xwe dike ku ev şeva hewqas dirêj e bê yara xwe şev naqede (xelas nabe) û ji ber wê ronkaya çavên wî tu (qet) nabînin.

### 3 –Dînê Îslamê

Dînî Îslam axir dînê ezmanîye ku Xwedayê Mezin ji bo mirovan şandîye, pêxemberê vî dînî Hezretî Mihemmed (D.X.L) e û pirtûka pîroz jî ‘‘Qur’an’’e. Ev dîna li seranserê cîhanê belav bûye û beşeke pirr ya cîhanê li ser vî dinîye bi taybetî jî gelê Kurd ku beşeke pirr bawerdarê vî dînîne û di jîyana xwe yê rojane da pîvanên vî dînî cîbicî dikin. Mistefa Begê Kurdî jî bawerdarê Dînê Îslamê bû, ji ber wê ev dîna çavkanîyeke giring ya wênehelbestên wî ne bi taybetî jî ‘‘Qur’ana Pîroz’’. Helbestvan di vî wêneyî da dibêje:

*Zahîd er xwendûwete tefsîrî: (لِكُلِّ وَجْهَةٍ)*

*qet mede te’ne le mestî û bêxudî rendanî eşiq*

[D.K, b.yekem, 257]

Dema ku em bala xwe didin ser vî wêneyî, em dibînin helbestvan sûdji Qur’ana Pîroz wergirtîye herwek amaje bi ayetekê kirîye jimare148 ya Sureta El Beqara ku Xwedayê Mezin difermo ; [ وَلِكُلِّ وَجْهَةٍ هُوَ مُوَلِّئُهَا فَاسْتَبِقُوا الْخَيْرَاتِ أَيْنَ مَا تَكُونُوا يَأْتِ بِكُمْ اللَّهُ جَمِيعًا ] ; Wata; ‘‘Bo her gel û mîlletêk qîbleyek heye, Xwa rûyan wedeçerxênêt bo lay. De êwey musulmanan pêşbirkê biken le çakekanda, rûy le her kiwê bin Xwa hemûtan ko dekatewe çunke be rastî ew Xudaye betwanaye beser hemû şitêkda=Ji bo her gelî berdaneke heye, ew berî xwe didin wî alî. De hûn gelî bawermendan di başî û qencîyê da pêşbirkê bikin, hûn li kîderê bin bibin Xweda yê we komî serhev bike. Bi rastî Xweda li ser hemû tiştî da bihêz e’’. Helbestvan dibêje ; ‘‘Hemû evîndar dilberên (hezkirî) wan hene ku ji bo wan herin û berî xwe bidin wan, herwek çawa hemû musulman ji Xwedaperistinê berî xwe didin ‘‘Qible’’ yê’’. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Weslî tu (يُحْيِي الْعِظَامَ) ey qalbi fersûdem e*

*sa miyêlle tû Xuda şad ba begerdim bay şemall*

[h.b, 271]

Helbestvan dîsa bi hoya sûd wergirtina ji Qur’ana Pîroz wêneyekî ciwan nexşandîye, ew jî Xwedayê Mezin di Ayeta 78 ya Sureta Yasîn da difermê: [ وَضَرَبَ لَنَا ] ; Wata: Nimûney lawazîyê û bê deselatî bo

ême hênawetewe û bedîhatinî xoy le bîr kirduwe, deyut: Kam em êskane zîndû dekatewe le katêkda ke rizîw pirukawin?=. Wî me ra mînak anî û afirandina xwe ji bîr ve kirîye. Wî digot; Kî yê ev hestîyên rizyayî û bi ser hev da genî bûne wê vejîne?’. Dema ku ev ayeta hate xwarê (nazilî) kafişkî hestîyakî rizyayî anî ba Pêxember (D.X.L) û jê pirsî ; tu dibêjî Xweda can û ruh dide vî hestîya?’, Pêxember (D.X.L) jî gotîye ; ‘’bele’’. Îjar ev ayeta hate xwarê. Helbestvan dibêje ; ‘’gihîştina bi wê? kesa ku helbesta xwe ji bo gotîye, bi vejîn û zindîkirina wî hestîyê rizyayî danîye. Helbestvan di wêneyekî din da dibêje:

*Ke demî sayey Tûba, be ‘efa meûwakem  
bête dill yadî bedîy ew sege, cêm pê seqer e*

[D. K, b. yekem, 592]

Helbestvan di vî wêneyî da sûd ji du suretên Qur’ana Pîroz wergirtîye, ew jî heryek ji ‘’Tuba’’ ku Xwedayê Mezin di ayeta 29 ya Sureta ‘’El Re’d’’ difermo: [الَّذِينَ آمَنُوا وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ طُوبَىٰ لَهُمْ وَحُسْنُ مَآبٍ يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا لَا تَقْتُلُوا الصَّيِّدَ وَأَنْتُمْ حُرْمٌ وَمَنْ قَتَلَهُ مِنْكُمْ مُنْعَمًا فَجَزَاءٌ مِّثْلُ مَا قَتَلَ مِنَ النَّعَمِ يَحْكُمُ بِهِ ذَوَا عَدْلٍ مِنْكُمْ هَدْيًا بَالِغَ الْكَعْبَةِ أَوْ كَفَّارَةٌ طَعَامُ مَسَاكِينَ أَوْ عَدْلٌ ذَلِكَ صِيَامًا لِيَذُوقَ وَبَالَ أَمْرِ عَفَا اللَّهُ عَمَّا سَلَفَ وَمَنْ عَادَ فَيَنْتَقِمِ اللَّهُ مِنْهُ وَاللَّهُ عَزِيزٌ ذُو انْتِقَامٍ]

Helbestvan bi hoya çavkanîya Qur’anê wêneyekî ciwan nexşandîye, ev jî jîrî û pisporîya helbestvan nîşan dide

## Encam

Wêneyê helbestî can û ruhê helbestê ye, çimkî wêne li hemberî mayîna rojên raborîyên dûr û dirêjyê dîroka deqên helbestê da zindîtî û nemirîye dide deqên helbestê...

Rol û erken serekîyên wêneyê helbestî heye di diyarkirina sîma û taybet mendîyên rêbazên wêjeyî da, herwek di vê vekolînê da ji bo me zelal bû ku her rêbazên wêneyê helbestî cuda ne digel rêbazên din yên wêjeyî.

Di bunyeya helbestê da wêneyê helbestî binaxeyeke (bingeh) xurt û bihêz ya helbestê ye, wek beşeke giring digel hemû hemanên (elemanên) xweyên helbestî bi hevbeşî ji "ziman, bîr, waqî'î, xeyal û aşop (endêşe) û hidamê (nest) pêktê. Çimkî dema ku wêne di tekstên (deqên) helbestê da nebe, ew hemanên wê çiqas bihêz û ciwan bin jî çêj û ta' ma deqên helbestê namîne.

Ziman û ew peyvên ku helbestvan bikaranîye, dikevîne xaneyê zimanekî hêsan û navendîku em bihêsanî wataya helbestên wî tê digên (fam dikin). Ev jî bi hoya wê awaza muzîkê ye ku di helbestên helbestvan da xuya dibe û di dema xwendina helbestan da bi hêsanî tê berçav guhê xwendevanan. Ev jî taybetîyeke eşkere ya helbestên helbestvane.

Zanîn û şîyana bilind ya helbestvan hebûli ser hunerarewanbêjî û bitaybetîli ser ronbêjî û bişeweyekî jîrî ev hunerabikarîye. Ew jî bi hoyalihevçîwandin, xaze, dirke ve.

Li ba helbestvan wêneyê helbestî bû giringtirîn **firiyaad resî** nexweşî û **nalebarî** jiyana wî. Çimkî helbestvan di beşeke baş ya dîwana xwe da ku ev jî weke çavkanîyeke hêsinî (xudî) sûd jê wergirtîye û şanazîyêbi xwe dike. Herwiha behsa ax û nalîn, tenêyî, dûrî û derbederîya xwe dike.

Helbestvanên hevserdema Mistefa Begê Kurdî bitay betî Nalî Salim bûneheyvanê helbestên wî. Bitaybetî jî Salim ku pismamê wî ye û gelek helbest bi şeweya name ye ji bo wî nivîsandî ye. Bi vê jî pêwendî û asta helbestên xwe pê bilid kirîye, çimkî bê guman ev pêwendî di wê serdemê da xaleke bihêz bû ji bo asta rewşenbîrî û jîrî ya helbestvan.

Helbestvan gelek sûd ji çavkanîya kelepûra neteweyî wata ji folklore wergirtîye, ev jî di çend beşên cuda cudayên vê sermîyana neteweyî. Weke gotinên pêşîyan, destan, efsane wata beşeke giring ya sermîyana neteweyî zindî kirîye.

Êş û jana nîştîmana helbestvan ramanên wî zêde fireh kirîye, ev jî ji ber wê zilm û zorîyên ku ji alîyê dagirkeran ve bi ser gelê wî da hatine. Bitaybetî xerabûn, şikandin û dagirkirina Mîrnişîna Baban ji alîye Osmanîyan ve, bi wê hoyê ve di wênehelbestên xwe da behsa bûyer û kesayetîyên dîrokî kirîye.

Dîn (ol) liba helbestvan pîroz bû, bişêweyekî gelekî hûr li ser dîn û bawerîyan rawestyaye. Herwihah elbestvan pirranîya qonaxên xwendina mellatî (mellatî) tamam kirîye û ev jî bûye hoy ku sûdê ji çavkanîyên dînen Zerdeştî, Xirîstîyanî û biradeyeke pirr jî ji Dîne Îslamê werbigre.



## ÇAVKANÎ

Arî Sûbhî Koyî, *Wêney Hunerî Le Şî'ri Nalî da*, Govarî Kosar, 2002,

‘Adil Germîyanî, *Çemkî Rîalîzm Le Nêwan Felsefe û Huner û Edebda*, Dezgay Newşafaq.

‘Adil Mecîd Mihemmed Germîyanî, *Wêney Babetî Le Hondrawekanî Goran û Seyyab da*, Namey Diktora, Kollejî Perwerdey Îbn Ruşd, Zankoy Bexda, 2000

‘Adil Germîyanî, *Şa'îranî Wêneyî û Çemkî Wêney Honraweyî*, kovarî Raman, 2001, J. 61

‘Adil Germîyanî, *Xesletekanî Zimanî Şî'ri Kurdiy Hawçerx*, kovarî Henar, 2013, J. 91

Azad Ehmed Mehmûd, *Binyatî Ziman Le Şî'ri Hawçerxî Kurdî da*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012

Azad Ehmed Mehmûd, *Şeş Lêkolînewey Şî'ri*, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2008

Berzan Mela Taha, *Edebî Felsefî û Ezmûne Zînduwekanî Serdem*, Çapxaney Şivan, 2008

Cebar Ehmed Hisên, *Îstatîkay Deqî Şî'ri Kurdî Kurdistanî 'Iraq*, Çapxaney Serdem, Silêmanî, 2008

Cegerxwîn, *Cegerxwîn Şa'îr û Mirov û Kurd perwer*, Dezgeha Spêrêzya Çap û Weşandin, Çapxaneya Wezareta Perwerdê, Hewlêr, 2004

Cemal ‘Hebîbûlla Bêdar, *Derwazey Şî'rnasîn*, Çapxaney Narîn, Hewlêr, 2013.

Cemal Mihemmed Mihemmed Emîn, *Dîwanî Hemdî*, Ehmed Begî Sahêbqiran, Çapxaney Ofîsî Serkewtin, 1984

Derya Cemal Hewêzî, *Wêney Rûnbêjî Le Komele Şî'ri (Şehîd Be Tenya Piyase Dekat) î Qubadî Celîzade da*, Çap û Bilawkirdnewey Silêmanî, Silêmanî, 2009

Dilêr Ehmed Qeredaxî, *Wêney Şî'ri Lay Nalî*, kovarî Raman, 2002, J. 74

Dilşad Elî, *Dîlan û Taqîkirdnewey Şî'ri*, Çapxaney Serdem, Silêmanî, 2007

Entonyos Betres, *el- Edeb Te'rîfe Enwa' Mezhebet*, el-Muesseset el-'Hedîset lil Kîtab, Lubnan, 2005

Ebbas Mihemmed Qadir, *Rîyalîzm Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî da 1946-1947*, Çapxaney Melbendî Kurdolojî, 2010

Ebdulla Goran, *Dîwanî Goran*, Çapî Çiwarem, Bilawkirawey Panîz, 1389 Koçî

Ebdulla Peşêw, *Hespim Hewre û Rikêfîm Çiya 1980-2005*, Çapî Çiwarem, Çapxaney Rojhellat, 2014

Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Wêney Hunerî Le Şî'rî Şêx Nûrî Şêx Salih*, Namey Diktora, Kollêjî Ziman, Zankoy Silêmanî, Silêmanî, 2006

Ebdulxaliq Sersam, *Le Lêwarî Gerdûn da*, Dar El Hurriye lil Teba'et, Bexdad, 1990

Ednan Mibarek, *El Şî'r El Konkirêfî*, Mucele El Eqlan, Bexdad, 1982

Ehmed Mihemmed Mam Usman, *Şî'rî Fêrkirdin Le Edebî Kurdî da (Nîwey Yekemî Sedey Bîstem)*, Namey Master, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 2007

Emîn Feyzî, *Encumenî Edîbanî Kurd*, Çapxaney Korî Zanyariy 'Iraq, Bexdad, 1983

Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî Le Edebî Kurdî da*, Çapxaney Dar el Ca'hiz, Çapî Yekem, Bergî Yekem, Bexda, 1972

Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî*, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2002

'Elaeddîn Secadî, Xoşxwanî, Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 1986

'Elaeddîn Secadî, *Edebî Kurdî û Lêkolînewe Le Edebî Kurdî*, Çapxaney Ma'arif, Bexda, 1967

'Elaeddîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Întîşaratî Kurdistan, Sine

Ebdulla Xidir Mewlûd, *Karîgeriy Şa'îranî Kilasîkî Kurd Le Ser Yektir da*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2013

Ebdulqadir Heme Emîn Mihemmed, *Binyatî Karnameyî Le Deqî Nwêy Kurdî da*, Çapxaney Tîşk, Silêmanî, 2008

Elî Cewad Tahîr, *el- Xulase fi Mezheb Edeb El Xerbî*, Dar el-Hurriye lil Teba'e, Bexdad, 1983

Erselan Bayiz Îsmâil, *Sîmay Şî'rî Kurdî Diway Raperîn, 1992-2002, Be Nimûney Şî'rekanî Rojnamey Kurdistanî Nwê*, Çapxaney Serdem, Silêmanî, 2002

Faîq Bêkes, *Dîwanî Bêkes*, Întîşaratî Kurdistan

- Fazil Mecîd Mehmûd, *Siruşt Le Şî'rî Goran da*, Çapxaney Serdem, Silêmanî, 2007
- Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, Çapxaney Endêşe, Silêmanî, 2009
- Ferhad Qadir Kerîm, *Binyatî Wêne Le Şî'rekanî Hemdî da*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2012
- Ferhad Ezîz Xoşnaw, *Efrandin û Mirdin Le Efsaney Kurdî da Be Pêy Avêsta û Deqe Pehlewîyekan*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2013
- Ferhad Pîrbal, *Şî'rî Nwêy Kurdî, 1898-1958*, Dezgay Kurdistan, Hewlêr, 2005
- Fûad Reşîd, *Deqî Edebî (Edgar, Çêj, Beha)*, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2007
- Fatîh Ellaq, *Mefhûm el-Şî'r 'Înde Rude el- Şî'r el- 'Erebî el- 'Hur*, Menşûrat Îtî'had el-Kîtab el-'Ereb, Dîmeşq, 2005
- Gîwî Mukiryani, *Mistefa Begî Sahêbqiran Dîwanî Kurdî*, 1387 Koçî
- Goran, *kovarî Rovar, Be Hawbeşiy Çapxaney Aras û Serdem*, 2710K, J.60
- Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyatî Hunerî Le Şî'rî Şêrko Bêkes*, Dezgay Serdem, Silêmanî, 2009
- Hawjîn Silêwe, *Rehendî Derûnî Le Şî'rekanî Letîf Helmet da*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2013
- Hîmdad Hisên, *Derwazeyek Bo Rexney Edebî Kurdî*, Çapxaney Xanî, Dihok, 2007
- Hawjîn Silêwe, *Soz Le Şî'r da*, kovarî Raman, 2010, J. 159
- Hejar Mukiryani, *Hejar Bo Kurdistan*, Çapî Noyem, Întîşaratî Hejar, 1392 Koçî
- Hejar, *Henbane Borîne*, Ferhengî Kurdî-Farisî, Çapxaney Sirûş
- Helmet Bayiz Resûl, *Rehendekanî Derûnî Le Çîrokekanî Şêzad Hesenda*, Zankoy Bexda, Kollêjî Îbn Ruşd, Namey Master, 2006
- Hemîd Hesen Mihemmed, *Layê Hunerî û Naveroka Hozana 'Sebrî Botanî'*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012
- Hêmin Mukiryani, *Dîwanî Hêmin*, Çap û Pexşî Çiwarçira, Silêmanî, 2708 Kurdî
- Hîmdad Hisên, *Rêbaze Edebîyekan*, Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr, 2007
- Husên Arif, *Koktêl*, Çapxaney Serdem, Silêmanî, 2005
- Îdrîs Ebdulla, *Qonaxî Pêş Romansîzmî Kurdî (1851-1921)*, Çapî Yekem, Çapxaney Roşinbîr, Hewlêr, 2006

- Îdrîs Ebdulla, *Kowanekanî Rewanbêjî*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2013
- Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Berawirdî Edebî*, Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 2014
- Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Edebî Konî Kurdî*, Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 2012
- Îbrahîm Sameraî, *Fî Luxe el- Şî'r*, Dar el-Fîkir, Emman, 1404 Hicrî
- Îdrîs Ebdulla Mistefa, *Layene Rewanbêjîyekan Le Şî'ri Kilasîkî Kurdî da Be Nimûney Hemdî û Hacî Qadirî Koyî*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2011
- Îdrîs Ebdulla, *Şêwaz*, Çapxaney Minare, Hewlêr, 2012
- Îdrîs Ebdulla, *Edebî Millî û Folklorî*, Bergî Sêyem, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2014
- Îzeddîn Îsmâîl, *el-Edeb we Finûnehû Dar El Fikir el- 'Erebî*
- Îzeddîn Mistefa Resûl, *Edebîyatî Nwêy Kurdî*, Xwêndinî Bala, Hewlêr, 1989
- Îzeddîn Mistefa Resûl, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Çapxaney Dezgay Aras, Çapî Sêyem, Hewlêr
- Îhsan Ebbas, *Fen Şî'r, Teb'e Selîse, Tewzî' we Neşir Dar Seqafe we Beyrût*, Lubnan
- Îsmâîl Tenya, *Wêney Şî'ri*, Govarî Karwan, Xulî Raperîn, 1994, J. 11
- Jiwan Ebdulselam Gerdî, *Şêwz le Şî'rekanî Kameran Mukrî Le Jêr Roşnayî Qutabxaney 'Fîlolojî Lîw Şpîtzer'' da*, Namey Master, Zankoy Selaheddîn, 2014
- Kakey Fella'h, *Wêney Şî'ri Çî ye ?*, kovarî Karwan, 1986, J. 49
- Kameran Mukrî, *Edebî Folklorî Kurdî*, Beşî Yekem, Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 1984
- Kamîl 'Hesen 'Ezîz Elbesîr, *Rexnesazî Mêjû û Peyrewkrdin*, Çapxaney Korî Znyarî 'îraq, 1983
- Kamîl 'Hesen 'Ezîz Besîr, *Wêjey Kurdî û Rexnesazî*, Çapxaney Dar el Ca'hiz, 1991
- Kemal Merûf, *Edebîyatî Cîhanî*, Nûsîngy Mîlo Bo Karûbarî Kompyuter û Çap
- Kemal Mîrawdêlî, *Felsefey Ciwanî û Huner*, Çapxaney Zankoy Silêmanî, 1979
- Kemal Mîrawdêlî, *Rîalîzmî Soşyalîstî*, Govarî Bîri Nwê, J.68

Kerîm Mistefa Şareza, *Wişey Şî'ri Le Honrawey Kurdî da*, Govarî Beyan, Dezgay Roşinbîrî û Bilawkirdnewey Kurdî, 1989, J. 156

Kerîm Mistefa Şareza, *Wişey Şî'ri Le Honrawey Kurdî da*, kovarî Beyan, Dezgay Roşinbîrî û Bilawkirdnewey Kurdî, 1989, J. 156

Kerîm Mistefa Şareza, *Wişey Şî'ri û Wişey Naşî'ri*, kovarî Raman, J. 128

Kerîm Şareza, *Wênay Şî'ri Le Honrawey Kurdî da Çon Dirust Debê û Be Çi Hestêk Werdegîret*, kovarî Raman, 1997, J. 9

Komelêk Nûser, *Serincêk Le Derwazey Folklorî Kurdewe*, Çapxaney Dezgay Aras, Çapî Duwem, Hewlêr, 2009

kovarî Beyan: J. (31) î Salî 1975

Lîlyan Firêst, *el-Romantîkîye*, Tercume: 'Ednan Xalîd, Mîn Menşûrat el-Merkez el-Seqafî el-Îctîma'î, Bexdad, 1987

Mehmûd Zamdar, *Le Banêjî Şî'rewê*, Komeley Roşinbîranî Kurd, Çapxaney Rojnamey 'Iraq, Bexdad, 1981

Mela Ebdulkerîm Muderîs, *Dîwanî Mewlewî*, Çapxaney Întîşaratî Kurdistan, Sine, 1377 Koçî

Mensûr Ebdulrehman, *Îttîcahat, el-Neqd el Edebî fî Qarin Xemas el-Hicrî*, Mektebet Encilû el-Misrîyet, Qahîre, 1997

Mihemmed Nûrî Arif, *Ferhengî Dîwanî Şa'îran Nalî - Salim- Kurdî*, Dezgay Aras, Çapî Duwem, Hewlêr, 2009,

Mela Ebdulkerîm Muderîs, û Fatîh Ebdulkerîm, *Dîwanî Nalî*, Çapxaney Întîşaratî Kurdistan, 1379 Koçî

Mela Ebdulkerîm Muderîs, û Mihemmedî Mela Kerîm, *Dîwanî Mehwi*, Çapxaney Întîşaratî Kurdistan, 1381 Koçî

Mihemmed Ebdulkerîm Îbrahîm, *Pêkhatay Zimanî Şî'ri Le Riwaney Rexney Edebî Nwêwe*, Ezmûnî Şa'îranî Heştakanî Hewlêr Wek Nimûne, Çapxaney Mukiryân, Hewlêr, 2012

Mihemmed Kurdo, *Geran Be Diway Şî'r û Ciyawazî da*, Berêberayetî Çap û Bilawkirdnewey Silêmanî, Silêmanî, 2004

Mihemmed Mistefa Hemebor, *Dîwanî Kurdî*, Bergî Dûyem, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2010

Mihemmed Mistefa Hemebor, *Dîwanî Kurdî*, Bergî Yekem, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2010

Mihemmed Sûbhî Es'ed Ebû Husên, *Sûre el Meret fi Edeb Endelûsî fi 'Esr el-Tewaîf we el-Merabitîn*, 'Alem el- Keteb lîl Neşir we el-Tewzî Erîd-Erden, 2005

Mistefa, Kanyaw 'Usman û Prof. Yarîdeder Dr. Newzad Waqas Se'îd: *Wêney Şî'ri Le Şî'rekanî Racî da*, kovarî Ekadîmyay Kurdî, 2012, J.22

Muhsîn Aware, *Rengdanewey Wêne le Şî'ri Kurdî da*, K.Roşinbîriy Nwê, J. 75, 1979

Mihemmed Nûrî Arif, *Têkstî Edebî Kurdî*, Çapxaney Zankoy Silêmanî, 1981

Mihemmed Xenîmî Hîlal, *Dîrasat we Nemazic Fî Mezheb el Şî'r we Neqdihû*, Qahîre

Mihemmed Xenîmî Hîlal, *el-Edeb el Meqarin*, Nehzet Mîsir Lîl Teba'et wel Neşir, 1998

Mihemmed Xenîmî Hîlal, *el-Neqd el-Edebî el-Hedîs*, Bila Seras lîl Neşir, 1985

Muhsîn Ehmed Umer, *Rûnbêjî Yan Rewanbêjî*, kovarî Raman, 2008

Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Sêyem, Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr, 2010

Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Yekem, Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr, 2010

Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Pêncem, Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr, 2010

Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Şeşem, Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr, 2010

Nale Hesên, *Suryalîzm Wek Bîr Wek Dahênan*, Govarî Henar, Çapxaney Silêmanî, 2009, J. 40

Necim Ellwenî, *Niwandinî Wêne*, [www.emrro.com](http://www.emrro.com)

Nesrîn Raûf Îsmâîl, *Erkî Şî'ri Le Edebî Kurdî da (1920-1958)*, Çapxaney Rojhellat, 2010

Osman Deştî, *Lebarey Binyatî Ziman û Şêwazî Şî'r*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012

Perêz Sabîr, *Rexney Edebî Kurdî û Meselekanî Nwêkirdnewey Şî'r*, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2006

Pêşrew Ebdulla, *Edeb. Şêwekarî. Tîyor*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2014

- Pêşrew Ebdulla, *Qutabxaney Derûnşîkarî Le Rexney Edebî da*, kovarî Ayînde, J. 89
- Pexşan Sabir Hemed, *Remz Le Şî'ri Hawçerxî Kurdî Kirmanciyn Xwarûy Kurdistan 1970-1991*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012
- R.L Brêt, *El Teswîr we El Xeyal*, Tercume: Dr. 'Ebdulwahîd Lulue, Dar el Hurîye lil Teba'e, Bexdad, 1979
- Reza Seyyid Huseynî, *Qutabxane Edebîyekan*, Wergêranî: Heme Kerîm Arif, Çapxaney Wezareti Perwerde, Hewlêr, 2006
- Rêzan Salih Mewlûd, *Endêşey Şî'ri Le Nêwan Rêbazî Kilasîk û Romantîkî Kurdî Le Kirmanciy Xwarû da*, Çapxaney Şahab, Hewlêr, 2009
- Rizgar 'Umer Fettah, *Romansîzm le Şî'ri Hêmin û Mihemmed Nûrî da*, Çapxaney Mukiryân, Hewlêr, 2013
- Roz Xerîb, *Temhîd fi el-Neqd el- Hedîs*, Dar el-Meqşûf, Beyrût, 1971
- Refîq Mihemmed Şiwani, *Edeb û Komele Witarêkî Edebî*, Çapxaney Wezareti Roşinbîrî, Hewlêr, 2008
- S.D. Lîwis, *Sure el- Şî'riye*, el-Tercume Ehmed Nesîf el-Canibî we Axîrûn, Dar el-Reşîd lîl Neşir, Bexdad, 1982
- Sa'd Farûq Yûsif Şêxbizênî, *Binyatî Hunerî Şî'ri Ehmed Muxtar Begî Caf da*, Çapxaney Roşinbîrî, Hewlêr, 2011
- Saman Îzeddîn Sa'dûn, *Binyatî Hunerî Le Şî'rekanî Letîf Helmet da*, Çapxaney Kemal, Silêmanî, 2009
- Serdar Ehmed Hesên Gerdî, *Binyatî Wêney Hunerî Le Şî'ri Kurdî da (1970-1991)*, Silêmanî, Dezgay Serdem, 2004
- Soran Azad, *Guzariştî Xud*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2012
- Soran Mamend Ebdulla, *Nostalojîya Le Şî'ri Hawçerxî Kurdî da, Be Nimûney Şî'rekanî: Ebdulla Peşew, Enwer Qadir Mihemmed, Sebah Rencder*, Çapxaney Taran, Hewlêr, 2016
- Semîr 'Elî Semîr Dilêmi, *el-Sûret fi el-Teşkil Şî'ri*, Dar el-Şûewen el-Seqafet el-'Am, Afaq 'Erebîye El 'Iraq, Bexdad, 1990
- Samî Mihemmed Ebabine, *el-Tefkîr el-Uslûbî*, Dar el-Reşîd, Bexda, 1982
- Sasîn Esaf, *Wêney Şî'ri Le Rêbazî Romantîk da*, Wergêranî: 'Adil Germîyanî, kovarî Raman, 1999, J.27

Sellah Fezil, *Nazarîye el-Bînaîye fî Neqd el-Edebî*, Dar el-Şûewen el-Seqafe el-‘Ame, Bexdad, 1987

Senger Qadir Şêx Mihemmed, *Felsefey Şî’r û Şî’rî Felsefî Be Nimûney Şî’rekanî Refîq Sabîr û Kerîm Deştî*, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr

Şaxewan Ferhad, *Şî’ryetî Wêney Şî’rî*, kovarî Raman, J.214

Şiwan Silêman, *Edebî Hawçerx*, Waney Qonaxî Çiwarem, Zankoy Selaheddîn, Kollêjî Ziman, Beşî Kurdî, 2014

Şukrî Ezîz Mazî, *Tîyorî Edeb*, Wergêranî, Dr. Serdar Ehmed Gerdî, Çapxaney Mardîn, Hewlêr, 2010

Şukurye Resûl, *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, Metbe’et Ta’lîm ‘Alî, Hewlêr, 1989

Şemêran Silêman, *Rûberû Legell Letîf Helmet*, Dezgay Aras, Hewlêr, 2011

Şêrko Bêkes, *Çepkêk Hevpeyvîn, Ezmûn (1985-2000)*, Kokirdnewe û Amadekirdinî Yasîn ‘Umer, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî, 2001

Şermîn Îbrahîm Ezîz, *Peşêw û Tazekirdnewe le Şî’rî Kurdî da*, Çapxaney Roşinbîrî, Hewlêr, 2006

Tenya Es’ed Mihemmed, *Dîyardey Xem Le Şî’rî Hesîb Qeredaxî da*, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2012

Tahîr Mihemmed Elî, Dr. Qumrî Se’îd Ezîz, *Riwanîn le Deq*, Çapxaney Silêmanî, Silêmanî, 2011

Tîfa ‘Eta Bin ‘Ude, *Mewqîf Neqd el Edebî mîn el-Herekat el Tecdîd fî Ş’ir el-‘Erebî (1918-1945)*, Rîsalet Macester, Camî’e Bexdad, 1985

Umêd Aşna, *Pîremêrd Pêdaçûneweyekî Jiyan û Berhemekanî*, Bergî yekem, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2009.

Umer Emîn, *Romansîzm li Şî’r Hêmin û Mihemmed Nurî da*, Çapxaney Mukiryana, Hewlêr, 2013, r.41

‘Umer Bin Ba’hir Ca’hiz, *el-‘Heyewan*, Te’hqîq: ‘Ebdulsela Mihemed Harûn, Mektebet Mistefa el-Babî el-‘Helî, Qahîre, 1938

‘Usman ‘Ebdûl Berzincî, *Rolî Şarî Silêmanî Le Edebîyatî Kurdî da Ta Kotayî Serdemî Babanekan*, Namey Master, Zankoy Selaheddîn, 1995

‘Umer Mela Hiwîş, *Eser el-Belaxe fî Tefsîr el-Keşif*, Metbe’et Dar el-Basrî, Bexdad, 1970



Werzêr Mensûr, *Hokarekanî Serhelldanî Rêbazî Suryalîzm*, kovarî Gelawêjî Nwê, Çapxaney Hemdî, Silêmanî, 2013, J.61

Xelîl Îbrahîm Mistefa, *Şî'ryetî Deq Be Nimûney Şî're Kurdîyekanî Mehwî*, Namey Master, Zankoy Selaheddîn, 2009

Xurşîd Reşîd Ehmed, *Rêbazî Romantîkî le Edebî Kurdî da*, Çapxaney Bexdad, 1989

Xanzad Elî Qadir, *Zimanî Şî'riy Hacî Qadirî Koyî û Mehwî û Şêx Rezay Talebanî*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012

Yûnis Silêman Ehmed, *Rengdanewey Romansîyet le Şî'ri Mewlewî da*, kovarî Raman, 2013, J. 198

Yûsif Ebû 'Edûs, *el-Îstî'are fî Neqd Edebî el-'Hedîs*, Tabî'et el Ule el-Ehlîye lîl Neşir we Tewzî', Emman, 1997

Yûsif Elî Mihemmed, *Binyatî Wêne Le Şî'rekanî Mîhrî da*, Namey Master, Kollêjî Perwerde, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 2014